

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Furkan DENİZ

MELA MÛSAYÊ CELALÎ VE MEM Û ZÎN ŞERHİNİN TAHLİLİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2021

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Furkan DENİZ

MELA MÛSAYÊ CELALÎ VE MEM Û ZÎN ŞERHİNİN TAHLİLİ

YÛKSEK LİSANS TEZİ

TEZ YÖNETİCİSİ
Doç. Dr.Ayhan TEK

MUŞ-2021

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Furkan DENİZ

MELA MÛSAYÊ CELALÎ Û TEHLÎLA ŞERHA WÎ YA LI SER
MEM Û ZÎNÊ

TEZA MASTIRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ
Doç. Dr. Ayhan TEK

MÛŞ-2021

NAVEROK

NAVEROK.....	I
ÖZET	VI
KURTE	VII
ABSTRACT	VIII
PÊŞGOTIN	IX
KURTEBÊJE.....	XI
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEMÎN

JIYAN Û BERHEMÊN MELA MÛSAYÊ CELALÎ

1.1. JIYANA MELA MÛSAYÊ CELALÎ	13
1.1.1. Nav û Mexlesa Wî	13
1.1.2. Malbat û Zarokatiya Wî	13
1.1.3. Zewac û Zarokên Wî.....	14
1.1.4. Perwerdeya Wî	14
1.1.5. Gundên Ku Mela Mûsayê Celalî Lê Xwendine û Seydayên Wî.....	16
1.1.6. Cihên Lê Wezîfe Kiriye û Muderîstiya Wî.....	16
1.1.7. Di Kamilbûna Mela Mûsayê Celalî De Rola Medreseya Wî.....	17
1.2. BERHEMÊN MELA MÛSAYÊ CELALÎ	19
1.2.1. Berhemên Mela Mûsayê Celalî yên Ku Bi Zimanê ‘Erebî nivîsine	19
1.2.1.1. Mecmuatu’l-Ulum	19
1.2.1.2. Mecmuatu’l-Fewaîd.....	19
1.2.1.3. Mecmuatu’l Qasaîd.....	19
1.2.1.4. Mecmuatu’l Fetawa	20
1.2.1.5. Mecmuatu’l Maqasid	20

1.2.1.6. Haşîye Ala İşaretî'l Î'caz	20
1.2.1.7. Şerhu Qasaîd-î İbn Fariz	20
1.2.1.8. Şerhu Ebyatî Tarîxu'l Xulefa	20
1.2.1.9. Şerhu Ebyatî Nurî'l Ebsar	21
1.2.1.10. Şerha Kizil İcazê.....	21
1.2.1.11. Haşiyeyek li ser Tefsîru'l Muhmelê	21
1.2.1.12. Talîqat Ala Haşiyetî'l-Kizilci Ala Tasrifî'l Eşnevî	21
1.2.1.13. Mecmuatu'r-Resaîl	22
1.2.1.14. Er-Risaletu'd-Daiyye İla Mahabbati Muaviye	22
1.2.1.15. Nefyu'l-Ciheti We'l-Xulul We'l-İttihad We'l Mekan Anil'llahi'l- Wahidî'l-Qahhari'r-Rehman	22
1.2.1.16. Ta'liqat Ala'l-Kitabi'l-Lezi Yebhasu Ani'l-Lah	22
1.2.1.17. Senau's-Saqaleyn Fî Menaqib-î Ş-Şeyheyn Ebî Bekir Es-Siddîq ve Omer El-Farûq.....	22
1.2.1.18. Celau'l-Ayneyn Fî Menaqib-î'l-Xateneyn Usman Zî'n-Nureyn we Alî ebî's-Sibteyn.....	22
1.2.1.19. El-Envaru's-Satîa Fî'l-Ecvibeti Ani'l-İ'tiradati'l- Warideti Ala'l- Xulefai'l-Erbaati.....	22
1.2.1.20. Nuru'l-Basar Fî Menaqibi'l-Eimmeti'l-İsney Aşer	23
1.2.1.21. Feyzu'l-Qadiri'l-Mubdî Şerhu'l-Mewlidi'l Kurdî	23
1.2.1.22. Feyzu'l-Qadiri'l-Alam Şerhu Nehci'l Enam.....	23
1.2.1.23. Feyzu'l-Qadîri'r-Rehman Şerhu Newbihara Biçûkan	23
1.2.1.24. Feyzu'l-Qadiri'l-Mennan Şerhu Aqîdeti'l İman	24
1.2.1.25. Mecmuatu'l-Fuyûzat.....	24
1.2.1.26. Şerhu Tefsîri'n-Nesefî	24
1.2.1.27. Haşiyetu Camiu'l-Mağasid Ala Halli'l-Meaqid Şerhu'l-Qawaid	24

1.2.1.28. Haşiyetu Şerhu'l-Muğni.....	24
1.2.2. Berhemên Mela Mûsayê Celalî yên Bi Kurdî Nivîsine	25
1.2.2.1. Mewlîd	25
1.2.2.1.1. Safikirina Mewlîdê Ji Bo Kurmanciya Celalî	25
1.2.2.1.2. Xebatekê Ta'liqatê Li Ser Mewlîda Kurdî	27
1.2.3. Berhemên Mela Mûsayê Celalî yên Ku Him Bi Kurdî û Him Ji Bi 'Erebî Nivîsîne	28
1.2.3.1. Şerha Mem û Zînê-Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerha Kitaba Mem û Zîn	28
1.2.3.2. Şerha Dîwana Mela Ehmedê Cizîrî	28
1.2.4. Berhema Mela Mûsayê Celalî ya Ku Bi Zimanê Tirkî Nivîsiye	29
1.2.4.1. Îhsan Süreyya Sırma'ya Reddiye	29
1.2.5. Beyt û Qesîdeyên Mela Mûsayê Celalî.....	29
1.2.5.1. Beyta "Tederru"ê	30
1.2.5.2. Beyta "Ji Xewê Rabe"	31
1.2.5.3. Beyta "Ey İnsan"	31
1.2.5.4. Beyta "Navê Xuda" (Celle Celaluh)	32
1.2.5.5. Beyta "Navê Pêxember" ('Eleyhisselam)	32
1.2.5.6. Beyta "Wefata Pêxember" ('Eleyhisselam).....	33
1.2.5.7. Beyta "Di Heqqê Şeytan" ('Eleyhille'net)	34
1.2.5.8. Beyta "Di Heqqê Ateîstî"	34
1.2.5.9. Beyta "De'wetê"	35
1.3. DI BEYT Ê QESÎDEYÊN MELA MÛSAYÊ CELALÎ DE REXNEYA CIVAKÎ.....	36

BEŞA DUYEMÎN

TEHLÎLA ŞERHA MELA MÛSA YA LI SER *MEM Ê ZÎNÊ*

2.1. KESAYETIYA EDEBÎ Ê ŞÊWAZA MELA MÛSAYÊ CELALÎ.....	38
---	-----------

2.2. ZIMANÊ ŞERHA WÎ Û DI ŞERHA WÎ DE BANDORA DEVOKA SERHEDÊ	38
2.3. UNSÛRÊN JI BILÎ KURDÎ YÊN KU DI ŞERHA WÎ DE DERBAS DIBIN ..	41
2.3.1. Unsûrên Erebî.....	42
2.3.2. Unsûrên Farisî	43
2.3.3. Unsûrên Tirkî.....	43
2.4. ÇEND ŞERHÊN KURMANCE YÊN LI SER MEM Û ZÎNÊ HATINEKIRIN Û ŞERHA MELA MÛSAYÊ CELALÎ	44
2.4.1. Şîroveya Perwîz Cîhanî.....	44
2.4.2. Şerha Jan Dost	46
2.4.3. Şerha Mela Mûsayê Celalî û Di Derbarê Şerha Wî De Çend Xalên Girîng	47
2.4.3.1. Rexneyek Li Ser Şerha Mela Mûsayê Celalî <i>Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerha Kitaba Mem û Zîn</i>	47
2.5. ÇEND HUNERÊN EDEBÎ YÊN KU DI ŞERHA WÎ DE DERBAS DIBIN	49
2.5.1. Hunerên Mecazî.....	49
2.5.1.2. Kînaye	50
2.5.1.3. Mecazê Mursel	51
2.5.1.4. Mecaz	51
2.5.2. Hunerên Ciwankarî (Bedî', Wateyî)	51
2.5.2.1. Tenasub	51
2.5.2.2. Telmîh	52
2.5.2.3. Îstifham	52
2.5.2.4. Husnê Talîl	53
2.5.2.5. Mubalexe.....	54
2.5.2.6. Tezad/Dijwate.....	54
2.5.2.7. Îqtibas.....	55
2.5.2.8. Tekrîr/ Dubarekirin	55

2.5.2.9. Nîda/Banglêkirin.....	55
ENCAM.....	57
ÇAVKANÎ.....	59
PÊVEK.....	62

ÖZET
YÜKSEK LİSANS TEZİ
MELA MÛSA CELALÎ VE MEM Û ZÎN ŞERHİNİN TAHLİLİ
Furkan DENİZ
Tez Danışmanı: Doç Dr. Ayhan TEK
2021, 372 sayfa

Klasik Kürt Edebiyatı alanında yazılan eserler arasında en çok tercih edilen türlerden biri mesnevidir. Kürt edebiyatında yazılmış ilk aşk mesnevisi olarak kabul edilen Ehmedê Xanî'nin *Mem û Zîn*'i ile bu geleneğin başlatıldığı görülmektedir. Bu eser hem Kürtçedeki türünün ilk örneği olması bakımından hem de özgün bir metin olarak Kürtlerin kendi sözlü kültür ürünlerinden "Memê Alan" destanına dayandığı için etkisi büyük olmuştur. Bu bağlamda Kürdoloji çalışmaları çerçevesinde *Mem û Zîn*'in üzerine yapılan ilmi çalışmaların yoğunluğu, bu metnin tesirinin bir diğer göstergesidir.

Ehmedê Xanî'nin *Mem û Zîn*'i üzerine çalışmış isimlerden biri de Mela Mûsayê Celalî'dir. Celalî bir medrese alimi olmanın yanı sıra pek çok talebe yetiştirmiş ve medrese geleneği içerisinde edebiyat metinlerine şerhler yazmış bir isimdir. Celalî'nin *Mem û Zîn* şerhi de şerh geleneğinin son dönem metinlerinden biridir. Biz de bu çalışmamızda Mela Mûsayê Celalî'nin hayatı, eserleri ve onun *Mem û Zîn* üzerine yazdığı şerhi incelemeyi amaçlamaktayız.

Çalışmamızın sonunda çevrimyazısını ek olarak verdiğimiz Mela Mûsayê Celalî'nin *Mem û Zîn* şerhi geleneksel örneklerine nazaran, bir şerhten çok bir çeviri ve yeniden-söyleme tarzına daha yakındır. Bu bağlamda metni birçok yönüyle bilimsel olarak değerlendirip bu eserin şerh geleneği içindeki yerini de tespit etmeyi amaçladık.

Anahtar Kelimeler: Mela Mûsayê Celalî, Mesnevi, Şerh Geleneği, *Mem û Zîn*

KURTE
TEZA MASTIRÊ
MELA MÛSAYÊ CELALÎ Û TEHLÎLA ŞERHA WÎ YA LI SER MEM Û ZÎNÊ
DENİZ Furkan
Şêwirmend: Doç. Dr. Ayhan TEK
2021, 372 Rûpel

Mesnewî ji wan cureyan yek e ku di nav berhemên warê edebiyata klasîk a Kurdî herî zêde hatiye tercîhkirin. Kevneşopiya mesnewiyan, bi *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ve destpê kiriye. Wisa tê pejirandin ku di warê edebiyata Kurdî de berhema ewil a ku bi terzê mesnewiya evîni hatiye nivîsîn *Mem û Zîn* e. Ev berhem him ji aliyê yekembûnê ve him jî ji aliyê “Memê Alan” ve xwedî bandoreke mezin bûye. Lewra, “Memê Alan” ew destana resen e ku di nav xwe de hafizeyeke kolektîf ya Kurdan dihewîne. Herwisa di çarçoveya xebatên Kurdolojiyê de pîrbûna xebatên ilmî yê li ser *Mem û Zînê*, xaleke din e ku bandora *Mem û Zînê* nîşan dide.

Mela Mûsayê Celalî jî ji wan kesan e ku li ser *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî berhem daye. Mela Mûsayê Celalî alimekî ehlê medreseyê ye ku, digel wê gelek xwendevan perwerde kirine. Herwiha Celalî di nav kevneşopiya medreseyan de şerha metnên edebî kiriye. Şerha *Mem û Zîna* Celalî ya ku mijara vê xebatê ye jî ji wan metnan e ku di serdema dawiyê ya kevneşopiya şerhan de hatiye nivîsîn. Em jî di vê xebata xwe de armanc dikin ku jiyana Mela Mûsayê Celalî, berhemên wî û şerha wî ya li ser *Mem û Zînê* vekolin.

Metna şerha *Mem û Zînê* ya ku ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve hatiye nivîsîn, bi muqabilê nimûneyên şerhê yê heyî, ji şerhekê zêdetir nêzikê wergêr û ji nuve vegotinê ye. Ji vê hêlê ve, me xwest ku em vê metnê ji gelek hêlên zanistî ve binirxînin û di nav kevneşopiya şerhê de cihê vê berhemê nîşan bidin û tesbît bikin.

Peyvên Sereke: Mela Mûsayê Celalî, Mesnewî, kevneşopiya şerhê, *Mem û Zîn*.

ABSTRACT
MASTER'S THESIS
MULLAH MUSAYÊ CELALÎ AND ANALYİS OF THE ANNOLATIION OF
MEM Û ZÎN
Furkan DENİZ
Advisor: Assoc. Prof. Ayhan TEK
2021, Page: 372

One of the most preferred genres among the works written in the field of Classical Kurdish Literature is mesnevi. It is seen that this tradition was started with Ehmedê Xanî's *Mem û Zîn*, which is accepted as the first love mesnevi written in Kurdish literature. This work has had a great impact both in terms of being the first example of its kind in Kurdish and as an original text based on the epic "Memê Alan", one of the Kurdish oral culture products. In this context, the intensity of scientific studies on *Mem û Zîn* within the framework of Kurdology studies is another indicator of the influence of this text.

One of the names who worked on Ehmedê Xanî's *Mem û Zîn* is Mela Mûsayê Celalî. In addition to being a madrasa scholar, Celalî is a name who trained many students and wrote commentaries on literary texts within the madrasa tradition. Celalî's commentary on *Mem û Zîn* is one of the last period texts of the commentary tradition. In this study, we aim to analyze Mela Mûsayê Celalî's life, literary personality and his commentary on *Mem û Zîn*.

In the last part of our study, we have given the transcription text of the commentary *Mem û Zîn*, which was annotated by Mela Mûsayê Celalî. This text is closer to a style of translation and retelling than an annotation compared to the traditional examples of commentary. In this context, we aimed to evaluate the text scientifically in many aspects and to determine the place of this work in the tradition of commentary.

Key Words: Mela Mûsayê Celalî, Mesnevi, Annotation, *Mem û Zîn*.

PÊŞGOTIN

Edebiyata Kurdî ya klasîk di dîrokê de xwedî cihekî girîng û taybet e. Ji Eliyê Herûfî bigre heta roja îro gelek helbestvan û nivîskarên di bin sîwana edebiyata klasîk a Kurdî de berhem dane. Lê belê ji wan berhemên gelek negiheştine îro. Ji ber ku di wê demê de saziyên ku berhemên Kurdî xwedî derkevin tunebûn ew berhem jî li hemberî dîrokê berxwenedan û windabûn. Gelek ji wan berhemên ketin destpiya û herwiha tu qedrê wan nema û bi wê şiklê winda bûn. Ew berhemên ku giheştin roja me jî bûne cihê xebata lêkolîneran. Li ser wan berhemên ku giheştine roja me gelek kesan nivîs nivîsîn hinek kesan wan nivîsê xwe bi terzekî rexnekirî nivîsîn û hin kesan jî nivîsên xwe de pesnê wan metna dan. Her wiha ew nivîsên ku di derbarê berhemên edebiyata klasîk de hatin nivîsin bûn sedema pêşketina têgaha ‘şerh’ê. Di derbarê pênaseya têgaha şerhê de gelek kesan fikr û ramanên xwe gotine. Ersin Durmuş ew kes e ku di edebiyata Tirkî de berhem dane, gotinên wî yê li ser pênaseya şerhê ev in:

Şerh di serî de ji bo ravekirina berhemên klasîk hatine kirin. Her wisa ji bilî ew berhemên ku hatine şerhkirinê, ew berhemên ku têde şerha berhemên klasîk hatine kirin jî di dawiyê de wek berhemên klasîk hatine hesabandin. Bi vê awayê şerhê xwestiyê metnên klasîk bigehîne nîfşên nû. (Durmuş, 2018: 716)

Edebiyata klasîk a Kurdî di nav xwe de gelek peyvên ‘Erebî û Farisî dihewîne her wisa ev jî dibe sedemekê giranbûna zimanê berhemên klasîk. Ji wan berhemên edebiyat klasîk yek jî *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ye. *Mem û Zîn* bi tenê serê xwe berhemekê giranbuha ye. Lê gelek şerh jî li ser *Mem û Zînê* hatine kirin. Ew şerh ne tenê bi zimanê Kurdî bûne, bi zimanê ‘Erebî, Farisî, Tirkî û hwd gelek zimanên cuda hatine kirin. Bi vî awayê *Mem û Zîn* belav bûye gelek deveran û gelek kesan *Mem û Zînê* bi zimanê xwe xwendiyê.

Mela Mûsayê Celalî ew kes e ku *Mem û Zîna* Xanî bi ‘Erebî û Kurdî şerh kiriye. Herwiha bi xêra şerha *Mem û Zînê* ya ku ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve hatiye kirin, Me him Mela Mûsayê Celalî da nasîn him jî li ser taybetiyên şerhê û şerha ku Mela Mûsayê Celalî kiriye rawestiyên û me tîpgeziya wê şerhê kir.

Di pêvajoya amadekirina tezê de gelek kes bûne alîkarê me. Spasiyên xwe ji şewirmendê xwe Doç. Dr. Ayhan Tek re pêşkêş dikim him bi şewirmendiya xwe ya

akademîk û him jî bi alîkariya xwe ya şexsî min ji kêmasî û tengasiyan xelas kir. Spasiyên bi dil û can pêşkêşî seydayê qedirbilind cenabê Mela Mûsayê Celalî dikim. Ew di amadekirina tezê de ji bo me bû pêşeng û çavkaniyekî bingehîn, tiştên ku me di derbarê wî de nizanibû me bersiva wan tiştan bi şexsê wî dibihîst. Herwiha ji kurên Mela Mûsayê Celalî. M. Salih GEÇÎT û M. Reşit GEÇÎT re spasiyên xwe pêşkêş dikim ji ber ku bi eleqeyeke germ ji min re mezinahî kirin û ew bûn sedem ku ez Mela Mûsayê Celalî bibînim û wî ji nêz ve nasbikim û M. Salih GEÇÎT û M. Reşit GEÇÎT di amadekirina vê xebatê de kêmasiyên xwe qet nîşan nedan, her tim li cem min bûn û piştgirî dane min.

Di dawiyê de spasiyê xwe pêşkêşî malbata xwe û hevalên xwe yê 'ezîz dikim. Him ji aliyê madî ve him jî ji aliyê manewî ve ez tenê nehiştim.

Mûş-2021

Furkan DENİZ

KURTEBÊJE

Amd	: Amadekar
b	: Bûyîn
bnr	: Binêre
c	: Cild
Haz	: Hazırlayan
Hız	: Hezretî
İA	: İslam Ansiklopedisi
j.d	: Ji dayikbûna wî
m	: Mîladî
MEB	: Milli Eğitim Bakanlığı.
r	: Rûpel
S	: Sayı
s	: Sayfa
s.a.w	: Sellallahu aleyhî wesellem
TDK	: Türk Dil Kurumu
TDV	: Türkiye Diyanet Vakfı
W	: Wefat
Wer	: Werger
Yay	: Yayınları.
YDE	: Yaşayan Diller Enstitüsü.

DESTPÊK

Mesnewî cureyeke ku di bin sîwana edebiyata klasîk de cihê xwe digire. Ev cure, bi piranî di edebiyatên rojhilata navîn de gelek caran hatiye bi kar anîn. Li ser pênaseya têgeha mesnewiyê gelek kesan fikr û ramanên xwe vegotine, yek ji wan kesan Îsmail Kekeç e. Kekeç fikr û ramanên xwe yên di derbarê mesnewiyan de wiha aniye ziman:

Mesnewî herî kêr ji 2 beytan pêk tê û dawiya sînora nivîsandina beytan tune ye. Eger nivîskar bixwaze dikare heta bêjî nivîsa xwe dirêj bike. Her wiha mirov dikare mesnewîya di bin çar serenavan de bisenifîne: 1. Mesnewiyên ku dixwazin agahiyê bidin xwînerên xwe. 2. Mesnewiyên ku li ser qehremantiyê disekin û mijara xwe ji dîrokê digrin. 3. Mesnewiyên ku ji hêla hunerê ve dewlemend in û xîtabê zewqa xwînerên xwe dikin. 4. Mesnewiyên ku behsa erdnîgariyê, da'weta, mirova û hwd. dikin. (Kekeç, 2017: 186-187)

Mem û Zîna Ehmedê Xanî jî li gor agahiyên jorê mirov dikare bibêje dikeve bin serenava sisê û çaran, lewra *Mem û Zîn* jî her hêlê ve dewlemend e û mesnewiyeke evînî ye û tê de behsa gelek bûyeran tê kirin.

Di edebiyata klasîk de nivîsandina mesnewiyan hûnera nivîskar jî derdixist holê lewra mesnewî nivîsandin ne tiştê kêr e, nivîskar dema ku mesnewî dinivîsin hemû hûnerên xwe derdixin holê, çî îmkân di destê wan de hebe hemû bi kar tînin. Wextê em van tiştan ji bo rewşa edebiyata klasîk a Kurdî ya wê serdemê bînin berçavan ew tişt diwartir dibê lewra Xanî yekem kes bûye ku di hêla mesnewiyê de di qada Kurdî de nivîsiye. Xanî di sebebê telîfa *Mem û Zînê* de nivîsandina xwe na bi zimanê Kurdî wiha vegotiye:

Xanî ji kemalê bêkemal î

Meydana kemalî dîtî xalî

Ye'nî ne ji qabil û xebîrî

Belkî bi te'essub û 'eşîrî

Hasil ji 'înad eger ji bêdad

Ev bid'ete kir xilafê mu'tad (Tek, 2018: 73)

Ev beyt jî nîşan didin ku Xanî meydan vala dîtiye û xwestiye berhemê bi terza mesnewiyê binivîse. Li ser berhema Ehmedê Xanî jî gelek xebat hatine kirin û li ser şerh hatine nivîsîn. Ji wan şerhan yek jî şerha Mela Mûsayê Celalî ye ya bi navê *Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerha Kitaba Mem û Zîn* e. Em jî di vê xebata xwe de -digel agahîdayîna derbareyê jiyana Mela Mûsayê Celalî- dê li ser wê şerha rawestin û metna wî yê transkribekirî bidin nasîn.

1. Girîngî û Armanca Mijarê

Edebiyata klasîk a Kurdî çawa ku ji aliyê dîwan, qesîde, xezel û hwd. dewlemend be herwisa ji aliyê mesnewiyan ve jî dewlemend e. Ji ber ku di mesnewiyan de sînora nivîsê tune ye û nivîskar di nivîsa xwe de azad e her tişt bûne mijara wan. Ji pesnê Xwedê bigre heta şîn û şahiyên civakî, rewşa gel, bûyerên ku di nav civakê de qewimîne, hestên xwe, ramanên xwe û hwd. di mesnewiyan de raxistine li ber çavan.

Mesnewiya Ehmedê Xanî ya bi navê *Mem û Zînê* jî di nav xwe de gelek bûyeran dihewîne. Ji ber ku *Mem û Zîn* di nav Kurdan de xwedî cihekî girîng e gelek xebatên curbecur li ser wê hatine kirinê. Ew xebat pir alî ne. *Mem û Zîn* hem ji aliyê folklorîk ve hem ji aliyê naverokê ve û hem ji aliyê felsefîk ve û herwiha ji gelek aliyên din ve ji aliyê lêkolînera ve hatiye vekolandin.

Mela Mûsayê Celalî jî ji wan kesan e ku li ser *Mem û Zîn* a Xanî xebitiye û şerha wê mesnewiyê bi zimanê 'Erebî û Kurdî kiriye û ew şerha xwe jî di du cildan de kom kiriye. Navê xebata Mela Mûsayê Celalî ya resen "*Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerha Kitaba Mem û Zîn*" e. Di bin beşên 'Erebî de Mela Mûsayê Celalî beyan, ma'ne, belaxata malikan kiriye û ew malik bi wê şiklê rave kirine. Mela Mûsayê Celalî di beşên Kurdî de ji bo ku ev mesnewî ji peyvên 'Erebî û Kurdî piçek be jî xelas bibin û ew kesên ku vê mesnewiyê dixwînin bêtir bigehijin mijarê û fêhm bikin bi zimanekî hêsan û rojane nivîsiye. Di vê xebata xwe de jî em ê li ser taybetiyên şerhê, jiyana Mela Mûsayê Celalî û şerha *Mem û Zînê* rawestin. Ji ber ku Mela Mûsayê Celalî, *Mem û Zînê* di berhema xwe de him bi zimanê 'Erebî û him jî bi zimanê Kurdî şerh kiriye, em ê bi tenê li ser beşên bi Kurdî hatiye kirin rawestin û di derbarê wê şerhê de agahî bidin.

Ji xeynî şerha *Mem û Zîna* ku Mela Mûsayê Celalî kiriye gelek xebatên wî yên cuda jî hene herwiha gelek helbestên wî hene ku pesnê Xwedê didin û li ser dunyaya fanî disekinîn û ji mirovan re şîretan dikin. Gelek xebatên wî jî hene ne bi Kurdî ne. Ji bilî Kurdî xebatên wî yên ‘Erebî, Tirkî jî hene.

Me divê xebata xwe de xwest ku behsa jiyana Mela Mûsayê Celalî, berhemên wî, Şerha wî ya *Mem û Zînê (Feyz-ulQedîr-ul Metîn Şerha Kitaba Mem û Zîn)* rawestin. Bi vî şiklî em di vê xebata xwe de ji bo cîhana akademîk Mela Mûsayê Celalî bidin naskirin xebitîn û herwiha bi rêya vê xebatê me xwest ku Mela Mûsayê Celalî jî di nav akademiya Kurdî de cihê xwe bigre.

2. Naverok û Rêbaza Tezê

Xebata me bi navê “Mela Mûsayê Celalî û şerha wî ya li ser *Mem û Zînê*” hatiye diyarkirin. Ev xebata me ji destpêk, du beş, encam û pêvekên ku agahiyên di derbareyê Mela Mûsayê Celalî û transkrîbsiyona şerha *Mem û Zîna* wî pêktên.

Me di destpêkê de behsa girîngiya armanca tezê kir û herwiha di meşîna tezê de me rêyekî çawa hîlbijartîye me behsa wan kir. Em li ser çend çavkaniyên sereke yên ku me di tezê de bi kar anîye sekinîn. Ji ber ku di beşekî xebata me li ser şerha mesnewiya *Mem û Zînê* ye, me bi kurtasî behsa têgeha mesnewiyê û têgeha şerhê kir.

Me di beşa yekemîn de behsa jiyana, berhem û kesayetiya Mela Mûsayê Celalî kir. Me di derbarê nav û mexlesa wî, malbat û zarokatiya wî, zewac û zarokên wî, perwerdeya wî, çend gundên ku Mela Mûsayê Celalî lê xwendîye û çend seydayên wî, cihên lê wezîfe kiriye û mudersitiya wî, di kamilbûna wî de rola medresa wî, di beyt û qesîdeyên wî de rexneya civakî de agahî dan.

Di beşa duyemîn de me behsa tehlîla şerha wî ya li ser *Mem û Zînê* kir û herwiha me di derbarê Kesayetiya edebî û şêwaza wî ya edebî, zimanê şerha wî û di şerha wî de bandora devoka Serhedê de agahî dan. Ji bilî van em li ser unsurên ji bilî Kurdî yên ku di şerha wî de derbas dibin, çend şerhên li ser *Mem û Zînê* hatine kirin, çend hunerên edebî yên ku di şerha Mela Mûsayê Celalî de derbas dibin de me agahî dan. ‘Erebî, Tirkî û Kurdî-‘Erebî nivîsiye agahî dan.

Me di dawiyê de cih da pêvekan. Di wan pêvekan de bo zelalkirina hemû pirsên di derbarê Mela Mûsayê Celalî û şerha wî ya li ser *Mem û Zînê* de bîr bersivandin me

hevpeyvînek rûbirû li gel Mela Mûsayê Celalî pêkanî. Ji bilî wê me metna transkrîbekîrî ya şerha *Mem û Zîna* Mela Mûsayê Celalî wek pêvek da. Di dawiya pêvekan de jî me cih da wenêyên Mela Mûsayê Celalî, çend wêneyên destxetên wî û hwd.

3. Çavkaniyên Tezê

Çavkaniyên xebata me yê sereke Mela Mûsayê Celalî bixwe ye. Di tengasî û kêmasiya me de Mela Mûsayê Celalî me tenê nehişt û gelek bersivên pirsên me ew î bixwe dan. Ji bilî wî du cildên şerha *Mem û Zînê* dane me û gelek berhemên din ji bo ku em jê îstifade bikin nîşanî me da û her tim ji me re bû rêber. Herwiha kurên Mela Mûsayê Celalî; M. Reşîr û M. Salih jî di derbarê Mela Mûsayê Celalî de gelek agahî dane me û ew ji bo me bûn çavkaniyên şexsî.

Mela Mûsayê Celalî hêj di roja me de jî pirtûkan dinivîse. Pirtûkên wî bixwe ji bo me bûn çavkanî. Ji bilî çavkaniyên Mela Mûsayê Celalî me ji gelek çavkaniyan îstifade kir. Çend çavkaniyên ku me jê îstifadekirin ev in:

Ali Nihad Tarlan, *Metinler Şerhine Dair*. (Di vê pirtûkê de Ali Nihad Tarlan bi awayeke berfireh behsa şerhê kiriye. Me jî di pênaseya şerhê de ji vê pirtûkê îstifade kir)

Ayhan Tek, *Hâmisiz Şâir Babasiz Metin*. (*Mem û Zîn ve Osmanlıca Çevirileri Üzerine Bir İnceleme*). (Ev pirtûka Ayhan Tek xebata wî ya doktorayê ye. Ayhan Tek vê xebata xwe li ser *Mem û Zînê* kiriye. Me di gelek cihan de ji vê pirtûkê îstifade kir)

Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi: Biçim-Ölçü-Kafiye*. (Yekta Saraç di vê pirtûka xwe de behsa cureyên edebî dike. Wextê ku me pênaseya mesnewiyê kir, me ji vê berhema Saraç îstifade kir)

Rêbaza Transkrîbekirina Şerha *Mem û Zîna* Mela Mûsayê Celalî *Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerha Kitaba Mem û Zîn*

Di rêbaza traskrîbekirinê de: 1) Me hem herdu cildên Mela Mûsayê Celalî yên tê de şerha *Mem û Zînê* kiriye hem jî destxetên wî yên li ser şerhê nivîsiye ji xwe re esas girtin. 2) Wextê ku me ev metn transkrîbe kir me ev alfabeya li jêr hatiye ravekirin sûd girt.

ح	h
ی	î, ê
ث	s
ء	'
ذ	z
غ	x
ض	d, z
ع	'
ص	ş
ط	ţ
ظ	z

4. Di Derbarê Şerhê De

Şerh, li ser gelek nivîsên dîrokî û rojane herwiha cûreyên metnan, nêrîna metnên ilmî, îfadekirina wan metnan û hwd. derdixê pêşiya me û li ser wan metnan radiweste. Wextê ku mirov di şerhê de li ser van meselan radiweste di heman demê de dikeve nav lêgerînan û ji ber ku mijar zelal bibe hîn pirsan ji metnê re dike. Lîteratura şerhê hemanekê bingehîn a edebîyata klasîk e. Heke mirov bixwaze zimanê klasîkan zelaltir bike û ji bo ku bîna fêhmkirin li ser wan bixebite ew çax şerhkirina metnê bêgûman divê bê kirin. Şerhkirina metnekî ne tiştekî hêsan e. Ji bo mirov bikaribe metnekî şerh bike şerta ewil ew e ku divê ew metn ji sedî sed were fêhmkirin û li gor wî jî were şîrovekirin ji ber ku şerh karekî zehmet e. Gelek lêkolîner û nivîskar li ser têgeha şerhê sekinîne. Yek ji wan kesan Îsmâil Kara ye. Kara pênaseya şerhê wiha kiriye:

Şerha metnê di nav xwe de zelalkirina metnê, pênaseya metnê, tahlîlkirina metnê, îtirazkirina tiştekî, tenkît, tashîh û hwd. dihevine her wisa şerh ji bo pirsgirikên ku di metnê derbas

dibin bên sererastkirin xwediyê rolekî pir girîng e. (Kara, 2016:

24)

Edebiyata klasîk di nav gelên rojhilata navîn de xwediyê rolekî mezin e. Herwisa şerhkirin jî di nav edebiyata klasîk de xwediyê cihêkî girîng û taybet e. Gelek berhemên klasîk hêj di roja me de jî têne şerh kirin. Piştî qebûlkirina dînê Îslamê di rojhilata navîn de ev dîn bi awayekî lez belav bûye. Bi belavbûna dînê Îslamê ve edebiyata Farisan, edebiyata Kurdan û edebiyata Tirkan di bin bandora wê dînê de mane. Ji ber ku şairan berhemên dînî bi awayekê zelal ji bo fêmkirina civatê vegotine ango şerh kirine. Piştî şerhkirina berhemên dînî hêdî hêdî berhemên din jî hatine şerhkirin.

Wextê ku berhemên klasîk têne şerhkirin ew berhem jî di nav literatûra edebiyatê de cihê xwe digirin û dibin berhemên serbixwe. Şerhkirin cureyekî edebî ye û ji bo ew kesên ku li ser edebiyata klasîk dixebitin xwedî bandorekî mezin e.

Wextê ku meriv li berhemên edebiyata klasîk mêze bike û bixwaze wan berheman şerh bike, divê meriv wan berheman baş binase. Lewra ji bo şerhê şerta ewil ew e ku di hişê merivan de di derbarê berhemê de divê tu pirsgerêk nemîne. Ango ew kesê ku berhemê şerh dike mecbûr e ku bibe hakimê wê berhemê

Ew kesê berhemê şerh dike hemû pirsên di derbarê berhemê de bizanibe jî nikare berhemê şerh bike, lewre rê û rêbazên şerhê hene. Ji bo şerhkirinekî serkeftî gelek rê û rêbazên cuda hene. Ango kesên cuda heman berhemê şerh bikin jî di navbera wan şerhan de gelek cudahî derdikeve pêşiya me. Lewra metoda şerhkirina nivîskaran ne wek hev e.

Edebiyata klasîk a Kurdî ji aliyê berhemên ku têne şerhkirinê ve zêde zêde cihêkî girîng digire, ev şerh wek ilmekî hatiye qebûl kirin. Yek sedema vê tiştê jî ew e ku edebiyata Kurdî ji aliyê çandî û tesewifê ve têr û tijî ye. Gelê Kurd jî pir girêdayê çanda xwe û ola xwe ne. Ji ber ku têbigehijîn bav û kalên xwe, pêşiyên xwe berhemên wan şerhkirine û bi wî awayê ji bo ku berhem zindî bimînin û bigehijîn nîfşên nû hewl dane.

Beriya her tiştî em mecbûr in ku li ser têgeha şerhê rawestin. Divê ew têgeh di serê me de zelal bibe da ku em astengiya fêmkirinê nekêşin. Ji ber vê jî divê danasîna şerhê were kirin.

Gelek nivîskarên fikr û ramanên xwe yê di derbarê şerhkirinê bi awayên cuda cuda anîne ziman. Mijara şerhkirinê ew qas mijarekî girîng û taybet e ku ev mijar bûye sedema nivîsandina bi dehan pirtûkan. Yek jî ji xebatên bingeîn ên ku di derbarê edebiyata klasîk de şerhkirina metnên klasîk in. Gelek caran şerhê xwe sipartiyê berhemên tesvîrî ango di serî de berhemên tesvîrê hatine şerhkirin. Xebatên şerhkirinê yê ku di li ser tesvîran hatine kirin bi şerhkirina tesvîra Qur'ana pîroz ve destpê bûye. Sedat Şensoy ew kes e ku li ser şerhê xebitiye. Şensoy di derbarê şerhê de fikr û ramanên xwe wiha aniye ziman: “Hin meseleyên ku Qur'anê de derbas dibin ji aliyê Hz. Muhamed ve hatine vegotin û îzahkirin pêşengê şerhkirinê tê qebûlkirin (Şensoy, 2010: 555).” Piştî jî di derbarê gelek berhemên tesvîrî de xebatên şerhê hatine kirin û bi vî awayê hêdî hêdî qada şerhkirinê zêde bûye.

Li ser têgeha şerhê pênaseyek jî di Saziya Zimanê Tirkî de derbas dibe. Şerh li gor saziya zimanê Tirkî (TDK) yê: “Vekirin, ji hev qetandin, ravekirin û şîrovekirina metnekî ye (TDK, 2003: 2087).” Têgeha şerhê ‘Erebî ye. Di Kurdî de şerh tê wateya şîrovekirin, vekirin, rave kirin, vegotin û hwd. Tunca Kortantamer ew kes e ku di derbarê edebiyata Tirkî de xebitiye, Kortantamer pênaseya şerhê bi vî awayê kiriye: “Şerh jî bo metnek were fêmkirin, ji aliyê ku kesên baş ji wê metnê fêm dikin ve tî vegotin û bi vî awayê ew kesên din re dibin pêşeng (Kortantamer, 1994: 1).” Dîsa Ali Nihad Tarlan di pirtûka xwe ne bi navê “*Metinler Şerhine Dair*” (“di derbarê şerha metnan de”) têgeha şerhê wiha aniye ziman: “Şerhkirina metnê ilmek e, rê û rêbaz û formulên şerhê yê xweser hene. Şerh di derbarê mijarên ku muhtacê ravekirin û aşkera kirinê de divê bînin kirin (Tarlan, 1981: 191).”

Ozan Yılmaz maqaleyek li ser mijara şerhê nivîsiye. Yılmaz di derbarê şerhê de wiha dibêje:

Roja îroyîn divê têgeha şerha klasîk ji têgeha şerha modern cudatir bê dîtin. Lewre ew kesên ku şerha berhemên klasîk dikin li pey dayina agahiyên sedî sed rast nakevin ango armancekê wan ê wisa tune ye. Ew kesên ku şerha metnên klasîk dikin, xîtabê kesên ku atmosfera wê dewrê dizanin dikin, kesên ji rêzê tînegihejin van metnan, lê belê di edebiyata modern de tiştekê wisa tune ye. (Yılmaz, 2007: 271-304)

Şerhkirina metnên klasîk ve gelek bûyer bi awayekê zelal hatine vegotin ev tişt jî di navbera çanda berê û çanda niha de bûye sedema têkiliyekî xurt, bi wî awayê mirovên nûjen çand û kewneşopiyên berê nas kirine. Dema ku şerhkirina metnên klasîk were vekolandin aşkera dibe ku ew beyt an jî îbareyên ku hatine şerhkirin bi piranî li ser hev girtina parçeyan sekinîne. Lewra armanca şerh ew e ku bi awayekî estetîk li ser metnê raweste. Ji ber vê jî mene di asta duyemîn de dimîne. Dîsa Ozan Yılmaz gotinên xwe yê di derbareyê şerhê wiha didomîne: “Şerhkirina berhemên klasîk li ser ravekirina peyvên dîskone û bi wê awayî heta roja me hatiye (Yılmaz, 2007: 271-304).” Ev taybetî di şerha *Mem û Zîna* Mela Mûsayê Celalî de jî gelek berbiçav e. Lewra ev mesnevî ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve di heman pirtûkê de him bi ‘Erebî û him jî bi Kurdî hatiye kirin. Wextê ku meriv li ser beşên Kurdî bisekine, meriv dibîne ku di beşên Kurdî de ji bo ku gel bêtir bigehije mesnewîyê û ji mesnewîyê fêr bike Mela Mûsayê Celalî ew beytên Xanî xwestiye bi awayekî zelal vebêje.

Di dîrokê de her tim jî aliyekî ve berhemên dînî û jî aliyekî ve jî berhemên edebî hatine şerhkirin. Mine Mengi li ser meseleya şerhê pirtûkek nivîsiye (*Metin Şerhi, Tahlili ve Tenkidi Üzerine. Divan Şiiri Yazıları*) Di vê pirtûka xwe de Mengi di derbareyê şerhê de ramanên xwe wiha vegotiye: “Şerhkirina metnekî êdî di edebiyatê de bûye kewneşopî, bi wê şeklî jî şerh di edebiyatê de xwediyê rolekî taybet e (Mengi, 2004: 75).” Şerhkirin di edebiyata klasîk a Kurdî de bi piranî li ser berhemên tesewûfî, li ser hînkêr li ser qasîde, xezel û dîwanan hatine kirin. Ehmedê Xanî jî gelek bandorê li ser edebiyatnasan kiriye û bûye sedem ku ew edebiyatnas li ser berhemên Xanî lêkolîn bikin, metnan fêr bikin û wan metnan şerh bikin.

5. Di Derbarê Mesnewîyê De

Mijara teza me danasîna jiyana Mela Mûsayê Celalî, berhemên wî û şerha mesnewiya *Mem û Zîna* wî ye. Ji ber ku em ê li ser şerha mesnewiya *Mem û Zîna* rawestin ewçax hewceye ku hişê me de di derbarê mesnewîyê de tu pirsgirêk nemîne. Ji ber wê jî divê em mesnewîyê binasin. Ahmet Ateş ew kes e ku di derbarê têgeha mesnewîyê de agahî daye. Ateş fikr û ramanên xwe yê di derbareyê mesnewîyê wiha aniye ziman: “Têgeha mesnewîyê cara ewil di edebiyata Farisan de hatiye bikaranîn û piştê jî derbasî edebiyata Tirkan bûye (Ateş, 1998: 127).” Qedera demekî şûn de jî

derbasî edebiyata Kurdan bûye. Wek têgehekê edebî jî mesnewî ji aliyê Yekta Saraç ve wiha hatiye pênasekirin:

Mesnewî, di edebiyata klasîk de ji teşeyên nezmê yên ku ji malikan pêk tên formeke herî zêde berbelav û naskirî ye. Wekî têgeheke edebî, mesnewî ew teşeya nezmê ya ku hemû malikên wê bi heman qalibê erûzê tên nivîsandin û her malikeke wê di nav xwe de hemserwa ye. (Saraç, 2014: 79)

Mesnewî bi beytan tê nivîsandin, her beyt di navbera xwe de ji aliyê qafiyê ve girêdayê hevdu ye. Di mesnewî nivîsandinê de sînor tune. Ango nivîskar karibe berhema xwe çiqas dirêj bike dikare lewra ew derfet heye. Piraniya mesnewyan ji sê beşan pêk tê. Nivîskarê mesnewiyan di beşa ewil de cih didine destpêkê, piştî beşa destpêkê beşa geşedanê derdikeve hemberî me ev beş, beşa duyem e. beşa sêyem jî beşa encamê ye nivîskar êdî nivîsa xwe bi hevdu re girê didin û nivîsên xwe diqedînin.

Mirov dikare mesnewiyan li gor mijarên xwe wiha bisenifîne:

1. Mesnewiyên Olî- Tesewiff
2. Mesnewiyên Ku Li Ser Eşqê Hatine Nivîsîn
3. Mesnewiyên Exlaqî
4. Mesnewiyên Dîdaktîk
5. Mesnewiyên Qehremanî (el-Bohtî, 2013: 10)

6. Ehmedê Xanî û Girîngiya Mesnewiya *Mem û Zîna* wî

Edebiyata klasîk a Kurdî gelek caran bala lêkolîneran kişandiye û her wisa bûye sedem ku lêkolîner li ser berhemên klasîk bixebitin. Yek jî ji wan berhemên klasîk ên ku xebat li ser hatine kirin jî mesnewî ne. Ji ber ku di nivîsandina mesnewiyan de tu sînor tunebûne, gelek kesan jî mesnewî nivîsandine. Yek jî ji wan kesan Ehmedê Xanî bûye ku mesnewiya bi navê *Mem û Zîn* nivîsiye.

Ehmedê Xanî (Jd. 1651- W. 1707) li Gundê Xanê ye û Colemêrgê hatiye dunyayê. Bavê wî Şêx Îlyasê Xanî, diya wî Gulnîgar Xanim e. Xanî teqrîben di temenê pêncî û şeş saliya xwe de li bajarê Bazîdê wefat kiriye. (Dost, 2010: 17-18)

Ehmedê Xanî çar ziman (Kurdî, ‘Erebî, Farisî û Tirkî) dizanibû. Xanî avakarê bingeha fikra netewî ya Kurdî tê jimartin. Ehmedê Xanî ji gelek medreseyan ders hildaye û ders daye. Ehmedê Xanî ji aliyê gelek kesan ve tê nasîn. Yek ji wan kesan Şamil Esgerov e ku li ser *Mem û Zîna* Xanî xebitiye. Esgerov di derbareyê Xanî de wiha gotiye: “Ehmedê Xanî çawa ku zanayekî medreyê ye, herwiha kesayetekî mutesewif e jî. Rengvedana vê yekê di *Mem û Zîna* wî û helbestên wî de aşîkar e (Esgerov, 2014:7).” Ehmedê Xanî ji xeynî *Mem û Zînê*, *Dîwan*, *Nûbihara Biçûkan* (ji bo zarokên Kurdan bi awayekî hêsan bikaribin zimanê ‘Erebî fêr bibin- ev berhem ferhengê Kurdî-‘Erebî bûye- Lê belê Xanî ji hêla *Mem û Zînê* ve derketiye pêş). *Mem û Zîna* Xanî ew behrem e ku di qada edebiyata klasîk a Kurdî de bêhtir xebat li ser hatine kirin. Hem bi zimanê Kurdî û hem jî bi zimanên biyanê ev xebat çêbûne. Di nav xebatan de piranî wergerên *Mem û Zînê* yên ji bo zimanê biyanî hatine kirin derdikevin pêşiya me. Selîm Temo jî li ser *Mem û Zîna* Xanî xebirtiye. Temo di derbareyê *Mem û Zînê* de wiha gotiye:

Mem û Zîn bi zimanê Almanî, Erebî, Ermenî, Farsî, Fransî, Hollandî, Îngîlîzî, Swêcî, Rumenî, Rûsî, Tirkî û ji bo gelek zimanên cuda hatine wergerandin û her wiha di sînemayê de bi terzekî filmî derketiye pêşberî temaşevanan. Ji xeynê wê jî di televîzyonan de wek rêzefilm derketiye. (Temo, 2016: 8)

Dema ku dîroka wan xebatên ku li ser *Mem û Zînê* bê vekolandin gelek tiştên girîng derdikevin holê. Mesnewiya *Mem û Zînê* mesnewiya Kurdi ya ewil e. mijara mesnewîyê eşq e, eşqa *Mem û Zînê* ye. Kadrî Yıldırım pir girîngî daye *Mem û Zînê* û gelek xebat li ser *Mem û Zînê* kiriye. Yıldırım hin agahiyên di derbareyê *Mem û Zînê* wiha vegotiye: “Ehmedê Xanî di sala 1694an de mesnewîya *Mem û Zînê* nivîsiye. Mesnewî ji 2656 malikan pêk hatiye. Mesnewiya *Mem û Zînê* navê xwe ji çîrokekî evînê girtiye (Yıldırım, 2010: 39).” Her çiqas mijara mesnewîya Xanî eşq bibe jî ji aliyekî ve Xanî bi rêya vê mesnewîyê xwestiye hûnera xwe jî derxe holê, ango eşqa *Mem û Zînê* bihane dîtiye.

Mela Mahmûdê Bazidî beriya vegotina çîroka *Mem û Zînê* fikrên xwe yên di derbarê *Mem û Zînê* de wiha aniye ziman:

Ji şairê Kurmancan, bi zimanê Kurmancî, di tarîxa hezar û şeşsedî de, di qeseba Bayezîdê de, hezretî Ehmedê Xanî kitêba ku telîf kiriye bi wezn bi navê *Mem û Zînê*, aşîq û maşûq, li

wechê muxtesr beyana wan dike. (Mela Mehmûdê Bazidî, 2007: 23)

Ehmedê Xanî xwediyê hûnerekê bihêz bûye. Di nivîsên wî de şeweyekê taybet heye. Hertim xwestiye tiştên orjînal derxe holê ji xwe dema ku em *Mem û Zînê* mêze dikin em dibînin ku Xanî helbestvanekî mezin e. Ji bo nivîsandina mesnewî ya Xanî gelek pirtûk, maqale û hwd. gelek şîrove yên curbecur li ser *Mem û Zînê* hatine kirin. Di wan nivîs û şîroveyan de gelek kes li ser armanca Xanî ya nivîsandina *Mem û Zînê* sekinîne û di derbarê wê de agahî dane. Yek jî ji wan kesan jî Ayhan Tek e ku xebata xwe ya doxto-rayê li ser *Mem û Zînê* kiriye. Tek li fikr û ramanên xwe yên li ser *Mem û Zînê* wiha rave kiriye:

Wextê ku em *Mem û Zînê* bixwînin ne tenê em çîrokekê eşê ya li ser eşqê dixwînin, her wiha di vê mesnewiyê de potansiyela edebiyata Kurdî ya klasîk jî dibînin. Ew nivîsên dewlemeniyên ku ji pênuşa Xanî derketine bi rêya menewiya *Mem û Zînê* giheştine roja me ya îro. Bi rêya mesnewiya *Mem û Zînê* em dibînin ku eşqê di Kurdî de dengêkî çawa hiştiye, lewra *Mem û Zîn* ji sînore zimanê xwe derbas bûye û ji bo gelek zimanên biyanî hatiye wergerandin. (Tek, 2018: 2)

Herwiha Ayhan Tek di xebata xwe da ji bo armanca Xanî jî wiha gotiye; “Di nivîsandina mesnewiya *Mem û Zînê* de armanca Xanî ya bingehîn cihê zimanê Kurdî ye li hember zimanê Farsî û Tirkî xwestiye bide nîşandan (Tek, 2018: 15).” Mesnewiya *Mem û Zînê* berhemekî ewqas taybet bûye bi dehan zimanê biyanî *Mem û Zînê* ji Kurdî wergerandine zimanê xwe. Ev mesnewî bûye sedema nivîsandina maqaleyan, pirtûkan. Pir kesan jî mesnewiya *Mem û Zînê* şerhkirine. Bi wê awayî wextê em dîroka nusxeya ewil a *Mem û Zînê* û xebatên ku li ser wê hatine kirin bibînin divê em ji pirtûka Ayhan Tek binêrin:

Nusxeya *Mem û Zînê* ya herî kewn a ku di destê me de ye di sala 1731an de hatiye nivîsandin. Gelek wergerên *Mem û Zînê* di zimanên biyanî de hene, lê bêhtir wergerên li ser *Mem û Zînê* hatine kirin bi zimanê Tirkî ne. Qasî ku me tespît kiriye. Wegera ku bi zimanê Tirkî hatiye kirin di sedsala 19e mîn de ji aliyê Ahmed Faîk ve di sala 1856an de hatiye kirin. Jibîlî wê konsolosê Rûs ê berê Auguste Jaba (1801-1894) û Mela

Mehmûdê Beyazidî (b. 1797) mesnewiyê bi kurtasî werdigerînin nesrê. Wek pirtûk jî cara ewil di sala 1335 (m.1919) an de li Stenbolê ji aliyê komeleya Kurd Tamim-i Maarif û Neşriyatê ve hatiye çapkirin. Nivîskarê vê berhemê jî Hemzeyê Mûksî bûye. (Tek, 2018: 21)

Xanî di sebebê telifa *Mem û Zînê* de wisa rave kiriye ku ev berhem ji bo gelê Kurd kiriye diyarî. Ev mijar ji aliyê Ayhan Tek ve di meqaleya bi navê “Li Dor Behsa Patronajê *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî” de wiha hatiye îzahkirin:

Sebebê telifa Xanî ji sebebê telifên mesnewiyên din cudatir e, lewra ji *Mem û Zîna* xwe ji bo neteweperweriya milletê Kurd kiriye diyarî” referanseke meşhûr e, lê divê li ser wê tehlîlên kûrtir bêne kirin. Lewra ji bo şairekî mesnewînivîs, neteweperweriyek wekî ya îro mumkin nîne...şairên Seraya Osmanîyan jî berevaniya zimanê Tirkî/Osmanî dikir, nemaze jî piştî sedsala 17ê, wan xwe li ber şairên Farisan rakirin û de’waya mesnewînivîsina ji edebiyata Farisan jêhatîtir kirin. (Tek, 2011: 50)

Ferhad Şakelî jî li ser *Mem û Zînê* xebitiye. Şakelî di xebata xwe ya bi navê *Mem û Zîn’de Kürt Milliyetçiliği* de derheq *Mem û Zînê* wiha gotiye: “*Mem û Zîn* ji ber ku rewşa Kurdan û kesera wan di nav xwede dihewîne ji aliyê Kurdan ve xwedî cihêkî bêpar e (Şakelî, 1996: 55).” Ev tişt jî bala Kurdan kişandiyê û bûye sedema xebatên li ser *Mem û Zînê*. Herwiha xebatên li ser *Mem û Zînê* roj bi roj zêde bûne û giheştine gelek kesan. Di nav wan xebatan de şerhên ku li ser mesnewiya *Mem û Zînê* hatine kirin jî gelek zêde ne. Ew şerhên cuda li gor rê û rêbazên cuda hatine kirin. Yek jî ji wan kesên ku *Mem û Zînê* şerh kiriye Mela Mûsayê Celalî ye.

BEŞA YEKEMÎN

JİYAN Û BERHEMÊN MELA MÛSAYÊ CELALÎ

1.1. JIYANA MELA MÛSAYÊ CELALÎ

1.1.1. Nav û Mexlesa Wî

Nivîskar di nava gel de bi navê “Mela Mûsayê Celalî” hatibe nasîn jî di nasnameyê de navê wî “Mûsa Geçit” e. Mela Mûsa jî eşîra Celaliyan e, ji ber vê jî wî re Mela Mûsayê Celalî hatiye gotin. Herwiha Mela Mûsa carna jî ji xwe re ji bilî mexlesa Celalî, ji ber ku ji Bazîdê ye û li wir dijî, mexlesa “Beyazidî” jî bi kar aniye Mela Mûsa niha li Bazîdê jiyana xwe didomîne. 83 sal emrê Mela Mûsayê Celalî heye.

Mûsa Geçit di helbestên xwe de mexlesa Mela, Celalî, Celalî el-Beyazidî û Bazidî bi kar aniye. Mexlesa Mela ji ber ku bi dehan salan li gundên cuda yên Kurdistanê de melatî kiriye hilgirtiyê. Mexlesa Celalî jî navê ‘eşîra wî ye, ji ber wê jî ev mexles jî hilgirtiyê. Mexlesa Beyazidî jî ji ber ku ji Bazîdê dayik bûye û li wir dijî hilgirtiyê û navê xwe yê resen jî di helbestan de bi kar aniye.

Mînak:

Ey pêxemberê me yî nazik û latîf

Hem ‘ezîz hem delal hem şerîf

Çe’vreş, qerqaş û qamet wek elif

Tu şefa’et ke li wî Mûsayê zeîf (Celalî, 2008c: 75)

Ev çarîn, çarîna dawiyêye ku di helbesta beyta “*Navê Pêxember*” de derbas dibe. Di risteya dawiyê ya vê helbestê de jî xuyaye ku Mela Mûsa navê xwe yê resen bi kar aniye.

Di şerha *Mem û Zînê* de Mela Mûsayê Celalî mexlesa “Celalî el-Beyazidî” bi kar anîye û bi vî navî pirûka xwe çap kiriye.

1.1.2. Malbat û Zarokatiya Wî

“Navê bavê Mela Mûsa, Hesên e, navê bavê Hesên, Ubeyd, navê bavê Ubeyd, Yusûf, navê bavê Yusûf, Mahmud, navê bavê Mahmud ‘Emer, navê bavê ‘Emer, Îsmâîl, navê bavê Îsmail jî Ehmed e (bnr.: Celalî, 2003).” Navê diya Mela Mûsayê Celalî, Gulê ye. Mela Mûsayê Celalî di sala 1938an de li gundê Subhan (Telçeker) a Bazîdê hatiye

dunyayê. Li gor hin riwayetan mezinên ango pêşiyên Mela Mûsayê Celalî 400-500 sal berê ji aliyê Îranê ve hatine gundê Subhanê. Dema ku Mela Mûsayê Celalî hatiye dunyayê malbata wî gelek feqîr bûye û ji aliyê aboriyê ve tengasî kişandine

1.1.3. Zewac û Zarokên Wî

Mela Mûsayê Celalî di sala 1959an de bi Xatûn Xanimê re zewiciye. Di sala 1960an de bi navê Mihemed Ferit kurek ji wî re çêbûye. Piştî Mihemed Ferît, Mihemed Reşît bûye, Piştî Mihemed Reşît, Seid, piştî Seid, Mihemed Salih, Piştî Mihemed Salih, Mihemed Sena çêbûye û di wê navberê de keçikek bi navê Eyşe ji wî re çêbûye û herî dawî jî lawikek bi navê Mihemed Emîn ji wî re bûye.

1.1.4. Perwerdeya Wî

Mela Mûsayê Celalî piştî şeş saliya xwe di sala 1944an de çûye dibistana seretayî ya ku li gundê wan hebû. Wextê ku Mela Mûsayê Celalî dest bi dibistana seretayî kiriye ji aliyekî ve jî xwestiye dest bi xwendina Qur'ana pîroz bike lê belê wê demê di gundê wan de alimê wisa zane û navdar tunebûne. Mela Mûsayê Celalî jî ji bo hildana dersa Qur'anê çûye li ba sofîyekî piştî qedera hildana dersê Mela Mûsayê Celalî çûye li ba Elî Çawûş qedera demekî jî li ba wî dersa Qur'anê hildaye. Paşê xwendina Qur'anê hîn bûye û êdî bi serê xwe xwendiyê. Rojekê melayek hatiye gundê wan navê wî Mela Mistafayê Qizilxweyi bûye, Mela Mistefayê Qizilxweyî jî yek ji feqiyê Mela Muhamedê Celalî bûye. Mele Muhamedê Celalî jî telebeyê Bedûzzaman bûye. Wextê ew Mela hatiye gundê Mela Mûsayê Celalî cara ewil dest bi xwendina pirtûkên ku di derbarê ilmên îslamê de hatine nivîsin kiriye. Heta yanzdeh salîha xwe Mela Mûsayê Celalî di gel dibistanê dersan ji Mela Mistefayê Qizilxweyî girtiye. Piştî yanzdeh salîya Mela Mûsayê Celalî, mamosteyê wî ji bavê Mela Mûsayê Celalî re gotiye kurê te pir zîrek e, muheqeq wî bide xwendine. Lê aboriya malbatê Mela Mûsayê Celalî ji bo xwendina Mela Mûsayê Celalî dibû asteng. Mela Mûsayê Celalî ji aliyê xwendinê de gelek tengasî kişandiye, mesela hin caran Mela Mûsayê Celalî ji bo xwendinê û nivîsandinê ne lînûsk dîtîye û ne jî pênûs. Bi vî awayê ji bo xwendina xwe pênûs û lînûskên xwe ji hevalên xwe girtiye. Him ji aliyekî ve dersên medreseyê hilgirtiye û him jî ji aliyekî ve di sala 1949an de dibistana seretayî bi awayekî serkeftî qedandiye. Di danzdeh saliya Mela Mûsayê Celalî de ji Bazîdê bo dibistana mamosteya ya ku li gundê Almêsa ya girêdayê Erdîşê ketiye ezmûnê. Di nav Bazîdê de tenê du kesan ev

dibistan qezenc kirine. Ew herdu kes Mela Mûsayê Celalî û Rifatê kurê Mela Elîyê ku di wê demê de li gundê Misûn (Suluçam) a Bazîdê de meletî kiriye. Di wê demê de, ji ber ku tunebûn hebûye tu wesayît jî tunebûne, Mela Mûsayê Celalî ji bo çûyina gundê Almêsê li gel bavê xwe bi rê ketine û bi şiklekî peya pêşiyê çûne Çaldiran a navçeya Wanê û piştê jî giheştine gundê Almêsê. Êvara ku giheştin gundê Almêsê xweregên cur bi cur hatine pêşiya wan. Ji ber ku malbata Mela Mûsayê Celalî feqîr bûye qet ew î xwerinên wisa pir nedîtibûne. Ji bavê xwe re gazinên xwe kiriye, lewra li gor Mela Mûsayê Celalî kesî ku li wir bimîne yê Xwedê ji bîr bike. Piştî wê şevê ji ber ku Mela Mûsayê Celalî ewqas rê peya hatibûye xwîn ketibûn çavan, ji ber vê jî mamosteyan mene girtine û Mela Mûsayê Celalî hilnedane. Mela Mûsayê Celalî û bavê wî dîsa vegeriyane Bazîdê. Di sala 1950yan de Mela Mûsayê Celalî û pismamê wî Mela Hesên ji bo xwendina ilmê medreseyê çûne Norşîna (Güroymak) Bedlîsê. Ew çaxa ku Mela Mûsayê Celalî û Mela Hesên çûne Norşînê, li medresa Norşînê Şêx Mehsûnê bavê Şêx Nuredîn perwerde dabûye. Şêx Mehsûn ji ber ku feqiyê medresa wî pir bûne, Mela Mûsayê Celalî û Mela Hesên şandiye medreseya gundê Melegorkê. Navê melayê Melegorkê Mela Cemal bûye. Ew medrese jî xwedî li wan derneketiye, Mela Cemal ji wan re gotiye hûn nû ji dest xwendinê dikin, hûn ji mi re lazim nîn in. Piştî wê Mela Mûsayê Celalî û Mela Cemal gelek medreseyan geriyane û li tu derê nehatine qebûlkirinê û di dawiyê de çûne medreseya gundê Tirtokê a girêdayê Kopa Mûşê. Melayê medresa Tirtokê Mela Reşîdê navdar ji wan pirsîye ku gelo xelkê ku ne? Mela Mûsayê Celalî gotiye em xelkê Bazîdê ne. piştî vê Mela Reşîd gotiye ez ji eslê Ehmedê Xanî me, ji ber wê jî ez ê we li vir bidim cîh kirin. Mela Mûsayê Celalî li wê derê cardin dest bi xwendinê kiriye. Li vir ji pirtûka “*İzzi*” ya ku di derbarê ilmên sarfî de ne dest bi xwendine kiriye û heta pirtûka “*Şerhu’l Muxnî*” yê li vê derê xwendiyê. Piştî perwerdeya salekî Mela Mûsayê Celalî û hevalê xwe di sala 1951 û 1952yan de rabûne çûne bajarê Îdirê. Li Îdirê Mela Îbrahîm el İxdirî hebûye û ew Mela li Cizîrê ders girtibûye. Ji ber ku ew dem dema tunebûnê bûye Mela Mûsayê Celalî û hevalê wî bi xwe re nivînên razanê jî divê bibirana Îdirê, ji ber ku wesayît tunebûne gelek zehmetî kişandine. Wê salê li Îdirê li medreseya Mela Îbrahîm el İxdirî ji pirtûka “*Şerhu’l Muxnî*” yê dest bi xwendinê kiriye û heta pirtûka “*El Behçetu’l-Mardiyye Ala’l Elifiyye*” ya Îmam Suyutî ya ku di derbarê “*Elifiyye*” de nivîsiye xwendiyê. Qedera salekî li Îdirê mane, piştî wê salê hevalê wî nesekinîye çûye mala xwe, Mela Mûsayê

Celalî tenê li wê derê qedera salnîvekî maye. Piştî dershildana salnîvekî Mela Mûsayê Celalî dîsa bi awayekî zehmet nivînê xwe kom kiriye û çûye qezaya Milazgirê. Mela Mûsayê Celalî gelek gundên cuda yên Milazgirê de ji gelek melayên cuda ve ders hildaye.

1.1.5. Gundên Ku Mela Mûsayê Celalî Lê Xwendine û Seydayên Wî

Tekerqazî- Mela Mihamed Nedîm, Qasimiye- Mela Elî (Mela Elî xezûrê melayê navdar Mela Evdîrehmanê Durre bûye). Piştê wê Mela Mûsayê Celalî ji gelek melayên din jî ders hildaye û piştî saleke din Mela Mûsayê Celalî çûye gundê Çoxreşiyê mala seydayê Şêx Yehyayê Çoxreşî. Mela Mûsayê Celalî gelek di bin bandora Mela Yehya de maye û wî yek ji çar alimên bakure Kurdistanê yê wê serdemê hesibandîye. Piştî xwendina van medreseyan Mela Mûsayê Celalî di sala 1957an de veqeriyaye Bazîdê.

Herwisa Mela Mûsayê Celalî ji wan kesan jî ders xwendîye û bûye şagirdê wan: Mela Evdîrehmanê Durre (1930-2012), Şêx Ebdurehman, Mela Şemsuddîn, Seyyîd Evdîrehman ed-Dêrizbînî, Elî Çawûş (Cîranê Mela Mûsa ye û Mela Mûsa cara ewil xwendina Qur'anê li ba wî hîn bûye), Mela Mistefayê Qizilxoyî, Mela Reşîd, Mela Îbrahîm el Îxdirî, Mela Mihemed Nedim, Mela Elî û Mela Yehyayê Çoxreşî.

1.1.6. Cihên Lê Wezîfe Kiriye û Muderîstiya Wî

Piştî veqerîna Bazîdê Mela Mûsayê Celalî di navbera salên 1957-1958an de li gundê Nureşînê melatî kiriye, piştê wê gundê li gundê Nêço û li gundê Girberanê jî melatî kiriye. Qedera du salan li van gunda melatî kiriye Mela Mûsayê Celalî Îcazetnameya xwe jî ji Şêx Muhyeddin el-Havilî girtiye û di sala 1961an de wextê wî yê leşkeriyê hatiye û ji bo wezîfeya leşkeriya xwe pêk bîne çûye bajarê Mêrdînê û nêzîkî du sal nîva li wir wezîfeya xwe ya leşkeriyê kiriye û di wê demê de jî li alimên wê herêmê sûd girtiye û ilmê xwe zêde pêşve biriye. Wextê ku Mela Mûsayê Celalî wezîfeya xwe ne leşkeriyê kuta kiriye dîsa veqeriyaye Bazîdê û li wir ji xwe re medreseyek vekirîye û di medreseya xwe de daîmî ders daye. Piştî vebûna qadroyê, Mela Mûsayê Celalî êdî ji fexrî melatîyê derbasê qadroyê bûye û êdî bi wî awayê di gelek gundan de wezîfe kiriye û melatîya xwe domandîye. Mela Mûsayê Celalî di sala 1991an de ji melatîyê emeklî bûye. Di sala 1994an de Mela Mûsayê Celalî ji xwe re medreyekî çêkiriye û ders daye bi sedan feqîyan. Ew medresa di roja me de jî hêj perwerdeya xwe li ser ilmên medreseyê didomîne. Di medreseya wî de perwerdekarî û

hîndekarî di nav hev de dihate dayîn û qet ji hevdu nedihate veqetandin. Mela Mûsayê Celalî ilmê li ser hemî mertebeya girtiye, qîmeta ilmê li cem wî xwediyê cihekî taybet û girîng e. Usula dersdayina Mela Mûsayê Celalî bi piranî li ser pirtûkên berê ye. Ango pirtûkên alimên berê ji bo wî çavkaniyên sereke ne. Alimên ku pirtûkên girîng nivîsîne yên Misrê yên Îranê ango yên alema îslamê jî dişopîne û ji feqiyên xwe dide xwendinê. Wek alimên mîna Şêx Hesên el Bennah, Seyîd Qutub, Mela Camî, Muhemed Qutub hetta mezhebên ehlê sunnet çawa dersan didin dişopîne, di gel van li ser mezhebên şaîtiyê jî disekine û behsa van mezheban jî dike û van mezheban jî dide xwendinê. Mela Mûsayê Celalî di medreseyan de bê navber nêzikî 50 sale ders daye xwendine. Ji ber ku ew kesên di derbarê ilmê de dixebitin kêmbûne, Mela Mûsayê Celalî piştî 65 saliya xwe hemû jiyana xwe daye amadekirina van kitêbên ilmî û her tim li ser ilmê xebitiye û hêj xebata xwe didomîne.

1.1.7. Di Kamilbûna Mela Mûsayê Celalî De Rola Medreseya Wî

Ji berê heya roja îro cihên ku perwerde tên dayîn di nav civakê de xwediyê rolekî girîng in. Hin medrese di nav civakê de cihê xwe parastine û perwerdehiya xwe bi terzekî klasîk dane hinek jî ji wan guherîne û di şûna wan de sazîyên nû vebûne. Di nav Kurdistan de perwerdehiya medresyan xwediyê dîrokêkê pir kevnar e. Medrese di giheştina gelek şair û nivîskarên Kurd de rolekî mezin girtine. Di ola îslamê de cihê ku perwerde dihate dayîn re medrese digotin. Di derbarê têgeha medreseyê de gelek pênase hatine kirin. Yek ji wan pênaseyan jî Nebî Bozkurt kiriye. Bozkurt, di derbareyê medreseyan de wiha dibêje “Maneya medreseyê ya ferhengî tê wateya xwendin, fêmkirin, ji bo têgihîştina metnekî jiberkirina wê metnê, dúbarekirina metnan. Medrese ji peyva “*derese*” ya erebî hatiye (Bozkurt, 2003: 323).” Herwiha dîroka medreseyan jî pir kevn e, lewra medrese bi ola îslamê ve geş bûye û wê rojê heya îro hebûna xwe domandiye. Murat Akgündüz li ser Medreseyên dewleta Osmanîyan xebitiye û wî fikrên xwe yên di derbarê dîroka medreseyan de wiha aniye ziman: “Mirov dema dîroka medreseyan binêre mimkun e ku mirov bibêje ev dîrok digehije Mescîd-î Nebewî ya ku di dema pêxemberê me (Hz. Muhammed. s.a.w.) de hatiye çêkirin (Akgündüz, 2004: 17).”

Dema mirov bi awayekê giştî di derbareyê medreseyan de agahî bide hewceye ku meriv ji gotara Abdulmuttalip Arpayê jî binêre. Arpa ji bo medreseyan wiha gotiye:

Di ola Îslamê de piştî avakirina medreseya Nîzamiyeyê ya ku Bexdayê ava bûye, êdî perwerdehiya medreseyan jî bi rêk û pêk meşiyaye. Ji aliyê dewleta Selçukiyan ve jî piştvaniya wan medreseya hatiye kirin. Ji ber wan sedema di dewra xwe de ji medreseyên din pêstatir bûne. Di medreseyên Nîzamiyê de hem dersên fennî hem jî dersên dînî dihatin dayîn. (Arpa, 2013: 102)

Gelek medreseyên Kurdistanê hene ku kewneşopiya medreseyên klasîk di roja me de didomînin. Ji wan medreyan yek jî Medresa Mela Mûsayê Celalî ye ku li Bazîdê hebûna xwe didomîne. Ev medrese di roja me de jî çalak e. nêzî 17 xwendevanên medresê hene. Ev xwendevan him ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve him jî ji aliyê zarokên Mela Mûsayê Celalî ve dersa dibînin. Piştî xwendina dersên medreseyê, heke xwendevanên ku dersên xwe dane û dersa baş 'elimîne ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve îcazeta qedandina medreseyê digrin, ev jî eşkere dike ku Mela Mûsayê Celalî û Medreseya wî li Bazîdê çiqas bi bandor e.

Mela Mûsayê Celalî wexta behsa medreseya xwe dike dibêje:

Min di zaroktiya xwe da li Erdîşê mekteba muallimiyê qezenc kir, lê ji ber ku em bi şiklekî peya çûne Erdîşê çavên min tije xûn bûn û ez bêxew bûm. Muallima li çavên min nihêrîn û gotin çavên te rind nabînin û wana ez qebûl nekirim. Şukir ji wê rojê ra ku wan mullima ez qebûl nekirim. Piştî wê ez û bavê xwe em vejeriyên Bazîdê. Berê medrese ne mîna niha bûn, gelek caran tişte tunebû em bixwin û em jî birçî diman lê dîsa jî me dev ji xwendinê berneda. Lê niha di medresa me da feqî hene ders dibînin. Nanê wan, ava wan, her tişt hazir e. Di medresê de qatê jorê jî dimînin, qatên jorê da doşek hene, nivîn hene... berê tişte tunebû, em biçûna medreseyekî me nivînên xwe bi xwe ra dibir. Min piştî 70 saliya xwe dest bi nivîsandina kitêban kir. Êdî rehetî heye, îmkan zehf in, ez tîm medresê rewşa feqiya dinêrim, ji wan ra eleqe nîşan didim û dixwînim piştî wê jî kitêban dinivîsim.¹

¹ Hevpeyvîna ku me bi Mela Mûsa re kir, me bandora medreseya li ser şexsê wî pirsî, wî jî bersiva li jorê da.

Di vê hevpeyvîna ku me bi Mela Mûsayê Celalî re kiriye, nîşan dide ku piraniya ‘emrê Mela Mûsayê Celalî di medreseyan de derbas bûye û Mela Mûsayê Celalî di wan medreseyan de gelek astengî kêşaye û bi wê awayê hatiye roja me.

1.2. BERHEMÊN MELA MÛSAYÊ CELALÎ

Mela Mûsayê Celalî niha li Bazîdê jiyana xwe didomîne 83 sal ‘emrê wî heye. Mela Mûsayê Celalî li gelek gundan melatî kiriye. Jiyana wî gelek zehmet derbas bûye. Mela Mûsayê Celalî ji aliyê aboriyê ve gelek tengasî kêşaye. Wî hemû zarokên xwe daye xwendinê û piştî halê wî xweş bûye. Mela Mûsayê Celalî piştî 70 saliya xwe biryar daye ku pirtûkan binivîse di navbera 70-83 saliya xwe de li ser nêzî 45 pirtûkan xebitî ye. Hê jî nivîskariya wê berdewam dike. Berhemên Mela Mûsayê Celalî hinek bi ‘Erebî, hinek bi Kurdî, hinek bi Tirkî û hinek bi Kurdî-‘Erebî ne.

1.2.1. Berhemên Mela Mûsayê Celalî yê ku bi Zimanê ‘Erebî nivîsine

1.2.1.1. Mecmuatu’l-Ulum

Mela Mûsa di vê berhema xwe de li ser dersên ku di medreyên berê û fakulteyên dînî yê roja me de hatine xwendin sekiniye. Di vê berheme de dersên serf, nehî, ilmên mantiqê, aqaîd, tesewîf, usula fiqhê, usula tefsîrê, ilmên ve’dî, usula hedîsê, tecvîd, ilmên arûzê, belaxet, beyan, munazara, meanî, bedî ango 14 ilmên bingehîn bi awayekî kurtasî û têr û tijî hatine dayîn. Ev berhem bi terzekî ansîklopedîk hatiye nivîsandinê. Ji bo kesên destpêka ilmên îslamî de xwendinên xwe didomînin ev berhem di nav xwe de taybetmendiyên sereke dihewîne (bnr.: Celalî, 2003).

1.2.1.2. Mecmuatu’l-Fewaîd

Ev berhem ji bo xwendekarên roja me yê ku di derbarê ilmên dînî de dixebitin hatiye amade kirin. Di vê berheme de agahiyên dînî yê klasîk û modern hene. Ev berhem wek terzeke ansîklopedîk e (bnr.: Celalî, 2004).

1.2.1.3. Mecmuatu’l-Qasaîd

Helbestên meşhûr ên di serdema cahiliya ‘Ereban de hatine nivîsandin ango helbestên Muallakat-i Seb’a (heft qesîdeyên ku li ser Kabeyê ve hatine daliqandin) di vê berheme de hatine şerh kirin. Mela Mûsayê Celalî di vê berheme de ne bi tenê cih daye şerha wan helbestan her wisa qesîdeyên meşhûr ên ku di nav ‘Ereban de belav bûne şerh

kiriye. Dîsa ew dîwan û qesîdeyên ku di dîroka îslamê de hatine nivîsandin jî di vê berhemê de cih girtine. Ji xeynî van dîwana Hz. Elî û Îmam Şafîî jî di vê berhemê de hatine şerhkirin (bnr.: Celalî, 2005).

1.2.1.4. Mecmuatu'l Fetawa

Mela Mûsayê Celalî fetwayên aidê mezhebên Şafîî, Hanefî, Malikî, Hanberî û Caferî bi fetwayên nûjen re li nava hev xisitiye û hemû fetwayan bi awayekî kurtasî vegotiye. Di vê berhemê de him bersiva pirsgerêkên klasîk û him jî bersiva pirsgerêkên nûjen hene. Her wisa Mela Mûsayê Celalî fikr û ramanên di derbarê dînê û tesewifê de hatine gotin jî berhev kiriye û bi awayekî taybet li ser van meseleyan rawestiyaye (bnr.: Celalî, 2006a).

1.2.1.5. Mecmuatu'l Maqasid

Hedîsên mucmel û muşkilên ku di pirtûkên Buxarî, Muslîm, En- Nihaye, El-Camiu's Saxîr de derbas dibin vedibêje û ji bo zelalbûna mijarê şerha wan dike. Ji xeynî wê xebatê di derbarê waazê de rîsaleyek jî di vê berhemê de cih girtiye (bnr.: Celalî, 2006b).

1.2.1.6. Haşîye Ala Îşaretî'l Î'caz

Mela Mûsa di vê berhemê de li ser peyvên dijwar ên Muqadîmeya Bedûzzaman Saîd-î Nursî ya ku di derbarê î'caz û belexata Qur'anê de nivîsiye rawestiyaye û wan peyvên dijwar ji bo ku were fêmkirin bi awayekî zelal vegotiye (bnr.: Celalî, 2008a).

1.2.1.7. Şerhu Qasaîd-î İbn Fariz

Di vê berhemê de helbestên edebiyatnas û helbestvanê meşhûr yê 'Ereba –İbn Fariz- hatiye şerhkirin (bnr.: Celalî, 2008b).

1.2.1.8. Şerhu Ebyatî Tarîxu'l Xulefa

Di vê berhemê de peyvên dijwar ên pirtûka Îmam Suyutî ya bi navê Tarîxu'l Xulefa hatine rave kirin. Mela Mûsayê Celalî wan peyvên bi awayekî zelal vegotiye û şerha wan peyvên dijwar kiriye.

1.2.1.9. Şerhu Ebyatî Nurî'l Ebsar

Helbestên dijwar ên ku di Pirûka Nuru'l Ebsar a ku behsa jiyana 12 melayên ehl-î beytê û behsa jiyana Hz. Muhamed dike de di vê berhemê de ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve hatine şerh kirin.

1.2.1.10. Şerha Kizil Îcazê

Îlmên dijwar ên ku di derbarê mantiqê de yê bi 'Erebî hatine nivîsandin ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve hatiye ravekirin û şerhkirin. Di vê berhemê de talîkatên Bedûzzaman Saîd-î Nursî jî cih digirin (bnr.: Celalî, 2009). Mela Mûsayê Celalî sedema şerhkirina vê pirtûka wiha aniye ziman:

Wextê ku ez ji bo çapkirina pirtûkekê xwe diçûme Stenbolê, min di rê de xewnek dît. Di wê xewnê de Bedûzzaman Saîd-î Nursî hate xewna min û ji min re got: "Êdî ewe ku ilmên mantiqê ji holê radibin, di vê mijarê de şerha pirtûka "*Kizil Îcaz*"ê bike." Ez jî ji wextê ji xewê şiyar bûm, min biryara şerhkirina vê pirtûkê da û bi wê şiklê min dest bi nivîsê kir.²

1.2.1.11. Haşiyeyek li ser Tefsîru'l Muhmelê

Tefsîru'l Muhmel yek pirtûke ku di derbarê tewsîra Qur'anê de hatiye nivîsandin. Taybetmendiyeke vê berhemê jî ew e ku qet xalband nehatine bi kar anîn. Mela Mûsayê Celalî şerha cihên dijwar kiriye û bi awayekî zelal wan beşan rave kiriye. Çapa ewil a vê berhemê li Stenbolê hatiye kirin. Ev berhem niha jî ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve ji bo çapa duyem tê amadekirin. Çapa duyemê li gor çapa yekem berfirehtir bibe lewra Mela Mûsayê Celalî bêtir li ser vê tiştê dixebite û bêtir vê berhemê hûr digire.

1.2.1.12. Talîqat Ala Haşiyetî'l-Kizilci Ala Tasrifî'l Eşnevî

Di vê berhemê de cihên dijwar û muşkil ên ku Haşiyeya Kizilci ya ku li ser pirtûka Eşnevî ya ku di derbarê ilmên serfê de hatine nivîsandin hatiye şerhkirin. Bi wî awayê Mela Mûsayê Celalî xwestiyê xwendekar û ew kesên ku li ser ilmê dixebitin di vî warî de tengasî nekêşin û bi hêsanî têbigehijin ramanên pirtûkê.

² Ji hevpeyvîna digel Mela Mûsayê Celalî

1.2.1.13. Mecmuatu'r-Resaîl

Ev pirtûk ji çar rîsaleyan pêk tê. di vê pirtûkê de jî di derbarê nîqaşên Îslamê yên roja me de agahî hatine dayîn. Ango di nav vê pirtûkê de meseleya nîqaşên di derbarê sinetên pêxember de, mijara Hz. Xizir, hatina Mehdî, Recm, Neqilkirina uzwan, ezaba qebrê û hwd. cih girtine.

1.2.1.14. Er-Risaletu'd-Daiyye Îla Mahabbati Muaviye

Ev berhem ji bo ew maqale û pirtûkên ku dixwazin Hz Muavîye xerab bidin nîşandan bi awayekî gerdişî xwe dispêre berhemên ehl-î sinet bi rêya wan pirtûkên ehl-î sinet Hz Muavîye diparêze.

1.2.1.15. Nefyu'l-Ciheti We'l-Xulul We'l-Îttihad We'l Mekan Anil'Ilahi'l-Wahidî'l-Qahhari'r-Rehman

Hin mijarên aqaîda îslamê de cih digrin ji aliyê mezhebên Mucessime, Muşebbihe, ehl-î sinet û Mu'tezileyê ve tîne nîqaşekirin. Xulul, îttihad, cihet û mekan di nav wan mijara de xwediyê cihekî girîng in. Mela Mûsayê Celalî bi rêya ayetan û bi alîkariya hin hedîsan ve van mijara rave kiriye.

1.2.1.16. Ta'liqat Ala'l-Kitabi'l-Lezi Yebhasu Ani'l-Lah

Pirtûka “Allah”a ku ji aliyê Se'îd Hawwa (1935-1989) ve bi zimanê Erebbî hatiye nivîsandin. Cihên ku fêmkirin û têgihiştina wî zehmet in ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve hatiye ravekirin. Di vê pirtûkê de ta'lik cih digirin.

1.2.1.17. Senau's-Saqaleyn Fî Menaqib-î's-Şeyheyn Ebî Bekir Es-Siddîq ve Omer El-Farûq

Mela Mûsayê Celalî mijarên ku bi Hz. 'Emer û Hz. Ebubekir re têkildarên, ji neqilkirin û îstîfadekirina çavkaniyên dîrokî yên îslamî ve aniye ziman.

1.2.1.18. Celau'l-Ayneyn Fî Menaqib-î'l-Xateneyn Usman Zî'n-Nureyn we Alî ebî's-Sibteyn

Dê vê berhemê de jî Mela Mûsayê Celalî jiyana Hz. Elî û jiyana Hz. Osman bi sûdgirtina çavkaniyên dînî yên îslamî ve aniye ziman.

1.2.1.19. El-Envaru's-Satia Fî'l-Ecvibeti Ani'l-Î'tiradati'l- Warideti Ala'l-Xulefai'l-Erbaati

Di vê berhemê de jî di derbarê çar xelifeyan de agahî hatine dayîn. Ew kesên ku hin nîqaş birine ser çar xelifeyan ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve hatine rexnekirin, Mela Mûsayê Celalî li hember wan kesan, çar xelifeyan parastiye. Mela Mûsayê Celalî bersiva wan pirsên ku di derbarê çar xelifeyan de daye. Da ku şek ji holê rabe û mijar zelal bibe.

1.2.1.20. Nuru'l-Basar Fî Menaqibi'l-Eimmeti'l-Îsney Aşer

Ev berhem jî di derbarê jiyan, şexsiyet û menqibeyê 12 îmamên ehl-î beytê de agahî dide û cihê 12 îmamê ehl-î beytê yê di îslamê de diyar dike. Her wisa ew qîmet û hurmeta ku ehl-î beytê didin van 12 îmama jî di berhemê de cih digire.

1.2.1.21. Feyzu'l-Qadiri'l-Mubdî Şerhu'l-Mewlidi'l Kurdî

Mewlîda ku ji aliyê Melayê Bateyî ve hatiye nivîsandin di nav civaka Kurdan de xwedî cihekî taybet e. ev mewlîd di gelek merasîma de tê xwendin. Mela Mûsayê Celalî mewlîda Melayî Bateyî pêşiyê wergerandiye zimanê 'Erebî û piştê jî bi zimanê 'Erebî şerh kiriye.

1.2.1.22. Feyzu'l-Qadiri'l-Alam Şerhu Nehci'l Enam

"*Nehcu'l Enâm*" a Mela Xelîlê Sêêrtî di edebiyata kurdî de cihekî girîng digre. Mela Xelîl di vê berhema xwe de li ser têgehên aqaîd û kelmê rawestiye. Mela Mûsayê Celalî jî pêşiyê ev berhem wergerandiye zimanê 'Erebî û piştê jî bi zimanê 'Erebî ev behrem şerh kiriye. Armanca Mela Mûsayê Celalî ew bûye ku bila civaka 'Ereban jî haj ji berhemên Kurdî hebin û karibin bi hêsanî wan berhemên bixwînin. Ango Mela Mûsayê Celalî bi rêya xebatên wiha edebiyata Kurdî di nav edebiyatên cuda de qedirbilind kiriye.

1.2.1.23. Feyzu'l-Qadîrî'r-Rehman Şerhu Newbihara Biçûkan

Berhema "*Nûbihara Biçûkan*" a Ehmedê Xanî ya ku di derbarê fêrkirina zarokên Kurmancan de nivîsiye Mela Mûsayê Celalî pêşiyê wergerandiye zimanê 'Erebî û piştê jî bi zimanê 'Erebî şerha vê pirtûkê kiriye.

1.2.1.24. Feyzu'l-Qadiri'l-Mennan Şerhu Aqîdeti'l Îman

Ev berhem jî li ser berhema “*Eqîdeya Îmanê*” ya Ehmedê Xanî hatiye amadekirin. Mela Mûsayê Celalî di serî de ev berhem wergerandiye zimanê ‘Erebî û di dawiyê de jî bi zimanê ‘Erebî şerha berhemê kiriye.

1.2.1.25. Mecmuatu'l-Fuyûzat

Ji ber ku telebkarê pirtûkên “*Feyzu'l- Qadiri'l- Mubdî Şerhu'l- Mewlidi'l Kurdî, Feyzu'l- Qadiri'l- Alâm Şerhu Nehci'l Enâm, Feyzu'l- Qadiri'r- Rahmân Şerhu Newbihârâ Biçûkân, Feyzu'l- Qadiri'l- Mennân Şerhu Aqîdeti'l Îmân*”ê zêde bûne, Mela Mûsayê Celalî jî van pirtûkan aniye li ba hev û wek yek pirtûk amade kiriye. Ev pirtûk di sala 2012an de li Stenbolê, ji aliyê Îhvân Neşriyatê ve hatiye çapkirin.

1.2.1.26. Şerhu Tefsîri'n-Neseffî

Ev berhem li ser pirtûka meşhûr a “*Tefsîra Neseffî*” hatiye nivîsandin. Nivîsandina vê berhemê hêj neqediyaye û Mela Mûsayê Celalî hêj nivîsandina berhemê didomîne. Sedema nivîsandina vê pirtûkê jî ew e ku alim û xwendekarên ku nikarin tefsîra Neseffî fêhm bikin ji ber wê jî ji bo nivîsandina cihên zehmet ên pirtûkê ji Mela Mûsayê Celalî daxwaz kirine, ev sedem jî bûye nivîsandina pirtûkê. Dema ku ev pirtûk biqede teqrîbên dê wek 5 cildan were çapkirin.

1.2.1.27. Haşiyetu Camiu'l-Maqasid Ala Halli'l-Meaqid Şerhu'l-Qawaid

Pirtûka “*Halli'l- Meakid*” ji aliyê Ahmed b. Muhammed es-Sivâsî ve hatiye nivîsandin. Ev pirtûk di medreseya de pirtûkekê sereke ye ku ji aliyê xwendevanan ve tê xwendin. Mela Mûsayê Celalî jî xebatekê haşiyê li ser vê berhemê kiriye. Ji aliyê Mehmet Can ve jî hatiye tehqîqkirin û di ji aliyê weşanên Şefkatê ve hatiye çapkirin.

1.2.1.28. Haşiyetu Şerhu'l-Muğni

Pirtûka El Muğnî ya ku di derbarê ilmê nahîvê de hatiye nivîsandin ji aliyê Mela Mûsayê Celalî ve hatiye şerh kirin. Ev pirtûk pirtûkekê sereke ye ku di medreseyan de tête xwendin. Bi wî awayê Mela Mûsayê Celalî cihên dijwar ên pirtûkê bi awayekê zelal vegotiyê, ev jî bûye sedema fêmkirina xwendevanan. Ev berhem di sala 2012an de li Stenbolê ji aliyê weşanên Sembolê ve hatiye çapkirin (bnr.: Celalî, 2012).

1.2.2. Berhemên Mela Mûsayê Celalî yên Bi Kurdî Nivîsine

1.2.2.1. Mewlîd

Mela Mûsayê Celalî di derbarê mewlîdê sê xebat pêk aniye. Ji wan xebatan yek bi zimanê ‘Erebî ye (*Feyzu’l- Qadiri’l- Mubdî Şerhu’l- Mewlidi’l Kurdî*) û dudu jî bi zimanê Kurdî ne.

1.2.2.1.1. Safikirina Mewlîdê Ji Bo Kurmanciya Celalî

Mela Mûsayê Celalî, Mewlûda Melayê Bateyî ya ku bi sedan sale di nav Kurdan de tê xwendin. Ji bo Kurmanciya îro safikiriye. Sedema safikirina Mewlîdê jî girêdaye giranbûna zimanê Mewlîdê, li gor Mela Mûsayê Celalî, Mewlîd berhemekê pir hêja ye. Cihê Mewlîdê di nav kurdan de qedirbilind e. Mela Mûsayê Celalî xwestiye hemû kes vê berhemê fêhm bike, ji ber vê jî Mewlîdê safikiriye û bi kurtasî Mewlîdek nivîsiye. Mela Mûsayê Celalî 138 beytên ewil ên Mewlîdê li gor Kurmanciya Celalîyan nivîsiye. Ev Mewlîd jî li gel Mewlûda Melayê Bateyî li herêma Bazîdê ji aliyê xwendevanan ve hatiye xwendin. Ev berhem ji ji du beşan pêk tê. Di beşa ewil de Mewlîd û di beşa duyem de jî beyt û qesîdeyên Mela Mûsayê Celalî hene. Ev berhem di sala 2007a de li bajarê Stenbolê ji aliyê weşanên Sembolê ve hatiye çapkirin.

Di pêşgotina pirtûka Mewlûda Mela Mûsayê Celalî de bi tîpên ‘Erebî sedema nivîsandina Mewlîdê wiha hatiye ravekirin:

Hemd ji bo Xudayê mezin be. Selat hem selamî bi ‘eded bo resûlê amê hezretî Muhammed Mustafî be. Ev pirtûka hanê piçûka di destê we da ji teref Seyda Mela Mûsî Celalî hatiye nivîsandinê. Seyda di sala 1978a de weqtê ku nav milletê Celalî melatî dikir dît ku Mewlûda Melayê Bateyî dihate xwendinê, lakîn zimanê wî Mewlûdê anegorê milletê Celalî pir giran bû. Lewra têda kelîmeyên ‘Erebî û Farisî û Kurdî ya kevn pir bûn, Ji bo vê halê merivê Celalî ji Mewlûda Bateyî fehm nedikirin. Seyda ihtiyacek hîskir ku Mewlûdê nêzîkê fehm û zimanê Celalîyan bike, ew kelîmên xeyrî Kurdî zivirandine bal kelîmeyên Kurdî li ser lehca Celalîyan e. baweriya me ev e ku hûn xwendevan in, hêja bi vî lehca Celalî Mewlûdê bixwînin hem fehm bikin

Xuda me temaman roja qiyametê ji şefa'eta pêxemberê
me yê 'ezîz mehrûm neke, amîn.³

Çend beytên ewil ji Mewlûda Mela Mûsayê Celalî

Hemd bo Xudayê alemê

Ew Xudayê Lewh û qelemê

Daye me misilmana dînê mezin

Em feqîr, muhtac û belengaz in

Em kirine ummeta ew pêxember

Tabîê wî qîmetlî bû mu'teber

Ew Xudayê bûye xûyê milkê xu

Daye me mîrasa Qurana xu

Dînê me kir kamil, ezîz û tamam

Yanê da me Ehmed eleyhisselam

Ew Xudayê bê mîsal û bê heval

Daye me îman, Quran, rizq û mal

Razîqê bê dest û piyan wekî mûristang û me'r

Xalîqê erd, esman, çiya û behr

Zana ye ji bo xeberê di sînga

Dibihê ji qûlê xu temamê denga

³ Ji pêşgotina pirtûka Mewlûda Mela Mûsayê Celalî (bnr.: Celalî, 2008c).

Kerîm û Rehîm û Mezin û Rehman e

Bibe qurbana wî rûb û can e

Esmanê bêstûn wî çêkirî

Quwet û qudreta Xu zehf lê kirî

Ricakar in em ji Te Lahê Ezîz

Hidayeta me bike bal riya temîz

Zehf e ji me sûc û gûne û zulm e

Lakîn îşê Te ye kerem, qencî û rehm e

Ya Rebb! Îmanê dixazin em daîm

Binê bayraqa pêxemberê me yê kerîm

Eger dixazin hûn ji agir bibine xelas

Daîm selewatê bêjin bi dil û bi îxlas (Celalî 2007: 7-8)

1.2.2.1.2. Xebatekê Ta'liqatê Li Ser Mewlîda Kurdî

Wextê ku Mela Mûsayê Celalî di medreseya xwe de ders daye xwendevanên xwe, di mufredata xwe de meala Mewlîda Kurdî jî ji xwendekarên xwe dida xwendin. Ji ber vê sedemê maneya peyvên 'Erebî, Farisî, Tirkî û peyvên Kurdî ya kevin lêkolîn kiriye û herwisa bi destnivîsa xwe ve maneya van peyvên li ser pirtûka Mewlîdê nivîsiye. Mela Mûsayê Celalî wextê ku ta'lik kiriye li gor vê rêbazê çûye:

Ew peyvên ku îzaha wî bi rêya peyvekî ve tê kirin li kêleka peyvê nivîsandiye.

Ew peyvên ku îzaha wan bi hevokan ve îzah kiriye jî ji ber ku cihê nivîsandinê teng bûye Mela Mûsa li gor tîpên alfabetîk jêrenot amade kiriye û maneya peyvê nivîsandiye.

Carna îzah bi tenê bi rêya dayîna berdêla peyvê ve tê dayîn. Carna Mela Mûsa ji xwe re encamek derxistiye û li ser encamê nivîsandiye ango îzaha peyva nekiriye. Carna di derbarê bûyerên ku di Mewlîdê de derbas dibin agahiyên dîrokî daye. Carna di derbarê mijara de serî li hedîsa daye û mijarê bi alikariya hedîsa ve vegotiye. Carna peyvên ku di Mewlîdê de derbas dibin him ji aliyê ilmên nahîv û him jî ji aliyê ilmên sarfê de agahî daye.⁴

Çawa ku maneya peyvên ‘Erebî bi Kurdî, Tirkî, Farisî hatine dayin, herwisa maneya peyvên Kurdî û Tirkî jî bi ‘Erebî hatine dayîn. Bi vî awayê xwendevanên zimanên cuda dizanin li gor xwe, ji bo fêmkirina xwe kîjan zimanê bixwazin ji wê zimanê sûd digrin

1.2.3. Berhemên Mela Mûsayê Celalî yê ku Him Bi Kurdî û Him Jî Bi ‘Erebî Nivîsîne

1.2.3.1. Şerha Mem û Zînê-Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerha Kitaba Mem û Zîn

Berhema Mela Mûsayê Celalî ya şerha *Mem û Zînê* bi Kurdî û Erebî hatiye nivîsandinê. Ev berhem mijara me ya tezê ye. Ji ber wê jî di bin beşa duyem de me di derbarê vê berhemê de agahî dan. Xulase naxwazim li vir jî behsê bikim.

1.2.3.2. Şerha Dîwana Mela Ehmedê Cizîrî

Mela Mûsayê Celalî di sala 2021an de di 83 saliya xwe de dest bi xebata “*Şerha Dîwana Mela Ehmedê Cizîrî*” kiriye. Ev xebat bi Kurdî û ‘Erebî ye. Di vê xebata xwe de jî Mela Mûsayê Celalî armanc dike ku bi zimanekî rojane Dîwana Cizîrî rave bike, da ku xelk ji wê fêhm bike. Di vê xebatê de wateya peyvên dide, balê dikşîne ser hûnerên edebî yê ku di dîwanê de derbas dibin û ew helbestên ku di dîwana Cizîrî de derbas dibin bi zimanekî rojane û bi devaka Celalîyan dinivîse. Ev xebat hêj neqediyaye.

⁴ Celalî, Ta’lîq ale’l- Mevlid. Ji destxetên Mela Mûsa. r. 1-45.

1.2.4. Berhema Mela Mûsayê Celalî ya Ku Bi Zimanê Tirkî Nivîsiye

1.2.4.1. Îhsan Süreyya Sırma'ya Reddiye

Ev pirtûk hin îddayên berhema “*Hilafetten Saltanata*” ya Îhsan Süreyya Sırma red dike. Ango ev berhem bi terzeke reddiye bi zimanê Tirkî hatiye nivîsandin. Hêj nehatiye çapkirin. Mela Mûsayê Celalî piştî qedandina vê berhemê ji bo çapkirinê çûye Stenbolê. Di derbarê çapkirin an neçapkirina berhemê de bêqerar maye û çûye li ba Mela Sadrettin û bi Mela Sadrettin re xeberdaye. Mela Sadrettin berhemê mêze kiriye û gotiye her çiqas xebatên girîng ên Îhsan Süreyya yên di derbarê îslamê de hebin jî ji bo xebata Mela Mûsayê Celalî ya ilmî jî were weşandin biryar daye. Mela Mûsayê Celalî piştî vê çûye matbaa Tenvir Neşriyat a wê dewrê. Xebatkarê Tenvir Neşriyatê ev berhem çap nekirine û gotine, ger em vê berhemê çapbikin dê Îhsan Süreyya re pir şermê çêbe. Piştî vê gotinê Mela Mûsayê Celalî ji xebatkarên matbaayê re gotiye, “*ez, we, di navbera Îhsan Süreyya û Hz. Muaviye de muhayyer dihêlim.*” Piştî vê gotina xwe Mela Mûsayê Celalî nusxayê destxetên xwe li wir hiştiye û vegeriya Bazîdê.⁵

1.2.5. Beyt û Qesîdeyên Mela Mûsayê Celalî

Di pirtûka Mewlûda Mela Mûsayê Celalî de ji bilî Mewlûdê hinek helbest jî hene, hinek ji wan helbestan bi beytan hatine nivîsîn û hinek ji wan jî ji çarîna pêk tên. Ev beytên Mela Mûsayê Celalî, di bin serenava “*Çend Beytên Îslamî*” de hatine komkirinê. Ew helbest li ser mirinê hatine nivîsînê. Mela Mûsa di helbestên xwe de li ser hezkirina Xwedê û pêxemberan sekiniye. Mela Mûsayê Celalî bi şewaza munacatê û ne'tê û li ser mijarên cuda gelek helbest nivîsiye. Hemû sernevên helbestên Mela Mûsayê Celalî bi navê beytan destpê dike ji ber wê jî şert e ku em bizanibin wateya peyva beytê çî ye?

Peyva beytê di edebiyata ‘Erebî, Farisî, Turkî û Kurdî da biwêjeke hevpar e. Gelek kes binêşa vê peyvê ji zimanê ‘Erebî dizanin. Lê beyta Kurdî, janereke edebî ya serbixwe ye û ji peyva beyta ‘Erebî ku bi wateya malikeke helbestê ye, cuda ye. Beyt çîrokekê vedigêre, lê ew çîrok devkî nîne bi deng e. Beytên Kurdî gelek caran bûne jêderên nivîsîn û afirandina berhemên edebî.

Parviz Jahany di xebata xwe ne doktorayê li ser *Mem û Zînê* çêkiriye. Jahany di wê xebata xwe de wiha behsa têgeha beytê kiriye:

⁵ Agahiyên ku me ji M.Salihê kurê Mela Mûsa girtiye, M. Salih ji me ra behsa vê bûyerê kir.

Beyt şiklek ji edebîyata gelêrî ya Kurdî ye, ku bi serê xwe janrekê serrast dike. Ew zortir çîrokeke evîndarîyê yan serpêhatîyeke hemasî, ayînî, civakî... vedigêre û di forma helbestên gelêrî da hatine dariştinê ku di hindekan da beytbêj ji bo şiroveya mijarê hindek agadarîyan jî bi pexşankî vedigêre. Beyt taybetî edebîyata Kurdî ye û bi vî navî û bi vê formê di edebîyata dîtir gelan da tune ye. Lê mesnewî berewajî beytê janrek e ku di nav edebîyata gelek gelên cîhanê da nimûneya wê heye. Peyva mesnewîyê peyveke Erebi ye û wateya wê dulib dulib e. Lewra her malikeke wê ji du misrayên hev kêş û hevserwa pêk tê. Pişka zor a mesnewîyan jî weke beytê çîrokekê vedigêrin. Beyt û mesnewî di vê xalê da hevpişk in. Lê forma mesnewîyê ji ya beytê cuda ye. Di mesnewîyê da her malikek bi serê xwe xudanê serwayekê ye, û hemû malikên wê, ji serî ta binî debê bi yek kêşê bêne nivîsînê. Lê di beytê da kêş serbest e û her pişkeke wê ku jê ra bend dibêjin di nav xwe da hevserwa ye. Her bendeke beytê ji çendîn rêzikên hevserwa pêk tê. (Jahany, 2020: 18)

Helbestên Mela Mûsayê Celalî di dîwanekî de cih nagirin. Di pirtûka mewlîdê de beşek ji bo helbesta hatiye veqetandin. Di wê beşê de helbest li gor dîroka nivîsandina helbestan hatine rêz kirinê.

1.2.5.1. Beyta “Tederru”ê

Ev helbest di sala 1974an de hatiye nivîsîn. Ev helbest ji 49 malikan pêk tê. Di vê helbestê de behsa belengaziya mirovan û dunyaya fanî hatiye kirin, herwisa di vê helbestê de ji bilî peyvên ‘Erebî û Kurdî, peyvên Tirkî jî hene,

Ez dertlî me û huzunkar im, hem asî me hem gunehkar im

Cem te ya Rebb şermdar im, li efwa te meraqdar im. (Celalî, 2007: 25)

Di beyta jorê de “*serwaya navekî*” hatiye bi kar anîn. Serwaya navekî ew cure serwa ye ku di nav risteyan de cih digire. Ev cure serwa di gelek helbestên Mela Mûsayê Celalî de dixûyê. Her wiha di mînaka jorê de “*serwaya kutayî*” jî hatiye bi kar anîn. Serwaya kutayî di dawiya helbestan de cih digire.

Di helbestên Mela Mûsayê celalî de gelek hûnerên edebî hatine bi kar anîn. Ji wan hûnerên edebî yên ku di vê helbestê derbas dibin yek jî “*hûnera bîranînê (telmîh)*” ye. Di malika 7an de ev cure huner heye,

Ey Xwedayê me yê Kerîm, bi hurmeta Nûh û Îbrahîm
Hem Ehmed û Mûsayê “Elkelim” me xelas ke ji narê cehîm.
(Celalî, 2007: 26)

Di vê malika jorê de Mela Mûsayê Celalî çend pêxemberan bi bîr anîye û bi wê şeklî jî hunera telmîhê (bîranîn) derketiye holê.

1.2.5.2. Beyta “Ji Xewê Rabe”

Di vê helbestê de jî Mela Mûsayê Celalî li ser dinyaya vala disekine. Du malikên ewil ên vê helbestê ev in:

Ji xewê rabe eya xafil, Xuda nas ke bi can û dil
Eger te ra hebe’eqil, zikir bike wekî bilbil

Ji xewê rabe eya mu’mîn, nebe qûlê pez û bizin
Rind nas bike Rebbê mezin, Çûnkî hûn dê bimirin. (Celalî,
2007: 30)

1.2.5.3. Beyta “Ey Însan”

Ev helbest di sala 1975an de hatiye nivîsîn, ji 320 malikan pêk tê. Dîsa di vê helbestê de ji behsa dinyaya vala, mirin, başî, qencî hatiye kirin. Di vê helbestê de jî pesnê Xwedê û pêxemberan tê dayîn. Herdu malikên ewil ev in:

Ey însan guh bidine vê gotin û xeberê
Nebine aşiqê malê dinyayê û koşk û qesrê

Bîr nekin mirin û agir û sekna di qebrê
Sual û ‘ezab û sirat û zehmeta heşrê. (Celalî, 2007: 33)

Mela Mûsayê Celalî çawa di her helbestên xwe de hûnerên edebî bi kar anî be her wiha di vê helbestê de jî gelek hûnerên edebî hene. Mesela, di malika 87an de hûnera dijjwateyê (tezat) hatiye bi kar anîn.

Ey însan qebr hineka ra cehennem e, hinek ra çîmen e

Hineka ra girîn heye, hineka ra hey e ken e.. (Celalî, 2007: 42)

Girîn û ken du peyvên dijjwate ne.

1.2.5.4. Beyta “Navê Xuda” (Celle Celaluh)

Ev helbest ji 31 malikan pêk tê. Di vê helbestê de jî Mela Mûsayê Celalî bi rêya 99 navên Xwedê şefa’etê ji Xwedê dixwaze, da ku Xweda ‘evdên xwe ji agirê cehenemê xelas bike. Di vê helbestê de jî wek hinek helbestên din “*serwaya nevekî*” û “*sewaya kutayî*” hatiye bi kar anîn.

Eya Rebbê me yî Rehîm, bi hurmeta navê ‘Elîm

Bi heqqê Quddûs hem Hekîm, me xelas ke ji narê cehîm.

(Celalî, 2007: 67)

Di vê malikê de Mela Mûsayê Celalî xwestiye ku Xwedayê Tealî wî ‘efû bike ji ber wê jî ji Xweda bi hurmeta navê “*Rehîm, ‘Elîm, Quddûs û Hekîm*” bexşandinê dixwaze.

Eya Rebbê me yî Helîm, bi heqqê Qayyûm hem ‘Ezîm

Melikulmulk hem Kerîm, me xelas ke ji ‘ezabê elîm. (Celalî,

2007: 67)

Di vê helbestê de exleb malik bi navê Xweda dest pê dikin û ew navê Xweda bi ‘efûkirinê ve tê girêdan.

1.2.5.5. Beyta “Navê Pêxember” (‘Eleyhisselam)

Ev helbest ne wek helbestên li jorê me behs kirin bi malikan hatine nivîsandinê, ev helbest bi çarînan pêk hatiye. Di vê helbestê de 24 çarîn hene.

Şemaya serwayê aaaa/bbbb/cccc.... ye.

Mirov dikare vê helbestê di bin sîwana ne’te de bisinifîne. Lewra di vê helbestê de methê pêxemberê me-Hz. Muhammed (s.a.w)- tê kirin. Di vê helbestê de Mela Mûsayê Celalî ji pêxember şefa’etê dixwaze.

Herdu çarînên helbestê ev in:

Ey pêxemberê me yî Kerîm û zû-rehmet
Resûlurrehmet, resûlurrehmet û zû-quwet
Mîftahulcennet, muqîmussunnet hem rehmet
Li ummta xu ra nezer bike di yewmul-‘eraset

Ey pêxemberê me yî delîlulxeyrat
Rehîm, qeyîm hem musahhihul-hesenat
Taha, Huda, Buşra û muqîlul- ‘esaret
Li ummeta xu ra nezer bike di yewmul-‘eraset. (Celalî 2007:
71)

1.2.5.6. Beyta “Wefata Pêxember” (‘Eleyhisselam)

Li ser mirina pêxemberê me –Hz. Muhammed- gelek helbest, ne’et û mersiye hatine nivîsandin. Di wan helbestan de methê pêxember hatine dayîn û şefa’et ji wê hatiye xwestin. Helbestvan an jî nivîskaran di wan nivîsên xwe de hezkirina pêxember, mirina wî, qenciya wî û hwd anîne ziman û ew î ji xwe re mînakekî sereke hilbijartine. Ji wan kesên li ser mirina pêxemberê me helbest nivîsiye yek jî Mela Mûsayê Celalî ye. Mela Mûsayê Celalî him methê wî daye, him wê ji xwe re wek pêşeng dîtiye him jî li ser wî fanîbûna dinyayê raxistiye li ber çavan.

Ev helbest ji 33 çarînan pêk tê. Şemaya qafiyeyê aaaa/bbba/ccca ye. Du çarînên ewil ên helbestê ev in:

Ya Îlahî, Rehîm û ya Ehed
Kanê hebîbê me yî Hezretî Muhammed
Bela û musîbet li me bûne bê-‘eded
Kanê pêxemberê me yî Hezretî Muhammed

Dunyaya fanî bûye pir berbat
Ji pêxemberê me yî emîn ra jî hat

Şerbeta wefatê û te'ma sekerat

Kanê pêxemberê me yî Hezretî Muhammed. (Celalî,
2007: 76)

1.2.5.7. Beyta “Di Heqqê Şeytan” (‘Eleyhille’net)

Şeytan ew e ku mirova ji rêya heq derdixe û dike nava gunehan. Hertim xerabiya mirovan dixwaze. Şeytan bi navê Îblîs jî tê nasîn. Di tesewifê de şeytan wek xeysiyetekê xerab, pîs û nebaş e. Ji ber wê jî mutesewif her tim parastina nefsê li hember şeytan dixwazin û hertim ji mirovan re şîretan dikin, da ku ew mirov nekevin bin bandora şeytan û gunehan nekin.

Li ser xerabî û nebaşiya şeytan bi hezaran tişt hatine nivîsîn. Yek ji wan helbesta Mela Mûsayê Celalî ye. Bi malikan pêk tê di vê helbestê de 28 malik hene. Ev helbest jî li ser nefsê, xerabiyên şeytan, mirin, dinyaya fanî, gunehkarî, bihûşt û hwd sekiniye.

Herdû malikên ewil ên helbestê ev in:

Gelî însan, gelî însan eger dixazî ji derda ra derman

Guh bide nesîhet û we'zan, dûr here ji weswesa şeytan

Lewra şeytan pîr dujmin e, hem xebîs e hem mel'ûn e

Qelbê wî da tijî hesed û kîn e, derdê wî ew e îmanê bistîne.

(Celalî, 2007: 82)

Di herdu malikên jorê de Mela Mûsayê Celalî behsa xerabî û fitneyên şeytan dike û herwiha şîretan li mirovan dike û dixwaze mirov nefsa xwe ji şeytan biparêze.

1.2.5.8. Beyta “Di Heqqê Ateîstî”

Ateîzm qebûlnekirina Xwedê ye. Li gor ateîsta Xweda tune ye. Kesên ateîst baweriya xwe bi tu Xwedayê naînin.

Ev helbest ji 59 çarîna pêk hatiye. Di vê helbestê de bêhtir komînîzm hatiye rexnekirin û Mela Mûsayê Celalî gotiye ew kesên kominêst Xwedê înkâr dikin.

Mela Mûsayê Celalî di helbestên xwe de pîr girîngî daye ola îslamê, Xwedê û pêxemberan. Kesên dijberî van gunehkar dibîne û ji wan re şîretan dike da ku bêne ser rêya heq. Mela Mûsayê Celalî di vê helbesta xwe de behsa mirinê, axretê, hebûna

Xwedê dike. Mela Mûsayê Celalî ji wan kesên ateîst re dibêje înkara Xwedê nekin û li vê dinyayê ji xwe re nekin me'bûd.

Herdu çarînên ewil ên vê helbestê ev in:

Gelî 'ecem gelî 'ereb

Warinê bibînî pir 'eceb

Ji mekteba rabûn xûyî- merteb

Ji bo ateîstî bûne sebeb

Bûne sebeb ji bo felaketê

Fesadiyê dixine nav milletê

Qebûl nakin cehennem û cennetê

Dûr mane ji rehmet û şefa'etê. (Celalî 2007: 86)

1.2.5.9. Beyta "De'wetê"

Ev helbest ji 72 malikan pêk tê. Di vê helbestê de ji Mela Mûsayê Celalî li ser qaîdeyên ola îslamê sekiniye û xwestiye tu kes ji rêya îslamê derneyê û herkes were li ser rêya heq. Mela Mûsayê Celalî gazindeyên xwe ji ew kesên ku gotina Xwedê nakin û li gor îslamê najîn dike û wan kesan bi rexneyên giran îqaz dike.

Hersê beytên ewil ev in:

Gelî millet, gelî Milet, warinê bibînî ders û 'ibret

Terîqê dara kirinê de'wet, fi'lê heram xistine 'adet

Hinek sofî şaşik ser e, ketine terîqa pêxember e

Xuda bîr kirinê derdê wan pere, sofiya guneh kirine pîrr e

Malê wan da tijî jin û bûk e, natirsin ji wî Xudayê yek e.

Derdê wan bûye dunya virek e, hevalê şeytanê le'in gelek e
(Celalî, 2007: 97)

1.3. DI BEYT Û QESÎDEYÊN MELA MÛSAYÊ CELALÎ DE REXNEYA CIVAKÎ

Di demên borî de cihên ku perwerde dihate dayîn medrese bûn û di wan medreseyan de şagirtan xwendinên xwe didomandin. Di medreseyan de ji bilî ilmên fenî, bi bandora ola îslamê ve ilmên dînî jî derketine pêş û şagirtên medreseyan jî zêde eleqe nîşanê van ilman dan e. Herwiha ji ber ku şagirtên wê demê medrese xwendine zêde girîngî dane tesewifê û gelek tiştan li ser nêrîna tesewifê ve nirxandine. Mijara Tesewifê zêde bandorê li ser nivîsên wan kiriye. Wan kesên ku medrese xwendine zêde li ser dinyaya fanî sekinîne û ji bo wan ev dinya derew e. Ji ber wê jî di beyt û qesîdeyên xwe de li ser vê mijarê sekinîne. Ji bo ew kesên ku ji vê dinyaya fanî re zêde têkildar in, rexneyên xwe anîne ziman. Ev rexne ji bo hemû astengiyên ku mirovan mijûlê dinyaya fanî dikin hatine kirin. Hin caran ji bo axa û şêxên ku dibine sedema xapandina gel ev rexne hatine kirin û hin caran jî ji bo mirovên xerab û fesad ev rexne hatine kirin.

Mela Mûsayê Celalî jî ji wan kesan yek e ku rexneya civakî di beyt û qesîdeyên wî de hene. Wextê ku em beyt û qesîdeyên Mela Mûsayê Celalî dinêrin, dixûyê ku Mela Mûsayê Celalî zêde zêde rexne biriye li ser axa û şêxên ku gel dixapînin. Her wiha di hemû beyt û qesîdeyên Mela Mûsayê Celalî de rexne li ser axa, şêx, sofî, şeytan, fesad û hwd. hatiye kirin.

Mînak:

Hinek sofî şaşik ser e, ketine terîqa pêxember e

Xuda bîr kirine derdê wan pere, sofiya guneh kirine pîrr e

(Celalî, 2007: 97)

Ev malika li jor me mînak daye ji helbesta “Beyta De’wet”ê ye. Mela Mûsayê Celalî sofiyan rexne kiriye û gotiye ew ji bo menfe’eta xwe şaşik didine serê xwe. Armanca wan pere û xapandina gel e.

Mînak:

Ey însanê nebaş, serserî, dîn û ehmeq

Her ji Xuda bitirsin bibine tabî’ê riya heqq (Celalî, 2007: 50)

Ev malika ji helbesta “Ey Însan”ê ye. Mela Mûsayê Celalî di vê malikê de jî balê kêşaye li ser dinyaya vala, ji ber wê jî mirovên nebaş rexne kiriye û daxwaz kiriye ku ew bêne li ser rêya heq.

BEŞA DUYEMÎN

TEHLÎLA ŞERHA MELA MÛSA YA LI SER *MEM Û ZÎNÊ*

2.1. KESAYETIYA EDEBÎ Û ŞÊWAZA MELA MÛSAYÊ CELALÎ

Melayên ku di medreseyan de perwerdehî dîtine û ji medreseyan derketine ji ber ku bêhtir girîngî dane ilmên fiqihê û zimanê ‘Erebî, piranî kêm berhem dane û kêm nivîs nivîsine. Nivîsên ku hatine nivîsîn jî ne li gor rê û rêbazan pêk hatine, lewra melayên medreseyan de xwendine piranî nizanibûne rê û rêbaz çî ne. Mela Mûsayê Celalî jî di medreyên cur be cur de xwendiyê û gelek ders daye. Mela Mûsayê Celalî her çiqas ji medreseyan de perwerdehî dîtibe jî ne wek melayên din kêm berhem nivîsiye bîlakîs gelek pir in berhemên wî. Lê ji ber ku me li jorê jî behs kiribû Mela Mûsayê Celalî jî wek melayên din ên ku di medreseyan de xwendina xwe tamam kirine, berhemên xwe bê rê û rêbaz nivîsiye, ev yek jî bûye sedem ku di gelek berhemên wî de gengeşiyek derketiye.

Mela Mûsayê Celalî her wekî ji navê wî tê zanîn mirovekî oldar bûye ji ber wê jî ji wî re “*Mela*” an jî “*Seyda*” hatiye gotin. Mela Mûsayê Celalî ji ber oldariya xwe gelek ji Xwedê tirsiyaye, ev yek di helbestên wî de bûye bingeh. Mela Mûsayê Celalî mirovekî wêrek e ku di dema me de jî dijî. Pêwendiyêke taybet di navbera Mela Mûsayê Celalî û medreseyan de heye. Ew medrese bûne sedem ku pêûsa Mela Mûsayê Celalî vala nemîne û hertim tevbigere.

2.2. ZIMANÊ ŞERHA WÎ Û DI ŞERHA WÎ DE BANDORA DEVOKA SERHEDE

Zimanê şerha Mela Mûsayê Celalî herîkbar, zelal û hêsan e. Ji xwe ev yek di helbestên wî de jî eşkere ye. Mela Mûsayê Celalî di şerha *Mem û Zînê* de bêhtir ji bo *Mem û Zîn* bê bêfhmkirin ked daye, ji ber wê jî zimanê wî zimanekî rojane ye. Ango zimanê wî zimanekî gelêrî ye. Nivîsên wî û şerha wî ya *Mem û Zînê* de li gel zimanekî hêsan, bandora devoka Celaliyan jî berbiçav e. Ji ber ku Mela Mûsayê Celalî xwestiye ji zimanekî rojane binivîse da ku gel têbigehije wî.

Mela Mûsayê Celalî bi Kurdiyeke sade nivîsiye. Em dikarin bo mînak ji hêla ziman ve çend malikên ku wî şerh kiriye binêrin:

Ev kitab bi navê Xwedayê Tealî tê destpê kirin

Ez sond dixwûm kitab bê navê Xwedayê Tealî noqsan e ne
temam e.⁶

Ev mînak ji malika ewil a *Mem û Zînê* ye. Mela Mûsayê Celalî ji bo Kurmancên
Celalî ji vê berhemê fêhmbikin û têbigehijin wê berhemê zimanê berhemê bi vê awayê
rehet û herîkbar girtiye.

Zimanê Mela Mûsayê Celalî zelal e, Jixwe armanca wî ya yekemîn ew e ku divê
berhemên wî bêne fêhmkirin, ji ber wî ked daye û li gor wî nivîsiye. Kurmanciya ku di
şerhê de hatiye bi kar anîn di bin bandora devoka Serhedê de maye, ango di şerha *Mem
û Zîna* Mela Mûsayê Celalî de gelek peyv hene ku taybetmendiya devoka Serhedê
dihewînin.

Ehmedê Xanî di *Mem û Zînê* de diyar dike ku bi sê devokan –Bohtî, Mehmedî,
Silvî- nivîsiye:

Bohtî û Mihemedî û Silvî

Hin le'î û hinek jî zêr û zîvî (Ehmedê Xanî, 1968: 460)

Ev tercîha Xanî giriftarî û qelebalixayîya ziman nîne bîlakîs dewlemendiya
zimanê Kurdî nîşan dide. Xanî bi vê awayê reng daye berhema xwe.

Mela Mûsayê Celalî jî ji ber ku bi kurmanciya Celalîyan berhem şerh kiriye *Mem
û Zîna* Xanî bi devoka Celalîyan nivîsiye û di şerha wî de taybetiyên devoka Serhedê
derdikevin pêş.

Beriya ku em behsa devoka Serhedî di şerha *Mem û Zîna* Mela Mûsayê Celalî de
bikin, pêwîst e ku em bizanibin Serhed çî ye û ji çî re tê gotin?

Rohat Alakom di derbarê Kurd û Kurdistanê de gelek xebatên girîng kiriye.
Alakom, Serhed û herêma Serhedê wiha pênase kiriye:

Li bakûrê Kurdistanê re herêma Serhedê tê gotin. Gelek Kurd li
vê herêmê jiyana xwe didomînin. Serhed di ferhengan de wek
“li dor sînoran, li ser sînoran an jî serê sînoran ve hatiye bi kar
anîn. Beriya belavbûna Sovyetê sînorê hersê dewletan (Osmanî,
Rûs û Îran) li herêma Serhedê giheştine hev. Niha jî sînorên
Tirkiya, Îran û Ermenîstanê li vê herêmê digehijine hev.

⁶ Ji malika ewil a şerha *Mem û Zîna* Mela Mûsayê Celalî.

Bajarên Qers, Agirî û Wan kakilê welatê Serhedê pêk tînin
(Alakom, 2012: 6)

Önder Beyter ew kese ku di qada edebiyata klasîk a Kurdî de li ser Mela Ehmedê Heyderî xebitiye û li ser wî teza mastirê (*Dîwana Mela Ehmedê Heyderî: Metîn û lêkolîn*) amade kiriye. Beyter di vê teza xwe de bi vê awayê behsa herêma Serhedê kiriye:

Îdir ji digel van bajarên bê hesabandin. Herwiha perçeyekî Mûş, Bedlîs û Erzîromê jî dikevî nava vê herêmê... Taybetiyekî mezin ê devoka Serhedê ew e ku li gelek deran dîftong -xw- bi hev re nayên bi kar anîn. Ango tîpa "w"ê dikeve û "x" tenê serê xwe dimîne. Bo mînak: Xweş (xaş), wisa (isa an jî ûsa), Xwarin (xarin), çawanî (çanî), dixwaze (dixaze) û hwd (Beyter, 2013: 34)

Çawa ku Önder Beyter jî behs kir, peyvên mîna xarin, çanî, dixaze... Ango peyvên taybetiyên herêma Serhedê di şerha *Mem û Zîna* Mela Mûsayê Celalî de jî pir hatine bi kar anîn.

Mînak:

Ew lêvê tî ava şîrîn û zelal dixazin

Ew gulî û xal hebb û tele ne.⁷

Di vê malikê de tîpa "w"yê ketiye û tîpa "x"yê bi serê xwe hatiye bi kar anîn û taybetiyên herêma Serhedê derketiye holê.

Mînak:

Nexandî bû lakîn muderris bû ji bo temamê xelqê

Qencî dikir bi mal û ewlad⁸

Dîsa tîpa "w"yê ketiye û tîpa "x"yê bi serê xwe hatiye bi kar anîn.

Mînak:

Muheqek şeytan yê li me şa bibin

Zehfî mel'una jî yê bi me kêfxaş bibin⁹

⁷ Ji malika 74an.

⁸ Ji malika 132an

⁹ Ji malika 183yan

Di vê malikê de taybetiyên herêma Serhedê heye. Dîsa tîpa “w”yê ketiye û peyva “*kêfxweş*” bûye “*kêfxaş*.”

Di herêma Serhedê de taybetiyek jî ew e ku di şûna tîpa “l”yê tîpa “r”yê bi kar tînin ango di navbera van herdu tîpan de tîpguhezîyek çêdibe.

Mînak:

Bira bitirse ji ah û elema dil

Car caran bipirse li halê min¹⁰

Ev mînak jî taybetiyên herêma Serhedê dihewîne lewra di vê mînakê de jî di şûna tîpa “l”yê tîpa “r”yê hatiye bi kar anîn. Di vê malika ku me li jorê mînak da tîpguheziya “l” û “r”yê radixe ber çavan. Di vê mînakê de peyva “*bira*” hatiye bi kar anîn. “*Bira*” ne di wateya “*bira*” an jî “*birader*” de hatiye emilandin. Bira di vê malikê de ji bo peyva “*bila*”yê hatiye emilandin.

Yek taybetiyên herêma Serhedê jî ew e ku di pirjimariya peyvan de xistina dengê “n”yê ye. Ango wextê pirjimariya peyvekî an jî hevokekî bê kirin ew yek bi xistina tîpa “n”yê pêk tê. Ev taybetî di şerha Celalî de gelek caran derdikeve pêş.

Mînak:

Eger tamamî ewan kafira bi tek sehabekî ra beraber bibin

Di heybetê da tu car mislê wî nabin.¹¹

Pirjimariya peyva “*kafiran*” di vê malikê de ketiye û ew peyv bûye “*kafira*” her wiha vê peyvê taybetiyên herêma Serhedê girtiye.

Ji aliyê fonetîkî ve taybetiyên herêma Serhedê, gelemperî jî hêla Bazîdê, ango zimanê rojane ya Mela Mûsayê Celalî di şerhê de pir zêde cih girtiye. Ev jî nîşan dide ku Mela Mûsayê Celalî ji zimanê xwe dûr neketiye û bi zimanê xwe yê herêmî nivîsiye.

2.3. UNSÛRÊN JI BILÎ KURDÎ YÊN KU DI ŞERHA WÎ DE DERBAS DIBIN

Di berhemên edebiyata klasîk de taybetiyek heye ew jî pir zimaniya berheman e. Di berhemên edebiyata klasîk de ji xeynî zimanê dayikê zimanê ‘Erebî, Farisî û Tirkî jî di gelek deran de cih digire.

¹⁰ Ji malika 825an

¹¹ Ji malika 147an

Her çiqas zimanê Mela Mûsayê Celalî zimanekî rojane û hêsan be jî ji ber ku berhemên edebiyata klasîk şerh kiriye di bin bandora zimanê resen de maye. Di şerha *Mem û Zîna* Mela Mûsayê Celalî de her çiqas ligel Kurdî zimanên ‘Erebî, Farisî û Tirkî jî hatibe bi kar anîn jî lê, dîsa zimanê şerha wî girift û hişk nebûye û rewaniya xwe wînda nekiriye. Di *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de gelek peyvên ‘Erebî û Farisî hene, dema Mela Mûsayê Celalî, *Mem û Zîn* şerh kiriye dest nedaye hin peyvên ew peyv wîsa mane. Mela Mûsayê Celalî wexta ev berhem şerh kiriye ji bilî peyvên ‘Erebî û Farisî, gelek peyvên Tirkî jî bi kar anîye. Me ew peyvên ku Mela Mûsayê Celalî di şerha xwe de bi kar anîye li jêrê çend mînak dan.

2.3.1. Unsûrên Erebî

Çawa ku edebiyata klasîk di bin bandora ola Îslamê de maye, her wiha ji ber ku çavkaniyên ku di derbarê ola Îslamê de hatine nivîsandinê bi zimanê ‘Erebî bûne, ev jî bûne sedem ku di klasîkan de zimanê ‘Erebî zêde hatine bi kar anîn. Li ser vê meseleyê gelek kesan fikr û ramanên xwe gotine, yek jî ji wan kesan Agah Sırrı Levend e. Levend, pirtûkek (*Divan Edebiyatı*) di derbareyê edebiyata klasîk de nivîsiye. Li gor Levend: “Edebiyata klasîk bîngeha xwe ji Qûr’an, hedîs, ayet û hwd hildide (Levend, 2015: 15).” Ji ber wê jî ola Îslamê li ser edebiyata klasîk gelek bandor kiriye. Edebiyata klasîk gelek caran di nav çerçova Îslamê de tê nixandin. Dîroka nivîsandina *Mem û Zînê* gelek kevn e. Ji ber wê jî di *Mem û Zînê* de gelek berhemên ‘Erebî hene. Piştî Kurdî di berhema *Mem û Zînê* de herî zêde zimanê ‘Erebî hatiye bi kar anîn. Mela Mûsayê Celalî di şerha xwe de hin caran girêdayê malik û peyvên resen maye.

Mînak 1.

Ev deng û izdiham xelqê gerandine ‘aşîq

Bû zelzele û rakirin xelqê¹²

Mînak 2.

Rindiya sûretê Sitî û Zînê

Bûye behrek ji agirê ‘eşqê¹³

¹² Ji malika 977an

¹³ Ji malika 432an

Her çiqas me li jorê ji bo bi kar anîna peyvê ‘Erebî çend mînak dabin jî, ev mînak ji bo ravekirina peyvên ‘Erebî ne bes in lewra piştî bi kar anîna peyvên Kurdî herî zêde peyvên ‘Erebî hatine ‘emilandin.

2.3.2. Unsûrên Farisî

Edebiyata klasîk ji ber sedemên îslamî her çiqas di bin bandora zimanê ‘Erebî da ma be jî her wisa ji ber erdnîgariyê jî di bin bandora zimanê Farisî de maye, lewra cihên ku edebiyata klasîk lê geş bûye, Faris jî xwedî par bûne. Her wisa ev tişt jî bûne sedem ku zimanê Farisan jî di nav klasîkan de cihê xwe bigire.

Di mesnewiya *Mem û Zînê* de gelek peyvên Farisî hene. Mela Mûsayê Celalî dema şerha wê kiriye hin caran dest nedaye ew peyvên resen û hin caran jî di şerha xwe de peyvên Farisî bi kar aniye.

Mînak 1.

Ew î ku bed ‘emelî wekî kilaban

Ya Rebb tu wî bigerîni tabi’ sehabeya.¹⁴

Mînak 2.

Hem kesê aqilmend nebêjin Kurmanc

‘Eşq ji bo xu nekirine amanc¹⁵

Mînak 3.

Zengîn dikir bi destê himmetê

Wê hikmetê binêrin ku li ser wan jî nake minnet.¹⁶

2.3.3. Unsûrên Tirkî

Mem û Zîna Xanî de ji bilî peyvên ‘Erebî û Farisî peyvên Tirkî jî hatine bi kar anîn. Kadrî Yıldırım di derbareyê hêjmara peyvên Tirkî yên ku di *Mem û Zînê* de derbas dibin wiha îzah kiriye: “Hêjmara peyvên Tirkî yên di *Mem û Zînê* de derbas dibin bi tevahî dora 26 heban in (Yıldırım, 2010: 64).” Her wiha di dîwana Xanî de jî gelek

¹⁴ Ji malika 160an

¹⁵ Ji malika 242an

¹⁶ Ji malika 282an

peyvên Tirkî hatine bi kar anîn. Ji xeynî Xanî di dîwana Melayê Cizûrî û gelek klasîkvanên Kurdan jî di nivîsên xwe de cih dane peyvên Tirkî.

Di helbest û berhemên Mela Mûsayê Celalî de gelek peyvên Tirkî hene. Di şerha *Mem û Zîna* wî de jî peyvên Tirkî pir in. Bandora devoka Serhedê jî li ser Mela Mûsayê Celalî zêde ye. Lewra di nivîs û axaftinên Serhediyên de gelek peyvên Tirkî hene. Ew peyvên ku derbasî Kurdiya Serhediyên bûye êdî ji forma xwe ne Tirkî winda kiriye û li gor sentaksa Kurdî formeke nû girtiye.

Hin caran jî nivîskar an jî helbestvanan rasterast peyvên Tirkî di nivîsên xwe de bi kar anîne. Di herêma Serhedê de jî bi kar anîna peyvên Tirkî gelek zêde ne. Mela Mûsayê Celalî jî di şerha *Mem û Zînê* de peyvên Tirkî bi vê şeklê bi kar aniyê.

Mînak 1.

Weqta pêxember ‘eliye-s selam bayraqa xwe bilind kir

Kisrayê ‘Ecem ji wî ra serê xwe berjêr kir.¹⁷

Mînak 2.

Xanim û xatûn rabûne

Wana bostan bi gula tijî kirine¹⁸

2.4. ÇEND ŞERHÊN KURMANCEÎ YÊN LI SER MEM û ZÎNÊ HATINEKIRIN û ŞERHA MELA MÛSAYÊ CELALÎ

2.4.1. Şîroveya Perwîz Cîhanî

Perwîz Cîhanî di sala 1955an de li bajarê Xoyê ya Îranê hatiye dunyayê. Di şaxê edebiyat û zimanê Farisî de lîsans wergirtiye. Di sala 1995an de ji Kurdistanê derketiye û ji wê pêve li Swîsreyê dijî. Perwîz Cîhanî di sala 1977an de dest bi nivîsên Kurdî kiriye û heya niha gelek berhemên wî hatine çapkirin.

Perwîz Cîhanî xebata xwe ne li ser *Mem û Zînê* bi navê “*Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Bi Rave û Şîroveyek Nû*” çêkiriye. Ev xebat di sala 2007an de li bajarê Duhokê hatiye weşandin. Piştê di sala 2010an de xebata Cîhana ya li ser *Mem û Zînê* jî aliyê weşanên Nûbiharê ve bi navê “*Mem û Zîn Ehmedê Xanî, Bi lêkolîn û şîroveyeke*

¹⁷ Ji malika 122an

¹⁸ Ji malika 505an

nû” hatiye çapkirin. Xebata ewil a Cîhanî ya li ser *Mem û Zînê* bi du cildan pêk hatiye lê belê ew xebat ji aliyê weşanên Nûbiharê ve di bin pirtûkekê de cih girtine û bi yek pirtûk hatiye weşandin.

Xebata Cîhanî ya li ser *Mem û Zînê* ya ku di sala 2010an de ji aliyê weşanên Nûbiharê ve hatiye çapkirin ji 1048 rûpelan pêk tê. Cîhanî di destpêka pirtûkê de behsa xebata xwe kiriye û her wiha li ser pênaseya “*Mem û Zînê*” sekiniye. Di derbarê Ehmedê Xanî û berhemên wî de agahî daye û ji aliyê şeklî ve li ser *Mem û Zînê* sekiniye.

Perwîz Cîhanî mesnewiya *Mem û Zînê* malik bi malik rave kiriye. Cîhanî di serî de malikê nivîsiye, piştî di bin serenava “*peyvnasî*”yê peyvnan bi maneya ferhengî daye nasîn. Piştî danasîna peyvnan di bin serenava “*cuwankarî*”yê de jî hûnerên edebî yên ku di wê malikê de derbas bûne rave dike û di dawîyê de jî bi awayekî giştî şîroveya wê malikê dike.

Mînak:

Bî neqşê te neqşê xame xam e

Bî namê te name natemam e¹⁹

Peyvnasî: Neqş 1: Neqîş, kar, ferman, kiriyar, kartêkirin, rol.
Neqş 2: Şûn, dewş, nivîs, nîgar. Xame 1: Qelem. Xame 2:
Xave, siste.

Cuwankarî: Herdu peyvên neqş pêkve cînasa tam û herdu peyvên xame jî pêkve cînasa murekeb serrast dikin. Herwisan li nîveka peyvên name û name da cînasa zayîda muteref heye. Peyva name jî digel herdu peyvên xame sec’a mutewazî çê dike.

Şîrove: Ey Xudayo bêy ferman û kiriyar û xwast û wîsta te şûnewarê qelemê xav û sist û pûç e. Wate her tiştê ku bêy navê te bê nivîsînê, xav û sist û pûç û bênaverok e û pirtûka ku bêy navê te dest pê bibe, nivîşkane û nîvçoyî dimîne (Cîhanî, 2010: 89)

¹⁹ Ji malika 4 a *Mem û Zînê*.

2.4.2. Şerha Jan Dost

Jan Dost ji wan kesa yek e ku şerha *Mem û Zînê* kiriye. Jan Dost ji binxetê ye, Di sala 1965an de li bajarê Kobanî dayik bûye. Lêkolîner, wergêr û romannivîs tê nasîn.

Ew xebata Jan Dost bi navê *Ehmedê Xanî Mem û Zîn Şîrove û Kurdiya Îro* ve di sala 2010an de ji aliyê weşanên avestayê ve derketiye. Ev xebat ji 725 rûpela pêk tê.

Di serê pirtûkê de Jan Dost behsa Xanî û serdema ku Xanî jiyaye dike û piştî gelemperî behsa *Mem û Zînê* û xebatên ku li ser *Mem û Zînê* hatine kirin dike.

Dost di beşên din de jî li ser Şîroveya *Mem û Zînê* disekine. Wextê Jan Dost mesnewiya *Mem û Zînê* şerhkiriye ev rê û rêbaz hilbijartiye:

1) Di serî de 6-9 di vê navberê de çend malikên resen ên mesnewiya *Mem û Zînê* hatine hilbijartin û li pey hev hatine rêzkirin.

2) Piştî rêzkirina wan malikan peyvên ku wan malikan de derbas dibin bi maneya ferhengî ve hatine ravekirin.

3) Piştî ravekirina maneya ferhengî ew malik bi Kurdiya îro ve hatine nivîsandin.

4) Di xala çaremîn de şîroveya wan malikan hatiye kirin.

Mînak:

Sernameyê name namê Ellah

Bê namê wî netemam e wellah²⁰

Fereheng: Sername: Destpêka kitêbê, name: kitêb, yanî Mem û Zîn, Namê wî: Navê wî, navê Xwedê. Natemam: Kêm...

Kurdiya îro: Serê kitêbê ye navê Yezdan

Bi navê wî her kêm e bi xwedan...

Şîrove: Ehmedê Xanî, pirtûka xwe bi navê Xwedê dest pêkiriye (Dost, 2010: 67)

²⁰ Beyta ewil a *Mem û Zînê*.

2.4.3. Şerha Mela Mûsayê Celalî û Di Derbarê Şerha Wî De Çend Xalên

Girîng

Mela Mûsayê Celalî di sala 2018an de dest bi xebata xwe ne li ser *Mem û Zînê* kiriye. Ew xebat dîsa di heman salê de ji aliyê Îhvan Neşrîyatê ve li bajarê Stenbolê hatiye çapkirin. Navê vê xebatê yê resen “*Feyz-el Qedîr-el Metîn Şerhê Kitabê Mem û Zîn*” e. Ev xebat bi du cildan pêk hatiye. Her cild teqîben 730-740 rûpel e. Ev xebat bi rêk û pêk hatiye amadekirinê. Di serî de malikên resen ên *Mem û Zînê* cih girtine, piştî peyvên ku di beytan de derbas dibin bi maneya ferhengî ve bi zimanê ‘Erebî hatine ravekirin. Piştî maneya ferhengîya peyvên dîsa bi zimanê ‘Erebî belaxeta beytan hatiye vegotinê. Piştî belaxetê jî maneya beytan bi zimanê ‘Erebî hatiye ravekirin û di dawiyê de jî maneya beytan bi zimanê Kurdî hatiye vegotinê. Dema ku Mela Mûsayê Celalî maneya Kurdî vegotiyê di serê xebata rave kiriye ku ev beş bi Kurmanciya zaravayê Kurdî ye. Di nava xebata xwe de jî êdî dev ji vê tiştê berdaye û tenê xebata vê beşê di bin serenava “*Maneya Kurmancî*” cih dayê.

Dema Mela Mûsayê Celalî malikên *Mem û Zînê* rave kiriye, Ji bilî gotinên xwe, hin gotinên ku li ser *Mem û Zînê* hatine gotinê an jî ravekirinên cuda yên li ser *Mem û Zînê* jî di nava kevanekê de diyar kiriye. Ev yek di metna ku hatiye transkirîbêkirinê de hatiye nîşandan.

Mela Mûsayê Celalî wextê ku *Mem û Zîn* şerh kiriye, ji bilî serenava ewil a *Mem û Zînê* hemû serenavên dinê bi zimanê resen ango bi ‘Erebî nivîsiye tenê serenava ewil bi zimanê Kurdî ye.

Ew jî wiha ye:

Di beyana jimaretina n’emeta û tekrar şukur kirina Xwedayê
te’alî di sureta xûyî neynik û rakirina perde digel Xwedayê
te’alî. Digel tamam kirina kitabî bazar û tesir’e ka kurt bi
zimanê Kurdî.

2.4.3.1. Rexneyek Li Ser Şerha Mela Mûsayê Celalî *Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerha Kitaba Mem û Zîn*

Di beşên Kurmancî de jî Mela Mûsayê Celalî bi zimanekî herîkbar nivîsiye. Ewîlîn Celalî 4-5 an jî 6 malikên resen nivîsiye, piştî malik bi malik wergerandiye Kurmancîya Celalîyan. Di hin cihan de ew maneya malikên resen derneketiye û ji ber

wê jî Celalî 2-3-4-5 an jî 6 malikan bi hev re mane kiriye û bi wê awayê rave kiriye. Ev yek jî tevliheviyê derdixe holê.

Di şerha ku Mela Mûsayê Celalî kiriye de wezn tune. Ji ber ku di şerha Mela Mûsayê Celalî de wezn tune metn gelek tevlihev dixûyê û gelek caran mirov nikare bigehêje metnê. Mirov nikare ji aliyê şeklî ve şerha Mela Mûsayê Celalî binirxîne. Mela Mûsayê Celalî bêtir girîngî daye maneyê, ji bo zelalbûna metnê hewl daye. Da ku metn bê fêhmkirinê. Ji ber ku di şerha ku Mela Mûsayê Celalî kiriye de wezn tune hinek malik ji malikbûna xwe derketine û mîna hevokan hatine nivîsîn.

Mînak:

Ya Xwedayê heq te ji bo me çêkiriye ev dinya bi tertîbeka rind
û rewneq.²¹

Di vê malikê de Mela Mûsayê Celalî terza mesnewiyê guhertiye û ev malik êdî ji maliktiya xwe derketiye bi terza hevokan hatiye nivîsîn.

Her wiha li gelek cihan de jî Mela Mûsayê Celalî ji bo ku maneya metnê winda nebe 4-5-6 malikan gihandiye hev û weke paragrafekî nivîsiye ew jî bûye sedema tevliheviya metnê.

Mînak:

Ew nî'metê zehf û ev tiştî biqîmet weha reng e ev te'am û kinc
ew metlûb ev tiştî ku nefis jê hezdike ev heywan û me'den û dar
û çêre temamê wan ji bo me ra xizmet dikan û di bin destê me
da ne.²²

Di berhema resen a Ehmedê Xanî de ev paragraf ji 4 malikan pêk hatiyê lê belê Mela Mûsayê Celalî wexta ku ew şerh kiriye, ji bo maneya metnê zelaltir bibe ew herçar malik di paragrafekî de îzah kiriye û ew malik êdî ji maliktiya xwe derketine û bûne nivîsekî ji rêzê.

Di hevpeyvîna ku me bi Mela Mûsayê Celalî re kiribû de Mela Mûsayê Celalî ragihand ku ew şerha wî ya li ser *Mem û Zînê (Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerhê Kitabê Mem û Zîn)* bi devoka Celaliyan ve hatiye nîşandan û armanca şerha wî jî ew bûye ku

²¹ Ji malika sih û sisêyan a ku me transkrîbe kiriye.

²² Ji malika bîs û neh, sih, sih û yek û sih û duduyan a ku me transkrîbe kiriye.

miletê Celalî di xwendina *Mem û Zînê* de astengî nekêşe û wê berhembê fêhm bike. Lê wextê ku em şerha wî mêze dikin em sedî sed wê tiştê nabînin, ji ber ku ev berhembê her çiqas bi devoka Celalîyan jî hatibe nivîsînê, di gelek malikan de ziman pir giran e û nayê fêhmkirin. Ango hinek gotin û kirinên Mela Mûsayê Celalî de nakokiyek derdikeve holê.

Mînak 1:

Weqta wisa ku dibû muraqib

Rûhê wê dibû li cismê xalib²³

Minak 2:

Eflak û 'enasir û mewalîd

Exlat û tebayî' û kilîd (ya xezîna asmana û 'erda)²⁴

Di wan herdu mînakên de jî dixûyê zimanê malikan pir giran e. Mela Mûsayê Celalî her çiqas gotibe “min ji bo fêhmkirina Celalîyan, şerha *Mem û Zînê* kir” jî di herdu malikan de ev tişt naxûyê û di navbera kirin û gotinên Mela Mûsayê Celalî de nakokiyek derketiye holê.

2.5. ÇEND HUNERÊN EDEBÎ YÊN KU DI ŞERHA WÎ DE DERBAS DIBIN

2.5.1. Hunerên Mecazî

2.5.1.1. Teşbîh

Teşbîh peyvek 'Erebî ye. Bi wateya wekhevîyê, şibandîne tê bi kar anîn. Ango bi Kurdî ji teşbîhê re “*şibandîn*” jî tê gotin. Di şerha *Mem û Zîna* Mela Mûsayê Celalî de gelek caran ev huner hatiye emilandin. Di derbarê teşbîhê de gelek pênase hatine kirin. Yek ji wan pênaseya Îskender Pala kiriye, li gor Pala teşbîh: “Teşbîh, du tişt ku bi hev re hevpar bin ji wan tiştan a lawaz were şibandîne bi tiştê dijwar re teşbîh tê gotin (Pala, 2004: 107).” Li gor Îskender Pala divê du hemanên şibandîne hebin û di navbera wan de hevparî hebe, herwiha tiştê lawaz divê bişibe tiştê dijwar.

Mela Mûsayê Celalî jî weke helbestvanên xurt xwestiye gotina xwe bi awayekî zelal û herîkbar vebêje.

²³ Ji malika 2414an

²⁴ Ji malika 2507an

Mînak:

Tu mehbûbî ji bo qelbê temamê aqilmenda

Tu kaş dikî qelba bal xwe ve²⁵

Mehbûb ji bo kesên ku tên hezkirinê tê bi kar anîn. Ango nivîskar vê peyvê ji bo hezkirîyê xwe diemilîne. Di vê malikê de jî nivîskar Xwedayê Tealî şibandiya mehbûba xwe.

Mînak:

Tu nûr î di rindaya suretê mehbûb da

Û agir î di qelbê aşiqê ze'îf da²⁶

Di vê malikê de bi rêya peyvên “*nûr, mehbûb, agir û aşiqê ze'îf*” ve hunera şibandinê hatiye bi kar anîn. Nivîskar Xwedayê Tealî şibandiye nûr, mehbûb û agirê di qelb da. Her wiha xwe jî şibandiye aşiqekî zeîf.

2.5.1.2. Kînaye

Kînaye yek cureyekê hunerê ye ku di derbarê wê de gelek kesan fikr û ramanên xwe beyan kirine. Îskender Pala di derbarê kînayeyê de wiha dibêje:

Ew cure hunerên edebî ye ku helbestvan an jî nivîskar gotina xwe bi awayekî girtî tîne ziman. Ango gotinek bi du maneya were fêhmkirin ew kînaye ye. Di kînayeyê de gotinek ya rastî ye û yek jî ya mecazî ye. Di bi kar anîna wan herdu peyvan de, peyva mecazî li ser peyva rastî dikeve û kînaye exleb bi rêya peyva mecazî ve çêdibe. (Pala, 2004: 109)

Mînak:

Em bizivirin bal serê hikayeta derbaz bûyî

Ew xelqê ku ji derdê ‘eşqê bûne qelb birîn²⁷

“*Qelbê birîn*” dema ev riste tê gotin du tişt dikevin bîra mirov; yek, maneya rastî ye. Ango birînek heye ku berbiçav e û ew birîn li ser qelb e. Ya duduyan, maneya mecazî ye ango maneya dûr e. Ev maneya dûr jî ji bo êşa evînê hatiye bi kar anîn.

²⁵ Ji malika 7an.

²⁶ Ji malika 10an.

²⁷ Ji malika 443an

2.5.1.3. Mecazê Mursel

Peyvekî mirov ji bilî armanca şibînê di wateya nerastî de bi kar bîne jê re mecaza hinartî tê gotin. Di vê hunerê de di navbera peyvan de şibîn tune ye. Ji vî aliyî ve ev huner ji hunera îstîfara û ya şibandîne diqete.

Mînak:

Goya kiribû ji miskê rijandî

Neqaşê felekê (Xudayê Tealî) hinek noqte rêzkirî²⁸

Ev malik ji bo hunera mecazê mursel mînakekê baş e. Di rista duyem de navê Xwedê rasterast nehatiye gotin, li şûna navê Xwedê “*Neqaşê Felekê*” hatiye bi kar anîn. Em pê derdixin ku Neqaşê Felekê Xwedayê Tealî ye.

2.5.1.4. Mecaz

Peyv heke ji bilî wateya xwe ya rastî û ya biwêjî bi wateyeke din were bikaranîn jê re wateya mecazî tê gotin. Peyv ji wateya xwe ya rastî derbasî wateyek din dibe.

Mînak:

Her wekî ew herdu roj û hîvan bi hevra beranberî kirine

Lewra temamê dunyayê bûne muşterî²⁹

Zîn û Sîfî ew qas xweşik û rindik bûne ku di vê malikê de yek ji bi rojê yek jî bi hîvê hatine pênasekirin û her wiha di şûna wan herduyan de “*roj û hîv*” hatiye bi kar anîn. Bi wî awayî jî hunera mecazê derketiye holê.

2.5.2. Hunerên Ciwankarî (Bedî’, Wateyî)

2.5.2.1. Tenasub

Dîsa Îskender Pala di xebata xwene di derbareyê huneran de ji bo hunera tenasubê wiha dibêje:

Tenasub, di navbera du an jî ji duduyan zêdetir peyvan de ji bilî nakokî pêwendarî, aliyê wateyê de hevparî hebe û li ba hev werin komkirin ji wê hunerê re hunera tenasub tê gotin. Ji hunera tenasub re: muratê nazîr, cem’iyyet, telfîq, îtilaf, tewfîq,

²⁸ Ji malika 401an

²⁹ Ji malika 435an

mutenasib hatiye gotin. Helbestvanên edebîyata klasîk vê hunerê di berhemên xwe de ji bo pêwendiya taybet a peyvan di pirî cihan de bi kar anîne. (Pala, 2004: 448)

Mînak:

Tu me'şûq î bi fexr û delal î

Tu aşiq î lakîn bê ihtiyaciya bal tu kes î³⁰

Di vê malikê de ji bo ma'ne xurttir bibe peyvên me'şûq û aşiq li gel hev hatine bi kar anîn lewra di navbera wan herdu peyvan de pêwendî heye herwiha bi wê awayê hunera tenasubê derketiye holê.

2.5.2.2. Telmîh

Telmîh yek cureyekê hunerê ye ku di bin sîwana hunerên wateyî de cihê xwe digire. Di navbera gotinê de, bûyerek raborî ku ji aliyê herkesî ve hatibe zanîn, kesekî navdar, baweriyek an jî gotinek pêşiyar were nîşandan, bi peyvek, bi du peyvan were bîrhatin re “hunera telmîh” tê gotin. Li ser hunera telmîhê gelek pênase hatine kirin. M. Orhan Soysal ji wan kesan e. Soysal hunera telmîhê wiha îzah kiriye:

Di helbest an jî pexşan de nîşandana bûyereke dîrokî ya girîng, rewşek, efsaneyek, pêkenînek navdar an jî çîrokek yaxut kevneşopekê re hunera telmîh tê gotin. (Soysal, 1998: 93)

Mînak:

Te gerandiye Şîrîn di ça'vê Perwîz da şîrîn weku şeker.

Ema Ferhad hêsira ku wekî xûnê dirêjîne.³¹

Di vê malikê de hûnera telmîhê ango bîranînê hatiye bi kara anîn. Navê *Şîrîn*, *Perwîz* û *Ferhad* hatiye zikirkirin û ew hersê aşiq hatine bi bîr anînê.

2.5.2.3. Îstifham

Dîsa M. Orhan Soysal hunera îstifhamê wiha pênase kiriye:

Ji bo bala mirov bêhtir were kişandin tiştêkî bi zen an ji hîs ve were fêhmkirin ev huner tê bi kar anînê. Ji vê hunerê re hunera pirsê an jî sualê jî tê gotin. (Soysal, 1998: 59)

³⁰ Ji malika 8an.

³¹ Ji malika 58an

Fîkr û ramanên Îskender Pala jî ji bo me gelek girîng in. Ji ber ku Pala gelek li ser hunerên edebî xebitiye. Pala di derbareyê hunera îstifhamê de wiha dibêje:

Ji bo bal baştir were kişandin tiştê bi armanca daxwaziya gotinê ji aliyê pirsê ve tê holê, ji vê hunerê re jî hunera îstifham tê gotin. Hinek hîs û raman bi pirsêkirinê ve werin holê baldartî didin peyvê. Ji bo îstifhamê ne hewce ye bersiv were dayîn. Pirs jî xiroş û ji hîsa dilê helbestvan tê zayîn. (Pala, 2004: 121)

Mînak:

Ev ‘umrê te yî çê bûye bi lefza kun ewî du âlem çê kiriye.

Xerez ji wî çî ye? Xerez Adem e.³²

Di vê malikê de bi rêya pirsê hîs û raman bi baldarî derketine holê. Ji bo îstifhamê pêwîst nîne ku bersiv were dayîn lê di vê malikê de bersiv jî hatiye dayîn.

Çima qey te ev temam li muqabilê hev çê nekirine?

Çima qey te qismekî ji qismekî ra mu’adil nekiriye?³³

Di vê malikê de jî nivîskar bi rêya peyva “çima” yê dîsa serî li hunera îstifhamê daye. Nivîskar bi vê awayê xwestiye ku gotin bihêz be.

2.5.2.4. Husnê Talîl

Husnê talîl ew cure hunerên edebî ye ku dikeve bin sîwana hunerên ciwankariyê. Li ser vê hûnerê gelek pênaseyên girîng hatine kirin. Îsa Kocakaplan jî ji wan kesan e ku li ser hunerên edebî xebitiye. Kocakaplan, di xebata xwene bi navê *Açıklamalı Edebi Sanatlar* de li ser pênaseya hunera husnê talîlê sekiniye û ew huner, wiha îzah kiriye: “Bûyerek ku derketibe holê bi xeyalî an jî bi sedemek baştir/rindtir ve were girêdan re husnê talîl tê gotin (Kocakaplan, 2005: 47).” Husnê Talîl, ji bo bûyerek an jî rewşek bedewî/rindî bigire jibîlî sedema wê ji tiştê sedemek were nîşandan re husnê talîl tê gotin.

Mînak:

Tu kesî rindaya sûretê wan nedîtibû

Lewra rindaya wan ji cemala sermedî bû.³⁴

³² Ji malika 15an

³³ Ji malika 69an

Di vê malikê de nivîskar behsa rindiya Zînê û Sitî dîke û dibêje tu kesî bedewbûna wan nedîtibû. Sedema wê nedîtîna jî girêdide xweşikîyekî ebedî. Ango sedema bedewbûna wan bi tiştekî xweş re girêdide û her wiha hunera husnê talîlê derketiye holê.

2.5.2.5. Mubalexe

Ji bo ku bandora peyvê were zêdetir kirinê, peyv ji maneya xwe ne resen kêmtir an jî zêdetir tê nîşandan bi wê şiklî hunera mubalexeyê dertê holê.

Mînak:

Te gerandiye Şîrîn di ça'v Perwîz da şîrîn weku şeker.

Ema Ferhad hêsira ku wekî xûnê dirêjîne.³⁵

Hunera mubalexeyê di vê malikê de eşkere ye. Nivîskar hêsirên ku Ferhad dirêjîne mîna xûnê nîşan daye û her wiha hunera mubalexeyê bi kar aniye.

2.5.2.6. Tezad/Dijwate

Di wateyê de du peyvên dijî hev bi hev re tên bi kar anîn û hunera tezdê pêk tê. Heke peyvek bi xiroş hatibe bi kar anînê, peyva din divê dijî wê be.

Mînak:

Ev hefta ku mîna dûrra ku hirdişin û şeş cihat û çar erkan û hersê ewlad weku ji wan purr ewlad çêdibin û erd û esman digel anaxtara û lewh û qelem û hêstirk û 'erş û heywan û dar û çêre û me'den û çûl.³⁶

Bi peyvên *erd* û *asman* ve hunera dijwateyê hatiye bi kar anîn. *Erd* û *asman* du peyvên dijwate ne. Yek li jêr e û yek jî li jor e.

Mînak:

Ew nûr bû 'esl ji bo temamê nefsa

Hem nefsa qeç hem nefsa xirab³⁷

³⁴ Ji malika 395an

³⁵ Ji malika 58an

³⁶ Mela Mûsa ji bo ma'neya malikan xirab nebe hin çaran 2,3 an jî 4 malika bi hev re nivîsiye. Ew hevoka li jorê jî ji şîroveya sê malikan pêk tê. Ew malik jî malikên 45,46 û 47anin.

³⁷ Ji malika 108an.

Peyvên “qenc” û “xirab” du peyvên dijwate ne. Yek başîyê temsîl dike û yek jî ji xerabiyê.

2.5.2.7. Îqtibas

Ew cure hunere ku helbestvan an jî nivîskar ji bo mane bihêz be, di helbest an jî pexşanên xwe de cih didin ayetan an jî hedîsan ji vê hunerê re jî îqtibas tê gotin.

Mînak:

Perçebûna hîvê bi îşareta te

Ayeta: (Ma Zaxu'l beserû) beyana bilindaya merteba te ye.³⁸

Di vê malikê de ji bo ma'ne bihêz be ayet hatiye bi kar anîn. Di vê ayetê de dibêje ku “*Gotinek bes e ji bo çav xelet nebînin*” Her wiha bi bi kar anîna vê ayetê ve ma'neya hevokê xurttir bûye.

2.5.2.8. Tekrîr/ Dubarekirin

Ji bo wate hêzdar bibe nivîskar an jî helbestvan hin peyvên dubare dikin û her wiha hunera tekrîrê derdikeve holê.

Mînak:

Ya dinê parçek ji qelb û cigera Emîr bû

Navê wê nivê navê Emîr bû³⁹

Di vê malikê de peyvê “navê” hatiye dubarekirin û hunera tekrîrê pêk hatiye.

2.5.2.9. Nîda/Banglêkirin

Di axaftin an jî nivîsê de vebêjer an jî nivîskar ji bo bala guhdarvan an jî xwendevanan bikêşe vê hunerê bi kar tîne. M. Orhan Soysal li ser hunerên edebî xebitiye. Soysal vê hunerê wiha pênase kiriye: “Denglêkirina yekî an jî heyîniyekê, bi armanca axaftina bi wan re bi baneşanên “hey, wey, oy, ya, ey, lê, lo...”, carinan jî baneşan neyê bikarhatin ve jî tê çêkirin (Soysal, 1998: 3). Di vegotina nivîsî û ya devkî de peyvên bangkirin û baneşan, mîna “hey, wey, oy, ya, hey, lê, lo... werin bikaranin re nîda (denglêkirin/banglêkirin) tê gotin. Banglêkirin ji bo balkêşiyê û li piştî kelecane hîsa ku dertê holê ye.

³⁸ Ji malika 164an

³⁹ Ji malika 390î

Mînak:

Got rabe ey bira ji nivînê

Bes e ah bike ji destê birînê.⁴⁰

Di vê malikê de banglêkirin heye. Bi peyvên “*ey bira*” ve ev yek pêk hatiye. Bi vê şiklî di hevokê de kelecani pêk hatiye.

⁴⁰ Ji malika 629an

ENCAM

Di nav cureyên edebiyata klasîka Kurdî de bêhtir mesnewî derdikevin pêş. Mesnewiya ewil a bi Kurdî hatiye nivîsîn *Mem û Zîna* Ehmêdê Xanî tê qebûl kirin. *Mem û Zîna* Xanî him ji warê yekembûna xwe ve him jî di warê kurdewariyê ve gelek derketiye pêş. Lewra, *Mem û Zîna* Xanî ji destana devkî ya Kurdî -Memê Alan- sût girtiye. Di destana Memê Alan de gelek taybetmendiyên xweser ên Kurdan hene. Ev yek jî bala lêkolîneran kêşaye û bûye sedem ku gelek xebat li ser *Mem û Zîna* bîn kirin. Ew xebatên ku li ser *Mem û Zîna* hatine kirin, piranî yan şerhên *Mem û Zîna* ne yan jî ji bo zimanên biyanî wergera *Mem û Zîna* ye.

Beriya ku em behsa Mela Mûsayê Celalî û şerha wî ya *Mem û Zîna* bikin, divê em hinekî behsa têgeha şerhê û girîngiya wê bikin. Şerh ji bo metnekê klasîk zelaltir bibe ravekirin, îzahkirin ango xebatên li ser metnên klasîk in, da ku ew metn bîn fêhm kirin. Şerhkirina metnê ilmek e, rê û rêbaz û formulên şerhê yê xweser hene, Şerh di navbera metnên berê û yê di dema me de wezîfeya pîrekî dibîne lewra, bi wê awayê ew metnên klasîk digehijin nîşên nû. Şerh di edebiyata klasîk a Kurdî de bi piranî li ser berhemên tesewûfî, qesîde, xezel û mesnewiyan hatine kirin. Yek ji wan şerhan, şerha *Mem û Zîna* Mela Mûsayê Celalî ye.

Mela Mûsayê Celalî jî ji wan kesan e ku li ser *Mem û Zîna* Ehmêdê Xanî xebitiye. Mela Mûsayê Celalî alimekî medreseyan e. Di demên borî bigre heya niha gelek mela û seydayên Kurd hene ku Ji bo Kurdî ked dane û berhem nivîsîne. Têkileyê xurt di navbera wan mela û seydayan û medreseyan de hebûne, lewra Ew mela û seyda piranî di medreseyan Kurdistanê de perwerdehî dîtine. Li ser jîyan, berhem û kesayetiya wan mela û seydayan gelek caran xebatên akademîk hatine kirin û ew mijar gelek caran bala lêkolîneran kêşaye. Yek jî ji wan melayan Mela Mûsayê Celalî ye ku gelek ji bo Kurdî xebitiye û ked daye.

Ji ber ku xebateke akademîk li ser Mela Mûsayê Celalî çênebûye, em di derbarê jîyan û berhemên Mela Mûsayê Celalî de zêde xwedî agahî nînin. Herwiha Mela Mûsayê Celalî di nav dewr û berên akademîk û nivîskarên Kurdan de zêde nehatiye naskirin.

Mela Mûsayê Celalî li ser gelek pirtûkan xebitiye û şerha gelek pirtûkan kiriye. Mela Mûsayê Celalî ji ber ku miletê Celaliyan *Mem û Zîna* fêhm nake, ev berhem bi

navê *Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerhê Kitabê Mem û Zînê*, bi devoka Celaliyan ve şerh kiriye. Mela an jî şagirdên ku di medreseyan de xwendine dema ku li ser berhemekê xebitîne, ew berhem çî werger, çî şîrove be exleb di bin serenava şerhê de komkirine. Xebata Mela Mûsayê Celalî ya li ser *Mem û Zînê* jî şerhê bêhtir ji nûve vegotin an jî werger e. Lê çawa ku me li jorê behs kir, ji ber ku Mela Mûsayê Celalî perwerdehiya medreseyê dîtiye, navê xebata xwe di bin serenava şerhê de diyarkiriye. Herwiha, heya niha gelek şerh li ser *Mem û Zînê* hatine kirin, şerha Mela Mûsayê Celalî jî vê hêlê ve ji wan şerhan vediqete.

Ji bilî şerha Mela Mûsa ya li ser *Mem û Zînê*, gelek xebatên wî hene. Hinek bi Kurdî, hinek bi ‘Erebî, hinek bi Tirkî û hinek jî bi Kurdî- ‘Erebî ne.

Di nav xebatên wî de helbestên wî jî hene. Mijarên helbestên wî jî hezkirina Xwedê û pêxemberan, terîqet, tesewif, rewşa misilmanên ku îro têde ne, fanîbûna dinyayê, mirin û hwd. pêk tên.

Armanca me ew bu ku em, li ser Mela Mûsayê Celalî bixebitin. Me, di vê xebata xwe de di derbarê jiyana, berhem û şerha *Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerhê Kitabê Mem û Zîna* Mela Mûsayê Celalî de agahî dan û me xwest ku di nav nivîskarên Kurdan de cihê Mela Mûsayê Celalî diyar bikin.

ÇAVKANÎ

- Akgündüz, M. (2004). *Osmanlı Medreseleri XIX Asır*. İstanbul: Beyan Yayınları.
- Alakom, R. (2012). “Serhed: Welatê ku roj lê hiltê.” *Nûbihar*. Hejmar 117, 5-16.
- Arpa, A. (2013). “Şark Medreseleri Programında Kur’ân Birikimi.” *Bingöl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*. Sayı 2, 99-123.
- Ateş, A. (1988). “Mesnevi.” *TDV İslam Ansiklopedisi*. Ankara: Türkiye Diyanet Yayınları. Cilt VIII. 127-133.
- Beyter, Ö. (2013). *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî: Metîn û lêkolîn*. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Mardin Artulu Üniversitesi YDE.
- Bozkurt, N. (2003). “Medrese” *TDV İslam Ansiklopedisi*. Ankara: Türkiye Diyanet Yayınları. Cilt 28. 338-340.
- Celalî, M. M. (2003). *Mecmuatu’l Ulum*. İstanbul: Şefkat Yayınları.
- Celalî, M. M. (2004). *Mecmuatu’l- Fewaid*. İstanbul: Şefkat Yayınları.
- Celalî, M. M. (2005). *Mecmuatu’l- Qasaid*. İstanbul: Sembol yayınları.
- Celalî, M. M. (2006a.). *Mecmuatu’l- Fetawa*. İstanbul: Sembol Yayınları.
- Celalî, M. M. (2006b.). *Mecmuatu’l- Maqasid*. İstanbul: Sembol Yayınları.
- Celâlî, M. M. (2007). “Ta’lîq ale’l- Mewlîd.” *Ji destxetên Mela Mûsa*. 1-45.
- Celalî, M. M. (2007). *Mewlîd*. İstanbul: Sembol Yayınları.
- Celalî, M. M. (2008a.). *Haşiye Ala İşareti’l- İcâz*. İstanbul: Sembol Yayınları.
- Celalî, M. M. (2008b.). *Şerhu Qasaidi İbn Fariz*. İstanbul: Sembol Yayınları.
- Celalî, M. M. (2008c.). *Mewlûda Pêxember*. İstanbul: Sebat Tanıtım Hizmetleri.
- Celalî, M. M. (2009). *Şerhu Kızıl İcâz*. İstanbul: Sembol Yayınları.
- Celalî, M. M. (2012). *Hâşiyetu’l- Muğnî*. İstanbul: Sembol Yayınları.
- Celalî, M. M. (Mela). 5 Adar 2021, “Jiyan, Berhem û Şerha Mem û Zîna Mela Mûsayê Celalî” Mijara Hevpeyvînê, Agirî.

- Cihanî, P. (2010). *Mem û Zîn Ehmedê Xanî Bi Lêkolîn û Şîroveyeke Nû*: Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Dost, J. (2010). *Ehmedê Xanî Mem û Zîn*, Stenbol: Weşanên Avesta.
- Durmuş, E. (2018). “Hediyetü’l İrfân Der- Şerh-i Bâhâristân ve Eserin Şerh Yöntemi.” *Litera Turca Journal of Turkish Language and Literature*. Cilt 11, Sayı 21, .715-727.
- Ehmedê Xanî. (1968). *Mem û Zîn* (Amd. M. E. Bozarslan). Stenbol: Weşanên Gün.
- el-Bohtî, M. S. R. (2013). *Mem û Zîn*. Abdulhadi Timurtaş (çev.). İstanbul: Kent Işıkları Yayınları.
- Esgerov (Əsgerov), Ş. (2014). *Mem û Zîn. Əhmedê Xanî*. Mehmet Kaplan (wer.). İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Geçit, M. R. (Mela). 5 Adar 2021, “Mela Mûsa û Xebatên Wî” Mijara hevpeyvînê, Agirî.
- Geçit, M. S. (Akademisyen). 25 Sibat 2021, “Mela Mûsa Kî Ye” Mijara Hevpeyvînê, Agirî.
- Jahany, P. (2020). *Berawirdkirina Beyta Mem û Zînê ya Kurmancî (Varyanta Oscar Mann) û Mem û Zîna Mîrza ya Hewramî*. (Yayımlanmamış Doktora Tezi). Bingöl Üniversitesi YDE.
- Kara, İ. (2016). *İlim Bilmez Tarih Hatırlamaz*. İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Kekeç, İ. (2017). “Türk Edebiyatında Mesnevi ve Roman İlişkinine Dair Görüşler Üzerine Bir Değerlendirme.” *Hikmet-Akademik Edebiyat Dergisi*. Gelenek ve posmodernizm özel sayısı, 186-194.
- Kocakaplan, İ. (2005). *Açıklamalı Edebi Sanatlar*. İstanbul: Türk Eğitim Vakfı Yayınları.
- Kortantamer, T. (1994). “Teori Zemininde Metin Şerhi Meselesi” *Ege Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Türk Dili ve Edebiyatı Araştırmaları Dergisi*: İzmir. Sayı: 8,1-10.
- Levend, A. S. (2015). *Divan Edebiyatı*. İstanbul: Dergâh Yayınları.

- Mela Mehmûdê Bazidî. (2007). *Mem û Zîn*. Diyarbakır: Lis Yayınları.
- Mengi, M. (2004). “*Metin Şerhi, Tahlili ve Tenkidi Üzerine*”. *Divan Şiiri Yazıları*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Pala, İ. (2004). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*. İstanbul: Kapı Yayınları.
- Sami, Ş. (1899). *Kâmûs-ı Türki*. İstanbul: İkdam Matbaası.
- Saraç, Y. (2014). *Klasik Edebiyat Bilgisi: Biçim-Ölçü-Kafiye*. İstanbul: Gökkube Yayınları.
- Soysal, M. O. (1998). *Edebi Sanatlar ve Tanınması*. İstanbul: MEB. Yayınları.
- Şakelî, F. (1996). *Mem û Zîn’de Kürt Milliyetçiliği*. İstanbul: Doz Yayınları.
- Şensoy, S. (2010). “Şerh”. *Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi*. İstanbul: TDV.Yayınları. 29: 555-557
- Tarlan, A. N. (1981). “*Metinler Şerhine Dair.*” *Edebiyat Meseleleri*. İstanbul: Ötüken Yay.
- Tek, A. (2011). “Patronaj İlişkisi Bağlamında Ehmedê Xanî’nin Mem û Zîn İsimli Eseri” *Mukaddime 3* (3). 41-60.
- Tek, A. (2018). *Hâmisiz Şâir Babasız Metin: Mem û Zîn ve Osmanlıca Çevirileri Üzerine Bir İnceleme*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Temo, S. (2016). *Mem ile Zîn Ehmedê Xanî*. İstanbul: Everest Yay.
- Türk Dil Kurumu, Türkçe Sözlük*, Ankara: TDK Yayınları, 2003, s. 2087.
- Yıldırım, K. (2010). *Mem û Zîn: Ehmedê Xanî. (Çeviri ve Kavramsal Tahlili)*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Yılmaz, O. (2007). “Klasik Şerh Edebiyatı Literatürü” *Türkiye Araştırmaları Literatür Dergisi*. Cilt 5, Sayı 9, 271-304.

PÊVEK

Pêvek 1

Hevpeyvînek Li Ser Şerha *Mem û Zînê* Li Gel Mela Mûsayê Celalî

Ev hevpeyvîn 5ê meha adar a sala 2021an de bi Mela Mûsa re rû bi rû hatiye kirin. Di vê hevpeyvînê de me çend pirsên di derbarê şerha *Mem û Zînê* de ligel Mela Mûsayê Celalî kir.

Çend pirsên ku me di hevpeyvînê de ji Cenabê Mela Mûsa pirsîn ev in:

Seyda tu cara ewil li ku rastê berhemên şerhkirî hatî û te çawa dest bi şerhkirina berhemana kir?

Min beriya eskeriyê li Bazîdê melatî dikir. Sala 1961ê de ez çûme eskeriyê. Qiziltepê, Mardînê. Wê derê cezaevîya eskeriyê hebû min nobet digirt. Yalnız Xaliqê alemê ji min ra muyesser kiribû, meriv dostê mi ji mi ra kitêb dianî. Wî çaxê şerh tunebû. Niha kitêb zehf in. Min ew kitêb dinêrî cihê ku mi nizanibû mi kifş dikir. Paşê mi dî dibû bazar ez diçûm li wan gundê kêleka, mela hebûn, heta tey Mela Xelîl Gunen hebû belkî we navê wî bihîstiye, wê çaxê muftiyê Qiziltepê bû. Min cihê ku nizanibû ji wan sual dikir û ûsa ûsa meraqam çêbû û ez jî li ser wan xebitîm.

Seyda te ji destpêkê heta niha medrese xwendiyê û niha jî feqîyan didî xwendinê, dikarî ji me ra behsa cudahiya medreseyan berê û yên niha bikî?

Di sala 1951an de ez li Bazîdê diçûme medresê, wê çaxê medresa me hebû lê ne mîna yê niha. Pere tinebû, birçîbûn bû, yek daîrek tenê bû, di wî de hem nivînê me têda bû, hem me dixwend, hem me destnimêj digirt. Ne mîna niha bûye heft heşt qat. Wî çaxê kî dixwend ji bo Xwedê dixwend, ne mîna niha dixwînin dibêjin belkî em maaş distînin. Sibê zû heta êvarê me ders dixwend, ne mîna niha di destê wan de tîlefûn hene, tîlefûnê dinêrin lê xwendin mendin tişte tine. Berê av tinebû em li xwe kin. Bi ava sar me derva serê xwe dişûşt. Ne mîna niha pênc şeş hev şohbenê wan hebûn. Berê wisa zehmet bû. Merivê wî çaxê jî ne merivê naha ye, merivê wê çaxê ji bo Xudê ders didan lê yê niha derdê wan ev e; dibê ez ê feqîya zehf bigirim, bira bêjin filankes feqîya xuyî dike. Nîyet mîna nîyeta berê nîne. Vê carê Xudê muyesser kir ez 1991an de hatime Bazîdê me vê derê medreseka da çêkirinê. Êdî feqî dixûnin.

Seyda niha di vê medresa te de çend feqî hene?

Niha halê hazir medresa me de 25 feqî hene dersa digrin. Mîna berê dewlet jî nahêle.

Seyda ew kitêbên ku te şerh kirine yek jî ji wan *Mem û Zîn* e, te çawa biryar da ku te ew şerh kir?

Belê, pêşiyê me ders dida. Me kitêb nedinivîsî halbûkî ji kitêb nivîsandinê ji ders dayînê, kitêb nivîsandinê daha rind e. Ders dayîn dixûnî diçe, inda dibe. Carekî ez çibûme Erzîrûmê, melak hatibû îmtihanê ew î melê go, go filankes mi Tîllo xundiye, me Camî xund, li ser Camî çend hev kitêb xund mi tamam ezber kir. Îro jî ez hatime, lê min ew tamam bîr kirine. Îro îmtihanê ayreten sualên dinê kirinê em qe nizanin. Ew î ûsa go kete qelbê mi go wele ez ê berê kitêbeke ‘Erebî neql bikim belkî bixûnin. Min kitêbeke ‘Erebî ya ku wan mela jê ders digirtin kurt kir. Ewil xebata min wisa dest pê kir. Paşê ez hîn bûm. Min bi wê şiklî gelek kitêb mane kirin. Ma Şêx Ehmedê Xanî. Min sê hev kitêbên wî mane kirine. Yek *Eqîda Îmanê*, yek *Newbihar* û yek jî *Mem û Zîn*. Min hez dikir ez *Mem û Zînê* şerh bikim. Me zanibû Şêx Ehmedê Xanî mezinekî me Kurmanca ye. Ji Bazîda me rabûye. Min xwest *Mem û Zîna* wî mane bikim û min kitêba wî mane kir. Tesîra wî gelek li ser min hebû, min gelek ji wê hez dikir. Ji xwe meriv yekî hez neke kitêbê wî mane nake.

Seyda te di pirtûka *Mem û Zînê* û gelek berhemên xwe yên din de mexlesa “*Mela Mûsayê Celalî el Beyazidî*” bi kar aniye. Çi bû sedem ku te ev mexles hilbijart?

Niha mecbûrî leqeb e, divê hebe. Çima mi bigota Mela Mûsa, îro halî hazirda Mela Mûsayek ez, vê derê me, Mela Mûsa jî Agiriyê heye, Mela Mûsak jî ez dizanim Mêrdînê heye. Hema ez dizanim halî hazirda sê Mela Mûsa hene. Ka kîjan Mela Mûsa. Divê ev tişt wisa be ku bê naskirinê. Ev naskirin jî yan bi şehr tê naskirin yan jî bi qebîle. Ja qebîla me jî Celalî ye, ji me ra Celalî dibêjin. Mi jî wê quydê xu da naskirinê. Berê di kultura ‘Ereba da jî hinek bi mezheb xu didine naskirinê, hinek bi memleket, hinek bi qebîle. Mesela Qûreysî, Haşimî. Em jî xu bi qebîla xwe didine naskirinê.

Seyda tu di wextê Şêx Ehmedê Xanî de hebûyayî, te ew bidîta ta, di derbarê Mem û Zînê de çi meraq dikir ku te ji wî bipirsiya?

Mesela di *Mem û Zînê* de Şêx Ehmedê Xanî gunehê xu ji şêfîn aniye, gotiye şeytanê belengaz filan. Ez di çaxê wî de hebûma min ê ji wî ev bipirsiya. Lewra ew mezinê me ye û ew î çima eva aha gotiye. Min ê ji wê ra bigota. Mesela Ehmedê Xanî ji aliyê tesewifê ve derdikeve pêş. Lê Ehmedê Xanî Şêfîn şewitiye. Gotiye şeytanê belengaz. Mesela min ê behsa wehdetu'l wicûdê bikira û min ê bigota madem wehdetu'l wicûd ev şekl e. Xwedê başqe û mexlûq başqe. Çika ew î li ser vê yê çi bigota?

Seyda tu dikarî di derbarê zimanê şerha ku te kiriye de çi bibêjî?

Kurmancî çend şêtilê wî heye. Zaza heye Soran heye, Goran heye. Em xelqê vî memleketîne. Em bi vî qaydê xeberdidin û me bi qaydê zimanê xu şerh kir. Em dixazin milletê me bira bizanibe ka *Mem û Zîn* behsa çi dike. Ehmedê Xanî ji Bazîdê ye. Em jî ji Bazîdê ne. Wextê em dixûnin em dibêjin ku ehlê Bazîdê a bi vî şeklî dibêjin.

Seyda *Mem û Zîn* sêsed çarsed sal berê hatiye nivîsîn, di *Mem û Zînê* de gelek peyvên 'Erebî û Farisî hene, te wextê ev me'ne kir ji bo te zor nebû?

Ji xwe ez wî zehmetê xu qebûl im, Ez dibêjim ev kitêb seva Kurdan hatiye çêkirin. Tê de kelîmeyên 'Erebî hene, Farisî hene. Millet nizane, min me'ne kiriye. Ji bo kelîmeyên 'Erebî, lûxatên 'Erebî nihêriye. Ji bo kelîmeyên Farisî lûxatên Farisî nihêriye. Me'neyên wan kelîmeyan di Kurdî de ev in, min wisa kiriye. Mesela hineka gelek Şêx Ehmedê Xanî bihîstiye, gelek ji wî hezdikin lê dibêjin ez kitêba wî dixûnim lê nizanîm wî çi gotiye.

Seyda wextê te *Mem û Zîn* amade kir te ji bo beşa Kurdî ji kîjan çavkaniyan îstifade kir?

Ba min kitêba Jan Dost hebû, min wê nêhêrî yek, min şerha ew Kurmancî Îranê Perwîz Cîhanî îstifade kir dudu, Yek Mela Ehmedê Qoxî hebû xelqê Diyarbekirê, kitêba wan ce mi hebû. Yek jî kitêba ew ê Şamê kûştin Remezan El Bohtî li ce mi hebû. Min kitêba wan dinêrî û ji kitêba wan jî îstifade dikir.

Seyda di destpêka şerha te de te beşên Kurdî di serî de Kurdî diyarkiriye û paşê jî ew peyva Kurdî bûye Kurmancî sebaba vê çî ye?

Kurd daha am e. Niha di bin Kurda de Soran hene, Goran hene, Zaza hene, Kurmanc hene. Lê Kurmanc qismekî Kurda ne. Ji bo hineka Kurd, Kurmanc yek in. Hine cara ji bo Kurda Kurmanc dibêjin hema wê çaxê di serî de mi jî wisa go. Paşê mi kifş kir ku ev ma'ne Kurmanciye, ne Zazakî yan jî yê din e.

Pêvek 2

Transkrîbekirina Şerha Mem û Zînê ya Mela Mûsayê Celalî

Feyz-ul Qedîr-ul Metîn Şerha Kitaba Mem û Zîn

1. Ev kitab bi navê Xwedayê Tealî tê destpê kirin
Ez sond dixwûm kitab bê navê Xwedayê Tealî noqsan e ne tamam e.
2. Ey Xwedayê metle'ê rindiya eşqî
Û mehbûbê eşqa heqîqî û mecazî
3. Navê te lewhe ye ji bo kitaba eşqê
Û neqş e ji bo qelema eşqê
4. Bê neqşa te neqşa qelemî noqsan e
Bê navê te kîtab ne tamam e.
5. Navê te ye şah beyta ku tê qesd kirin
Û fihriste ye ji bo mektubatê ku tê hemd kirin.
6. Û m'ena ye ji bo tamamê wehyanê bê şek
Têda tê dîtîn mekaşefatê xeybî
7. Tu mehbûbî ji bo qelbê tamamê aqilmenda
Tu kaş dikî qelba bal xu ve.
8. Tu me'sûq î bi fexr û delal î
Tu aşiq î lakîn bê îhtiyaciya bal tu kes î
9. Ya Rebb tu mutleqa mufîd î û mustefad î
Û murîd î û murad î bê şek

10. Tu nûr î di rindaya suretê mehbûb da
Û agir î di qelbê aşiqê ze'îf da

11. Tu mûm î ne ji cinsê nûr û agir
Tu roj î bi çeva nayê dîtin

12. Tu xezîneka veşartî yî di nav tilsima 'alemî da
Û xezîneka tê naskirin bi hebûna însana.

13. Ev 'alem û beşer û mexlûq
Û xeyrî van ji mûcûdata

14. Temam mûhtacê te ne
Di tedbîra 'umrê xu da ya xaliq çîmen alema hesî û xeyrî

15. Ev 'umrê te yî çê bûye bi lefza kun ewî du âlem çê kiriye.
Xerez ji wî çi ye? Xerez Adem e.

16. Adem ferdek ji efradê herdu 'alema ye.
Adem herfek ji lefza "Kun fekanê" ye.

17. Ew herfa heqîqeta mûheqqeq e û hatiye çêkirin ji 'alema 'emr û
'alema xelq î lewra têda heye rûhaniyeta ûlûhiyetî û zilmeta madîfî

18. Cesed hatiye çêkirin ji nasût
Rûh jî hatiye 'elamet kirin bi lahût î

19. Ew rûh û cesed bi zor bi hevra hatine tev hev kirin. Bi 'emrî
Xwedayê Tealî

20. Cesed gerçî bê qîmet e. Lakîn rûh ji nûra cemala Xweda ye.

21. Ew herfa weku me ji wî behs kiriye ew neqşeka biçûk e.
Lakîn meqsed û me'na wî kûr e.

22. Ya Rebb eger te însan di zahir da biçûk nîşan daye
Ew di heqîqetê da neqşê qelema mezin e.

23. Di wî da 'alema şehadet û xeybî heye
Hem di wî da mezinayî û noqsanî heye

24. 25. Însan tariye bi heseb cesedê xu nûr e bi heseb rûhê xu
Adem nêzîkê te ye bi rûhê xu dûr e ji te bi cesedê xu
Temamê cinsê ji 'alemê tabi'ên û mesxerin ji bo new'ê însan

26-27-28. Weha renga feleka mezin û melaîketên mûkerrem û roja mezin
ku dewran dike û hîva 'ecêba ku hereket dike û 'erezî digel 'enasira û
'erezî digel cewahira.

29-30-31-32 Ew nî'metê zehf û ev tiştî biqîmet weha reng e ev te'am û
kinc ew metlûb ev tiştî ku nefis jê hezdike ev heywan û me'den û dar û
çêre tamamê wan ji bo me ra xizmet dikin û di bin destê me da ne.

33. Ya Xwedayê heq te ji bo me çêkiriye ev dinya bi tertîbeka rind û
rewneq.

34. Em xafil in ji zikra te, em gûnehkar in
Mane di qeyda nefsa ne rind.

35. Nîne zikra te û fikra te di qelbê me da
Em bi zimanê xu hemd û şukur te nakin

36 Ya Rebb medet ku nîne Xanî zakir be qelbî
Tu bide wî zimanekî şakir.

**Di beyana jimaretina n'emeta û tekrar şukur kirina Xwedayê te'alî di sureta xûyî
neynik û rakirina perde digel Xwedayê te'alî. Digel temam kirina kitabî bazar û
tesir'e ka kurt bi zimanê Kurdî**

37. Ya Xwedayê ku şukra te cewhera zeman e
Ya Xwedayê ku zikra te temîz kirina qelba ye.

38. Ya wahidê tenê ku bê şerîk e
Ya wahidê ku bênezîr e

39. Ya baqî û daîm ku bêzewal e.
Ya hadîyî ku bêfena ye.

40. Ya xaliqê 'erd û asman
Wiya xaliq temamê îns û cinna.

41. Ya Xweda te çêkiriye temamê melek û melaîket û felekê bicarek

42. Te rind kiriye temamê tiştê ku te çêkiriye.
Ew tiştê ku te derxistiye meydanê te rind kiriye.

43. Her çi tiştê ku te çêkiriye ey sani'ê rind
Di heddê zatê xu da laîq e û mûnasib e.

44. Ev neh felekê berraq ev rojî di sipî û şefaf û şevê di tarî

45-46-47. Ev hefta ku mîna dûrra ku hirdişin û şeş cihat û çar erkan û her
sê ewlad weku ji wan purr ewlad çêdibin û erd û esman digel anaxtara û
lewh û qelem û hêstirk û 'erş û heywan û dar û çêre û me'den û çûl.

48. Ya Rebb te zahir kirin ev temamê sena'e
Te peyda kirin ev temamê 'ecaîb

49. Ya Rebb te çêkiriye temamê ewan tiştan ji tinebûnê
Bê îhtiyaciya bal 'eslekî ku jêra dibêjin heyûla

50. Bi'l-cumle tamam xelq ji ewwel axir
Û bi'l-qisse çi mu'mîn û çi kafir

51. Geriyane cih ji bo dîtina 'ezmeta te
Di her tiştî da zatê te tê dîtînê

52. Bê rindiya te nîne wicûd ji xelqê ra
Û bê nûra te nîne hebûn ji bo mexlûqa

53. Hikmet ew e tu hem batin î hem zahir î
Qudret ew e tu hem xaîb î hem hazir î

54. Nîne ji te ra parçebûn û mesken û mekan
Lakîn tu veşartiyî di nav mexlûqê xu da

55. Goya her tişt cism e tu rûh î
Goya her tişt şehre tu menzil û hakim î

56. Rindiya te xemilandiye suretê mehbûba
Xîreta te gerandiye hesûdî di qelbê dijminan.

57. Meyla te ye 'eşqa celb dike bal me'sûqa
Qelb diêşe ji derdê 'eşqa te

58. Te gerandiye Şîrîn di ça'v Perwîz da şîrîn weku şeker.
Ema Ferhad hêsira ku wekî xûnê dirêjîne.

59. Te mûptelê kiriye Qeys bihezkirina Leylîyî
Ramîn jî bû metî' eşqa Weys.

60. Ya Rebb te çira hûsna Yûsif zahir kir ji bo Zuleyxayî

Te çira wamiq gihandiye bal ‘Ezrayî

61. Ew şêxê weku pêncî hecc kiriye
Te ew gerandiye mecnûn ji bo keçka kafir.

62. Te gerand gula nîlufêra delal î
Te gerand ‘aşiq ji bo tavî

63. Te daye ji dara serwî ra qameta bilind
Te mûptelê kiriye teyrê tezerwan bi girêdana piya.

64. Te gula sor ji pîja derxistiye
Te bilbil bi hezar car gerand ‘aşiq û mecnûn

65. Ya Rebb te daye gula sor rengê rind
Û te daye bilbila dengê şîrîn û rind

66. Te ronahî daye li serê mûma
Te aqil ji pirpiroka istandiye

67. Te çêkiriye ew mehbûbat ku celba qelba dikin
Te gerandiye ‘aqlê ‘aşiqê wan tevlîhêv

68. Ev ‘eşqa ev mûhbeta di qelba da
Ev porê wan ê li ser milê wan da

69. Çima qey te ev tamam li muqabilê hev çênêkirine
Çima qey te qismekî ji qismekî ra mu’adil nekiriye.

70. Ya Rebb te neynik çêkiriye mukerrer
Te rindaya xu di wan da şekil û sûret kirye

71. Te daniye ewana pêşiya teyrê bibixa'
Te çikandiye tele li pêşya kovîya

72. Ewana zen dikin ku neynik av e
Eksa wî jî ku tav e

73. Ewana ku neqşa te di avê da dibînin
Natirsin ji avê û tela ku di avê da hatiye danîne.

74. Ew lêvê tî ava şîrîn û zelal dixazin
Ew gulî û xal hebb û tele ne

75. Wextê ku Xwedayê Tealî hazir be li pêşiya mexlûqa
Temamî wan qesda wî dikin

76. Gelo teyrê pepexa' bixu şekira dirêjînin.
Ewana çî dibihên ew î dibêjin.

77. Ewana meqsedê kurt dibînin
Lewra di qeydê da zehf dimînin

78. Ya padişah tu meqsûd û mirada tamamê qiluban î
Lakîn tu dibî delaletê ew kesê ku tu delaleta wî bixazî

79. Çî kesî ku tu bixazî wî bibî delaletê
Tu piyê wî qîd dikî bi gilê û xala

80. Ew kesî ku tu wî bibî hîdayetî
Wî ra bikî 'îneyetî

81. Ji wî ra meqamekî mezin hazir dikî
Ew î ji xûlamtiyê bilindî bal axatiyê dikî

82. Ya me'bûd te Adem 'eliyelselam gerand qiblegah ji bo melaîketa bê
secda wî ji te ra

83. Te çewa hezretî 'Îsî di nav tamamî pêxembera da veqetand.
Ew gihande bal asmana

84. Ew dersa ku te bi dizî ji Îdrîs 'eliyelselam ra gotiye
Ew î ew gihandiye bal meqamê muqeddes

85. Ew şeytanê feqîr î bê sûc
Weqta ku 'enayeta te ji wî ra hebû...

86. Îblîs her roj hezar ta'et dikir
Lewra te ta'et dabû wî

87. Wî ji xeyrî Xuda ra secde nebîr.
Te ew ji dergahê xu red kir berda,

88. Qehra te ew gerand ebedî di cehenem da

89. Wel hasil me nedîtiye tu xelqek ji hikmeta te bizane ya Xuda.

90. Ew talibê me'rîfetê û xûyê îdrakê di heqqê te da wiha gotiye: Me bê
heqq naskirina te nasnekirî.

91. Xanî bêsebeb nezanbûna xu
Dûr nîne ji riya rast derkeve.

92. Îla wekî Xuda alîkarê wî be
Weya pêxember hezretî Mûstefî delîlê wî be.

93. Ya Rebb tu biheqqê pêxemberê xu Mûsteffî kî
Tu Xanî bigerîne ku te nas bike.

**Di Ne'ta Qelemê Mesnû'at û Serdefterê Mewcûdat û 'Eqlê Me'qûlat û Pêşdestê
Mexlûqatê Hezretê Seyyîd'us-Sadat Muhammed-ul Musteffî 'Eleyhî efdek-ul
Selewat**

94. Temamê eşya bi heseb delîl û burhan.

Yan wacib e yan mimkûn e.

95. Wacib yek e ew jî ew zat e ku kubriya ye.

Mimkûn zehf e ew ji temamê tiştê ku ji xeyrî Xuda ye.

96. Ew wacibê ku mimkûnat ji wî ra bûne perde û neynik (zatê wî di wan da tecellî dike).

97. Dixaze ku wehdaniyeta xu bê delîl îsbat bike û husna xwe ji mekanê xefî zahir bike.

98. (Xudayê Tealî) îrade kir da ku zahir bike xezîna cewhera

Ji bo ku sabit bike hebûna xwe

99. Lakîn sen'etê wî hekîmi zana

Û neqşê wî qadirî qewî.

100. Îmkan nedibû delîl anîna li ser bê asra ku delalet li ser wî bike.

Hem lazim e ji 'elameta ku hebûna wî îsbat bikin

101. Ev temamê tiştê ku mewcûd in berê bê xet û bê suret bûn (bê tedwîn û bê tertîb bûn).

Lewra ewwel tiştê ku Xudayê Tealî çêkiriye qelem bû

102. Ev qelem û rûh û 'eqlê ewvel

Her sê lûxat navin ji bo tiştêkî

103. Qet tu ferqî nexê wan
Wiha bike tewfîq navbera wan.

104. Tu bibêje: Ev her sê bizatê xu yek in
Lakîn bê 'êtîbarê xu zehf in

105. Evvel ji husna Xudayê Te'alî şe'le da
Nûrek bû ji wî nûr î rûhê pêxember 'eliye-s selam çêbûye.

106. Ew nûra bi 'emrê Xudayê Te'alî 'elema xeybî.
Geriya mekan ji bo Feyza 'elema xeybî

107. Temamê rûha ji nûra wî pêxember 'eliye-s selam çêbûne.
Mîna çêbûna şekir ji pincarê.

108. Ew nûr bû 'esl ji bo temamê nefsa
Hem nefsa qeç hem nefsa xirab

109. Temamî rûha ji wî nûrî peyda bûne
Temama bi wesita wî lezzet û menfee'tê dîtine.

110. Di wextê ne erd ne asman hebû
Ew (pêxemberê me) reîsê temamê pêxembera bû

111. Xelqa felekan ji bo xatirê wî bû
Hem ji bo xatirê wî melaîketa ji Adem aleyhî-s selam ra secde kirin.

112. Ew rehmet bû ji temamê 'eleman
Hê Adem nav av û herrîyê bû

113. Hem ew resûl cuz û kullî bû
Adem bi xu hêj av û herrî bû

114. Ew pêxember pencereye ji bo cemala Xudayê barî
Û roja felekê ye ji bo qelbê tarî

114. Wextê ku ew hate dunyayê
Û bû pêxemberê axir zemanê

116. Û bû perde di nav Xudayê Te'alî û mexlûqa da
Û bû padişah di suretê dergevana da

117. Nusxa tamamî dîn û miletn kir
Wî 'elîl û 'ellet za'il kirin

118. Wextê ku (pêxember eliye-s selam) dît dunya tijî bûye bi kufri
Sufra pêxemberiya xu anî

119. Ji bo tamamî mexlûqa danî
Bi wasita qasidê xu gazî kir. (bal dînê îslamê)

120. Haqan mîna hindûyan li cem wî esîr bû
Û Fexfûr li ba wî xizmetkar bû

121. Qeyser bi cehl û qusûra xu
Yeqîn kir heqî û rastiya wî

122. Weqta pêxember 'eliye-s selam bayraqa xwe bilind kir
Kisrayê 'Ecem ji wî ra serê xu berjêr kir.

123. Rûm û Hebeş û Fireng û Tatar
Û ewanê ku bi dînê îslamê nekirine îqrar

124. Bi şûr gelek ji wan fena bûn

Hetî qismek ji wan dîn qebûl kirin.

125. Bi eger şuştina putxaneyê putperestan
Vemirandin hemî 'ebadetxane yên agirperestan

126. 127. Weqta ku pêxember eliye-s selam dîn kir aşikarî zehfî Dawûdî
û Yehûdî û nesarî tewrat bîr kir. Încîl û zebûr û ji ezbera wana çûn

128. Weqta ku Hezretî 'Îsî dixand Încîl
Behsa pêxember eliyê-s selam dikir bi wehî û tenzîl

129. Gotê: Ez mîzgînî didim bihatina resûlê emced
Ew ê li pey min bê ku navê wî Ehmed e.

130. Wî (pêxember 'eliye-s selam) de'wa xu dikir bi dest û ziman
Bi destê wî da şûr bi devê wî da Qûran

131. Şiklê wî rind bû hem pêxember bû hem mîr- şecî'- bû
Hem hekîm bû hem xuyê kitab û şûr bû.

132. Nexandî bû lakîn muderris bû ji bo temamê xelqê
Qencî dikir bi mal û ewlad

133. Hikûm li dinyayê dikir bê hesp û 'esker
Ew bê def û bayraq meşhûr bû li dinyayê serarser

134. Her çi tiştê tu dibînî tu zen dikî her ew e (wisa nîne)
Belkî ji wîra 'eliye-s selam heyê 'eskerê ku nayê dîtinê ji melaîketa

135. Bê çadir û qesr û eywan
Li ser wî 'eliye-s selam sî dikirin 'ewran

136. Her tiştê li pişt xu ve didît
Çewa ku tamam tiştê ku li pêşiya xu didît
137. Sîya wî 'eliye-s selam nedikete li ser 'erdan
Bi hevra dibihîst sed xeberdan
138. Bi tiştê bê rûh bi pêxember 'eliye-s selam ra xeber dida.
Dar û çêre dihatine li cem wî.
139. Qet nema qismek ji cinsê heywan
Bi nubuwweta wî nekin îman
140. Îla qismek hindik ji benî Adem
Ew jî geriyan musteheq agirê cehenemî
141. Hasil kelam ev e: Ne di 'erdê ne di asmanan
Ne di nav tamamî îns û canan
142. Tu kesek di şerefê da mislê pêxember 'eliye-s selam tunîne
Ji me ra tu alîkarêkî ji wî mezintir tunîne
143. Ewî bi himmeta xu ummeta xu ya ze'îf veqetand û bijare kir.
144. Bi wer'a xu dînê îslamî qewî kir
Û bi şer'a xu riya hidayetê rast kir.
145. Temamê 'aliman muşabihê pêxemberan e
Temamê abida weliyê Xudayê te'alî ne
146. Tek ferdek ji sehabeyê kiram
Hemberî ji pêncsed kafirê şecî' ra dike

147. Eger temamî ewan kafira bi tek sehabekî ra beraber bibin
Di heybetê da tu car mislê wî nabin.

148. Ew kesê ku di heqqê dînê îslamî da şubhe dikan
Û bê'ilm û bi cehelî di dîn da mucadele dikan

149. Quran û hedîs çî xweş mu'cîze ne
Ayat û sûre çî xweş delîl in

140. Ebûbekir û 'Emer çî hevalê baş in
'Osman û 'Elfîyê heyder çî xweş hatine qebûlkinin

141. Ya ew padişahê merteba wî bilind e
Ya roja ku rûniştiye li ser 'erşê felekê, ya siya ku em bi wî dibin xûdan sî
(weya ew î ku li ser 'erşê felekê rûniştiye û mûhafizê ûmmeta xwe ye).

142. Wesfa te bi 'ilmê min ne mimkûn e muhal e
Ew î ku methê te kiriye Xudayê Zu'l-Celal e

143. Ka ez ê çî bibêjim ya padişah
Ew ê ku wesfê te dike kelamê Xuda ye.

144. Ya padişah ji te ra rind e navê Yasîn
Ya te ji te ra tilsime herfa Tasîn

145. Ev ji te ra kafî ye ya hebîbê Mûxtar
Lewra Xudayê Tea'lî biheyata te sond xar.

146. Sed car tu sax bî ya xuyê qencî yû kerem î...

147. Gerçî em bi sed mertebe xirab in
Dîsa em ji te bê hîvî nabin.

148. Hetî bigehîje Xanîyê ze'îfê jar e
Ew ê ku ne pak e û ne baş e û laîqê agir e.

149. Ew î ku bi xirabî û seyîfî
Nisbeta xu dike bal ummetî

160. Ew î ku bed 'emelî wekî kilaban
Ya Rebb tu wî bigerînî tabî' sehabeya

**Îstid'ayê Şefa'et û Îstişfa' û Mexfîret ji Cenabê Sahibserîrê Şefa'et û Sûretê
Mi'racê da Bi Bal Hezretî 'Îzzet**

161. Ya ew pêxemberê sebebê ji bo hebûna herdu dunya
Ya ew ê ku layiqê bi nêzîk bûna bal Xuda

162. Ya padişahê padişaha textgahê te ye Medîne
Me Ji te pir me'cizat dîne

163. Çûyina bal asman li cem te wekî gavek
Fexra melaîketa ji tê li ser vana selamek

164. Perçebûna hîvê bi îşareta te
Ayeta: (Ma Zaxu'l beserû) beyana bilindaya merteba te ye.

165. Ya padişahê ku rûniştiye li ser textê Lewlak
Rabe bi lez here asmana

166. Hazir bûye ji bo te Buraq û Refref
Melaîket yê ji te ra hevaltiyî bikin sef sef

167. Ji bo ku li ber te rabin perde
Hem bê perde bi Xudayê Te'alî ra xeber de

168. Xudayê Te'alî ra bibêje: Tu qadir î Zu'l-celal î
Û Xudayê Tealî ra bibêje: Tu hem qadir î hem la-yezal î

169. Em fanî ne û jar in û kulmek xûlî ne
Eger Hadî tu nebî em halek in

170. Ya Rebb ewwel te ji bo çî da me te'zîm
Tacê kerametê danî li serê me

171. Te teşrîfa xilafetê da me
Weqtê te emanetê xu da me

172. Te dizanî ku em cahil in
Qedrê wî emanetî nizanin

173. Ya Rebb çi tiştê te ji me ra îrade kiriye
Meji wê zêdetir tu tiştekan nekiriye.

174. Haşa ji kemala şefqeta te
Dûr e ji celal û rehmeta te

175. Tu kufr û guneha bikî sebebê ‘ezabê
Ev laîq nîne ji bo te, ma qey ev karê sultanî ye

176. Li cem te yek in kufr û îman
Yek e li cem te cinneta ebedî û cehenem.

177. Eger tu qehra xu li ser me bikî zahir
Cinnet ji bo me ra yê bîbe agir

178. Eger ew rehma te ya wekî ‘ewra birêje li ser me
Agirê yê bîne cinnet ji bo me

179. Em çi kafir bin çi gunehkar bin
Em gişk ji te rica rehmê dîkin

180. Ji kafir û gunehkar kesek tune ye
Ku nebe mezherê sifatan

181. Em geryan kafir bitecelliya îsmê Xudayê Qehhar

Ew Xudayê Xeffar em gerandine gunehkar

182. Ya Rebb eger tu nexazî kufre bibexşînî
Eger gunehê me 'efû nekî

183. Muheqek şeytan yê li me şa bibin
Zehfî mel'una jî yê bi me kêfxaş bibin

184. Gelo ji xîretê ye, ya xelaskiriyê 'alemê
Gelo qet laîq e ya şivanê benî Adem...

185. Ev gurgê le'înê bed aqîbet
Me bigerîne mîna pez

186. Xulase ya Rebb tu ew î şeytanî serhişk
Bi tenê bişînî cehenemê

187. Xulase xas ê me û 'am ê me
Û gunehkarê me şeqiyê me û ne tamamê me

188. Tu xas bikî bi şefa'eta xu
Me temaman xilas bikî ji agirê cehenemê.

**Iş'ara Mediheta Tewa'îfêd Kurdan e Bi Şeca'et û Xîretê Îzhara Bedbextî û
Bêtalî'îya Wan e Digel Hinde Qeder Semehet û Hemîyyetê**

189. Ya Saqî tu bi xatirê Xudayê Tealî kerem bikî
Ji me ra qirtek şerabê berde cama Cemşîd

190. Hetî ku camê bi şerabê 'alemê bide dîtîne
Ji me ra zahir be ew tiştê ku em dixazîn dîtina wî

191. Hetî ku hal ji me ra kifş bin
Em binêrin gelo ji me ra şans muyesser dibe.

192. Gelo bêşansiya me gihêştiye bal nihayetê
Geryaye qabilê ji bo zewalê

193. Yan jî bêşanstiyê lazîmê me be
Hetî ku dunya hebe

194. Gelo îmkan dibe ku felek ji me ra hevaltîyê bike
Û hêstirka şansê me li ser me derkeve

195. Textê me ji me ra bibe dost
Em carekî ji xewê hişyar bibin

196. Ji me jî rabe hafizek ku me mihafeze bike
Hem ji me ra padişahêk peyda bibe.

197. Yê bê danîn şûrê me'rifeta me
Yê bê zanîn qedrê qelema me

198. Dêrdê me yê ji xu ra bidîta 'îlac
'Îlmê me yê ji xu ra bidîta rewac

199. Eger hebûya ji me ra hakimekê mezin
Sexî û nazik kelamek

200. Li pereyê me sikke bihata lêxistinê
Wiha qet bêqedr û qîmet nedibûn. (Wiha bê bazar û şekbar nedibû)

201. Gerçî (pere) safî ye û temîz e
Lakîn perê bisîkke' daha 'ezîz dibe

202. Eger ji me ra padişahê hebûya
Xudayê Tealî ji wî ra tacek laîq bidîta

203. Ji wî ra textê padişahî te'yîn bikira
Ji me ra şansê wê bûya

204. Eger ji wê ra tacek hasil bibûya
Yê ji me ra jî rewac û qîmet çêbibûya.

205. Wî padişahî hifza me yetîma dikir
Em ji destê le'îma xelas dikirin

206. Turka zor li me nedikirin
Memleketê me bi destê Rûma xirab nedibû

207. Em nedibûne xidmetkar ji bo Turk û Tacîka

208. Lakîn Xudayê Tealî ji ezel da wiha qeder kiriye
Turk û Faris mûselletê ser me kiriye.

209. Gerçî ew tabî'iyeta wan 'eyb e
Lakîn ew 'eyba navdarê wan e

210. Şeref û xîret ji hakim û emîra ra ye

Gelo çî ye gunehê şa'ir û feqîr a

211. Ew kesê ku bi destê himmet şûr hilde

Ew jî bo nefsa xu murewwet û şeca'et dewletekî çê dike.

212. lewra dunya mîna bûkekî ye

Hukmê wî di destê şûrê rût da ye.

213. Emma nikah û mehra dunyayê

Lutf û kerem û dayîn e

214. Min ji bo hikmetekî ji dunyayê pirs kir

Mehra te çî ye? Ew î ji min re wiha go: Mehra min himmet e

215. Wel hasil dunya bişûr û qencyê dibe metî' însana

216. Ez şaş û me[^]tel mame di hikmeta Xudayê Tealî da

Çima Kurmanc di vê dunyayê da

217. Gelo çima mehrum mane

Bi tamamî çima mehkum bûne

218. Ewana bi şûr memleketê meşhûr feth kirine

Wan bi himmet memleket xistine bin emrê xu

219. Her emîrekî wan di dayînê da wekî Hatem e

Her mêrekî wan di herbê da wekî Ristem e

220. 221. Kurda li etrafê Turk û Farisa girtiye

Di her çar terefê di wan ra bûne zirx û mertal

222. Wan herdu terefa Kurd

Gerandine hedef ji bo tîra mirinê

223. Ekrad her wekî kilîd in li ser hidûda

Her ta'îfê ji wan seddek mehkemin

224. Ev behra Rûm û Behra Tacîk

Çiqas ku bihejin û pêl bidin- yanî çiqas ku herb navbera 'esmanî sofûyan
da şedîd bibin-.

225. Kurd bi xûnê dilewitin

Wan ji hev vedîqetînin mîna berzexekî

226. Camêrî û himmet û sexawet

Mêranî û xîret û sebr

227. 'Elamet in ji bo milletê Kurd

Ewanê ku bela kirine 'edalet bi şûrê himmetî

228. Çiqas xûyê şeca'etê ne û bi xîret in

Wisa jî ji minnetê nefret dîkin

229. Ev xîret ev himmeta bilind

Manî'ên ji bo hildana barê minnetê

230. Ji bo wê hemû bê tifaq in

Daîmî xûyê 'isyan û şeqaq in

231. Eger ji me ra îtfaqek hebûya

Û em li pey hev biçûna

232. Temamî Rûm û 'Ereb û 'Eceman
Ê ji me ra bikirana xûlamî

233. Me Yê dîn û dewlet temam bikira
Û me ê 'elem û hikumet tehsîl bikira

234. Ê gotin ji hev biqetiyana
Xudan kemalatê yê kişf bibûna

**Sebebê Nezmê Kitabê Bi Vî Ezmanî û Sûretê Şekwaya Dewranî û Giliya Ji
Ebnayêd Zemanî Ku Li Bal Wan Yeksan e Hunerê Dananî Digel ‘Eybê Nadanî**

235. Xanî ji ber zehf cahilbûna xu
Meydana kemalê xalî dîtiye

236. Ye'nî Xanî qabil û zana nîne
Lakîn te'essuba qewmê xu kiriye.

237. Wel hasil ew î çî bi 'inadê çî bi neheqiyê
Ev bid'et çêkiriye bi xilafa 'adetî

238. Şeraba safî terk kiriye û tortê vexariye
Zimanê Kurdî mîna Durrê ye

239. (Xanî ev zimanê Kurdî) Bi nîzam û întîzam tertîb kir
Ev cefa kişand ji bo milletê 'amê

240. Hetî ku xelq nebêjin: Kurmanc
Bê me'rîfet û bê 'esl in

241. Hem gelek millet xudan kitêb in
Kurmanc tenê di vî da bê par in

242. Hem kesê aqilmend nebêjin Kurmanc
'Eşq ji bo xu nekirine amanc

243. (Kurmanc) Temamê wan ne talib in ne metlûb in
Ne hezdikin ne têne hezkirin

244. Ew ji 'eşqê mehrûm in
Valane ji eşqa heqîqî û mecazî

245. Kurd bêkermal nînin
Belkî ew yêtm in ze'îf in

246. Wel hasil ew cahil nînin
Lakîn ew feqîr in zelîl in bêxuyîne

247. Eger ji me ra hebûya xudanek
Ku 'elî kerem bûya û daîna wî zêde bibûya

248. 'Îlm û fenn û edeb û me'rîfet e
Şî'r û xezel û kitab û dîwan

249. Ev qisim li cem wî me'mûl bibûya
Ev neqd li ba wî meqbûl bibûya

250. Min ê bayraqa şî'rê
Bilind bikir ali jora asman û feleka

251. Min ê rakira rûhê Melayê Cizîrî
Sax bikira 'Elî Herîrî

252. Min ê wisa Feqiyê Teyra keyfxaş bikira
Hetî ebedî şaş û me'tel bima.

253. Lakîn ez çi bikim bazar kesad e
Nîne ji qûmaş ra muşterî

254. Xususen Di vê 'esrê da kîsê pera
Ji me temaman ra bûye mehbûb û bira

255. Ji timamtiyê pûl û pere

Bûne hezkiriyê her yekî me

256. Eger tu temamê 'ilmê bidî pûlekî
Hikmetê bifroşî bi solekî

257. Kes (Mewlana) Camî nake sa'îsê hespê xu
Û Nîzamî ji xu ra nake xidmetkar

258. Weqta ku me dî zeman wiha ye
Temamê însanan ji bo mal herb dîkin

259. Me xwest ku em bibine kîmyager
Weqtê ku me dît ku ew ji me ra muyesser nebû

260. Em mudetekî meşxûl bûn bi nisfiyye
Em xebitîn ji bo saffikirina cewherê sexte

261. Qelbê me hîle qebûl nekir
Me ji bo hedefa xu rêyek nedî

262. Dîn çû nekete destê me dînar
Em bê rîza xu bûne sipîkar (da ku em paxirê zengê girtî sipî bikin)

263. Me paxirê xu yê veşartî eşkere kir
Berê kaxid bû me ji wî ra di'a kir

264. Di'ayê me qebûl bûbe rastî
(Di'aya me) Bu wasiteya ihtiyaciya me.

265. Gerçî ew pûlana bêqîmet in
Lakîn xalis in temîz in bihayê wan giran e

266. Di wan da hîle û ne biçûk in û tamam in
Meqbûle mu'ameleya wan li cem 'amê

267. Ew (pûl) Kurmancî ye sirf e bê şek e
Ew ne zêr e hetî ku bibêjin ew sipî maye.

268. Ew paxirekî sor e aşîkar e
Ew ne zîv e hetî ku bibêjin 'eyarê wî kême

269. Tu ji bo perê me ra nebêje: Ew bêqîmet e
Û ne sikke ê şah e û resmê şah li ser tune.

270. Eger ev perê me li derbxane ê bihata neqşkirinê
Wiha bê rewac û sexte nedima

271. Pûlê me tê hezkirinê talibê wî tune
Lewra bextê wî reş e nayê xwestinê

272. Kaxidê me yê ku em bê alîkar in
Digel ku bê sikke ê padişahî ye

273. Li cem zehfê 'alîma ne sax dimîne
Welî li cem zehfê hekîma meqbûl e

274. Lakîn hakim 'eserê ew ê ku 'alîm e
Guh nedayê bi guh dayîna îdrakê

275. Emîrê ku navê wî Mîrza ye
Nezereka wî ya kîmyawiye heye

276. Ew me'denê ne rind dizvirîne bal cewherê temîz
Ew perê sexte digerîne bal perê zêr

277. Sed bar fulûsê sor hebûn
Derhal tek bi nezerekî digerîne zêr

278. Bi qehrê yê li jorê tîne li jêrê
Bi lutfê yê li jêrê derdixê jorê

279. (Emîr) Ew ê padişah digirtin wekî esîran
Azad dikirin wekî feqîran

280. Di her rojê hezar mesekîn
Di her lehzê sed feqîrê parsek bi lutfê

281. Zengîn dikir bi destê himmetê
Wê hikmetê binêrin ku li ser wan jî nake minnet.

282. Eger Emîr nezer bida me carekî
Berê xu ê mibarek wekî îksîrê bida me

283. Temamî gotina yê bikirana şî'r
Ev pûl yê bibûna zêr

284. Lakîn nezera wî zêde 'am e
Lewra nezera xas ji dil nedaye me

285. Ew rehmetekî xas e bo temamê 'amê ye
Ya Rebb tu bidî wî her dewamî

**Fihristê Seraxazê Kitab û Exbar û Eş'arê Eşî'at û Serniviştê Elqabê Asar e Di
Sûretê Î'tiraf û Îqrar Bi 'Ecz û Înkisarê Digel Î'tizara Guftarê**

286. Ya Saqî ew qedeha rengê hêşîn tiji bike
Bi wî şeraba ku rûhê ebedî ye

287. Hetî rûh me têr be
Lehzekî bi wî şeraba ku rûh xuyî dike

288. Ya Saqî tiji bike wî qedeha muzeyyen
Bi ava ku bi wî qelb dibîne

289. Bi wî qelbê mehzûn şad bike
Bi wî 'aqlê mecnûn muheyzer bike

290. Birêjîne di qedeha ku hatiye çêkirinê ji cewhera
Wî şîreya ku li cehê temîz hatiye givaştinê.

291. Ew (şeraba mîna) yaqûta helandî û le'lê ku dikişe
Ji wî xoşava mîna durrê û wî şeraba pir lezzete

292. Hebî durrê xu birêjîne navê
Ye'nî ew xudana ku wekî ava golê ye

293. Ya Saqî tu şeraba ji ava tirîya
Zêdeke ji me ra di wî qedeha bilûr

294. Ya Saqî şerabê lehze lehze bide destê wan hezkiriyê şerabê
Ye'nî ew xelqê ku dilê wan di destê wan da ne

295. Ya Saqî tu wî qedeha neqîşandî
Tev bike bi şeraba sor a wekî le'lê ew ê ku celba qelba dike

296. Ji bo ku fîncana qelban muzeyyen bibe û meclisa listikê xweş bibe
Tu di wî meclisa şerabxuran ya daîmî, serxoş bihêle bi şeraba teze.

297. Îmkan dibe ji wî feyza ku bê nihayet e
Ji min ra bibe dilopek bi 'inayet û ihtimam.

298. Zewqa wî qedeha şeraba safî û berraq
Kêfa tirî ya dara rind

299. Ew reng bike di nefsê da te'sîr
Di qelb da şewq û îşareteka veşartî ji 'eşqê çêbe

300. Ye'nî bikeve canê min şewqek
Hetî ku bigîje bal qelb zewqek

301. Bila ji min ra ta'sîra nefsê çêbe
Û fereha sîng (çêbe).

302. Temam be ji bo min sefa' qelb
Ez bibim hevalê teyrê 'enadil di xwendinê da

303. Bila qelbê mirî yê ku mîna teyraye bifire
Bila qesîdê bêperde muntezim bibe

304. Bila carekî mîna bilbila ah bike
Carekî jî mîna 'enadil aqîrînî bike

305. Weqta ku ahu zarî bê şandinê di weqtê seherê
Ku ew bibe heval digel baî nesîmî

306. Muheqqeq bi sedan gulê qelban yê vebîn

Gulê sosin yê bi ziman bin û xeber din

307. Gul û çîçek yê ji pîjan vebin û derkevin
Boçika bulbula yê bi xûnê bilewitin.

308. Gulê sor yê hesrê şil birêjînin
Bulbul yê ji rexma gulan bikenin

309. Ya Saqî bide min ew şeraba di rengê gulê da ye
Bê dengê def û sedayê sazî

310. Hetî ku polês û zabite nebînin
Şahî û fereh bicivin tu xem nemînin

311. Hetî ku weswese û teredud ji qelbê mehzûn here
Halê min ji nû va dîsa serobin bibe

312. Ez ê serxoş bibim û bikim kalamê fizûlî
Serrest bibim bikim lafan

313. (Lewra) Ez hetî serxoş nebim nikarim tişteki bibêjim
Da weku cunî bibim, durra birêjim

314. Bedhal bibim sirra eşkere bikim
Bê gotin ji dil xeber bidim

314. Mîna neyê terennum bikim
Mîna pepexanê xeber bidim

316. Ji bo ku keramet ji min zahir bibin
Meqamat û derecatê ji min peyda bibin

317. Da weku deng herin ji meqamê qelb
Û baxçe ê gulan bixemlînin bi meqamê gewest û şehnaz

318. Bê deng û bi aheng ji kuraya qelb
Ez ê sed qa'ide dengê derxim mîna aletê çengî

319. Mîna ew rebaba bê kemeççe
Deng derkeve ji defa me bê toqmak

320. Da weku stêrka zuhre ê dengê meqamê 'aşiqan bibihîze
Da weku neh felek bîne reqsê bi meqama ewcê

321. Bila saza qelbê birîndar bi meqama nizm û bilind be
Bila sazbandê 'eşqê Zîn û Mem bibin

322. Ez ê şerha xema dil bikim efsane
Ez ê Zîn ê û Mem ê bikim bihane

323. Ez ê wiha meqama ji bin perdê derxim
Zîn ê û Mem ê teze sax bikim.

324. Hebîb û 'aşiq naxaş bûne
Îro wekî tebîbekî mahir...

325. Ez ê ewana derman bikim û tedawî bikim
Ez ê ewan kesê bê pişt teze sax bikim

326. Êşa qelbê Memê xuyê kezeba birîndar
Û Zîna ku ji dil zulm lê hatiye kirin

327. Ew a li pişt perde ê û 'effa mestûr e (Zînê)
Ew ê berbi ji tuhmetê (Memê)

328. Ez ê herdu yan meşhûr bikim bi terz û uslûb
Muhîbb û mehbûb yê ji hev kifş bibin.

329. Bi wî şiklê ez ê teze serbind bikim (weya ez ê halê ‘aşîqa bilind
bikim)
Hetî ku temaşê van ji bo dîtîne warin temaşayê

330. Ew jinê me’suqat li ser Memê bigirîn
‘Aşîq ji elema Zînê bikenin

331. Da weku sefa çêbe ji bo ew ê ku mîna wan xudan bela ne
Hem ew ê ku bê ‘eşq in şaş û me’tel bimînin

332. Ew însanê ku ji sîng û dîl saf in
Ew ê ku xuyê exlaqê qenc in û ehlê însafê ne

333. Wel hasil bila vê ‘emelê me rind hesab bikin
Hem bibêjin eva êmela bi terzekî rind hatiye tertîb kirin

334. Ew kesê ku Xudayê Te’alî ji wan hez dike
Û ew ê ku ji ezel ji Xudayê Te’alî hez dikin

335. Bila bînî û guh bidine vî hikayetê
Bila hinek di weqtê bihîstina vî hikayetê halê xu bîr kin

336. Bila hinek bi can guh bidinê
Bila hinek jî bi dil xatirê xu jê bixazin

337. Lakîn ez rica dikim ji ‘alima,
Ku guh nedine ‘eybê feqiya

338. Lewra ev name çi rind be çi rind nebe
Me digel wî dused ezîyyet kişandine

339. Ev name mîna fêkiyê teze ye û zarê piçûk û teze gihêştî ye
Her çi ew qasî rind be, nebe jî

340. Lê min ji rezaan fayde nedîtiye
Min mîna dîza ji kitaba tu kesî hilnedaye.

341. (Name ya min) Çiqekî taze ye ji baxçe ê qelbê
Bêguneh e û binamus e û 'eslê wî temîz e

342. Meyweyeka teze ye çi şîrîn çi tehl be
Hatiye çêkirinê mîna zarê piçûk

343. Ez rica dikim ji qenca
Ewan zarokan (şî'ran) êybdar nekin

344. Ev meywe eger çi teze nîne
Lakîn Kurdî ye ewqas bes e

345. Ev zara gerçî nazek nîne
Teze ye li cem min pir şîrîn e

346. Ev fêkî gerçî lezzeta wî kême
Ev zara li ba min pir 'ezîz e

347. Kincê wi û gihara wî têne hezkirin
Ev mulkê min e ji tu kesî nehatiye 'ariye kirin

348. Elfaz û me'anî û 'ibaret
Înşa' û mebanî û îşarat

349. Mewzû' û meqasid û hikayet
Mermûz û menaqib û dirayet
350. Uslûb û sifât me'nê û lefz
Me ewana ji tu kesî qet'a deyn nekirine
351. Temamê ewan tiştê hatine behskirin ji netîca fikrê ne
Ew qîzê xama û bûkê teze û bakîre ne
352. Ya Rebb tu mede dest xelqê ne baş
Vî mehbûba ku dila bal xu kaş dîke û nazenîn e
353. 'Ûmîd ew e ji ehlê me'rîfetê
Ew qet'a li pey 'eyb û noqsaniyê min nekevin
354. Mîna kesê xîretkêş 'eybdar nekin
'Eyb û qisûrê min îslah bikin
355. Kesê xuyê kemalê ew in ku 'eyba vedişêrin
Ew merivê nêt xerab sirra zehf bela dîkin
356. Rica' ew e ji ehlê sirran
Ew bi min tinazan nekin
357. Ez çerçî me ne serraf im
Min terbiyeya xu bi xu kiriye kesî ez terbiye nekirime
358. Ez Kurd im çiyayî û kenarî me
Ew çend xeberê Kurdewarî ne
359. Bila îmza bikin bi rindaya lutfê

Bila guh bidinê bi însaff

360. Eshabê xerezê jî bila guh bidinê
Ji kerema xu rab ila ‘eybê min veşêrin

361. Ava rûyê şa’irê nerêjin
Eger îmkan hebe bila xeberê qenc bibêjin

362. Bila ji schw û xeletê ‘ecêb nemînin
Bila ta’wîl bikin ji bo te’subî

**Mibtedayê Meqal e Di Ne'ta Hakimê Bohtan ê Xwedan Îqbal Emîr Zeyneddîn Îbn
Emîr Ebdal Digel Wesfa Herdu Hemşîreyêd-i Wî di Sahibcemaî Zîn û Sitî Yêd
Bêmîsal**

363. Ew ê ku sehîfa hikayetê neqş kiriye
Qalib riwayetê teftîş kiriye

364. Ew ê bi vî şiklî riwayet kiriye
Riwayet bi vî terzî xemilandiye

365. Wiha gotiye: Di zemanê berê hebû padişahêk
Di hukmê memleketê xu, xu da jihatî xebitiye

366. Her millet mutî' bûne
Nesla wî ji 'ereba bûye emîrtiya wî ji bo Kurda bûye.

367. Textê wî Cizîra Bohtan e bextê wî qenc e
Tali' wî qewî ye meqamê wî mehmûd e

368. Rûm û 'Ereb û Ecem di bin emr û hukmê da ne
Ew meşhûr bi navê Emîrê Bohtan e

369. Bav mezin û kalik û walid
Mensûb û muselsel in bi Xalid (kurê Welîd)

370. Feleka mezin ji wî ditirse
Ji kalan hatiye kişandinê bi kişandina şûrê Xuda (Xalid kirin Welîd)

371. Ew emîra laîq e ji bo padşahitiyê ra û zînet e ji bo dîn ra
Navê wî Zeyneddîn bû

372. Emîrtî ji wî ra tê wesf kirin bi zînetê

Zînet ji wî ra tê naskirin bi diyanetê

373. Asra şeca'eta wî şahî
Ji asmana hetî 'erdê girtiye

374. Heqîqeta wî merkeza dunyayê ye
Hakimiyeta wî nîşan e ji bo roja qiyametê

375. Hatem tiyy muhtacê bal sexaweta wî bû
Ristemê Zal mexlûbê şeca'eta wî bû

376. Hatem ji kemalê himmeta wî
Deftera sexaweta xu pêçabû û hildabû

377. 'Eqî û huner û sexa û meydan
Zebt û neseq û nizam û dîwan

378. Dîndarî û dewlet û diyanet
Serdarî û quwwet û hukumdarî

379. Tijî bû ji her yekî xezîneyek
Veşartî bu ji her yekî defîneyek

380. (Temamê wan tiştê derbas bûyî) Ji bo wî ra bê muşeqqet muyesser
bû
Û bê zerer ji wîra muqedder bû

381. Temam tiştê nadir û cewhera
Temam tiştê biha û birqûnek

382. Temam tiştê mimkunê ku însan dixazin
Xudayê tealî ji wî ra çêkiriye

383. Temamê mudde'a û metlûba bi wî hasil dibin
Û bi wasita wî tê gihêştinê bal lezet û mehbûba

384. Ew hewşa ku mehram têdane
Cinnet tijî bû bi jinê bedew

385. Horiyê wî di cinnetê da zehf bûn
Xizmetkarê wî di huzura wî da melaîket bûn

386. Lakîn ji 'eîla wî xanedanî
Ji meyve ê bostan 'iffetê

387. Li cem wî du emîrê jin hebûn
Herdu du roj bûn li hinda wî hîvê (Emîr)

388. Ye'nî ji wî neseba bilind
Du xuşk hebûn îrtibata wan bi tu kesî ra tûne bû.

389. Yek ji wan dara serwî ji çîmenê heqîqî bû
Navê wê bi rastî Sitî bû

390. Ya dinê parçek ji qelb û cigera Emîr bû
Navê wê nivê navê Emîr bû

391. Rawiyê hikayetê ev ji min ra bi lexezî wiha got:
Ew horî dihate nav dan bi navê Zînê

392. Yek zêde şîrîn û mehbûb bû
Ya din rûhê qelba bû û horiya meqlûb ji hirûfê rûh bû

393. Yek esmer bû yek jî zerî bû

Yek horî bû yek jî perî bû.

394. Ew horî û perî bêbedel bûn

Lewra ewan ji nûra Xuda bûn

395. Tu kesî rindaya sûretê wan nedîtibû

Lewra rindaya wan ji cemala sermedî bû.

396. Lêv le'l e cînîk yasemîn e sûret gul e

Ewana şikandine rewneqa jinê rindê şehre Xulluxê

397. Herdu gulê wekî tayê sinbilê ye

Herdu sûret ji rengê rûyê sorgulî

398. Ew sorgul û gula azad

Li ser qameta dara serwî û sefsafî vebûne

399. Sorgul bi xu li ser (dara serwî û sefsafî) hêşîn bûne

Sunbul bi xu daliqîne bi hev ra

400. Rindaya xetê sûretê ji xetê yaqûtî ye

Çe'la çenê ji sihrê Harût e

401. Goya kiribû ji miskê rijandî

Neqaşê felekê (Xudayê tealî) hinek noqte rêzkirî

402. Xal û nuqît û sipîtayê û sorayê

Beyt û Hecer-ul Eswed û tewaf û 'Umre ne

403. Bijang ji kevana felekê ye

Biryê çavê bêguman ji tîrê semakî ne (yan jî: Mîna çengelê me'sî firoşan e)

404. Sermayeya wehşeta cunûya
Hatiye veşartinê di dehşeta çavan da
405. Şaş û me'tel dima di îşareta çava da
Keşafê rumûzê hikmetu'l- 'eyn
406. Ne'tik ji terefê tacê kifş dibin
Goya li ufqê baskê Cebraîl e
407. Daîmî di orta asman da sekiniye
Roj di xidmeta wî da ye
408. Her kesî ku rû û ustûyê wan bidîta
Derhal êqlê xu winda dikir
409. Ne zen dikir ku ustû di destê Saqî
Fîncaneke ku bi şeraba daîm hatiye tijîkirin
410. Yan jî mîna şûşa şekrê nebatê ye.
Yan jî menbe'ê ji bo kaniya heyatê
411. Sertilî û neynikê hinnekirî
Elem û eziyetê didine wan kesê bêxem
412. Ew kesî ku navê teng didîtin
Ji kuraya qelbê axînî dikin
413. Ewana zend û bazin zahir dikin
Êdî nediman tu gilî û gazin
414. Her çend ku ew herdu mîna rûh bûn

Ew herdu di husnê da hevalcîvî bûn

414. Her çend ku Sitî wiha letîf bû
Lê zîn mîna horî'în bû

416. Her çend ku Sitî istêrka bi rohnî bû
Zîn bi rûyê xu hîva çarde şevî bû

417. Her çend ku Sitî mîna hîvê bû
Zîn di sîfetê tava pir bi rohnî bû

418. Ew herdu mîna du çirayan bûn
Gava ew herdu dimeşîne bax û baxçe

419. Cemadat û heywanat didine nalandin û giriyaandinê,
Çêre û însan talan dikirin

420. Kofiyê hatine mezinkirin bi cewhera
Laçik hatine muzeyenkirin bi zincîrê zîv

421. Qeytanê didine ser ne'tîkê
'Aşiq derman ji destê 'êşqê

422. Ewan zînet û xeml û qîşt û henbel
Li pêş û pawê rast û çepê

423. Weqtê ku ewana digel wan digeriyan
Weliya di xelwetê da dîn û muheyber dikirin

424. Însan çi şêx û 'alim û emîr bin
Çi derwêş û zengîn û feqîr bin

425. Kes nîne ku nebe talibê cemalê

Kes nîne ku nebe wisalê

426. Hinek ji wan talib cemala Xudayê Tealî ne

Hinek talib qalibê betal in

427. Lakîn mehbûb bi yeqîn li cem temama yek e

Ferqa di navbeyna wan da heye her wekî ferqa di navbeyna mêjî û postê
(yan jî mîna ferqa di navbeyna kakil û qalik da ye.)

Tehsîna Qumaş û Kalayê Walayê Husna Hebîban e ‘Umûmên Te’rîfa
Cewherê Bêbuhayê Cemala Sitî û Zînan e Mexsûsen

428. Temamê padişahê dunyayê

Xudayê Tealî daye temama mal û mulk

429. Temamê xezîne ê Qeyser

Hettî bigîhêje Qebra Îskender

430. Durrî di xezîna Xaqan da

Le’lê di gustîla Silêman aliyê-s selam da

431. Gerçî zehf biqîmet in

Temamê wan beranberî cuz’êk husna Sitî û Zînê nakin

432. Rindiya sûretê Sitî û Zînê

Bûye behrek ji agirê ‘eşqê

433. Weqta ku digirte pêl û mewcan

Roja ku zahir û xefî dibû

434. Herdûyan sed rûh û qelb û ceger dişewtandin

Xelqê di heqê wan da bi mesel digotin:

435. Her wekî ew herdu roj û hîvan bi hevra beranberî kirine
Lewra tamamê dunyayê bûne muşterî

436. Nêçîrvan cemala wan xezalan
Ew ê ku dengê wan delalan bela dike

437. Gelek mêrê mîna şêran mîna telalan
Ji gazî û nalînan têr nebûne

438. Roj û şevan gelek dinalîn
Hettî melaîket jî digel wan dikalin

439. Husna ku bê hedd û xayet e
Nabe ji xu ‘aşiqan ra nihayet

440. Lakîn ‘aşiq û mecnûnê ku meşxûlê bi wekî tewî hev nînin
Hinek ji wan taliba mehbûbî dikin ji bo rûh

441.442. Hinek jî taliba rûh dikin ji bo mehbûbê
Hinek taliba gihiştina mehbûbê dikin wekî Tacdîn
Hinek jî elem û ezîyetê dixazin mîna Mem û Zînê
‘Etfê ‘Enan û Licamê Bi Serencamê Kelamê

443. Em bizivirin bal serê hikayeta derbaz bûyî
Ew xelqê ku ji derdê ‘eşqê bûne qelb birîn

444. Gerçî bê hed û bê qiyas bûn
‘Ewam û xulam û xewas bûn

445. Lakîn ji xulamê mumtaz

Sed xulamî bejin rast ser bilind hebûn

446. Her yek ji wan di meqamê husnê da wekî rojek e
Her yek ji wan bi xebirdanê sînga dişewtîne

447. Her yek di kemalê da bedir û hîv e
Her yek di cemalê da sedir ‘ezem e û padişah e

448. Temamê wan ji ‘aşiq û talib in
Temamê wan jî talib û raxib in

449. Lakîn ne bidîtin û şehadetê bû
Belkî bi bihîstin û zanebûnê bû

450. Temamê wan di xidmeta emîr da bûn
Temamê wan sirrê hev dizanîbûn

451. Reîs û lîderê wan kesê ku mîna periya
Sertaca wan kesê ku di exlaqê rind da mîna melaîketa

452. Gencek hebû ji wî ra Tacdîn digotin
Guhderzê zeman û pehliwan bû

453. Nesla wî, neseba wî, heseba wî kifş û zahir bû
Reîsê dîwanê û lîderê genca bû

454. Ji bavê wî ra digotin Îskender
Lakîn ‘Ereba ji wî ra digotin Xezenfer

455. Lewra ewa bişûr wekî şêr bû
Di roja herbê da mîna hezar merivî cesûr bû

456. Ji tacdîn ra du bira ê mêrxas hebûn
Her wekî du teyrê seqer ku bihevra dileyîstin

457. Herdu a daîm dilê dujmin dişewtandin
Ji yekî ra digotin ‘Arif û yê dinê ra Çeko

458. Amma Tacdîn digel hebûna xewasa êwama
Digel hebûna bira, bav û apa

459. Gencek ji xu ra kiribû bira
Lê ez xeletî me belkî ew ji xu ra kiribû çira

460. Roja ku ew î bira nedîta
Dibû mîna şeva bê çira

461. Temamê dunya ê li ber wî reş dibû
(Bira’ wî)Roj û ji wî wunda dibû

462. Ew hevalê ferehî û şerîkê xemmê bû
Ji xemxa heyran û bêhuş bû ku navê wî Mem bû

463. Mem jî ji wê ra tam ‘aşiq bû
Hezkirina wî (ji Tacdîn ra) ne mîna hezkirina bira û bab û apa bû

464. Her çend birayê axiretê bû
Te digo qey hem birayê dunyayê hem birayê axiretê bû

465. Tacdîn kurê wezîrê dîwanê ye
Mem jî kurê katibê dîwanê ye

466. Ew herdu ciwan ‘aşiqê hev bû
Ew herdu bira ji hev ra sadiq bûn

467. Yek Qeysê zemanê yek jî Leylî
Yek Wamiq weqtê yek jî 'Ezra

468. Ew herdu heval ji dil serserî nebûn
Bi durustî mîna roj û Muşteriyê bûn

469. Dostî û biratî hevaltî
Nabin bi riyayê û bigotinan

470. Dostî ne sahil e, cefa ye
Meqsed ji dostiyê wefa ye

471. Eger tu di axiriyê da nekî wefayê
Tu ewwel da nede nefsa xu cefayê

**Dastana Beyana Newroza Sultanî Tesemmayê Mewsîmê Surûr û Şadimanî Bi
Mersûmê Qedîmê Kurdistanî Ku Wan Digotê Sersal, 'Ed Dikirin Bi 'Îdê Wisal**

472. Xaliqê dunyayê ji feyza xaliqtî
Û bi wechê qudretê ew şiklê felekê

473. Bê qalib û bê muhît û bê miqyas
Bê alet û bê muşîr û bê miqs

474. Ev çendê hanê mezin û girover
Ev rengê musennea't û mukerrer

475. Anîne bal meydana hebûnê
Kêşane bal menzera şuhûdê

476. Hikmet ew e: Temamê van meşxûlê kar in
Hinek peya ne hinek sîwarî ne

477. Hinek derng diçin hinek jî zû diçin
Hinek alîkar in hinek jî mane' in

478. Hinek diçin hinek jî têne tedbîrkirin
Hinek hatî ne hinek jî têne teqdîrkirin

479. Hinek katib in hinek jî ustad
Hinek mîtrib in hinek jî cellad

480. Hinek 'abidê rojê ne hinek jî şevê rohnî dikin
Hinek def'a xemma dikin hinek jî celba xemma dikin

481. Hinek mîna Zînê ji zêr hatine çêkirin
Hinek jî mîna Memê muşterî ne

482. Temamê wan temîz û nûranî ne
Hinek padişah in hinek jî wezîr in

483. Hinek ji teherruka tebî'î
Têne bal nuqta xuya biharê

484. (Ewan ecramê semawî) Ji me ra teze dîkin salê
Di weqtê tîne bal nuqta î'tidalê- Ew jî di roja newrozê da ye.

485. Ew zanayê 'emir dirêjî kal ji me ra wiha gotiye:

486. 'Adetê zeman berê li her cihê wiha bû

487. weqta ku şehsuwarê şerqê (roj)
Di meha adarê da dizvirî (bal burca hemelî)

488. Ye'nî di weqta (roj) bigihîştî burca sersalê (Ew jî burca hemelî ye)
Tu kes nedîma di mal û meskena da

489. Temam derdîketin dervayê malan
Hettî ku digihîşte pîr û kalan

490. Roja ku dibû 'eyda newrozê
Te'zîm ji bo roja ku qelbê meriva mifereh dîke

491. Çol û çîmen dîkirin mesken
Dêşt û kelefê dîkirin baxçe

492. Xisûsa gencê nezewicî û qîzê bakîre
Bi kurtî ew cewherên kêr peyda dibin

493. Temam bi zînet û kinc
Ji bo hatina wan a bal geştê îzin hebû.

494. Lakîn ne bi tuhmetê û minnetê
Belkî bi terîqa şer' û sunnetê

495. Lewra xereza wan ji geştê
Qesda wan ji çûyîna bal deştê

496. Ew bû: Çi talib bin çi metlûb
Ye'nî herdu terefê muhib û mehbûb

497. Ew herdu teref hev bibînin
Hinkufê xu ji xu ra bînin (bizewicin)

Bi Derketina Şehrîyan e Bi Deştê Ji Bo Seyrana Sersal û Geştê

498. Dewra felekê ji bextê qenc
Dîsa newroz carekî dinê jî eşkere kiriye

499. Li gorî vî 'adetê mibarek
Bajarî û 'eskeran bi carek

500. Şehir û qel'e û xanî berdan
Teşbîhê bi rêber û cerdevan a

501. Sef sef diçûne bal çiya' û çolan
Cema'et cema'et diçûne bal seyran û geştan

502. Sinifê milletan ji piçûk û mezinan
Qet kesek nedima di şeher da

503. Hinek bi peyayî çûne baxan
Hinek jî bi sîwarî çûne mêrgan

504. Hinek bi tebayî û zehfî çûne
Hinek bi hevala û hinek bi tenê bûnê

505. Xanim û xatûn rabûne
Wana bostan bi gula tijî kirine

506. Huriya cînetê ji xu ra kirine mesken
Bê perde û bê 'eciz û minnet

507. Genc û qîz û ew ê sûret sor
Ew î xuyê gulê tewcek û xalê paqij

508. Ew ê ku salê wan yek in û ew ê ku memikê wan bilind bûne û qîzê bakîre

Xortê temîz û ew ê ku nêzîkê bilûxê ne.

509. Ew ê ku rûyê wan wekî qumaşê xas geş bûn

Ew ê ku dîtîne wan wekî tiştê xweş bûn

510. Her yek ji wan ji ew ê dinê ra eşyayekî nîşan dide

Wî texmîn dikirin bi dirêjayî û bi berayê

511. Ewana tucarê 'eşqê bûn di wî sûqê da

Hem firoşkarê husnê bûn hem muşteriyê

512. Ew ê ku sê salî (yan; yek salî) û qîzê bakîre û sûret sor

Ew ê ku sed salî û xortê genc û pîr û kalan

513. Ê di sersalê da ji bo wî 'adetê kifş

Pîroz kirin li gorî cih û meqamê pir qenc

**Murexxesbûna Wîşaqan Bi Gulgeşta Sersalê Rexbetkirina Wan e Bi Bazara Husn
û Cemalê**

514. Qendîla ronî (roj) di dêrê hêşîn (asman) da
Burca hemelê ya ku mîna pencereyane ronî kir

514. Sersalê ku teze bû me'mûr
Emîr îzneka teze da genca

516. Weqta ku îzna emîr bû ji bo keran
Temamê wan mîna 'aşîqa rabûn

517. Temam bihevra çûne bal meydana husna mehbûba
Ji bona taliba meqsed û miradê

518. Îlla Mem û Tacdîn tenê
Wana kincê jina xu kirin

519. Ye'nî weqtê ku zeman geriya (bihar bû)
Wan herdu bira kincê xu tebdîl kirin

520. Kincê Îstebreq û sundus li ser wan
Li ser serê wan çend laçik û perde

521. Porê serê xu berdabûn li ser tamamê bedena xu
Berjêr kiribûn tuncek xu wekî zulf û biska

522. Lewra wana kincê xu wisa kiribûn
Ji bo ku (weqtê tevbûna bi jina ra) zehmetî nebînin

523. Li ser wan kincê jina hebûn
Bi kibr û fêxr di rê da diçûn

**Mulaqîbûna Tacdîn û Memî ye Bî Sîfî û Zînê Mustexreqiya Wan e Di Behra ‘Eşq û
Evînê**

524. Ew herdu gencê ku kinc guhirandî
Di weqtê digeriyan di nav şêher da

525. Ji wan ra nişkêva tiştêkî ‘ecêb peyda bû
Ji ‘eqlê wan qet tiştêk nema

526. Wan herduwa dîtî di mehelle û soqaqa
Di her rê û xanî û pencera da

527. Bî sedan genc bêjna wan mîna dara serwî
Li ser wan kinc dîbac û hevirmûş

528. Pensed ji keç û kura sûret soran
Ew çend ji qismê pîr û kalan

529. Hem gelek ji mêr û jina
Hinek rût hinek jî kinc xukirî

530. Hinek ji meqam bilind û mezina
Hinek ji bindest û piçûka

531. Hinek pêxas hinek jî serqot
Piyê wan mîna kaşo ya serê wan jî mîna top a

532. Hinek sermes û hinek serxoş in
Hineka nefsa xu girtine û hineka jî nefsa xu berdane

533. Hinek xeber didin hinek bisikût in
Hinek diçin hinek disekinin

534. Hinek kincê wan qelişî ne hinek serxoş
Hinek ‘aqlê wan çûye û muşewweş in

535. Hinek fixan û feryad dikan
Hinek jî’ aqlê xalî û cunnî bûne

536. Her yek di meqamekî xirab da bû
Her yek bi cefayekî cigerxûn bû

537. Ew herdu muddetekî muheyzer man
Di behra tefekkurê da xeniqîn

538. Tacdîn sekinî û pirs kir
Pirsa xu ji şexsekî kal kir

539. Got: Ya Xizir riya hidayetê! Tu bêje:
Ew çi belayeka bê nihayet e

540. Wî (merivê kal) got: Du gencê şecî’
Îro bûne cellad li vî xelqî

541. Her çi kesê ku dibînin ev herdu serxoş
Derhal wiha muşewweş dikan

542. Herduwa sual kirin: Gelo te nedîtiye ewan çi şeklê da ne?
Ew î got: Du xortê pir bedew in

543. Herduwa got: Gelo ew herdu bi şûr û toqmaq in
Yan bi rim û xençer in

544. Ew î (kalê) got: Ew bi îşaret û bi awiran

Xelqê dikujin wekî bi kêra tûj

545. Wan herduyan dipirsîn ku eger bibînin
Ji bona xu bi mêranî dest hilînin

546. Ewan di wê fikrê da bûn ku nişkêva
Bi serf qudreta Xwedayê Tealî dîtin

547. Ew herdu kurik wekî du heykelan
Rewneqdar in mîna roja ku şahê histêrka ye

548. (Ewana) Bi yek heyat û şekl û bi kincî ne
Lakîn ew herdu di wî şehri da nayêne nas kirin

549. Exlaqê wan mîna exlaqê milaîketa ne û sûretê wan mîna sûretê cina
ne
Ew ne bayi'in ne jî muşterî ne

550. Weqtê ku herdu birayan (Mem û Tacdîn) ew herdu kinc
Dîtin qelb û rûh wiha bexşîş dan

551. Wiha dîn û ebter bûn
Îdî 'eql ji serê wan çû bi temamî

552. Bêfehîm û 'aql û bê îdrak û hûş
Ketine erdê mehîr û sersem

553. Temamê wan ji 'aql û rûhê xalî mane yan jê têr bûne
Derhal herdu jî dûr va ketine

554. Wan herdu melaîketê kubbar
Dîtin du melek zêdetir mehbûb in

555. Ewana parçekî hîvê ne lêkîn roj in
Mehbûb in welakîn ciger kibab in

556. Mîna nêçîra ku tamam nebûye serjêkirina wî
Bê şubhe gihiştine bal halekî zor û zehmet

557. Naçar wan lez kirin bal nêçîrvan
Fikirîn rûyê wan me'şûqa

558. Wan zanîn ku ew nêçîrana ne nêçîr in bê fayde ne
Ewana reîsê siwariyê 'eskerê 'aşiqan e

559. Ewana sekinîn û bi diqqet nezer kirin
Hate qelbê wan rehmet û şefqet

560. El-hasil ji rindiya van xezalan
Rehm kete qelbê wan gencan

561. Sirra dilê wan bi hev girtin.
Nûra sûretê wan bûne 'aşiqê hev

562. Di riya naskirina zahir û eşkere
Rûh qet ji hev neqetîn û cuda nebûn

563. Tek renekî sirf 'alema xeybî
Zahir dikir yekbûyîn bê şek û bê şubhe

564. Hezkirinê wiha ew ji hev ra gerandine esîr
Rindayê wiha bi hev ra gerandine talib

565. Tu digo ku çi qalib çi meqlûb

Herçar çi talib çi metlûb

566. Bê şubhe yek in çi cesed çi rûh

Ew yek in çi rûh û çi qelb

567. Hubba di qelban wiha eşkere kiriye şîrînayî

Buxza di qelban wiha bellî kiriye dujmintayî

568. (Hub û buxz) Bi nisbet bal me vahadisîn tune ne

Lakîn ji heqîqeta qedîm in

569. Çunkî ‘eskerê rûh kom bûne

Çêbûne di ‘ilmê Xuda da ezeli

570. Hinek elfeyt didine hev hinek jî muxalifê hev in

Hinek cuda ne hinek jî hev hez dikin

571. Wanê ku nava wan da elfeyt heye

Îdî di nava wan da muşeqqet û zehmet jî nemaye.

572. Ye'nî ku ewan kurê xwîn xwar

Weqta wiha dît in ew herdu birîndar

573. Ew herdu hezkirin bi sed qelbî

Rûniştin û ew herdu teftîş kirin

574. Gavek li qameta wan nezer kirin

Pêlekî muheyzer man di gulî û xalan da

575. Gotin ‘eceba evana qîzê kê ne?

Yan jî ew herdu melek in ji ji melaîketê Xuda ne

576. Ev meywe li ku cihê gihîştine
Ev gul di çi çîmenê hêşîn bûne

577. Dara serwî ji çi çemê ne
Teyr di çi çolê ne

578. Ava gulê ji hêstirên zehf xûn
Rijandine ser sûretê wanê di rengê gulê ye

579. ‘Eşqê ewan kirin husa ne hişyar
Xebera wan ji nefsa wan qet’a tunebû

580. Di axiriyê da (Sitî û Zînê) kirin bi qelema ‘eşqê
Rindiya xet û neqşê wan (Tacdîn û Memê) di lewhê qelbê xu da nivîsîn

581. Ewana hezdikirin bizanin ew çi esl in
Lewra ewana nizanîn çi ye neslê wan

582. Gustîlê wan gencan
Derxistin ji tiliyê wan

583. Gustîlê xu ji tiliyê xu kişandin
Gustîlê xu danîne dewsa wan ji bo ‘elametê (wekî nîşana ku wan nas bikin)

584. (Wan herdu ya) Yaqût bi moriya guhirandin
Elmas jî bi şîşeyê bilûrê

585. Sersal û xuşî ji dest der dan
Heyata xu guhirandin bi derdan û xeman

586. Nişkêva hinek ecnebî eşkere bûn

Rabûn bi mehrûmî û xatirê xu xwestin

587. Man herdu biran wekî du nêçîra
Piyê wan hatine girêdan bi zincîr û qeydan

588. Rabûn di şeveka reş û tarî
Roj û hîv çûn ava

589. Birastî wekî teyra nîv kuştî
Bê qewwet û bê taqet û bê dil

590. Sersem û sergêj û serêş û tayî
Melankolîk û 'aqlê xirabûyî û serxoş

591. Sed cara diketine şîmîkan
Hettî gihiştine hêlîman

592. Her çend gihiştine meqaman
Amma li wan kesê bêhêvî ne û ta'le mirada wan

593. Roj û şev û weqtê sibehê û êvar
Mîna hev xuya dikir yek car

**Hişyarîya Memî û Tacdîn e Ji Bêhoşî û Mexmûrîya Şeraba ‘Eşqê Agahî û
Xeberdariya Wan e Ji Sebeb û Wasitê Wemqê**

594. Ew herdu şahîn ku zaf hêsir barandî
Ew ê per şewitî ku Mem û Tacdîn in

595. Xweş çûne nêçîra kew û qaz a
Nişkêva hirşê li ser kir wekî teyrê bazî

596. Nişkêva kete li ser wan nûrek yan jî tozek
Îdî nema ji wan ra çeta' zerrek 'aqil

597. Digel wî qasî di hefte ya burca hemel bûn
Zêde wehşet û bê'aqilî ji wan ra çêbû.

598. Ew hefte ku li ser wan ra derbas bû
Herdu 'aşiqan nêzîkî hev bûn û elfeyt dane hev

599. Rojekî rabûn û li reng û rûyê hev nihêrîn

600. 'Eşqê ewana gerandin halekî wisa
Ewana hev nasnekir ji ewwel

601. Ewwel ji hev dûr diçûn
Paşê nêzîkê hev bûn

602. Ewana xu dîtin ku hatine qeydkirin bi bend û zincîrê hesin
Perwaz û firrîn îmkan nabe û zor e

603. Li ser wan perdeka tarî
Li pêşiyê sêlava muhbetê

604. Geriyan bêtu'me û bêşerab û bêçav
Bêmeqsed û bêmirad û bêgav

605. Serxoş in wekî çaf⁴¹ dildaran
Serxoş in û reş in û mest in û nexweş in

606. Mîna dev mehbûbetê bûne dilteng
Nalîn ji tamarê qelbî wekî aletê çenkê

607. Gotin: 'Aceba em bûne nexwaş
Yan jî em di kîjan herbê de bûne birîndar

608. Eger wisa nîne em çira nikarin
Birîndar in û ze'îf in û mexmûm in

609. Wiha wan dikir teftîş
Li heqîqeta halê xu digeriyan

610. Tacdîn nihêrî û dît ku di destê birayê
Cewherek rewneq dide wekî çirayê

611. Yaqûteke mîna heba hinarê
Mîna meş'elekî di şeva tarî

612. Rewneq dida mîna mûmê
Neqaş li ser nivîsîbû navê Zînê

613. (Tacdîn) Destê xu dirêj kir ku (wî gustîlê) bîne
Ji bo rind lêbinêre û bîne

614. Memê jî dît di destê Tacdîn da

⁴¹ Di vê malikê de "çaf" di şûna "çav"ê de hatiye bi kar anîn.

(Dît) Elmaseke bêbiha û bêtexmîn (yan jî: Elmaseke qîmeta wî pir zêde
ye texmîna)

614. Li ser wî navê Sitî nivîsiye
Sana'kî xudan miharet

616. Eger Buqrat bibe seraf
Texmîn bike bi wezn û qîrat

617. Û bazar bike ji bo Eflatûn
Û temamê xezîna Qarûn

618. Heşta yekî qîmeta wan qaşan
Nabe bihesebê fikra zanayan

619. Herdu mane di te'eccub û teheyyurê da
Noq bûne di fikrê da û gelek kirine tefekkur

620. Zanîn xuyê gustîla (Sitî û Zînê)
Çi tişt kirî Sitî û Zînê kiriye

621. Roja weku bûye 'eyda newrozê
Ewan jî kincê xwe tebdîl kirin

622. Çewa ku ewana (Mem û Tacdîn) xemilîne di hey'eta qîzan da
Ew jî (Sitî û Zînê) vegeryane di hey'eta kuran da

623. Ewana bûne çawa ku me go di roja newrozê
Mîna hîv û roja ku rewneq dane 'alemê

624. Ew herduwa kincê xu ji milê xu bilindkirin
Wan herduwan xelq dikuştin

625. Wan herduwan di şehre da bûne cellad
Wan herduwa xelqê ji destê wan feryad dikirin

626. Wan herduwan ewana bidil hezkirine
Ewana ciger li vana ('aşiqê xu) şewitandine

627. Wan herdu biran bi'aqil û texmîn
Bêşek naskirin qatilê xu

628. Li nik Tacdîn hebû qederek ji şu'ûrê
'Eşqê hiştibû di wî da qisûrek

629. Got rabe ey bira ji nivînê
Bes e ah bike ji destê birînê

630. Em şêr in ewan bixwe xezal in
Zehf 'eyb e em ji destê wan binalin

631. Mem bitemamî pehtiyê 'eşqê bû
Gotê: Bira tu hê xam î

632. Zenneke ez bicism im
Ji serî hettî piya hatime parçekirin

633. Cismê min bûye xet xet
Ew xet jî bûne noqte noqte

634. Ta'sîra 'eşqê û hezkirinê wiha ye
Bi dirêjahiya di dirêjayê û berayê û kurahiyê da

635. Yek noqte xalî nema ji derda

Hêj tu dibêjî çira dinalî

636. Qelb bûye mehelle 'eşqê û halê
Ew hal dixaze cihekî vala

637. Tu 'ecêb nîne ez bibim hulûlê
Ji sûretê min maye heyûlî

638. Şahî şahê 'eşqê bê xerez hat
Cewher tê veşartinê dema 'erez hat

639. Ew hal û mehel û cism û cewher
'Eşqê ji xu ra mesxerkirin

640. Rûh û ciger û dil û hinavan
Dest û ser û pê û pişt û çavan

641. Wellahî nema ji yekî ra rahetî
Billehî nema ji yekî ra taqet

642. Wana 'elaqe ji min birîne
Temam dibêjin ku em 'aşiq in

643. Tu napirsî li halê min ey zalim
Hêja tu dibêjî nenale.

644. Wexta (Memê halê xu) wiha şikayet kir
Nema ji bo Tacdîn qet xeberdan

645. Ew herdu mane digel van birînan
Behsa me (bila bibe) ji Sitî û Zînê

Mu'awedeta Sitî û Zînê Ji Sersal û Geştê Îstitle'a Dayeyê Li Macera Serguzeştê

646. Ew herdu jî zivirîn bi wan kincan
Derhal jixu xistin da ku kes wana nas neke

647. Her çiqas kinc gihurandin jî
Lê neql nedibûn ji halî

648. 'Eşqê ewana wisa tebdîl kiribûn
Îdî nediçûne bal halê ewwel

649. Kesî nedigo ewana Sitî û Zîn in
Xelqê wisa zendikir ewana ecnebînin

650. Zemanekî hebû dayikeke wana
Ew mîna balaya asmanî bû.

651. Feleka pîr li cem wî ze'îf bû
Navê wê ji pîrbûnê Heyzebûn bû

652. Ew nişkêva hate cem wan
Dît kincê wan bi ber wan e

653. Runiştine bê xwarin û bê vexwarin
Winda kirine çene di goştê binê çenê da (ye'nî serê xu berjêr kirine di
fîkr û heznê da ne)

654. Ye'nî herdu teheyyur û melalê dane
Herdu parçekî hîvê ne di haletê şiddetê da

655. Çeqê taze çilmisîne
Soraniya sûretê wan zer bûye

656. Sûretê sor bûye mîna kafûranî
Sorgul bûne ze'feranî

657. Pêrî zanî ku hurî bêlîbas in
Mehbûbê mehebbeta kesa ne

658. (Pêrî) Got: Ey hewesa dil û hinavan
Her yek ji we rohaniya du çavan

659. Hafizê we tek Xuda ye
Canê min ji we ra feda ye

660. Hûn mudeteke hatine qeydkirin di qeydê da
Hûn îro bitenê li ku çûne nêçîrê

661. We çima 'eyda sersalê zû terk kiriye
Rast bêjin ku hal (û mes'ele) çî ye.

662. Bêjin ku mes'ele çî reng e
Ew heyret e yan xeyala ji bengê ye

663. Çira hûn mehzûn in ey keçê ciwan?
Nîne tu netîceka bêsebeb

664. Hûn bibêjin ji min ra çawa bûye ev mes'ele?
Gengê tiştêkî veşartî ji min ra eşkere nabe?

665. Ez ê niha remlekî bavêjim
Nava û zemîra bibêjim (ez ê nava û tiştê di dilan da veşartî bibêjim)

666. Yan ez ê şûşe û mendila danim

Heqîqeta halê dê bizanim

667. Wan gotine pêrî bi dizî:
Em weqtê sebehê ji xanî çûne derva

668. Her çi li me bû dûçar û peyda
Derhal giriyane cinûn û ‘aşiqan

669. Axir zulm ji heddê derbaz bûye
‘Aqîbetê zulmê zahir bû li ser me û zivirî li bal me

670. Em jê bûne melûl û mexbûn
Em hatine bi sivikiya ‘aqlê û cinûnê

671. Pîrê hêdîka û bi sikûnetê
Çû bal wan û tesellî da

672. Got: Hûn bi cemalê padişah in
Her yek ji we şah û hakim in

673. Kêyî mutî’ û muhtacê we nîne?
Kêyî nede we bêxwestin bacê

674. Her çi ku we jê hezkiriye ya ewladê periya
Rindahiya we (wana) dike mutî’ we

675. Xasma zemanê mehbûbê we di wî şehre da be
Ez ê wî niha bikim muşterî

676. Bêjin ewa kî ye da ku ez herim bibînim
Û hazir bikim ji we ra bînim

677. Wan gotin ji pîra sihirbaz ra:
Derd li me ey doxtorê mahir...

678. Bêşubhe derman ji destê te tê
Eger ji destê me wesfkirina derd û êşan bê

679. Teqrîr û wesfkirin ne mimkun e
Tedbîr û dermankirin betal e

680. Temamê qîz û kurê Bohtan
Belkî tamamê xelqê Bohtan

681. Kîjan wan meşhûr bi rindahiyê be
Îlla hatiye nivîsandinê di deftera me da

682. Ye'nî me tamamî rûbirû dîtine
Temam kesî vî şehre ji însanan e

683. Îro du keç xeniqî di rindahiyê da
Ji ser hettî pê di nava hevirmiş da

684. Rind in di şiklê şahê şerqê da (roj)
Rewneq didin ji rengê hîva rewneqdar

685. Nişkêva li meduçar bûn zahir
Ew herdu nadir ji dûrva ketin

686. Em çûne bal wan da ku em bibînin ewan kî ne
Me dît ewana ne wekî însana ne

687. Muheqqeq ewana yan melek yan jî perî bûne
Lewra ji av û heriyê berê bûne

688. Gava me ewana dîtin
Em geriyan mehrum ji 'aqlê

689. Ewana mîna du camê Cemşîd in
Em herdu wekî hîv û rojê ne

690. Gava ku wiha bûne muqabilê hev
Çira û şûşe geriyane mua'dilê hev

691. Şûşe ji stêrkê rewneq hilda
Me nûrek biqelbê girt

692. Eger qendîl û fitîl ji wan be
Agir ji rûyê me herduwan bû

693. Donê me û agirê me dîsa
Em şewitandin û rewneq da dilê me bi wî

694. Em şewitîn xu bi xu me nizanî çî hal e
Hişyarî ye yan xûn e yan xeyal e.

**Tekrar Îstixbara Dayeyê Ji Kunhê Macerayê Tesrihê Teqrîra Wan e Ji Keyfiyeta
Te's'ira Hewayê**

695. Pîrê şaş ma ji tiştê bûyî

Got: Ya rûh û cesedê dayê

696. Hûn çûne ji bo dîtina gencan

Hûn valane ji 'eşqa xezalan (qîzan)

697. Şiklê we dîtî bê heqîqet e bê netîce ye

Meyla we bal qismê jina ne mimkun e

698. Meyla beşerê beşera dixaze

Emma hûn ku qîz in kura dixazin

699. Keç qet li keçan dibin muşterî

Bê pereyê kura ticaret îmkan nabe

700. Kur neynik in ji bo cemala zat

Keç ciyê zahirbûnê ye ji bo nûra sifata

701. Bê zat sifet mîna 'erzê ye (bê fayde ye)

Cewher nebe 'erez betal e

702. 'Erez bi cewherê qaîm dibe

(Ka) Hîv bê rojê rewneq dide?

703. Ew meyla ku ji sûretê kuran dûr be

Sed carî ku hurî û perî be

704. Ev meyl yê çawa we bike 'aşiq?

Ew ew Leylî yê çawa we bike mecnûn?

705. Mecnûnê ku li ba Leylîyê nebe
Ka Leylîyê çawa meyla xu bide bal Leylaka dinê?

706. Qe gul dibin ‘aşiqê gula?
Ka ‘Ezra xu bi xu dibe Wamiq?

707. Eger Xusrew nebûya siwarê Şebdîz
Çawa Şîrîn yê bibûya ji Perwîz ra şekir? (Weya: Şîrîn çawa yê xûş û
şekir bibûya mîna jina wiya şekir?)

708. Ferhad eger hêsirê xu ya wekî xûnê
Nerijanda ewî nedidît siwarê Gulgûn (ye’nî Şîrîn)

709. Ji wê miqdara ‘alema mêra
Ji beg û reîs û genca

710. Eger qelbê we meyl nede bal tu kesî
Wisane hûn qîz in ji rezîlan e. (Perwîz Cîhanî: Dilên we nekete kesî,
dilên we çawa çû kete wan keçên bênav û nîşan û kesê nenas? M.
Bozarslan: Ku kesek meyla dil we ber bi xwe nekşîne, nexwe hûn gêj in,
rezîl in û rûmet ketî ne)⁴²

711. Bênav û nîşan û bêzanîn
Qelbê we li wan bûye ‘aşiq

712. Bi min ev karekî zef muhal e
Ew ê we dîtiye yan xûn e yan xeyal e

713. Zînê weqta ew xeber bihîstin
Ew nexme ji perdeyê derxist

⁴² Mela Mûsayê Celalî wextê ev şerha Mem û Zînê kiriye hinek caran di nav kevanekê de cih daye
şîroveya Perwîz Cîhanî û M. Emin Bozarslan.

714. Gote ji dayeya pîr ra:
Nemaye li cem te ne 'aqil û ne tedbîr

714. (Ya pîrê) Te digo bi di'a û nivîsta
Hal veşartî bibe ez dizanim

716. Şiklê ku me dîtiye ne bê'esl e
Baltehqîq ew e ne xewn e ne xeyal e

717. Ewan eger melek bin yan beşer bin
Yan qismê jina bin yan kur bin

718. Gustîlê wan ev in
Me ewana anîne ji bo nîşan û 'elametê

719. Eger birastî tu remlê dizanî
Gustîl ev e de bizanbe xuyê wî

720. Ew pîra hîlekar û cazû
Got: Zû bîne ji bo min wan gustîlan

721. Seba ku îşev remlekî bavêjim
Hettî sibê xuyiyan bibêjim

722. Sitîyî derhal derxist ew gustîl
Da destê pîra zemanê

723. Zînê wiha gote Heyzebûnê:
Dilê min gerîneka ji xûnê

724. Gava ew gerînek tê heyecanê

Weqta ku ew dike qîrînî

725. Ew gustîl rehet dike qelbê jar
Car caran ez çavên tijî xûn mizdidim

726. Zîhar eger tu gustîlê dibî
Zû bîne bal min a dil şikestî

727. Lewra bi wî ye sebr û raheta min
Ew ji bo min mîna xatema hesretî Silêman 'elîyê-s selam e

Tefehhus û Tefeula Dayeyê Ji Remmalî Ji Kesşfa Heqîqata Wî Ehwalî

728. Ew pîra sihirbaz û bêfesaî û hîlekar
Di weqtê sibehê da xu gihande bal kar (ku reml davêje)

729. Zêrek yan jî du zêr digel xu ji bo pîr
Halê xu wiha beyankir

730. Go: Du kurê bêguneh hene
Bê nav û yêtim û jar û mehrûm

731. Roja ku bûye 'eyda sersalê
Ew jî bi qa'îdeyê tebî'eta zaroka

732. Herdu rabûne û çûne bal geştê
Cina ewna şaş kirine (revandine) di deştê da

733. Îro dema ku peyda bûne
Dîn in, teles in, serxoş in, 'aşiq in

734. Tazî û bêkinc hatine
Car caran fixan û gazî dikin

735. Bêhiş dikevin û gelek dimînin
Gava ku radibin dîn in

736. Ew gustîlê ku di destê wan da ne
Tu dibêjî qey bi van (gustîlan) serxoş in

737. Ya merivê zanayê îşareta û kaşifê sirra
Ez bêçare me û tu çareyan dibînî

738. Îhsan bike û qenc jê xeberde
Kanê derdê zarokê min çî ye.

739. Cinûnî ye yan ser'e ye yan hewa û 'eşq e
Çi nexwaşiye çî jêra derman e

740. Ey murşîd û pêşewayê tiştê musteqbel
Helkiryê muşkilata

741. Sirrek di van gustîlan da heye
(Ev sir) Eşkere ye li cem we 'aqilmenda

742. Bêje xuyê gustîlan kî ne?
(Gelo) Ji cinan e yan ji perîyan e yan ji însanan e?

**Dewlet û Teqrîra Remmalî ye Ji Bo Pîrê Muwafiqê Ma-fi'z-Zemîr û Muxalifê
Teqrîrê**

743. Ew warisê 'ilmê Danyal aleyî-s selam
Wexta nezer kir di şiklê falê

744. Derhal di rehma diya da
Beriya bûyîn û danîna nebatan (zarokan)

745. Lehyan û neqî (du stêrk) hev ra dîtin
Tacdîn û Sitî bi yekva dîtin

746. Şeklê ferehê digel xemê dî
Wiya bêperde Zîn digel Memê dî

747. (Remal) Wiha gote Pîrê Qasid
Ku meqseda wî mikir û vir û hîle ye:

748. Qe hasil dibe ji bo te
Bê riya rast ne mimkun e menzil

749. Te digo kurê min dîn in
Te nedigote min Sitî û Zîn in

750. Roja ku bûye geşt û seyran
Wan dîtine dê rêy da du şexsê çav rindik (yan: Dîtine di rêy da du çav
xezal)

751. Ye'nî du kurê ku qameta wan dara serwî ye
Rabûye li wan kura qiyamet

752. Derhal evnê ku du roj in

Dil çûye bal du hîv an

753. Ew (kurana) ji 'eşqa van (qîza) bê' aqil bûne
Ew (qîzana) ji rindaya wan (kura) bûn şaş û meheyyur

754. Ev (qîzana) muhtela bûne bi belaya 'eşqê
Ew (kurana) tî bûne li Kerbelaya 'eşqê

755. Ev gustîlê van kuran e
Herdu gustîlê van (qîza) jî di destê wan (kura) da ne

756. Çawa qîza kincê kura xu kirine
Kura jî kincê qîza xu kirine

757. Pîrê ji şêxê remal ra got:
Ji bo min şubhe nema di keşfa ehwala da

758. Lêkin tu bêje ew çi esl in
Qenc îzah bike ew çi nesl in

759. Gelo ewana ewladê mezinanin xuyê meqamê bilind in
Yan ji eşrafanin yan jî 'ewam in

760. Şêxê got: Di dînê 'eşqê da
Bey'ek heye ku jêra dibêjin terazî

761. Ew a caîz e bê şertê hinkeftiyê

762. Xasma ew kurê ku wan xanima ew qebûl kirine
Yek hebek durre û yê dinê lûlû e

763. Yek begzade ye ji nesla mîra ne

Ey dinê jî bi nesebê kurê katiban e

764. Ew pîra sihirbaz ji bo nîşanê
Dîsa xebereka dinê kire bihane

765. Go ‘aşiq û xuyê bela û dînan
Meflûn ji bo Sitî û Zînê

766. Ew nabine qabilê hesaban
Nakevîne defter û kitaban

767. Ya şêxê min tu dizanî ev Cizîr e
Temamê wan mezin û guregur û mîr in

768. Qencyê bike perdeyê hilde
Ew herdu melek bibêje kî ne?

769. Soz didim eger ez tenê wana bibînim
Ez ê biçim ji bo te çil zêrê bînim

770. Şêx go tu here bîne ciwanan
Teffîş bike cih û zuqaqan

771. Çi kesê ku dibêjin ew nexwaş e
Ew nexwaşî ji bo te ra delîl e

772. Xu nîşan bide bi sûretê doxtora
Bêperde tu yê bibînî wan hebîban

773. Gava ku te dîtin ewanê mîna melaîketa
Yê eşkere bibe muşterî ji bo qumaş

774. Xasma di destê wan da gustîl in
Hatine neqşkirin bi navê Sitî û Zînê

775. Rabû ew pîra mîna Loqman Hekîm
Li serî hettî pîyan tijî derman e

776. Şûşe û huqqe û neşter û kîs
Hilda hilda ew î xebîsî

777. Danî paxila xu qederek kitab
Xu eşkere kir bi şeklê hekîmekî ‘ecêb

778. Derhal xu gihande li cem xidmetkara
Fi’l-hal bûye hevalê yaran û ‘aşîqa

779. Wana gotin tu ji ku va tê yî tu çi pîr î?
Texmîneka mezin ev e tu zanayê ‘alemekî

780. 781. (Pîrê) go: Ger çi bi zahir ez hekîm im
Lekîn ez zanayê du nexwaşîya me. Yek ‘illeta bedenê ya dinê ‘illeta rûha

782. Wana go me ra bibêje
Ew derdê ku li rûha hebe ew çi derd e?

783. Wê (pîrê) got: Dibe ku hûn wî nebînin
Wê derdê ra heye nîşanê veşartî

784. Ew derdekî zehf bédewa ye
Ji wî derdê ra şîfa ne mimkun e

785. Ji we dûr be gelî xortê bedew
Ew birq e di sûretê jinê rind

786. Gava birq vede wekî birûska ye
Bêşu'le û bêqozî û bêçirûsk e

787. Ew derda bê kêr û birîne
Navê wî derdî her evîn e

788. Ew e hinavan dişewtîne
Xûna dilê tê ji herdu çavan

789. Wan gotine tu bi xêr hatî
Niha jî me du heval nexweş in

790. (Ya pîrê) Qencyê bike herduwan derman bike
Dermanke bi terzekî tu rake

791. Her çiyê ku tu dibêjî em ê wisa bikin
Her çiyê tu dixazî em ê bînin cih

792. Pîrê xu gihande bal nexweşan
Weqta nihêrî li wan 'ezîzan...

793. Wî (pîrê) gote bi heval û delîlan:
Min tenê bihêlin digel nexweşan

794. Da wekî ez vî derdî teşxîs bikim
Paşê ez dermanê wî peyda bikim

795. Temamê hevalan ji ba wan çûne derva
Pîrê tenê ma hinda herdu xortan.

**Giheştina Dayeyê Ji Hemsihbetiya Wişaqan, Bi Hemxelwetiya Muştaqan,
Waqiffiya Wê Li Serweqtê ‘Uşşaqan**

796. Nexweşî bi derdê ‘eşqê bedhalan
Nişkêva nihêrîn ku heval çûne

797. Pîrek li pêşiya wan rûniştine
Qamet civiyaye mîna hîva teze

798. Xeberdide bi gotineka hêdî
Digirî û hêstiran dirijîne

799. (Wana) Gotin tu çi kesî ey ew a ku dila şa dike?
Çira tu wiha digirî bi mehrumî û bêhêvî?

800. Wê (pîrê) go bi ser Sitî û Zînê
Tek ji bo we digirîm

801. Xisûsa ez ji cem Sitî û Zînê
Hatime ji bo birînê we derman bikim

802. Evana gustîlê we ne
Min anîne ji bo ‘elametê (li ser rastiya de’wa min)

803. Hûn (herdu gustîla) hildin û wan gustîlan bidin (ew ê ku li cem we
ne)
Kotî nekin (xerab nekin) navê Sitî û Zînê

804. Ez qasid im hûn ji bo min meqsûd in
Gelo mirada hûn min ra nekin

805. Weqta ku ev mizgînî bihîstin

Yek car ji ferehê ‘aqil nema

806. Weqta ku hişyar bûn qederekî nesekinîn
Derhal revîne bal (paçkirina) pê û destan

807. Dîsa li dest û pê û pêş û kinca
Wan herdu kuran sed paç didan

808. Pîra dayîn muheyyer ma ji îştîyaqê
Berda giriyê ji îftiraqê

809. Got: Xem mexwun ey mirad û meqsûd
Mizgîn ji we ra bi heqqê Xudayê Tealî

810. Tewfîqa ji Xudayê bibe hevalê me
Ez ê we temama bi wasîteya sihrê

811. Hûn gişk li ‘erdekî top bibin
Hûn her çar bi meqseda xu şa bibin

812. Hûn nav û neseba xu bêjin
Sirra dilê ji bo min beyan kin

813. Da weku ez bizivirim bi van gustîla
Tesxîr bikim Sitî û Zînê

814. ‘Ecele bikim ji bo kesba xêrê
Zû bêmê digel cewabê

814. Tacdîn gustîl ji destê xu derxist
Da destê pîra zemanî

816. Tefekur kir Memê ku bê gustîl
Çawa bikaribe bike îdare û heyatê

817. Got ya dayê tu min xuyê 'ezer bidêre
Kîjan meriv rûhê xu bi destê xu dide

818. Ev gustîl çi nav bi çi tilsim be
Ew rûh mina qelbê min cism e

819. Ya dayê tu qasidê hebîbî
Bê şubhe tu doxtorê derdê min î

820. Bi sedeqa serê Zînê ku xuyê cemalê ye
Nestîne ji destê min gustîlê

821. Weqta ku diçî ey wefadar
Wiha mehbûbê ra bibêje ji teref min

822. Ew şah e eger çi ez xûlam im
Rehma padşahê padşaha 'am e (ji bo her kesî ra ye)

823. Ez 'ebd im laîqê ne wisalê me
Qan'em bi sûretê xeyalê me

824. Razî me bi ew qeder cemalê
Min bîne di xelweta xeyalê

825. Bira bitirse ji ah û elema dil
Car caran bipirse li halê min

Vegeriyana Dayeyê We Ba Dildaran Agehkirina Wan e Ji Ismê Resmê birîndaran

826. Ew herdu çeqê dara ‘er’erê
Rûniştîbûn mîna bişkoya dilteng (mîna gula darê)

827. Civiyayî bûne hev bi fikrê ser berjêr
Her lehze ji dayeyê bihêvî

828. Zehf serxoş bibûn bi şeraba êvarê
Bi xayet muştâq bibûn li şeraba sibehê

829. Dîtin derhal doxtor
Ew hat bi sûretekî ‘ecêb e

830. Zîn û Sitîya ku ji ‘eşqê şaş û sersem bûne
Wana Dayê zû hemêz kirin

831. Gotin bi Xudêkî ey ew a ku qelba şa dike
Gelo te li ku dîtine ew herdu hevalê melaîketan

832. Remla te çi gotiye? Tu dizanî ew perî kê ne?
Yan te ew herdu di şûşeya remlê da anîne?

833. Ew tîra ku qelbê me qulkiriye
Gelo tu dizanî kî avêtiye.

834. Wî (pîrê) go: Ez bi serê we yê mibarek
Sed cara sond dixwûm ne ku carek tenê

835. Ez hatime vî weqtê ji bal wan
Lêbelê dilê min dişewite bi xortan

836. Her weqta ku behsa Sitî û Zînê dîkin
Sed renk hêstirê wekî xûnê dirêjin

837. Ez qurbana we bim bi vî kemal î
Ew herdu kurikê bi wî cemal î

838. Çawa we bijartiye ew herdu mumtaz
Ew laîqê wisalê ne û şerîf in

839. Wellahî ez sond dixwûm bi Barî Tealî
Ev herdu durrê ku we bijartine

840. Yê mîna wan tune li ser 'erdê û di behra da û di me'dena da
Melekê di asmana jî ne mîna wan in

841. Ew herduwana laîq bi we nin
Ewana çi ewladê emîr bin çi jî feqîr û parsek bin

842. Ew pîrê wisa bi dil va bûye wasiteya navbera 'aşıqa
Ew herdu mehbûb jî mudetekî li pêşiya wî lal mane

843. Nema di dilê Zînê û Sitî da 'aqil weqta
Van bihîstin ev xeber

844. Xulase ji heqîqeta macerayê
Weqta ku dayeyê hişyarî dida

845. Te digo agir gihande niftê
Alaf jê diçû asmanê hefta

846. 'Eşq agir e, cesed Çiyayê Tûr e
Dil ew dara ku hem agir e hem nûr e

847. Qefes pencereye û çira kozê ye
Rûh rûn e (zeyt e) û fitîla wî cefa ye

848. Dil şûşe ye û ew çira di nav da ye
Sirra cuz'e û di kullî da belav bûye

849. Bi kullî ji serî hettî piya
Ewan mehbûban bi wî agirê şewitîne

850. (Wan mehbûbeya) Gotin (ji pîrê ra): Tu ji bo me ra xuyê rehm û
şefqet î
Ey daye tu ji bo me ra çareyan dibînî

851. Tu 'eslê darêyî em çiqil in
Tu zimanî em lal in

852. Eger lehzeyekî xeber nedî
Û sa'etekî nebî şîrîkê xemê

853. Em ê wekî pîj û kayê belabin hem
Wekî belgê dara berbayê bin

854. Ey zanaya hewadîsê berê yî
Ji xêra te em kesekî eqreba nahesibînîn

855. Tacdîn û digel Memê ku te behs kirî
Perperokin me perê wan şewitandine

856. Ewana jî niha li hêviyê ne
Belkî ji me zêdetir neçar in

857. Rabe here zû bibêje Tacdîn ra
Eger tu Sitî dixazî Mem jî Zînê

858. Mizgîn ji we ra be me hûn qebûl kirin
Em jî ji we zêdetir melûl in, mehzûn in

859. ‘Eşqa we gem ji me revandiye
Mani’ me perdeya heyaya ye

860. Ew perde ji we ra tune
Bê perdeyî ji we qedîm e

861. Xwazgîn û wasite û wesîle
Her çi ku ji ba we da were ewana rind in

862. Wiha renga bibêje wan hebîban
Temamê reîs û ‘alim û xetîban

863. Hinek ji we ra şefa’etê bikin
Hinek ji me ra du’a bikin

864. Belkî Xuda Tealî qeder kiribe
Gihîştina me bi hev ra muyesser bibe

Şifabexşiya Tebîb e Bi Derdê ‘Ellîlan Şewqet û Merhemeta Mîr e Li Halê Zefîlan

865. Weqtekî xweş e ji bo nexweşê muştîq
Xasma ji bo taîfa ‘aşîqan

866. Dermaneke ji bo sihhet û şifayê
Mizgînî ji bo wefayê

867. Nişkêva bigihêje wan ji derva (weya ji wan derran)
Azad bike wan a ji derdan

868. Dayeya ku ji rengê Aristo ye
Ji serî hettî pê bi kincê fesadiyê...

869. Dîsa (pîrê) kete sûretê doxtoran
Derhal xu gihande bal hebîban

870. Ew mizgîniya ku me gotê gotin
Ew şewitî weku ku neşewitîbin şewitandin

871. Ewan bi wî agirê wisa kêfxweş bûn
Te qey digo ewana nexweş nebûn pakbûn

872. Her wekî wana ji destê Eflatûn
Bi yeqînî derman û me’cûn xwarin e

873. (Herdu hebîb) Rabûn û çûne bal hevalan
Hinek eqreba û xortan

874. Wan ra gotin temam tiştê bûyî
Rabûn bi te’essub û bi tebayê

875. Gava wan bihîstin ew mizgînî
Temamê xelqê û xwazgînan pê hesandin

876. Hinek ‘alem û ‘adil
Hinek emîr û hinek cahil

877. Rabûn û tamam çûne bal emîr
Mes’ele wiha jê ra beyan kirin

878. (Jê ra gotin): Ew waliye mal û mulk û millet
Ey hafizê ‘adil û dîn û dewletê

879. Tu siya lutfa Xudayî
Îro li me tu şah û tu reîs

880. Tu şahî nezera te kîmya ye
Tu hîv î esera te pîrr rewneq e

881. Her kesê ku te gazî kiriye ew ‘ezîz e
Her kesî ku te gazî nekiriye ew ne temîz e

882. Her kesê ku te kiriye çira û geş kiriye
Ger çi halê wî xirab e jî te xweş kir

883. Tacdîn ger çi ji nesla emîran e
Bi nisbet li bal te bende ye, geda ye

884. Em hatin ku bikin ji dil du’ayê
Em gişk ji te dikin ricayê

885. Tacdîn ji te Sitîyê dixaze
Ew ‘ebed talibê xitmetê ye

886. Ew bende ye wî azad bike
Ew munasib e ku bibe zavayê te

887. Mîr got: Çi tiştê weku we laîq dîtiye ew tiştê li ba me tê qebûlkirinê

888. Her kesê ku wekîl e bila bê rûnê
Mela û sahib kî ye bila xutbeya nikahê bixûne

889. (Mîr go) Me 'eqda nikaha Sitfyê li Tacdîn kir
Cewab ev e, me qebûl e amîn (Perwîz Cîhanî: Xuda pîroz bike)

890. Derhal Çeko 'ecele çû û piyê Mîr
Paç kir û teqrîra nikahê qebûl kir

891. Temamê mela û şêx û mîran
Axa û ekabir û feqîran

892. Wan sena û medh kirine devê xu
Temaman bi dilê xu du'a kirin

893. Mîr got: Li def û rebaban xin
Bînin temamê şerbet û şeraba

894. Da em meclisa şadimane danîn
Îro he lewra sibehê em nizanin

895. (Gelo) Mîna vî wextê em ê xweş bin
Yan em ê bimirin yan jî nexweş bin

896. Şev avisin ey ehbab
Kanê çî diwelidînin li pey hev

897. Ev şîn û şahî cêwî ne
Ev çerx û felek bêeman in

898. Carna nûrê dirêje û carna tarîbûnê
Carna da'wetê nîşan dide carna şîn û matemê

899. Gava ku tu dibînî weqtê enisîyetê
Eman derbaz neke zemanê firsetê

900. Lewra zeman mîna şûr e
Nabêje eva mela ye yan mîr e

901. Îro da ji bo razîkirina Tacdîn
Min jî ji xu hesab bikin bi xwazgînî

902. Ev çîqa zemane ew xulam e
Daîmî di xulamîyê da temam e

903. 'Emrê wî riya xizmeta me da çûye

904. Şert e di şerî'eta wefayê da
Em jî ji bo wî ra bixwin cefayê

905. Îro (em ê) rabin di xitmeta wî
(Em ê) Balzat di xitmeta wî da bibin

906. Mîrekî wiha hebe ku rûhê.
Çakî feda neke bi şadimanî

907. Eger min hebe hezar û yek serî
Wan temama di rojekî da bi defter

908. Eger ez feda nekim bi carekî
Mîrtî ji min ra nebe mubarek

909. Tacdîn ku di xidmeta Emîr da bû
Fereha emîr di destê wî da bû hem ewî li xûrek dinêrî

910. Hasil kelam Emîr bi selteneta xu
Rabû bi xu li xûrek dinêrî

911. Di meclisa xu da sifreyek kişand
Te digo asman kiriye fers

912. Hîv û roj di asman da
Te digo anîn di şûna nan da

913. Ev lengerê zîv û zêr
Mîna feleka jor û jêrê ye

914. Her firaqeka mezin mîna burcekiye
Perdeyê li ser wan mîna sendoqê cewhera ye

914. Her tebsî û kaseyê fexfûrî
Wekî istêrkeka pir rewneq e

916. Burca Cedy û Hemelî ya asmana
Biryar û kibabê mîhmanî... (karek û berxekî li ser sifreya mîr xweş û
zehf in her wekî burcê Cedy û Hemelî li ser sifreya asmanî hatine
raxistinê)

917. Her kase û tebsîk mîna ‘enbarekî ye
Tijî ye wekî nefsa emare

918. Çêşîd te'amê zûn û şîrîn
Çêşîdê xwarin û fêkiyê hişk, keriyê rengîn

919. Ewan fîraq û qedehê Çînî
Dewran dikirin bi nazenînî

920. Wesfa wan bi geşt û seyranê mîna istêrkê seyyare ne
Çi kesê ku ew didîtin şaş û me'tel diman

921. Narenc û turunc û hinar û leymûn
Ewana fêkiyê tezeyê darê cinnetê ne

922. Fanîd û nebat û qend û şekir
Ava gulê û esans û misk û 'enber

923. Hinek ji wan xeza didine mef'deyê
Hinek ji wn jî mêjî tijî dikin

924. Cihê bihûrê bîna 'ûd û 'enberê bela dikin
Bîna xweş gihişte tamamê qûlikê cana

925. Mitribê xweşnewa û xweşdeng
Laiq e ji bo qumaşê xweş û rengê xweş

926. Dengê hinekan munasibê dengê saza ye
Hinek dişibihin hinekan bi fexr û nazî

927. Mexnî û kemaçe û 'ûd û tenbûr
Çeng û def û sûrena û sentûr

928. Meqamatê 'Uşşaq û Newa û 'Îraqî û Ewc

Bûne munasibê digel meqamê rast

929. Awaze û şu'be û meqamat

Û bê perdene bi mu'cizat û keramat

930. Weqta eşkere bi ji nayê meqamê gerdan

'Aqil û dîn û îmanê dibin

931. Saqî (garson) lez dîkin bi ava tiriye

Mitrib ricifin bi dengê sentûrê

932. Qewwal û kilambêj û dengbêj

Şerabxwer û sefiye û mest û serxoş

933. Xulase digel nexwestina heft asmana

Wana danîn bi vî şeklê xîmê da'wetê

934. Qelem ji destê xettatê felekê ('etarid) ket

Cellad' dîkir ku serî qet bike (yan jî: Şûr ji destê celladê felekê (merîxê) ket).

935. Zuhreyê sêrkir li ser 'erdê

Hîvê xu veşart di burca sertanê da

936. Zuhâl wînda bû di burca Delwê da

Muşterî bê nîşan bu di burca Hûtî da

937. Temamê dunyayê bûye xûyê heyat û însiyetê

Feleka pîr ji kerb û hesretê

938. Ji destê wî tiştê nedihat û maye 'aciz

Û bê çare pîrê bûye Kadiz

939. Ew feleka pîra bi rengê asmanî
Diçe ji bo guhdana meqamê rehawî

940. Temamê 'alemê bi 'işretê av bûye
Ji xelqê şehîr û xelqê koçer û 'ebid û hûr

941. Xeriqîne di nî'met û reqsê da
Topbûne di şahî û listikê da

942. Weqta sifre rabû ji ber xewasa
Saqî geriyan bi şûşe û qedehan

943. Mîr gazî Mem û Tacdîn kir li bal xu va
Go mesref li min Memo tu birazavayî

944. Mîr ewana bi kincan xelat kirin
Rabûn bi edeb pêşa kincê Mîr paç kirin

945. Rûniştin û temamê wan şerab vexwarin
Ew roj bi hev ra derbaskirin

‘Erûsiya Sitîyê Ji Bo Tacdînî Tehîyyeya Esbabê Şahiyê Ji Bo Tehnîyeya Xemgînî

946. Weqta ku ew roja mîna bûka bakîre
Neh felekê ku mîna cama Cemşîd in

947. Hemî ronî kirin bi rûyê xu
Te digo bi zêr hatine kilkirin

948. Jinê ku pora şe dikin û daye û ewanê xidmetê dikin
Ewanê ku ‘eşqê rewaca çarsiya wan zêde kiriye

949. Çûn ji bo ku bixemlînin Zînê û Sitîyê
Wan herdu delalan delal bikin

950. Di ewwel da nihêrîn li çûncik û xalan
Dîtin ku ewana dilan talan dikin

951. Gava nihêrîn ew bijangê mîna kevana
Rengê rûyê wan reşbû wekî buyaxa reş

952. Gava nihêrîn li rûyê wan ê taze
Îdî dewsa buyaxel sor wana şerm kirin

953. Îdî nikaribûn bi kilê reş
Çavê wan xezalê xotenî (Zîn û Sitî) xirab bikin

954. Ji serî hettî pê ji rengê şe
Sed xebat kirin ji bo bihane

955. Lekîn ji herdu xezalan yek ‘eyb
Nedîtin bi qasî serê mûyekî

956. Îlla serê mûyekî ji navtengî
Ew jî bi misal ne cesed bû ne rûh bû

957. Ji tirsê şikestinê qet'a
Qet kemerek lê nehate girêdanê

958. Dilê kesekî nedihat ku tu kemberan li newqan bibîn
Belkî ji nazikîyê bişkê navtenga wan

959. Gelo dest dide ku dest û tiliyê wan
Hene bikin bi darê zorê

960. Ew neqşa ku Xuda çêkiriye
Kî dikare wî neqşê xerab bike

961. Nihayet ew jin mane bê hêvî
Her wekî halê merivê zelîl ê ku piya paç dike

962. Zîmeta qameta wan hebîban
Dayê 'erdê rengê zêr û zîvan

963. Wana tac ser wan mubarek kirin
Wana biriqandin bi tacan cewherê wan

964. Serlewheyê ku terefê tac e
Bi cewhera hate xemilandin

965. Zîmeta ji rewneqa cemalê
Bû wekî daîrek li bêdera hîvê

966. Elmas û zumrud û lû'lû
Xal û xet û tunceka tarî

967. Mîna kitaba şa'irane
Hatine danîn beyt bi beyt

968. Ev rewneqa 'arizî û zatî
Bûn nusxe ji bo sihr û mu'cizata

969. Beyt bi topbûnê bûne dîwan
Ayet bi sen'etê bûne Qur'an

970. Ew sen'eta ustadê mutleq e
Her kesê ku didît digotin: Xuda heq e

971. Gava tamam bû xemilandina bûka
Merasim kete çarsû û soqaqan

972. Çêşîd tiştê xemilandinê û kinc
Çêşîd cewher û tiştê biha

973. Sed cariye û du sed xulam çûn
Bi kincê zêrekî û avzêrkirî çûn

974. Deve bi qafila, dur bi qentara
Yaqût bi bara, zêr bi çuwala

975. Durre ji jimartina hesaba
Derketiye ji qeydkirina bi deftera

976. Ev cihêz nedihate te'eqqulkirinê
Wan deveya taqet nedikirin vî cihêzî hildin

977. Ev deng û izdiham xelqê gerandine 'aşîq

Bû zelzele û rakirin xelqê

978. Şehrê ji mêr û jina

Temam muzeyyen bûn bi zînet û li wan hate kirin kinc

979. Mîna behra pir mewc

Hereket dikirin bi meqseda seyr û geştê

980. Nişkêva bi comerdîyê vebû

Derê keremê li ser gemiya Nûh aleyhî-s selam

981. Ya'nî hudica ku Sitî tê da bû

Qesra ku têda sekinî bû horiya rastî

982. Her textek ji darê sendelî ye

Textek hatiye çêkirin ji dara abenûsî (yan jî: Textek ku perwazê wî abenûs bû)

983. Textek hatiye xemilandin bi cewhera

Belqîs (Sitî) li ser wî textê rûniştiye

984. Xidmetkara li pêşiya wî dest girêdane

Kemerê wan der e, giharê wan cewher e

985. Sed Asefê Berxiya wekî bayê

Hildidin textê wî bi 'eşq û dil

986. Ewana text (Sifîyê) dane ser serê xu

Dest bi dest direvandin ji hev bi sed zehmetî

987. Ew textê rewan wekî gemiyê bû

Behra ku gemî li ser ketibû ademî bû

988. Behra ku bi 'eşqê were heyecanê
Mecbûre ku ji dil bike qêrînê

989. Xelqê wî mekanê tev 'aşiq in
Wekî perperoka li dora mûmê (Sîfî) digerin

990. Sofî û mela û feqîr û paşa
Temamê wan li seyr û temaşayî

991. Ew xelqê ku ji destê xeman feryad dikin
Ferdek qe nema nebûyî kêfxweş

992. Her berderekî qerebalixek lê heye
Her ciyekî dilşadî û temaşayî heye

993. Te zen dikir ku bûk (Sîfî) 'eynî rûh e
Lewra beden (ya' nî xelq) li peyî wî rewan e (diçûn)

994. Aleta lehwê mirî sax kirin wekî sûra Îsrafil aliye-s selam
Kûs û def kerrenay û naqûr

995. Şewaş û seda û dengê bilind
Guhdar zengîn kirin ji aleta lehwê

996. Weqta ku bihevra deng ji wan derket
Seda li ser qesra felekê ket

997. Ev heyat e û kêf û şadimanî
Tu zemanê çav mîna wana nabînin

998. Ew gemiya felekê ku melek (Sîfî) di nav da ye

Mewca revand di weqt û gavê da

999. Ev dengana û gazî û 'adet
Di lehzekî çûn gihîştin Tacdîn

1000. Tacdîn bixwe bûye padişahêk
Mem jî li teniştê wî mîna hîvek

1001. Rûniştine di meqamê emîrtiya bilind da
Cem'ek ji mezina li dora wî bûn

1002. Rabûn ji bo temaşeyê û sekinîn
Di destê her yekî da tebeqek hebû

1003. Mîna tebeqa asmanî
Yaqût û zumrud di me'den da

1004. Hirşandin tebeq di wî de'wetê da
Ji jorda li ser hewdica Sîfîyê

1005. Tebeqê wan tijî bû
Bi zêr û zîv û cewher û dur

1006. Yexmakirê xezîna bûne serbest di xwestina xu da
Feqîr hemî bûne mîr û padişah

1007. Ew mal sed carî zêde ye li hêviya harisan
Dûrê civandina pîsa

1008. Çêtir e ji karameta kerîman
Zêdeye ji xarkirina piştê ji bo le'îman

1009. Feqîr û geda bûne zengîn
Jînerest û tabî' şehwanê mufelles bûne

1010. Feqîr û geda, xenî û zengîn
Şadan û hezîn, şad û xemgîn

1011. Îdî ji hev nedihatine ferqkirinê
Te zen dîkir temamê wan îzzet ji wan ra hatiye dayînê

1012. Temamê wan munasib û muwafiqê hev in
Hemû dost û mihûbê hev in

1013. Hasil ji meqseda ku meriva serxoş dîke
Temamê xanî û qesran mest bûne (yan jî temamê mekana geriyan e
serxoş ji hatina wê mehbûbetê (Sitî)).

1014. Hinek serxoş in hinek jî medhûş û 'aşîq in
Dengbêj in, mutrib in li çengê dixin

1014. Her 'aşîq û serxoşê Botan
Hatine reqs û lîstik û de'wetê

1016. (Reqskirine bi reqsê) Bêrîte û sema û saz û govend
(Hazîrbûn e) Ewanê şîrîn û lêvşekir û şekirken

1017. Bakîre û rewal û xort
Horî û melek û perî û wildan

1018. Xûyê kirasê ku mîna gulê sor e û 'ebayê ku mîna gula yasemînê
zer e
Devê wan şîrîn e û xeberdana wan xweş e

1019. Kemerê wan zêr e û kofiyê wan xar e
Sûretê wan mîna hîva çardeh şevî ye û porê wan reş e mîna komirê

1020. Bedena wan mîna zîvê ye û porê cînîkê wan mîna gula yasemînê
ye
Çenê wan mîna sêvê ye û memikê wan mîna hinarê ye

1021. Evana navtengê wan mîna mûyê ye û guliyê wan mîna ma'ra ye
Evana 'emrê wan çardeh sal e, bijangê wan reş û mîna kevanê ye

1022. Gencê bêrû û ewanê nêzîkê bilûxê û 'ezeb
Lawê ku sûretê wan wekî zumerred e

1023. 1024. Hinekê wan xweş deng in hinekê wan jî xweş reng in
Hinekê wan 'ecele dikin hinekê wan jî topal in.
Ji bo xelafa vî pîra piştixar

1025. Qîzê sivik, xortê teze
Mîna istêrkê qutbê û mîna istêrka Sureyyayê

1026. Hinek dîreqîsin di helqeyê da hinek digerin
Hinek di silsileyê da nin hinek jî seyyar in

1027. Ewanê ku sifetê wan wekî istêrkane û rewneqê didin helqa reqsê
Heft şev bi tamamî û heft roj

1028. De'weta Sitî û cem'a Tacdîn
Gerandin bivî terzî zînet û tezyîn

Meqalê Îştixalê Şem'ê Cemalê Mehbûb e Meqamê Întiqalê Îştixalê Wîsalê Metlûb e

1029. Pêşa bûka 'alema pak

Zava ku kir bi mûhbet yan jî bi rewneqa rojê reng gulî

1030. Tarîfî bi ronahiyê rakir

Xema mîna şeverişê fenakir

1031. Weqtê seherê ji roja hefta

Te zen dikir ku agir ghişte niftê

1032. Germa agir nêzikê meqsûdê

Ji bedena 'aşîqa dû rakir

1033. Cem'iyeta xasa agir û ba

Bê şek meriva berbad dike

1034. Ev 'eşq û hewê weqta ku bûne bihevra heval

Wî rûh û qelbê xu bi xelat bidin

1035. Ev iftiraqa ku sebrê şewitandiye

Agir berdaye wisalet û şewatê

1036. Behra mehebbetê xilbet kiriye

Qerar û sebr û tehemul nehîştiye

1037. Mehbûb û muhib ji zêdebûna îştîyaqê

Hatin bi şewqê ku bibîn qederê

1038. Ew jinê ku pora şe dikin û xidmeta dikin û dayîn

Birazava û eqrebayê Tacdîn

1039. Dîtin ku nêzîk bûye weqtê zefafê
Li gorê 'erf û 'edetê

1040. Temamiya bixûr û tiştê ku bibin didin
Mexlûta tiştê ku kêfxweş û serxoş dikin

1041. Cam û qedeh û firaqê şerabê
Ev misk û zabad û 'ûd û bixûr

1042. Ê ava gulê û 'itrê şahî
El hasil ji hîvê hetta masiyê ye'nî ji asmana hetta 'erdê

1043. Esbabê ferehê û kêfê û heyatê
Alatê sefa û zewq û suhbetê

1044. Ew çend ewana hazir kirin
Mirî pê sax dibûn mutleqa

1045. Hazir bû mala bûkê
Dîwar û derî û banê xanî

1046. Rabûne xas û xitmetkar
Hindik ji eqreba û meharima

1047. Mûmek ku temamê wî hatiye kilkirinê bi zêr
Rojek bi cemala xu rewneq dide

1048. Reqasan ew danîne ser serê xu
Anîne orta meclisa xas

1049. Mûm bi zimanê halê bê meqalê
Wiha beyan kir ehwal.

1050. (Go) Ey ‘aşıqê bê qerar û bê taqet
Eger tu mîna min bê sebrî (tu mîna min î xûyê agir û nûrê yî).

1051. Rabe here mala bûkê
Piyê xu qêd ke bi paçkirina piya

1052. Mûma te wekî te di intizarê da ye
Şewqa te agir e ji bo rûh û cismê wî

1053. Şewata te ya mîna mûma bes e
Bes e rijandina te hêsira wekî rijandina min

1054. Eger tu ‘aşıqî rabe mîna perperokê
Rûhê xu bide şewaş û hediye

1055. Ey merivê ku sa’iyê dike bal tewafê
Ey merivê ku ketiye riya metafê

1056. Ew a qible û Ke’be ya te ya meqsûd e
Nêzikî te bûye bi emrê Xudayê me’bûd

1057. Beyt û Hecer-el Eswed û meqamê Îbrahîm ‘elêyh-îs selam û hurca
‘Îsma’îl ‘elêyh-îs selam
Se’y a Sefa û Merweyê û teleba Hecer-ul Eswedê û tewafa Ke’beyê û
‘umrê

1058. Xudayê Tealî ji te ra muqedder kirine
Ewana ji te ra muyesser bûne

1059. Tu av î here pêşiya dara selwî
Tu şêr î heman kerem ke li xelwetê

1060. Tacdîn ji sûretê mûmê

Me'nî mehebbeta rindî...

1061. (Tacdîn) Zanî bi ta'amul û îdrak

Rabû ji cihê xu kêf û 'ecele

1062. Memê jarî ku dostê xem û ferehê ye

Pey ra bûye heval û silehdar

1063. Destê wî di destê wî da û dilê wî di dilê wî da bû

Bû dergevanê derî û şûr di destê wî da bû

1064. Tacdîn bi vî şeklî çû seyayê

Mem ma li ber derî digel di'ayê

1065. Lewra bi tirs bû ew rast hatina wan bi hev ra

Lazim e ji 'aşiqan ra dujminayî

1066. Ewana çi muhib bin çi jî hebîb

Bê şek ji wan dujmin çêdibin

1067. Hinek dêw û hinek ji wan perî ne

Hinek jî însanê munafiq in

Wusûlê Ke'beyê Murad û Tewaf e û Husûlê Meqsedê Meram û Zîfafa

1068. Zava bi edeb ji derî da çû
Mûma ku li pişt perdeyê da

1069. Rabû û çû li pêşiya (Tacdîn) bi fexr
Kaşkir pêşa xu li ser erdê bi nazî û delalî

1070. Guliya xu berjêr kir hettî piya
Bi destê xu porê serê xu tertîb û tezyîn kir

1071. Ruyê ku bi nûra Beyt-ul Eqsayê
Qendîla felekê bi wî rewneq dide

1072. Serxoş bi şeraba derdê firaqê
Muştaqê şeraba giheştina mehbûbetê

1073. Ji ewwel ve li 'adetê helaliyê
Destê xwe dirêj kire bal qedehê (yan jî bal sitûyê mehbûbetê)

1074. Fexwar ji qedeha lêv şekir
Herduya vexwarin ji şerabê lêv bi lêv

1075. Serxoşê ku defî kiriye şeraba safî
Bêhn kir gul û sunbulê ku têr av in

1076. Carna nergîz û lale carna gula sor
Reyhan û binefşe carna sunbul

1077. Carna ji hev diqetiyên û carna jî nêzikî hev dibûn
Carna hev paç dikirin, carna hev gez dikirin

1078. Ev çeqa bi hev radimûsan
Dûr nedidane hev li ser ramûsan

1079. Sûretê wekî elmas, diranî wekî cewher
Sûret bi le'lê û diran bi mercanê tebdîl bûne

1080. Behra hezkirinê wiha heyecan kir
Dest li ser ustû, lêv bi lêv ketin hemêza hev

1081. Serxoş bûn bi wî şerabê
Wisa bêhûş ketin ji ser rabûnê

1082. Nedikaribûn rûnên
Ji bo secdeyê ketine 'erdê

1083. Gava dîsa ji secdeyê rabûn
Mudetekî bi hev ra şa bûn

1084. Şekir ji lêvê hev revandin
Gula sor ji rûyê hev civandin

1085. Ji xu ra gulqend çêkirin
Ew herdu 'aşiq zewicîn û dilê wan bi hev ra girêdayî

1086. Sê roj û sê şevan li pey hev
Ewanê lêv tî şerab vexwarin

1087. Ewanê ku vedixwarin şeraba xalis
Axir ku bi vexwarinê qe jê têr nedibûn

1088. Zewqa lezzeta şerabê
Ew herdu kişandin bal nihayeta heyecanê

1089. Xûyê ya çena beraq û bedena şefaf
Meyl û mehbet kir bal zifafê

1090. Ewanê serxoş hevdu hemêz kirin
Bûne wekî şûşe û darek kilî

1091. Carna ghişte hev carna jî hev cuda bûn
Carna hejiyan carna jî ba dibûn

1092. Carna ew didu dibûn, carna yek dibûn
Carna cot û digel hev dibûn. Carna tek dibûn

1093. Tîra ji diranê filê ber hedef bû
Xaye ji sedefa safî bû

1094. Hedefa ku bû ciyê tîra bidil kirin dur bi mercana

1095. Tîr zivîrî û sertîr ma di wî da
(Tacdîn) Zuriyeta xu ji can û dil da wî (Sitî)

1096. Daîm bû çî bi roj çî bi şev
Berê wan (yan jî meyweyê wan) ji mehebbetê bi hev ra bû

1097. Daîma du merivê serxoş û bi înad
Vala dikirin di hev da cihê tîra (ava xu)

1098. Çî roj û çî şeva tarî
Ew herdu melek xweş bûn bi hev ra

1099. Te digo ewana du kîmyager in
Meşxûl bûne bi girêdana cewhera

1100. Ew rûh û cesed gihiştine bal hev
Herdu nefis ketine di nav hev

1101. Ketiye di tasê da ava misînê
Çûye av ji jêra jinikê bal rehma wî da bi wasita aletê

1102. Tev li hev bûne mîna şîr û şekir
Gihiştine hev mîna ava Heyatê û Kewserê

1103. Qet'a ji wan ra nebûye xwarin û xew
Nedihate bîra wan nan û av

1104. Temamê heft roja bûye gerdek
Ferdek agah nebû bi halê wan

1105. Sihhetî xelbet li derdê kir
Xem çû hate veşartinê ji kerba gihiştina bal mehbûbetê

1106. Nişkêva di weqtê sehera roja heyştê da
Ridwan (Tacdîn) meşiya ji nav cennetê (xelwetê)

1107. Hê jî Mem wisa li ber derî bû
Daîmî ew î serê xu danîbû ser kevîrê

1108. Hêja meskenê Memê şîmika derî bû
Temamê roj û şeva nobedar bû

1109. Weqta ku Tacdîn ji gerdekê derket
Te digo qey rojek li ser Memê derketiye

1110. Memê derhal wisa şad bû

(Ku) Taca ser wî digihişte ber perê asmana

1111. Eger dostekî te hebe bila vî celebî be
Eger wiha nebe bila qet tunebe

1112. Dostê te yê ku bi te ra muwafiq be
Bila sed eqreba' te yê xaîn û munafiq

1113. Qurban bike nebêje heyf in
Tu çî dikî bi wan kesê ku bê wefa ne

1114. Qurban bide qet nebêje ewan kê ne
Bêkêr e bira eger kîna wî hebe

1114. Dostê te ji te ra bira ye
Hem çav e ji bo te hem çira ye

Hîleperdazî û Fîtneengîziya Bekir e Ji Hesed û Reziya Li Tacdîn Ku Bû Sebebê

Mîr Neda Neda Memê Zîn

1116. Weqta Xuda ji tunebûnê îcad kir
Ev kewn û mekan ji teze va bi çêkirina rind

1117. Temam tiştê ku hene di 'alemê da
Hettî xulasa mexluqa ku new' însana ye

1118. Eşya bi hesebê sîfat û ef'al
Çêkirine bi ehwal cure cure

1119. Îcad kir ev mewcûdat hinek bi hineka tînê naskirinê
Hinek bi zidê xu tînê beyan kirinê

1120. Ev 'erd û asman û tiştê hêdî û tiştê dizivire
Ev melek û melaîket û kesê mala xu da sekinîne û ew ê ku seyahet dike

1121. Ev nûr û tarî û kufr û îman
Ev cennet û cehennem û bihûşt û agir

1122. Ev tiştê sar û germ û ter û hişk
Ev mîr û xulam û zengîn û feqîr

1123. Ev xûlî û hewa û agir û av
Ev şev û roj û sî û tav

1124. Ev terk û wisal û şahî û xem
Ev mirin û heyat û de'wet û şîn

1125. Hinek wekî nûr in hinek jî wekî agir in
Hindik helîm in hindik jî serhişk in

1126. Ewana rast in, durust in, xêrxwaz in
Evana virek û xwar rûreş in

1127. Evana ehlê cehennem û ‘ezabê ne
Evana jî musteheqê cinnet û sewabê ne

1128. Çima tu nabînî ku tamam tiştê zidê hev in
Hikmet çî ye û çima tamamê wan dujminê hev in

1129. Lewra eger muxalefet nebûya
Ferqkirina wan û naskirina wan îmkan nedibû

1130. Xulase bi xwestina çêkirinê
Mîr bi sebebê kemala ‘izzet û bilindaya xu

1131. Girt ji bo xu dergevanek
Ew dergevan fesadê zemanê bû û ji nesla kuçikan bû

1132. Daîmî li derê emîr dergevan bû
Fitnekar û fesadkar û qehwekar bû

1133. Ema neseba wî ne ehlê Bohtanê bû
Belkî çêbûye ji vir û iftirayê

1134. Dibêjin ‘eslê wî ji Mêrgeverê bû
Xalis beşerekî bi fitne û fesadkar bû

1135. Navê wî munafiqê Bekir bû
Belkî pîstir bû ji Belûqiyayê

1136. Menna’xêrê dike munafiq e Şeytan e

Hîlekar e xebera digerîne fesad e

1137. Di nerindiyê da Şeytan şagirdê wî ye
Ehlê Bohtan şerm dikin ku behsa wî bikin

1138. Bedsûret e ji rengê dêwê 'ifrît
Bedfi'l e fitneyê radike hîlekar e

1139. Tacdîn ji eşkere ji Mîr ra digot:
Ey Mîrê min berde vî dergevanê

1140. Eva laîqê dergahê te nîne
Ev a kelb e û ya hindirê xu veşartiyê û dirr e û bi kîn e

1141. Her çi qas se û dergevan birayê hev in
Feqet zaf sa xûyê xu hezdikirin, hem bi wefa ne

1142. Wiha Mîr gote li Tacdîn
Çima em nizanin fi'la Bekir?

1143. Em qismê emîra qismê aşa ne
Pirfetl û gerrîn û paş û pêş me hene

1144. Lazim e ji me ra aşvanek
Lazim e ji me ra dergevanek

1145. Her çi em îdara hikumetê dikin
Carna em 'edaletê dikin di karê xu da û carna jî em zulmê dikin

1146. Bekir ger çi weledê zînayê ye
Bi fetl û bayê wî aşê me dizivire

1147. Ev cema'eta ku zalim in mufesed in
Qûmandan û muhafiz û dergevan in

1148. Ewana aşê me zalima digerînin
Dexlê di me zalima dihêrin

1149. Aşê me eger çi weqfa 'am e
Lakîn gewriya wî tijî garisê heram e

1140. Wî garisê merivek diçîne
Ew meriv ji bo me hiltîne (Bekir)

1141. Ev 'adeta xasê mîran nîne
Çima tu nabînî li ber derê feqîra jî heye.

1142. Ewana tamam jî nobedar in ji sa nin
Hemû jî qismê dergevan in

1143. Padişahê 'erşê yê ku ne muhtacê tu kesî ye (Xuda)
Tu nabînî ji bo wî karsazî jî

1144. Biqasî ku wî padişah rakirine
Deh qatê wî jî şeytan çêkirine

1145. Xulase Mîr ji seyê xu derbaz nebû
'Îllet dihanî bi mecbûriyetê

1146. Hine mîr henin seyê xu yê tazî
Nadin muqabilê hespê 'ereb yê kehîl

1147. Ew kîndar û xebîs û fe'lbaz
Ye'nî ew Bekirê bi dil fitnekar

1148. Tîrsa wî hebû bi dizîka ji Tacdîn
Daîmî dilê wî da hebû kîn

1149. Weqta ku bi dewlet û se'adet
Ev de'weta çêbû bi resm û 'adet

1160. Veşartî ji însana wekî şeytan
Meqseda wî sirf vir û îftira ye

1161. Tenha Mîr ra wiha got bi dizî:
Mîrim te Sitî zehf telef kir

1162. Ew cewhera tacê ye û taca cewhera ye
Ew taca cemalê ye û cemala taca ye

1163. Ew wisa laîqê textê paşatî ye û her wiha
Hekîm e bi 'eql û cemal û edeba xu

1164. Kîsrî bi hesret e ji bo dîtina wî
Fexfûr eziyetê dibîne ji bo hezkirina wî

1165. Eger Qeyser ji bo kurê xu bixwesta
Xaqan jî li pêşiya wî destê xu girêda

1166. Hê jî laîq nîne bi erzanî
Wiha tu (Sitîyê) bidî wan bi rehetî

1167. Mîr got: Ey bextê reş, qe didim
Tacdîn û Memê bi textê Qeyser?

1168. Roja ku bûye cenk û herb

Tacdîn û Memê dused Qizilbaş

1169. Digel zirx û zend û mertal

Anîne ji me ra bi şûr û şeşper

1170. Xaqan kê ye, ez çi bikim bi Fexfûr?

Ez nadim ewana bi çaryeka dunyayê

1171. (Bekir) Mel'ûnê ku dît nebû tu ta'sîr

Ew mes'ele wergerande vir û hîleyan

1172. (Bekir) Got: Heqîqeta mezinan qenc e

Gava sedaqeta xulaman jî dengê wî be

1173. Roja ku vedixwin şeraba belayê

Gava ku dixwin kebaba tîr selwa yê

1174. Çawanin di şahî û sefayê da

Bila wisa bin di tengî û cefayê

1175. Bila tu guherîn peyda nebe li wan

Bila tu vegerîn peyda nebe li wan

1176. Qet'a ewan (xulamana) bila nekin qusûr di xidmetê da

Bila ew (Emîr) jî sist nebin di himmetê da

1177. Ev zewq û cefa gerek bibin muqabilê hev

Ew sidq û wefa jî bibin mîna hev

1178. Lekîn himmeta kerîman bê fayde ye

Di heqê merivê ne laîq û xerab da

1179. Merivê bê'esl ne laîqê mal û xezîna ne
Ciwan û teze pêketî nemunasibê mezinahî û 'ezemetê ne

1180. Dêrdê gencê teze şerab e
Kirinê serxoşan xerab e

1181. Dixwaze pir 'eql û pir tehemmul
Hettî ku şerab xortan negerîne

1182. Ya Mîrê min çima te nedî kurê Îskender
Weqta ku te daye wî ehtimam ji heddê xu derketiye

1183. Roja ku te Sitî daye Tacdîn
Ew î ji ji terefê xu da Zîn daye Memê

1184. Mîr got: Çi 'ecêb e ew î ji min pirs nekîr
Yan jî qe nemaye tirsê wî ji min

1185. (Bekir) Got: Çima tu nizanî ew kî ye?
Ew ji nesla emîra ne, genc e, pehlewan e

1186. Meydan xalî dîtiye dizgîn revandiye
Ew çî tişt wisa bike jê ra dirust e

1187. Tirsê min ew e bisebebê kibr û kînê
Ji heddê xu derbaz be piştî (zewaca Memê bi) Zînê

1188. Tacdîn yê de'wê neseba bal Xalid yek e
Qesda hesebê jî bike bi ser da

1189. Mîr go: Me hezdikir bi zewacê
Zînê bi Memê serbilind bikin

1190. Ez sond dixwûm bi rûhê bavo
Hetta bigehije kalko Xalid

1191. Li kesekî ji mîrê benî Adema qet'aa
Ez qet nadim Zînê bi jinanî.

1192. Her çi kesî ji serê xu bêzar bûye
Ev Zîn e bila jê ra bibe muşterî

1193. Merivê ku ji ser û rûhê xu têr e
Bê tirs bila bixwaze eger mêr be

1194. Hakim di zahir û batinî da
Bêşubhe mîna agirê ne

1195. Di zahir da bedew in, bi nûr in
Di batinê da ji îdarekirinê dûr in

1196. Ewana gava ku rehmê dîkin dibin mîna rojê
Gava ku qehrê dîkin dinyayê dişewitînin

1197. Qet bi wan neke bawerî
Gerçî bav û kur û bira bin

1198. Xisusa gava ku eqrebayê pîs
Nêzîk bibin ne'ûz bi'llah

**Naummîdiya Zînê Ji Dewleta Wuslet û Hezretê Derdmendiya Wê ye Ji Kurbeta
Firqet û Hesretê**

1199. Tacdîn û Sitf bi hev bûne şad
Gihêştina wan bi hev ew xelas kirin ji hicranê

1200. Mem maye di kuncê tenê bûnê da
Bê dost û bê heval, bê hemderd

1201. Weqta ku dost nebin ji bo zemana
Heval nebin ji bo xema

1202. Xemgîn yê bi çi tehemmul bike
Dilşa yê çi bike wasite?

1203. Fereh û xem dixwazin şerîkekî
Derd û weqt, sihetê dixwazin hevaleyê

1204. Unsiyyeta 'aşiqan sukûn e
Sermayeya wehşetê cunûn e

1205. Rahet heval xeberdanê bi hev ra
Baxisus ku halê wan yek be

1206. Zînê û Sitf û Memê û Tacdin
Hevdu îdare û teskîn dikin

1207. Weqta ku Zînê ji derdê xu fixan dikir
Dengê Sitf jê ra dibû derman

1208. Gava ku Memê bi dil dinalî
Tacdîn jê ra dibû hekîm li cem wî

1209. Ev herdu (Tacdîn û Sitî) ji herduwan (Mem û Zîn) qetiyar
Herdu (Tacdîn û Sitî) çûn û bi meqseda xu şa bûn

1210. Ma Zînê û Memê bê netîce
Bê meqsed û bê mirad û bê hêvî

1211. Zînê çil rojî ne xûrek xwar ne raza
Serê wî ji ser girînê ranedibû

1212. Xeza û xwarîna wî xûna dil bû
Hêstirê wî bû şerbet û vexwarin

1213. Daîmî bi roj û şev halê ji firqetê her ev bû

1214. Rojan digiriya û bi şev jî fikir ah
Wiha reng geriya ze'îf ew hîv (Zîn)

1214. Rûyê wî wekî hîva çardeh şevî ye ze'îf bûye wekî hîva teze
Rûçîk geriyaye mîna xeyalekî

1216. Emsal û heval û dost
Hevalê siran û emîn û nazenîn in

1217. Her lehze jê ra bi delalî digotin:
Ey taze ya dara baxê rif'etê

1218. Serê te kesk e û belkî te teze mêwe girtiye
Çima tu ew qasî dirêjînê hêstira

1219. Xûşk eger ji te cuda bû
Çû bi xweşî û şa bû bi mêrê xu

1220. Ew î girtiye ji xu ra sebr û qerar
Ew şa bûye li wî derê û tu jî livira xemgîn î

1221. Piştî wî xema rake ji qelb
Mîna guliya bide ber bayê

1222. Wan guliye reş bigerîne helqe bi helqe
Gul bi gul veke ew sûretê ku wekî gula sor e

1223. Guliya veke hettî bibin wekî zincîra
Bila bibe iklîlê netikê bixemilîne

1224. Biskan jî ji guliyan dûr ke
Guliya şe ke û bişîne ber bayê

1225. da weku sunbul û sorgul hev nas bikin
Reyhan û binefşe bibin ta bi ta

1226. Biskan berjêr bike ser hilalan
Cinû bike di Mekkeyê da Bîlalan

1227. Dîsa bike guliya vexwarê şerabê
Veke helqeya por hettî bibe mîna Ke'beya ku lê hatiye kirinê perdeya reş

1228. Ta xelqê ji xerbî û şerqî û hettî Şamê
Mîna heciya bîne îhramê

1229. Bigehîne hev bisk û xalê
Şîrêz ke belgê Mushefa cemalê

1230. Da wekî jora rûyê te bibe zêrkirî

Ayatê Xuda were tertîbkirinê

1231. Hettî firqeyê kafir û musulmanan
Tesdaq bikin bi nesa Qur'anê

1232. Van îşaretê ce'van û nezerê ku xwîn xwarin
Û wan xencer û tîrê pir tûj

1233. Qet'a nede îzin
Ewana li tu kesî rehmê û rifqetê nakin

1234. Îzin bide guliyê ku 'aqilan ji seran dibin wekî rêbera
Da hukum bikin li paşa û hakiman

1235. Perde hilde jiber gulan
Bibîne bêsebriya bulbulan

1236. Bikenîne kulîlka devê
Bigerîne hezar çîrokbêjî bila nalan bikin

1237. Serxoş ke guharê li sitûyê
Serser bike dîn û cûnî û har an

1238. Şerabê bide mela bi delal î û naz î
Şêxa bişîne ber xinzîra

1239. Îznê bide biska û guliya û xala
Bigerîne ehlê hala bila bizanibin

1240. Hettî murşid bê terîq şaş bûyî
Muheyzer nebe wekî heywana

1241. Da ku înkâr bike delaleta mutleq (kufirê)
Îqrar bike bi sûretê heq

1242. Da ku vala bibe ji tecelliya celalê
Îqna' bibe bi tesewwura cemalê

1243. Fanî bikin wî wucûdê
Baqî bibin bi vî şuhûdê

1244. Çiqasî vana digotin ev nesîhet
Zînê pê nedibû sabir û qanî'

1245. Belkî bi wan nesîhet û şîreta
(Zînê) Yek car dikete bela û benda

1246. 'Eşq agir e û nesîhet pif e (wî agirê zêde dike)
Sir perde ye lewmekirin 'eyba wî eşkere dike

1247. Çiqa ewana lome dikirin
Ew zêde dibû ji wan bi nefret û poşmanî

1248. Hêsira firset nedidane çav
Ah ah gotin muhlet neda dev

1249. Hettî ev (dev) bi kelamekî xeberde
Yan jî ew (çav) bi meqamekî binêre

1250. Ewan şîretbêja dîtin ku we'z û nesîhet
Ta'sîr nake û fayde nade bi tu rengî

1251. Man di te'eccubê da ku ev hîv
Ji bo çira evqasî ah dike

1252. Wan wiha qiyas dikirin ku Zînê

Her ji bo Sitîyê digirî

1253. Dîtin ku xeber bi temamî ber hewa çû

Ji neçariyê sikûtîkirin û rabûn

Hemdemîya Zînê Digel Xeman Bi Sebebê Nîfaq û Naf'timadiya Hemdeman

1254. Zînê ma bi tenê û bû hevalê xeman

Xem lê civiyan û Zînê gotê wan:

1255. Ya ewanê lazimê 'ecizanin

Ya ewanê ku guh didine şikayeta mezluman

1256. Hûn hevalê dilê derdmendanin

Perdeyê ser mehzûnanin

1257. Hevalê dilê birîndaranin

Şerîkê xatirê hezînanin di xewê da

1258. Ey hevalê sifreya bête'man

Hevalê sifreya şeraba ku qirikê dişewitîne (xuyê heyata bê kêf)

1259. 'Aşiq bi wasita we digihêjin cemalê

Salik jî bi we digihêjine celalê

1260. Xirabeya dil wiha maye xalî

Qet xeyrê we kes nînin li cem wî

1261. Çawa ku hûn dixwazin te'mîra wî ji bo xu

Me daye ji we ra destûr û îcaze mutleqa

1262. Dewlet bi we ye di dunyayê da

Şeref ji we ye di seraya axretê da

1263. Lewra em xeman dixwazin ji ber ku ew wefadar in

Nabêjin ev tehlî ye ev cefa ye

1264. (Xem) Di rojê reş da yarê rûha ne
Yarê xweşiyên e şadimanî

1265. Li dinyayê û axretê çiz û û çî dereng
Weqta ku xem û meraq nebe çawa hasil bibin (dunya û axret)?

1266. El-hasil bi we xweş dibe dilê min
Bê xezîna xema ji dil çî qaîde heye?

Mu'atebiya Zînê Digel Sitîfyê Gazindiya Horiyê Ji Periyê

1267. (Zînê) Weqt weqt bi Sitîfyê ra xeber dida
Wiha 'etab fikir ew meleka:

1268. Ya ew a ku rûh û rewanê qelbê Zînê ye
Nûra çav diyar û dîtinê ye

1269. Ya hevalê kêf û xemê dostaniya
Ew a ku ji goşt û hestî û cild û xûn a min e

1270. Ya xûşk û per û bask û serî
Şerîkê hêk û hêlîn û perra

1271. Ey ew a ku teb' min e
Îla di bextê nemuwafiq da

1272. Sed şukir ku bextê te bûye heval
Te çawa dixast Xuda wisa daye te

1273. Sed şukir ji bextê te yalê te kiriye Şansê te ji bo te bilind bûye

1274. Bextê min eger çi zêde reş hat
Ew qismeteke ji bo min zêde xweş hat

1275. Teqşîmkirina xema ji bo min ra bûye
Teqdîra ezelê yeqîna wisa bûye

1276. Şahî ji te ra xem jî ji bo min
Tacdîn ji te ra û Mem ji bo min

1277. Çunkî xem li sûretê Memê ne

Lewra ji xem mi ra li ser xemê ne

Mukalemeyê Hemrazê Şem'e Mudawemeyê Xwûnrîzê Dem'e

1278. Hine weqta Zînê mûm ji xu ra dikir heval
(Jê ra digotê:) Ya hevala min û dosta min û ya şerîka sira min

1279. Her çiqas tu bi şewatê mîna min î
Ema bi gotinê ne wekî min î

1280. Eger mîna min te jî xeber da
Dilê min ewqasî nedişewitî

1281. Derdê min û te ji hev cuda ne
Ew ferq ji rojava hettî rojhilat e

1282. Tu meşrîq î agirê te eşkere ye
Ez mexrîm hindirê min agir e

1283. Tayê rûh daîmî min dişewitîne
Yê te jî tek zimanê te dişewite

1284. Laiqî agirê min li serî ye û di qelbê min da kozî heye
Rûhê min digel koziyê di cengê da ye

1285. Şewqek li ser serê te zahir e
'Eşqeka bêfayde têda heye

1286. Ew şewq ji bo te ra ziman e
Ev alaf ji bo mi ra ziyan e

1287. Alafa ku ji qelbê min gihêştiye serî
Hukmê dike li bayê hişk

1288. Her çend bi şev dimînî hişyar
Ji sibehê hettî êvarê pal didî

1289. Êvarê û seherê û çî bi rojê û çî bi şevê
Ez her wisa li ser hev dişewitim

Bilbilya Zînê ye Digel Perwanêyê Perwaniya Wê ye Digel Dîwanêyê

1290. Carna ji destê dilê birîndar

Mecbûr dibû ji canê xu bêzar

1291. Îltifat nedikir bagerê xemê

Perperok ji xu ra dikir heval

1292. (Jê ra digotê:) Ey ta'irê hêlîna firqetê

Ey bilbilê bostanê şewatê

1293. Ey delîlê 'eşqa rast

Ey betalkiriyê de'wa vireka...

1294. (Ya perperok) Bi mêranî û şeca'etê tu rûhê xu didî bi erzanî

Ma'lasef tu bi sebebê mirinê dilerizî

1295. Nasekinî lehzekî li ber hewa 'eşqê

Bêy zanîna 'eşqê tu fenayî dixwazî

1296. Ew lezkirin ji te ra gelek qusûr e

Ew lerze ji bo te ra noqsanî ye

1297. Bêsebr î, bêsukûn î û zeîf î

Lewra tu 'ecele dikî di wî zehmetiyê da

1298. Nepehtiyê 'eybeka tamam e

Ew kesî pehtî dibêjine (kesê mîna Zînê) hûn xam in (nepehtî ne)

1299. Gelo îmkan dibe ewanê pehtî bişewitin carek ji cara

Qe fanî dibin ewana bi nûr û agir

1300. Ewana baqî dibin wekî semender
Cismê wan dibin rûhê enwer

1301. (Ew Zîna ku) Cismê wî nûranî ye û rûhê wî melekî ye
Mîna hîvaka sipî muqabilê rojê ye..

1302. Yek zerre ji 'esman û 'erdan
Nedima ku (Zînê) digel wan xeberdan nekiribe

1303. Ji ew însanê xûyê niyeta pîs
Muheqqeq hifza xu dikir jê dûr diket

1304. Fikra xu ddikir ji îns û cin a
Sirra xu digote bêzar û bêzimanan

1305. Ji serî hettî pê di xema da xeniqî bû
Nefsa qelb û rûh xeyala Memê bû

Mecnûniya Memî ye Ji Işqa Leylayê Wamiqiya Wî ye Derdê 'Ezrayê

1306. Mem jî ji xeyala rûyê maşuqê
Ye'nî jî xwestina dîtina wî bû

1307. Bû dîn û hezkirî û sewdaserî
Mecnûnekî bêemsal û 'aşiq

1308. Xalib li 'aqil geriya dehşet
Wehşet bûye hevalê qelb

1309. Ne qabile ku hilde dax û derdan
Negîhiştiye seyra baxê gulan

1310. El hasil gihîştina bal Zînê çênebû
Qe rahatî nebû ji ber birînê

1311. Lewra du merivê lêv tî û bêgav
Bêhêvî ji bo qûrtek avê

1312. Zemanê ku nişkêva ji nişkêva asman birije
Kaniya ava heyatê

1313. Yek ji wan mirada qelbê wî hasil dibe
Yê dinê yê ku şewitiye her wisa dimîne

1314. Yekî kesba heyata edebî bike
Ê dinê yê here mirina dirêj (a ku jê zivirîn tune)

1314. Tacdînê ku îmkana gihîştinê kete dest
Wisa ji Memê ra huzun û melalê destpê kir

1316. 'Esla ji xeman xilas nebûye
Tu alîkarî nedaye kesî

1317. Qet'a nîne jê ra qirarek li cihekî
'Esla nikaribû digel yekî îdare bike

1318. Ew weqta ku (Mem) diçû pêşiya Mîr
Te zen fikir ewa nexweş e, piyê wî di zincîrê da ye

1319. Her lehze ji derd û ah û wahî
Agir digîhande asmana yan jî qesra Mîr

1320. Gava diçû pêşiya Tacdîn
Ew zeîf digel dil bi nalîn

1321. Qederek nedikir bisekine û suhbet bike

1322. Mecbûrî ji bajêr dûr diçû
Dibû hemderd bi şetê kûr ra

Muxatebiya Memî ye Digel Şetê Cizîrê Mucawibiya Ji 'Îşqa Bênezîrê

1323. Ya ew ê ku mîna hêsirê min dikişê
Bêsebr û bêrukûnî wekî 'aşiqan e!

1324. Tu bêsebr û bêqerar û bêrukûn î
Yan wekî min tu jî mecnûn î

1325. Qet nîne ji bo te ra qerarek
Xalib di qelbê te da ye yarek

1326. Her lehze çî tê bîra te
Serxoş dibî li kêleka Cizîrê?

1327. Ev şerha eger ji bo te mehbûb e
Mîrada te jî hasil bûye

1328. Daîm di qelbê te da ne menzil
Destê te li sitû hemaîl e

1329. Hêj tu ji Xuda tefekkur nakî?
Her roj hezar carî şukûr nakî?

1330. Ev qedereke tu dikî hewar û gazî
Êdî tu çî miradê dixazî?

1331. Beyhûde çîra dikî feryad?
Tu bi şaşî diçû memleketê Bexdadê

1332. Eger ez bigirîm yan binalim
Eger bimirim yan yan biqîrim

1333. Her çi tiştê ku ez bikim caîz e
Ew tiştê me'qûl ji bo min ra fena ye

1334. Carekî bi ser qelbê min ra derbaz be
Li kaniya çavê min nezer ke

1335. Çawa derdê dilê min bêdewa ye?
Hikaya çavê min ê şil çi ye?

1336. Ez dîn im û min periya xu winda kiriye
Ez Dicle me, min zenberf (gemê) li pey xu hîştîye

1337. Westanî û Nêrgizî û Seqlan
Derwaze û 'Umerî û Meydan

1338. Evana sêrgah in û tu lê dikî seyahet
Ez ma me û ji bo min ra çol û dêşt

Mubaheseya Memî ye Digel Bayî Hewadariya digel hewayî

1339. Carna (Memê) xeberdida digel bayê sibayê
Beyana xema dil dikir ji bayê ra

1340. (Digotê:) Ey cismê letîfê wekî rûh
Dergahê beden ji bo vekiri ye

1341. Ez hêvî dikim bêsekn
Bi pê îşyayê û bê tekelluf

1342. Carekî here der se'adetê
Gavekî here bal Sidretu'n-nihayetê

1343. Di ewwel da şîmîkê paç bike
Paşê here pêşiya ew a ku qelba distîne

1344. Lekîn bi tewazu' û te'zîm
Sed mertebe bi ihtiram û bi tekrîm

1345. Jê ra du'a hêdika bike
Sena lê bike daîmî

1346. Teqdîm bike hurmeteka laîq
Bisekine û destê xu girêde û selamê lê ke

1347. Paşê hereket bike li pêşiyê bi 'ecele
Giranî negire li teb'a wî ya nazik

1348. Ev name xûna dil xebera wî ye
Ev sehîfeke xeta wî ava çava ye

1349. Perdê nehejîne ji ber cemalê

Tenha bide destê ‘erzihalê

1350. Zîhar raneke niqabê

Gava ku dixûne kitabê

1351. Bêje ji terefê min: Ey padişahê min

Ji terefê min bêje tu yî qiblegahê min

1352. Çunkî tu metle’ê nûra Xuda yî

Çunkî menbe’ê Kewsera zelal î

1353. Çunkî mekan nezer î û mezhera îlahî yî

Em bûne geda tu padişah î

1354. Da ku ji bo me mutessif biheq bê

Der heqê me ‘edil û însafê bikî

1355. Li ber çavan bi çav muhebbet û re’ayetê

Carna bikî li qelbê tecellî

1356. Ev ‘edeteka qedîm e ji bo padişahan

Nezera wan ‘am e ji bo pir gunehkaran

1357. Wellah ez gunehê xu nizanim

Lekîn dizanim dilekî min hebû

1358. Periya ew dil ji min revand

Ev qedereke ew ji min cuda ye

1359. Weqta ku ew digel min û tabî’ min bû

Ew xuyê hewes û ‘eşqê bû

1360. Belkî (qelbê) kiriye xeta û 'isyan
Însan hatine çêkirinê bi noqsanî û bîrkinê

1361. Qelb ji sed carî zêdetir pir gunehkar e
Feqet siya guliya te jê ra ciyê xelasbûnê ye

1362. Eger li wî qehrî yekî ew ceza ye
Eger 'efû bikî ew dayîneka pir 'ecêb e

1363. Wiha bêje ey bayê sibayê bi 'ecele
Wan weqta 'erdê paç ke û rabe

1364. Ey bayê siba bi heqê Xuda kî
Gava ku tu tiyî ji pêşiya mehbûba meqsûd

1365. Zînar hinek ji xûliya şîmîkê
Digel xu ji me ra bîne

1366. Toza ku ji rengê tûtiya ye
Bi xu ra bîne çunkî ew kîmya ye (îksîr e yan sêhr e).

Mucadeleya Memî ye Bi Dilê Kul ra Muharebeya Perwaneyê Bi Bilbil ra

1367. Carna herb fikir digel qelbê zeîf

(Digotê:) Ey Şermesar û xedar

1368. Kanê qewl û qerar û 'ehd û 'elaqe

Peyman û qesem û yemîn û sond?

1369. Te digo ez digel te sadîq im

Te digo ez digel te muwafîq im

1370. Te digo ez digel te yek dil im

Te digo ez xudan tehemmul im

1371. Esfa ku tu zêde bêwefa yî

Weyla ku tu ne qabil î ji bo cefayê

1372. Qelpê hîlekarî bidil neyar î

Pirr çîl û çep î, xerab î û xwar î

1373. Ey tûtîyê ku bi şîrînî hatiye xuyîkirinê

Ey zarê bi delalî hatiye terbiye dayînê

1374. Meger tu dostê xweşîyan î

Meger tu di roja reş da qelp î

1375. Qelbê şexsa ku di nav cendekê da ye

Gelo însaf e tenê bihêlf?

1376. Ev can wekî bilbilê di hebsa bedenê da

Maye tenê wekî Bêjen

1377. Însaf e tu canê terk bikî
Derê bedenê kilît kî?

1378. Sirra te ji feyza canê ye
Nûra 'erdê ji asmana ye

1379. Ey dil meçe bêçiraya rûh
Tarî ye, tu kor î, rê nizanî

1380. Meqsûda te eger mehbûbeta te be
Mehbûbet di rûh da hatiye veşartinê

1381. Lewra tu nimûneyî ji bo zat
Neynikî ji bo sûretê sifâtê

1382. Zinhar meçe li pey hezkirinê
Da ku rûh ji te berê nebe

1383. Çûyina te dibe sebebê Xariciyyetê
Terka te dibe sebeb Rafiziyyetê

1384. Xaric nebe hettî ku nebî daxil
Terk meke da tu bibî wasil

1385. Rafiziyetê meke hettî bidil bibî Sunnî
Ev çi halê te ye? Rehm ji te ra, tu ji min î

1386. Sabit be hettî nekevî tev muxalifan
Hettî waqifê hikmeta (men 'eref) yê bibî

1387. Her çiqasî tu çûyî ber derê dost
Lekîn dost li cem min e li wî derê heye post

1388. Qameta ku te hebandiye ji bo te dara ‘îdamê ye
Guliya ku te civandî ew çengel e

1389. Cezba ku tu revandiyê rûh li bal e
Sirra ku tu fedayî ew xu mal e

1390. Baweriya te bila ney li zulf û xalan
Malê xu nede Hindûyan bi talan î

1391. Pey xu girênedê bi ta, çûncika
Serxoş mebe bi tîrê bijanga

1392. Her çend mîna hezretî Xelîl bî ey belakêş
Baxçeyê gulên ji te ra yê bibe agir

1393. Wekî te sed hezar bilbil
Sed carî bikin fixan û zarî

1394. Mîna perperoka li pêşiya gula
Her weqt yê bişewitin bi dax û derdan

1395. Ey dil, te nefsa xu daye ber hewayê
Qesda te ew e ku bikî sefayê

1396. Lekîn ji tebîbê ‘eşqa rast
Min zaniye ji bo te tiştê muwafiq

1397. (Ev e:) Dûr here ji tiştê iştah lê vedibe
Teqwayê ji wan tiştê ku lezzetê didin

1398. Çi tiştê ku muxalifê hewayê ye

‘Eynê wî ji bo te şifa ye

1399. Min pirsîye bêşek ji Loqman Hekîm
Xassiyeta şerbet û te’man

1400. Çi tiştê şîrîn e ew êş e
Çi tiştê wisa tehl e ew derman e

1401. (Memê) Çiqasî ji dil ra got:
Bi neçarê dil dilê wî bi wî bi wî şewitî

1402. Dû ji herareta qelbê
Rabû, tijî bû cihê mêjî (serî).

1403. Rabû ji qelbê dûyekî reş
Reşkir li serê mêjî û poz

1404. Neynika xeyalê şêlî bû
Neynika ‘eqlê muxeyyer bû

1405. ‘Ewrek te digo ji ‘erdê rabû
Li jora asmana topî ser hev bû

1406. Vî ‘ewrê ji nîvê hinavan
Xûn dirijandin bi herdu çavan

1407. Sêlava cigerê wisa gur hat
Te zen dikir ku çemê kur kete nav çemê Erez

1408. El hasil ji ‘illeta dilê da
Sêlav wisa diçû û digihîste milê Memê

1409. Şettu'l-'Ereb û Firat û Ceyhûn
Hersê te digo bi hev ra rabûn

1410. Çiqas ji hêstirê Memê zeîf
Hêşîn bûne li kenarê şetê spîndar

1411. Temamê çola bûne meydana bostana
Sahil bûye gulşen û gulistan

1412. Wî bêdil î (ew 'aşiq) her li wir mekan girt
Wî bilbilê ji xu ra hêlîn girt

1413. Ew bilbil eger çi pir bi zewq bû
Zindana bedenê jê ra qefes bû

1414. Hirşiyane temamî per û baskê wî bi hev ra
Temamê xet û xala ji wî hirşiyane

1414. Qameta wî mîna dara senewberê ye
Xwarbûye û civiyaye wekî dara 'er' erê

1416. Rûyê wî gerçî ter û taze bû
Wekî kulîlka zizamê zer bûye

1417. Jeng peyda bûye li neynikê
Rewneq nema qet li neqşê Erjeng

1418. 'Eşqê wiha nexwaş kir ew mubtela
Hubbê wiha serxoş kir ew muşewweş

1419. Di sûretê wî da nema qet'a av û reng
Di xeberdana wî da nema cewab û deng

1420. Ji ewwel va li kenarê şetê nexwaş ket
Çil rojî temamî mîna leşekî ket

1421. 'Eql û û⁴³ îdrak û şu'ûra însanê
His û hereket û qûwayî heywanê

1422. Qet'a nema ji wan tu eser
Cuz'ek tenê li cem Memê birîndar

⁴³ Di metna resen de muellîf du "û" bi kar aniye, ji ber wê ji bo metn resen bimîne me jî mudaxale nekir û bi heman awayî nivîsî.

Çûna Mîr Zeyneddîn e Bi Seyd û Nêçîrê Azadiya Memî û Zîn e Ji Qeyd û Zincîrê

1423. Nêçîrvanê nêçîrê xeberxweş
Xeber zahir kiribû ji bo me ra hikayet

1424. Got: Rojeka xweş ya ji rojê zemanê
Dewrana felekê ya ku fena dibe

1425. 1426. Raxistiyê qezayê (ku Xuda ye) bi sen'eta qudretê ew dunya
kevin mîna jinê ku pora dişkinin
Xemilandibû mîna xemilandina bûka de'wetê

1427. Her yek ji newal û çiya û dêşta
Wekî koşeyek ji koşeyê cennetê ne

1428. Her çîmanek mîna çîmanê cennetê mezin bû
Her kaniyek ji ava Kewserê bû

1429. Her çiyayek ji rengê Tûrê Sîna
Ji nûra tecelliyê şu'le dida

1430. Her çemek ji rengê me'ra bû
Her sebze yek mîna 'esayê Mûsî 'eliye-s selam bi mu'cize bû

1431. Her dar ji feyza biharê şu'le dida bi nûra Xudê

1432. Her gula wekî agirê çiyayê Tûrê Sîna ye
Wekî meş'eleka pir nûra bêqusûr e

1433. Her bilbilek bixwe mîna Mûsayê Kelîm e
Her tûtî û qumrî hevalekin

1434. Her dara xurmeyê her weqtî gazî dikir:
Mîna darê digo 'Ena' llah

1435. Kîvroşek û xezal û kerê wehşî û ahû
Ev qaz û quling û kew û teyhû

1436. Kerî kerî diçêrin li çiya û dêştan,
Ref ref difirîn li nav çîman û baxçeya

1437. El hasil bi xwestîna zemanî
Çêbû firseta heyat û se'adetê

1438. Fesla ku bigerin li geşt û seyranan
Û nêçîrê bikin ji wehş û teyran

1439. Mîrê ku felek mutî'ê emrê wî ye
Got: Hê ku sibe nebûye qewmê Bohtan

1440. Hildin silah û gurz û şûra
Bi tamamî digel mi bîne nêçîrê

1441. Ew kesê ku hazir neb di nêçîrê da
Ew ê bimre di bend û qeyda da

1442. Xelqê hettî şefeqa kazib
Hazir kiribûn cil û nivîn û eşyayê lazim

1443. Weqta ku şefeqê 'elamet ji wan ra eşkere kir
Qiyamet rabû di wî şehre da

1444. Mêra vekirin teyrê 'uqab û bazî
Şêra birin piling û te'jî

1445. Heywan durr û ademî û heywanê çar pê

Hebek qet nema di şehre da

1446. Hem jî nema heywanê ehlê û însan û heywan

Zarê nûciwan û aşvan (yan jî şivan) û nobedarê baxa

1447. El hasil ji qismê mêra

Kesek nema di mala da

1448. Cihê nêçîrvana bû wekî mehşerê

Şefqet û rehm nekirin li wan heywanê bêguneh

1449. Ewqas ji wehşiya dikuştin

Herwekî qet wehşekî nehiştin e

1450. Heywanê durr û revok û firiyayî

Hinek hatine kuştinê hinek jî hatine girtinê

1451. Destsiyik û genc

Siyarî û şerkar û pehlewan...

1452. Parçekirin heywanê wehş bi şûra

Belakiribûn teyr bi tîra

1453. Xort mîna merivê jîhatî

Merkebê wan hespê 'ereb in (yan jî 'erebê ne) û xuyê kemend in

1454. Çewgen di dest da digel gopalan

Davêjine sitûyê xezalan

1455. Ew siyarina wekî şêr û pilinga nin

Li xûnê gerandine pilingê belekî

1456. Ewana ew çend xezal nêçîr kirin

Ewana ew çend piling girêdan

1457. Îdî nikaribûn digel xu bînin

Belkî nedikaribûn ji cih hilînin

1458. Yê kuştî feqîran ji xu ra birin

Yê girtî jî mêra bi xu ra birin

**Dastanê Bostanê Cennetnîsanê Mîran Ku Bûye Mecme'ul-Behreyna 'Işqa Herdu
Dilfikan Metle'un-Neyyirîna Şewqa Husna Herdu Gulîzaran**

1459. Baxekî Emîr Zeydîn wisa hebû
Baxê Îrem diçû bi mizgînî

1460. Her dareka wî û her teyrek
Qesreka cennetê û hûriyek

1461. Ji bo şûştina dest û pê û çav a
Ridwan kanîka dikişiya çêkiribû ji Kewserê

1462. Darê serwî mîna Sîdret-el mentehî ne
Her teyr mîna melaîketa ne

1463. Qelbê senewberê mîna qelbê Memê ye
Qameta dara 'er'ê sed parçeye ji 'eşqê

1464. Narinc û turunc mîna Zînê
Zerbibûn ji 'illeta hezkirinê

1465. Sêv û xurme û hinarê baxça
Bûne wekî lêv û çene û memikan

1466. Dara şimşad û çinarê nêzîkê hev bilind bûn
Xweş siya çêdikin û bilind bûn

1467. Qedehê zêrkirî yê hettî dev tijî
Reyhane û binefşe tamam gulê teze ne

1468. Temamê sebze û kulîlka
Şîrêza av û çema

1469. Meydana reza bi kurtî wekî kitabekî ye
Her parçe û fesi fesi û babin

1470. Goya kitabê muneccim bi edeb
Sersefheyê bax (gerandiye) wekî teqwîmê

1471. Bi helandina civayê kişandibû bi cedwelê
Gulên tê av jî hemî dişibihyan şingerfê (rengê sor)

1472. Her teref bi sunbul û reyhanan
Reng ji xetê kesk û reş bû.

1473. Goya her yekî hukmek nîşan dida
Bextê reş û şansê sipî (eşkere dikir).

**Rehayiya Zînê ye Ji Qeyda Te'elluqa Exyaran Tenhayî û Tekelluma Wê Digel Belg
û Daran**

1474. Ew xezala seydgahê wehşetî

Ew xanima qesra 'ulfetê

1475. Reîsa xezal çola 'alemê

Çiqla serxoşa baxê gul da

1476. Piyê girêdayî bi qeyda 'eşqa xûnxwar

Nêçîra ku Memê ew kirî birîndar (yan: Ew nêçîra ku Memê birînda
kiriye).

1477. Ew î dît ku tamamî şehr û mehelle xalî ne

Vala bûne soqaq û kûçe û der û dor

1478. Tenha û xalî ne bax û bostan

Bêînsan û bêperî ne meydan û eywan

1479. Zanî ku ew zemana bêeman e

Got: Rabe ey dilo zeman 'ecêb e

1480. Firset xweş e da weku em biçine seyranê

Îcar em sêrbikin li weş û teyran

1481. Kanê qe heye hevalê mi yê derdan?

Lewra ev beşer in bêderd in

1482. Teyrek me bihîstiye di nav baxan da

Bextê wî reş e wekî rengê qijika

1483. Lê jar e, zeîf e, bêmecal e

Muşewweş e ji dîtina rûyê gula sor e

1484. Di roja da dike fixan û zar î
Xûna xu dixwe di şeva tarî

1485. Daîm dike fixan, qêrînî
Ew hevalê min e di dengê da, navê wî bilbil e

1486. Ew teyra hevalekî qenc e, ehlî hal e
Dermanê derdê min li cem wî ye

1487. Ey dil, were hettî em bi dizî biçin
Hêja ku heye ji bo me ra heyat

1488. Belkî bi nesîhet û şîretê
Azad bike me ji qeyd û benda

1489. Wiha got bêsekinandin
Zîne hate baxê bêteklîf

1490. Haj nema ji wê tu kes
Ne dayê, ne xidmetkar, ne cariyê

1491. Meqseda wê ne suhbetek bû
Tek xalis mirada wê tenêmayîn bû

1492. Lewra hate baxê ew hûrî
Ji bo têr bike şikayeta xu ji dostê xema

1493. Her lale li sîng da bûne dax
Her bişko bisebebê şewatê bûne çirayek

1494. Her dar li cismê bûye barek
Her kulîlkê hinara li qelbê bûye agir

1495. Xu tenê dît ku di destê wê da kevirek hebû
Ev kevir zimanê zingilê bû

1496. Car caran li defa mermerê dixist
Bêşek qelbê kevira dibû parçe parçe

1497. Gava ku nezer dikir li ava
Sêlava xûnê diçû ji herdu çava

1498. Meydana baxçe bû 'eşqa bilibilê
Şa dikir gul bi ava gulê

1499. Qameta weku bi heqîqet dara senewberê ye
Sûretê di rewneqa xu da wekî roja munewwer e

1500. Wî wisa reng dida xûlî û 'erdê
Ew çend te'fir dikir di tozê û xûliyê da

1501. Xûliyê dikire axê, ax û kevir dinalîn
Dara dikir ahe ah û belg dikalîn

1502. Her weqta ku dikir ji derdê xu hewar
Neynika felekê digerî rûreş dibû

1503. Sorgul pejmurde kirin bi reng
Perîşan kirin bilbil bi deng

1504. Bilbil nedikarî bibe hevalê deng
Sorgul nedikarî bibe hevalê reng

1505. Çiqas ku li bax nezer kir

Behsa xu digel gulê zer kir

1506. Gulê kulîlkê mîna ‘aşıqan e di xerabûnê da

Ew ê mîna min e di zerbûn û çilmisînê da

1507. Belgê sed in û meqam hezar in

Çima hûn zer in, zêf û jar in

1508. Yan hûn mîna min bê Memê ne?

Lewra wekî min hûn di pir xemê da nin

1509. Bilbil bi gula sor meşxûl e

Hûn jî mîna min mane di tenêbûnê da

1510. Lewra hûn nexwaş in, derdmend in

Mehzûn in, sîng qelişî ne

1511. Hûn delîl qenc in ji bo min

Hûn ji bo mi ra di hal da emsal in

1512. Xûşkeka min hebû ji rengê gula sor

Hildaye ji bo xu ra bilbil

1513. Ha ji bo mi ra hîştîye ‘endelîbek

Mehrûm û sefil û bênesîbek

1514. Ez jî ji zulet û bênesîbî

Zer bûme ji bo terka ‘endelîbî

1515. Sûretê min ê sor yê erxewanî

Zer bûye wisa wekî ze'feranî

1516. Min carek ew a bidîta bi xwestina dilê xu
Îdî min nedikir ah wellah

**Teqazayê Da'iyeyyê Dîdarê Didar û Mulaqat e Ji Bo Memî ra Ji Cenabê
Wahibu'l-Meramê Qazu'l-Hacat**

1517. Çi tiştê bibe ji xêr û şer î
Bêsebeb muyesser nabin

1518. Eger gihîştin be eger dîtin be
Bêsebeb nabe tu bazar

1519. Ew sebeb tamam îşaret û hal in
Belkî ji terefê Xudayê Zu'l-Celal in

1520. Qelbê te dibêje ku rabe
Ev sa'ete 'eynê vekirina derî ye

1521. Ew çiyayê giran û behra sekinî
'Eşqê kiribû sivik û mecnûn

1522. Ye'nî ku zeîftiyê Memê nexwaş û bedhal
Zeîftiyê zehf kiribû perîşan

1523. Roja ku xelq ji şehr derket
Sewdayê xeyala Zînê jê ra kifş bû

1524. Ew nexwaş bi derdê 'eşqê serxoş
Beriya pakbûna nexwaşiyê kete ber sekerata mirinê

1525. Bêsebatiyek kete qelbê hezîn
Qet'a sikinandina wî di xanî da nedibû

1526. Mecbûrî ji xanî derket
Bi sebebekî ew jî Xizir 'aleyhî-s selam bû û lê xûya bû

1527. Ew Xizir çi bû? Ew şewqa dil e
Ew şewq çi bû? Ew jî 'eşqa dil e

1528. Qelbê wî digel wî bûye talib (yan zalim)
Hettî ku ew kaş kiriye û gihandiye bostan

1529. Zîna ku di şevê reş û tarî
Her weqt bi fixan û ah û zarî

1530. Daîm ji Xudê dixwestin
Mem rabe bê li nik wê bi tenha

1531. Nişkêva dît Memê ji der da hat
(Wekî) Nexwaş ku Mesîh bi serda hat

1532. Zînê ji hezkirinê û şadimanî
Derhal nema tu heyatek

1533. Bêhiş ket (Zînê) li ser çîmen wekî gulê
Cigera wê bû sed parçe ji 'eşqa bilbil

1534. Mem hat nezer kir li gulan
Seyrek li reyhan û sunbulan kir

1535. Got: Ey gul eger tu delal î
Kengê tu rengê ji rûyê Zînê

1536. Ey sunbul eger hebê ji te ra bîna xweş
Reyhan ji te bûye rûreş (ji hesûdiyê)

1537. Hûn ne misalê çûnçika yarê ne

Hûn herdu fizûlî ne û bêfayde ne

1538. Ey bilbil eger tu ehlê hal î ('aşiq î)

Tu perperoka mûma gula sor î

1539. Zîna me ji sorgula te rindtir e

Bextê me ji bexte te reştir e

1540. bilbilê ez im ey axirî bixêr

Beyhûda çira navê xu xerab dikî

1541. Ne gulek tenê belkî bi sed hezaran

Rozê dide di ewwelê biharê da

1542. Me'şûq ku mîna wan gelek bin

Ger çi horî û melek bin

1543. Ew nabine sebebê tu derdan

Lewra ku hene li temamî 'erdan

1544. Gul yek tenê be û bêemsal û hemta be

Veşartî be wekê Zînê û teyrê 'Enqa

1545. 'Aşiq bi çi terzî yê îdare bike?

Xeyrî bêsebrî û mirinî û mirinî jê ra çi çare heye?

1546. Memê wiha digot ji halê xafil

Nişkêva dît ku li pêşiya wî ye

1547. Zîna ku dused perî xidmetkarê wê ne

Horiya ku Memê jê ra esîr e

1548. Ew a ku mîna sebzeyekî li ser 'erdê ye
Dermanê 'eşqê ew a bêhiş kiriye

1549. Zîna ku wekî durra veşartî di sedefa xu da
Nişkêvâ Memê cegerxwîn dît

1550. Bêhiş ket ber piyan ew zeîf
Ewa mîna dara serwî ye ku gihêste ber piyê wî av

1551. Kulîlka darê vebû weqtê seherê
Beranberî kir bi bilbilê xu ra

1552. Got: Ew xew e yan sirf xeyal e?
Ev xûna sehîh e yan betal e

1553. Xulase ji pişt sed xeyala
Xassiyetê bîna çûnçik û xala

1554. Zînê gihande ber poz (Memê)
Nêçîra Mirê sax kir bi tele yê

1555. Rabû Mem li pêşiya destê Zînê
Nihêrî ku herdu destê wê di destê Zînê da ne

1556. Herdu mane lal li pêşiya hev gelekî
Ne nutq e ne xeber e ne qîl e û ne qal e

1557. Ewwela bi destê xu îşaret dikirin
Paşê ku li wan vebû 'ibaret

1558. Ewqasî bi hev ra xeber dan
Ewqasî li pêş hev şewitîn

1559. Ewqasî şekir bi yekve rijandin

Ewqasî lêvê hev mêtin

1560. Ewqasî şerab bi hev ra vexwarin

Ewqasî qeza ji nû eda kirin

1561. Çav û lêv û sîng û istû û mil

Sûret û çene û memik û bejê guh

1562. Yek bi yekî bi dil dixwastin

Carna paç dikirin carna gez dikirin

1563. Ew lêvê ziwa ji bo gihîştina hev tî ne

Bêhn dikirin wan gerdenê hev

1564. Zîna ku sûretê wê mîna şemdanekî ye

Pir şewq û şemal û nûr û rewneq

1565. Memê ku mîna perperokê ye di zahirê xu da

Beden û rûhê xu dida agir

1566. Carna geş dibû agirê evîn û hezkirinê

Îhtimam nedim ali cem Zîne

1567. Herdu di vî halê da kifş bûn ber çava

Bê çadira heremê û bê sitargeh

1568. Wan dît di bax da qesrek

Mîna neynika Cemşîd keşfa 'alemê dike

1569. Rabûn û çûne qesran

Rûniştin herdu delal

1570. Şikayeta terk û firaqê dikirin ji serî da
Teze dikirin riwayeta 'êşa 'eşqê

1571. Carna mîna 'ewra mehzûn digiriyân
Carna jî mîna bişkoy teze letîf in dikeniyân

1572. Her weqt qeza û sunnet dikirin
Ferza wisa ku paçkirinê îdî çi minnet

1573. Her çiqasî tekelluf rabûye
Lekîn wana xu muhafeze kiriye ji teserrufê

1574. Gerçi ba wan hêvî hebû jî
Ew zêde berjêr nediçûn

1575. Hezkirina delal ji hed zêdetir bû
Li ser hed lîstikan kemer hebû

1576. 'Eşqa ku gihîştîye heddê kemal ê
Ava ku derketîye ji kaniya zelal...

1577. Yê xu muhafeze bike qet'a
Tu necasetê qebûl nake

1578. Genctî û bihar û bax û mehbûb (hene)
'Eceba di dinê da metlûb çi maye?

1579. Xisusan heye 'eşqa zehf
Herdu terf ji bo 'eşqê tî ne

1580. Êdî çî bibêjim ez nizanim
Zimanê min jî nizane çî bibêje

**Vegeriyana Mîr û Mîrzan e Ji Şîkarê Serxweşiya Memî û Zîn e Bi Meya Dîdarê
Bêxemberiya Wan e Ji Bi Serdahatina Mîr Di Weqtê Êvarê**

1581. Ya ew kesê ku şerabê dide meriva, min bigre ez bêtaqet im
Bêvexwarina şerabê ez serxoş im

1582. Gava ku Memê û Zînê vexwar
Vebû li min cihê birînê

1583. Em ‘aşiq eger çi meyperest in
Ema ji şeraba (elest) mest in

1584. Ew şerab ne wekî şeraba te sor e
Belkî ew şerab ji cemala Xuda ye

1585. Ew hezkirina hebîb temîz zat e
Goşeyê baxçeyê sifât e

1586. Ya saqî bide min ji bo Xudê
Qedehek ji wê şeraba ku te duh digerland

1587. Her gulmekî ez jê te’ m bikim
Zewqek tenê bes e hettî paşiya ‘emr

1588. Ew kêfeke xalis e bêkem û kêf e
Sirreke bêxeyal û bêteyf e

1589. Ji bona ku def’ bikim serxoşbûna duh
Hişyar bibim ji xewa şîrîn

1590. Da mîna Memê nebit xafil
Mêrê ecel ‘ecele bê ser min

1591. Roja ‘umrê min diçe ava
Hê jî ji xefleta xu nebim xeberdar

1592. Ew Zîna ku hewesa qelbê ‘eşqê ye
Min daniye nava ‘ebayê xu

1593. Mîr hate li ser wî (li ser Memê) digel hinek ‘eskeran
Bi zurna û nefîr û kûs û mehterê

1594. Bilind bû dengê def û sazan
Çawûş deng û qîjeqîjan

1595. Piyê herdu xezal bi ‘eşqê hatine girêdan
Li cem hev sekinîbûn bi heyranî

1596. Qet nizanibûn ku ev çi reng e
Qet guh nedabûn ku ev çi deng e

1597. Mîr got: Vekin evan xezalan
Girênedin piyê wan rindan

1598. Temamê wana berdîn baxa wekî teyran
Da em wana temaşê bikin her roj

1599. Ew merivê ku xezal û kerê wehşî û kîvrîşk
Li ser milê xu û hemêzê xu rind girtibûn

1600. Ewana gişk anîn û bi wan bostan tijî kirin
Şivan mexel tijîkirine bi pez

1601. Mîr gote mezina û xewasa:

Hişyar bikin heval û nasa

1602. Da weku em herin di bax da qederekî rûnin

Lewra em ji westanê zeîf bûne

1603. Ewana hatin ber derê koşka bilind

Dîtin ku tamamî derî û bana vala ne

1604. Feqet derê piçûk vekirîne

Wekî qur'eya texteyê şans û miradan (yan jî: Mîna qur'eya texteyê damayê)

1605. Derhal kete qelbê wî (qelbê Mîr) xeyalek

Zanibû di vî emrî de hebû halek

1606. Mîrê biweqar û 'aqil û zana

Tacdîn û Bekir xu dane bin çeng

1607. Ewana Mîr anîne qesra ku Zîn û Memê tê da ne

Guh dane dengê aletê lehwê yê qalind û zirav

1608. Mîr hat bi ser da û dît Memê jar

Pala xu dayê balgîkî ji tay zêr hatiye çêkirinê

1609. (Mem) Kaş kiriye li ser xu 'ebayek

Weqtê êvarê ne mûm hey enî çirayek

1610. Mîr got eva kî ye di vî zemanî

Bê îzna min di vî mekanî

1611. Zînê ku bihîst dengê nas kir

Derhal xiste bin kincê

1612. Mem qet ji cihê xu ranebû û got:
Nêçîra te dil û cigerê min şewitand

1613. Mîrê min tu dizanî ez nexaş bûm
Hettî duh zehf bêhiş bûm

1614. Îro me bihîst ku temamê xelkê digel mîr
Gişk çûne nêçîrê bitevayî

1615. Sebra min nema di nav nivîna da
Rabûm digel van birîna

1616. Naçar ji xanî derketim
Nişkêva min xu li vî mekanî dît

1617. Mîr got: Li ser nexwaşa nîne qeyd (sûc)
Barî te di baxê da çi nêçir kiriye?

1618. (Memê) Got: Ez çi bibêjim tu bawer bike
Xudayê Tealî bi min ra bûye alîkar

1619. Min dît di vî baxê da xezalek
Ema ew ne xezale belkî delalek e

1620. Ew a xezaleka sipî bû çavê wê reş bûn
Biskê wê reş bîna wê xweş bû

1621. Her lehze ji kîsê miskê Tetarî
Sed bar ji guliyan dibarî

1622. Eger çola Xutenê tijî bibe misk

(Nabe wekî) tayekî çûnçika wê

1623. Her çiqas sipî û çav belek bû
Ema bi nisbet bal min ew melek bû

1624. Lewra weqta ku tu hatî ew veşartî bû
Lê weqta ku tu nehatibûyî ew eşkere bû

1625. Tacdîn ji xeberdana wî zanî
Zîn hatiye ba Memê bi dizî

1626. Got: Guh Medine Memê lewra ew dîn e
Malxwoliyê ketiye 'aqlê wî qet tunîne

1627. Î'raz kirin ji wê kelamî
Eşraf hemî top bûn bi tamamî

1628. Xwestin şerabdêr û şerab û mûm
Dîwaneka hakimane girêdan

**Rabûna Tacdîn Ji Dîwanê Di Wê Demê Da Sohtina Mal û Mulkan e Di Rêya
Memeê Da**

1629. Tacdîn dît ku meclis tijî ye (yan jî: Bêfayde ye)
Zewq û sefa û heyat xweş têda pir e

1630. Mem zêde mehzûn e ‘aciz e
Tacdîn çû ba Memê got: Bira hal çî ye?

1631. Lekîn bi îşaret û bi lexez
Pirsî û Memê bi remz û îma

1632. Destê xu ji huçikê ‘ebayê derxist
Kaşkir û ‘ecêbeka giran eşkere kir

1633. Tacdîn dît keziyê ji miskê Tatarî
Mîna du me’rê di serê wan da morî heye

1634. Hatine pêçandinê di paşla Memê da
Mem mabû di heybet û xemê da

1635. Tacdîn zanî ku hal pir xerab e
Rabû bi lez çû malê

1636. Nageh bi hêrs ku çû ji derî da
Sitiyê zanî û pêra xeberda

1637. (Sitiyê) Got: Te çî hal e ey pehlewan?
Ew çî ‘ecele ye, dujminê te kî ye?

1638. (Tacdîn) Gotê: Rabe Sitî ku min dereng e
Îro herba min bi vî malê ra heye

1639. Zarê xu xelas ke, mal yê here
Mal ji bo min e û ji bo te jî zarok e

1640. Sermayeya 'emr û heyatê
Ye'nî Mem û Zîn bi dilgiranî

1641. Mane di tehlikaya belayê da
Qesda min ew e ku ez xelas bikim

1642. Xelq dadmirîne agir bi avê
Ez ê avê damirînim bi agir

1643. (Tacdîn) Mala xu wekî qewmê Zerdeşt
Da agir û gaziya xu bilind kir

1644. Weqta ku agir girte xan û manan
Wî dest bi gazî û fixana kir

1645. Qewm û qebîle û 'eşîret
Hemî lez kirin ji bo damirandina agir

1646. Weqta ku agah bûn Emîr û xûlam
Xalîkirin ew qesr û bostan

1647. Ewana jê revîne bal wî hewarî
Wî muttehemî (Mem) wiha gote yarê (Zîn):

1648. Te dît Tacdîn çi reng xebitî?
Mûsî li me behra behra xemê ziwa kir

1649. Rabe û here qesra heremê

Da ku ez jî herim bal agir û dengê hewarê

1650. Zîn rabûye çûye xelweta xas

Li Tacdîn nema kinc û nivîn

1651. Eşya û ferş û defîne

Melek û cewher û xezîne

1652. Temam di riya birayê da şewitand

Lewra navê wî ye qencî tê gotinê

1653. Hez neke malê ya merivê qenc

Hezkirina wî meriva dike nav xerab

1654. Zinhar nebe harisê malê

Lewra waris yê ji destê te bibin

1655. Topkirina mal ji bo te barekî zehmet e

Terka wê ji bo te agirê hesretê ye

1656. Roja tu herî hizûra Xuda

Destê te ji xezîne û mala rût dibe

1657. Ev cennet e û ev kincê hevdîtinê ye

Ey muflisê ku axretê dikire

1658. Kengî ji te ra muyesser dibin?

Yê ji te ra bibêjin: Ey muflis derkeve here der

1659. Ev cîhan jî mîna cîhana faniyê ye

Bêheq parçeyek nan nadine te

1660. Malê xu belaş nede warisa
Eger tu dixwazî rahetiya rûh

1661. Warisan ji te ra bazara kefen
Hê nekirine, hisseyan pardikin

1662. Hê ku tu di heyatê da yî mal serf bike
Temamê wê bide di riya xêrê da

1663. Yan jî serf bike mîna Tacdîn
Bi wî navekî îdî ji xu ra bistîne

1664. Yan jî bigere dostekî qenc
Ew çêtir e ji bo te ra ji sed xezîna

**Agahiya Mîr e Li ‘Îşqebazî û Yariya Mem û Zînan Bi Îfşa û Îlqaya Neyaran û
Muzebzebînan**

1665. Padişahê welayeta hezkirinê
Sersiwarê eyaleta evînê

1666. Gava ku ji cihê ‘ezletê
Kifş bike li ser textê dilê rûniştinê

1667. Kengî qebûl dike perda
Hettî bayraqa xu veneke

1668. Mînanê padişahê stêrka
Di feleka çara da rewneq dide (ye’nî roj)

1669. Ji ew çend tebeqeyê asmanî
Ji ew çend mesafe û mekanî

1670. Ji ew çend ‘însûr û ‘ewra
Ji ew çend mane’ û perda

1671. Lazim e eşkere bibe her roj
Elbette rewneqî bide ‘alemê

1672. Ev padişahê ku navê wî ‘eşq e
Nisbeta wî bal rojê tamam e

1673. Ew jî qe venaşêre tu caran
Naçar diqelişîne perdan

1674. Ew sirra di qelbê Memê û Zînê da
Saza ku di ber perdeya hezkirinê da

1675. Weqta ku negihîstibû wa zemana
Nedîbû qet zirar û ziyar ji bo xuya ra

1676. Mizrabê (qirşsazî) zemanê xelqê pîs
Bêperde li meqaman dixê

1677. Zîna ku bêguneh e û Memê ku bêsûc e
Xeberdane pê mezin û biçûk a

1678. Zengil bi wasita deva gihişte zengila (hate girêdan zengil bi gihanê
deva ku gihanê zengilkirî)
Sertiliyan mîna tiliyê badayî (bi dengê bilind xeber eşkere kirin)

1679. ‘Aşiq mehzûn û aciz bûn
Xelq jî tî bûn ji bo hezretî Hisên şehîdê Kerbelayê

1680. Meclis bideng û meqama saza bûn
Tijî bû bi ‘eşqa Memê û Zînê

1681. Barê li deveya ne bes bû
Merivê fesad jî di merteba zengilê bûn

1682. Ye’nî xebara herdu dostan
Nemama û hesûdî û hîlekar a

1683. Ewqasî di meclîsê da gerandin
Ewqasî gihandin bal virrekan

1684. Hettî ew Bekir wekî şeytan
Xûyê xerez û xebîs û fesad

1685. Ew jî ji wî halê bû xeberdar
Rabû ji cihê xu ew xûyê xerez û kîndar

1686. (Bekir) Bi tenê xu gihande xelweta Mîr
El hasil ew mes'ele jê ra beyan kir

1687. Bi çavê sorî hate Mîr hate xîretê
Kete behra fikr û heyretê

1688. Pirskir ji ew î xebîsê hîlekar
Go: Ev xebera xilafa şerefê ye

1689. Em çawa heqîqetê eşker bikin
Serbendê tuhmetê beyan bikin

1690. (Bekir) Got (Mîr): Tu emr bike bila gazî Memê bikin
Hûn herdu li di cihekî tenha da ku rûnin

1691. Rind bizanibe Memê 'aşîqekî sadîq e
Bi hev ra setrenc bilîzin

1692. Şertê xu ji wî dilxwazê bixwaze
Yê heqîqeta sirrekî keşf bibe

1693. Gava ku te zora wî bir
(Jê ra) Bêje: Rast bêje metlûba te kê ye?

1694. Mem sîyar e, qehreman e, şecî'e, sîng saf e
Ba'l xisûs te ra ku bêxilaf e

1695. Hezkirina di dilê xu da înkâr nake
Yê sirra xu ji bo te îqrar bike

1696. Di vî hezkinê da pê kutaye êrdê
Yê bêje ez 'aşiqê Zînê me

1697. Paşê tu yî xûyê 'aqil û ferasetê
Laiqê wî bibîne çî ye sîyaset

1698. Hakim ji cinsê şahê me'ra nin
Xûyê je'r û şefqetê ne (yan jî xûyê mohra ne)

1699. Mohra ku didin tu bizanibe ku ew je'r e
Şefqeta ku ew bikin bizanibe ew qehr e

1700. Merivê 'aqil ji me'ra dûr diçe
Merivê xafil jî dibine dostê yaran

1701. Her çend tu li nik (hakiman) 'ezîz û delal bî
Herçend digel wan bilîzî û bibezi

1702. Eger ewana ji te bibînin qedrek tebdilî
Bi temamî ji te 'îraz dikin

1703. Ba'l xisûs ku hebin ji merivê pîs û şeytan
Bêexlaq û bexilê xelqê bin

1704. Muheqqeq ewana xerabtirin ji şetîn
Ya Reb wana nêzîkî sultan neke

Setrenbaziya Memî û Mîr e Bi Şertê Dilxwaz Vedana Damê Tezwîr e Ji Bo Keşfê

Raz

1705. Reîsê cema'eta stêrka

Serdarê stêrkê ku ji meşerqê derdikevin û mexribê da diçin ava (roj)

1706. Padişahê textê feleka çar a

Weqta ku derkeve ji şerqê

1707. Setrenca hîvê û 'eskerê stêrkan

Temam li ser nivîna kesk

1708. Şah mat kirin bi piyadeyê nûr

Te zendikir ku hemî di nava tora nûrê da winda bûne

1709. Mîrê ku bi sebeba xîretê dilê meraqdar

Şêrê ku ji bo hemiyetê birîndar

1710. Hettî weqta sibehê xew nekete çavan

Nedisekinî mîna avan

1711. Roj ku ji meşriqê nûr eşkere kir

Etrafê 'erdê dûr kir ji tarîbûnê

1712. Mîr rabû û hate qesrê

Ku nêzîkê qesra delalê ye (Zîn)

1713. Mîr rûnişt wiha gote xulaman:

Hûn gazî bikin heval û dostan

1714. Tenha ji bo me ra Memê bixwazin

Tacdîn û biran nexwazin

1715. Îro ez ê li Memê xezeb bikim
Sûcekî wî heye ez ê wî edeb bikim

1716. Nabe ku (hûn) ji min xafil bimînin
Bi tamamî zû bibin metî' emrê min

1717. Paşê (Mîr) şande bal Memê û gazî kir
(Xulama) Hazir kiribûn gulav û gulqend

1718. Ewqasî şerab û qend û şekir
Ewqasî ava gulê û misk û 'enber

1719. Anîne û meclisê da gerand
Gihîştine kêf û zewqa xu ser bi ser

1720. Pey behs û xeberdanê
Hate raxistinê textê şetrenc û nerdê

1721. Mîr gote Memê bi kîn û kerb:
Îro me ra digel te heye ceng û herb

1722. Rabe were pêşiya min
Bêşek ez ê bi te ra mucadele bikim

1723. Şertê min digel te ey serbilind
Her çi te dixwast yê bibe ji bo me dilxwaz

1724. Lekîn di nav kurê Mîr da hebû ciwanek
Hezkiriyê zemanê kubarek e

1725. Hezretî Yûsif ji rindaîya wî mehbûbî

Ristemê Zal ji şeca'eta wî mexlub be

1726. Hemsihbet û hevalê Memê bû
Di hemşahî û hemxemê Memê bû

1727. Reîsê kuran bi navê Gurgîn
Derhal xeber gihande bal Tacdîn

1728. Ew (Tacdîn) jihatî ku bi wî halê hesiya
Digel wî rabûn Çeko û 'Arif (herdu birayê wî)

1729. Wan şêran qeyd û zincîr qetandîn
Hersê bi tevayî çûne cem Mîr

1730. Tacdîn digel herdu biran hat
Her kevirê tewleyê ji bo Memê duşêş hat

1731. Fîl û rex û gergedan ku hatin
Dîtin ku Mîr û seydayê wî (ku Bekir e) mat in

1732. Zanîn ku Memê mahir e di lîstikê da
Mîr ji Memê ra got: (Em) Du destê teze (bilîzin)

1733. (Mem) Sê dest ji Mîr birin bi tamamî
(Bekir) Mufsid nihêrî ji wî meqamî

1734. Dît ku Zîn di pencerê da xuyaye
Rojeke li Memê dinêre

1735. Binêre ew ê xêrnexwaz çi hîle rakir
Evrenge çi bihane eda kir

1736. Got: Bend û lîstik û cî bi dor in
Hûn herdu ciyan bi hev bigurin

1737. Mêmê vê carê yê mexlûb bibe
Metlûbê te yê hasil bibe

1738. Mîr rabû çû cihê Memê jar
Mem jî hate cihê ku li pêşiya wî hebû mehbûb

1739. Çavê Memê dît rûyê Zînê
Fîl û ferzîn bêsebeb ji dest da

1740. Dilê wî maye li pencerê
Hespê xu dida li cihê peyaka

1741. Mîr bir ji Memê şeş dest
Mem ji wî şeraba li pêşiya xu (Zîn) serxoş bû

1742. Mîr gote Mem: Min qezenc kir dilxwaz
Wî (Memê) go: Bibêje çî ye daxwaza te?

1743. Mîr got: Xereza me ne kesba mal e
Meqsûda me ji te kişfa hal e

1744. Teleba me ji bend û lîstika
Qet nîne ji xeyrî kişfê sirran e

1745. Mîr got: Şertê min ew e ku tu îqrar bikî
Kanî di dinyayê da mehbûba te kî ye?

1746. Herçi periya ku dil li bal e
Horîsifet e yan melekmisal e?

1747. Eger ew î laîqê te bibînim

Ez ê bidim mal û ji bo te bînim

1748. Xûyê xerezê (Bekir) di weqtê firsetê da te'n kir û ji bo def'a
tuhmetê ji nefsa

1749. Bekir got: Ewa ku Memê jê hezdike

Qîzika 'Ereban e, lêv deqandiye

1750. Ji serî hettî piya reş e wekî qîrê ye

Ne laîqê behs û xwestina Mîr e

1751. Ev te'na di Memê da wiha eser kir

Yek car ji 'aqlê bê xeber kir

1752. Behra dilê perdekirî hate coşê

Mecbûrî gazî û qîrînî kir

1753. (Mem) Got: Ne wekî gotina wî ye (Bekir)

Mîrê min ew periya dilê min şewitandiye

1754. Ji nesla padişahan e, dîwana şaha mekanê wê ye

Teyrê 'Enqa ye û bilind e hêlîna wê

1755. Mîrane, ji nesleka pak e

Nûraniye, ne ji avê ye ne ji xûliyê ye

1756. Lîdera horî û nazenîna ne

Her çend melek e, bi navê wê Zîn e

1757. Weqta ku Mîr ew xebera xilafê heybetê

Gava ku bihîst hate xîretê

1758. Gote cema'eta xulama ra:

Hûn çima gelî nankora?

1759. Vî heqîrê bi zillet nagirin

Da weku ez wî ji bo 'îbretê bikujim

1760. Rabûn dused şêr bal Memê

Mem jî rabû piya di dest da xencer

1761. Tacdîn û Çeko digel birayê ('Arif)

Rabûn bi te'essub û bi hev ra

1762. Gotin gelî 'eskera bisekinin

Hûn ne serxoş in, ne mest in

1763. Hûn qenc dizanin em kê ne?

Xûyê huner in û pehlewan in

1764. Pênsed kesî we hicûm bikin bi kerba

Em nadine we firseta derba

1765. Gerçî 'ecelê we ji destê me nîne

Ema we gelek (tişt) ji destê me dîtine

1766. Hetta ku hûn Memê bikin esîr

Sêsed ji we dê bibin birîndar

1767. Hetta me hersêyan hûn parçe parçe nekin

Hûn ê çawa li Memê binêrin?

1768. Herçi hakimê me emir ke
Em nabine mani'ê tu hukmê wî

1769. Destê me li ber Mîr girêdayî ye
Eva ûstî ye û bi dest e û pê ye û zincîr e

1770. Mîr rabû dest û pê Memê girêda
Tacdîn mrina xu wî weqtî xwast

1771. Ema çi bike ji bo wî 'ar nîne
Cellad emîr e hem hakim e

1772. (Emîr) Mem girt şande bal serheng
Go: Wî hebs bikin di qulika teng da

1773. Hilgirtin Memê û birine pêşiya muhafizê qul'eyê
Hebs kirin di vî qulika tarî

1774. Ehlê dîwan û meclisê zivirîn
Gişk ji bo Memê mehzûn bûn

1775. Ewana mîna cuniya bi ah û feryad
Temamê wan ji bo Memê hewar kirin

**Xulûsiyyet û Xilusiyyeta Memî ye Di Xelweta Zîndanê Da Ji Sifatêd Heywanî
Muşarik û Muşakeleta Wî ye Bi Exlaqêd Rûhanî**

1776. Hezkirina felekê ji ezel da tune
Kîna felekê ebedî û qedîm e

1777. Çi tiştê ku (felek) ewî ji ‘erdê rake
Muheqqeq yê wiya dayne ‘erdê jî

1778. Ji xu ra bilindayê eşkere dixaze
Ema ji me ra jî bi dizî nizmahiyê dixwaze

1779. Çima tu nabînî her roj ku rojê
Davêje şikefta xuliyê

1780. Xisûsa ku digel taîfa ‘aşîqa
(Felek) Hem xaîn e hem xwar e hem minafiq e

1781. Bêşek dilê me ‘aşîqa
Ewwel dibe bi delalî û naza

1782. Axir dike melûl û bêhêvî
Mîna Memê yê zelîl di hebsê da

1783. Davêje hebsê bi mehrumî
Paşîya paşîn dixê gorê

1784. Ew bextê reşê ku leqeba wî Memê ye
Bê dost û bê heval e, bê hogir

1785. Bi zillet avîtine çe’lekî
Mîna goreka teng û tarî

1786. Mekrûh e wekî devê ejderha
Ne meqbûl e wekî Munker û Nekîr

1787. Mem di wî da rûnişt wekî 'ebda
Zindan li wî bûye çilexane

1788. Ew ciya li wî bûye Bîra Nexşebî
Ew hîv geryaye hîva yek şevî

1789. Weqta ku sofî gihîşte kuncê tenêbûnê
Şêxtiya wî giha meqam û wehdetê

1790. Geh mîna 'aşîqa ne bi dilxwaz
Geh mîna 'ebda ne bi daxwaz

1791. Her lehze digel kela girînê
Wiha ew î digote Zînê:

1792. Ya ew a ku herareta tebî'eyê ye
Îro tu 'ezîz î di Misra dilê da

1793. Sed car her roj qelbê mehzûn
Te parçekir kirasê sebra min

1794. Çi dibe car car wekî Zuleyxayê
Pirsa min bikî ey şekirxwar?

1795. Tu Leyla yî ez ji bo te Mecnûn im
Ji bona te hêsirê xûnê dibarînim

1796. Ez Ferhad im tu ji bo min Şîrîn î

Sêlavê hêsira bûye çemê şîrîn

1797. Gerçî dinya li min bûye zindan
Çunkî îro ez tenê musulman im

1798. Lewra ji devê pêxemberê Mursel
Hatiye ev xebera sehîh û mursel

1799. Dinya cinmeta kafiran e
Ji bo mu'mîna şûna belayê ye

1800. Her çend ez zaf muşewweş im
Ew çend bi muşewweşê ez xweş im

1801. Sed salî tu min bigirî di hebsê da
Gelo ez ji weslê qet dibim bêumîd?

1802. Ezsond dixwim bi sûreyê Nûr
Bi rûyê ku ew e kitabê mestur

1803. Deh cara bi heqqê qametê
Çil carî jî bi heqqê çuncik û xalê

1804. Tehqîq bi roja sûretî
Tesdaq bi hîva dîtîne

1805. Te'kîd bi qiblegahê bijangê
Te'zîm bi secdegahê çuncikê

1806. Sed car sond bi herdu nûnan
'Ehda min ew e digel çavan

1807. Hetta qederek hebe ji rûh
Ya dost tu di rûh da veşartî yî

1808. Bi qasî ku ji dûr ketinê bê qîrar im
Ewqas ji te hêvîdar im

1809. Her çiqasî Mîr li min xezeb kir
Ev qehra ne bêsebeb li min kir

1810. Her çiqasî ku guh da xebera Bekir
Ev xeber li min ew î bi cih kir

1811. Lewra ku tu şah î ez geda bûm
Ez ji bo te ne hemkuf û ne laîqê gihîştinê bûm

1812. Tu roja cemalê yî hîva ne'tikê yî
Ev qas tu letîf î, nazik î

1813. Ez heqîr im, zêflî im, bê'itibar im
Ev renga zêfî im, dil birînim

1814. Ez perperok im, min cendek daye agir
Ez şewitî me bi batin û zahîr

1815. Qelb lûle pir e, tu roj î
Cesed mîna kitan e û tu hîv î

1816. Eger beden birize weya parçe parçe bibe
Eger dil bixerîqe di behra xema da

1817. Heqê min e ewa 'edalet e zulm nîne
Xassiyeta agirê hezkirin e (ya'nî hezkirin mîna agirê cehennemê ye)

1818. Ev çe'la eger çi zêde kûr e

Ema ji 'edaletê ne dûr e

1819. Ez sofi me di cihê 'îbadetê da rûniştîme

Xweş talib nûra rûyê Zînê me

1820. Xûlase çêbû meqam (mûtû/bimrin)

Bisebeb (qabl en temûtû/ beriya ku hûn bimrin)

1821. Temîzkirina nefsê mukemmel bû

Safikirina qelbê hasil bû

1822. Neynika rûh pak bû

Nefs û dil û can bi hev ra temîz bûn

1823. Ew mu'tekifê ku di binê çalê da

Hêja negihîştîye dewra salê

1824. Belkî ne çil û ne erbe'înek

Zenna di dilê wî bû yeqînek

1825. Nûr hazir bû di qelbê da

Sirr li ber wî kişf bûn

1826. Neynika dil safî bû

Sûret bidil bû bi me'nayê

1827. Ew heykelê metleba mecazî

Bûye cihê listikê ji bo zarokê 'eşqê

1828. ev mumkin ji kaînata seraser

Ji bo wî (Memê) bûne cihê nezerê

1829. Ev dar û meywa û rûhber û însan
Ev me'den û çêre û heywan

1830. Her çi tiştê ku wî (Memê) bi dil lê nezer kir
Her çi tiştê bi xeyalê li ser ra derbaz kir

1831. Her yek ji bo wî Zînek têda eşkere dibû
Didît her tiştî da yeqînek

1832. Goya bi xu ew di resedxaneyekî rûniştî bû
Ew çal ji bo wî dûrbîn bû

**Me'yûsiya Zînê ye Bi Sebebê Mehbûsiya Memê Me'nûsiya Wê ye Bi Xem û Derd û
Elemê**

1833. Zîna ku bisebebê derdê hicranê mehzûn
Bêsebr û bêsikûn, bêqîrar û bêtemkîn

1834. Weqta ku wiha Mem di hebsê da nebû
Hêj ji gîhiştinê bêhêvî nedibû

1835. Gava ku wiha Memê gîhişte bal çalê
Umîd nema ji bo gîhiştinê

1836. Seyrangah û qesr û eywan
Lê bûne hisar û hebs û zindan

1837. Wiha qasî şerbet û te'am hebûn
Her wekî tamam li ser wê heram bûn

1838. Rûh nedikir tu xew û rahet
Cismê wê nedikir tu sebr û tehemmul

1839. Wisa zeîf û jar bibû
Her wekî cism têla zirava mû bû

1840. Ew mû kete rengê ze'feranî
Bû mîna rengê rûyê Ehmedê Xanî

1841. Şevê hetta seherê seherê hetta şevê
Vala nedibû ji zikra (Ya Reb)

1842. Her lehze digote feleka ku dizivire:
Ey zalimê bêîman û xûnxwar

1843. Digel te qesd û xereza min nîne

‘Eceba ev çi kîna te ye digel min?

1844. Dewrek te nekir carekî ji bo min

Meger te Mem ji bo min pir dît

1845. Te nûrek di rûyê mi da peyda kir

Te bi wî şewitand reşka qelbê Memê

1846. Te şewqek di rûyê Memê da hilkir

Qelbê min bi wî te şewitand û kûl kir

1847. ‘Eceba te di min da çi meslehet dît

Te nîşanî min kir yekî jîhatî?

1848. Ewwel te çawa ji mi ra kifş kir

Paşê te çima li min veşart?

1849. Şewitandin te bi agirê firaqê

Kuştin te bi derdê îştîyaqê

1850. ‘Alem hemî pêkve şad û kêfxweş in

Te daye min û Memê şîn

1851. Derdê xu ji me ra bibêje

Je’ra dilê xu da birêje

1852. Yûsif te li min şande çalê

Te ez hiştim di vî mala xerab da

1853. Mîna Ye’qûb mehzûn û bi nalîn

Te sebra dil û can te bir bi talan

1854. Ez mame her wekî Zuleyxayê
Bê Yûsif û bê mirad û bê mekan

1855. Carna şikayet dikir ji bo Memê jar
(Digotê:) Ey Yûsifê bêguneh û esîr

1856. Tefekkur neke ku ez rahet im
Zen neke ku ez bi taqet im

1857. Welleh sond dixwim bi Xudê
Di roja sipî û şevê tarî

1858. Nîne ji bo me ra xew û xwarin
Îlla ku herdu çav xûnê dirêjin

1859. Hişyarbûne sen'etê herdu çavan
Xûnxwariye xarina hinavan

1860. Ey qibleyê qelb bi dilxwaz
Ey Ke'beyê rûh bi Ke'ba Xuda

1861. Her lehze ji destê firqeta te
Her weqt ji derdê hesreta te

1862. Sed car ah û dused car nalan û fixan
Bê ixtiyara min tîne ji nêv dil û rûh

1863. Evrenge halê min bi şev û roj
Halê te çawa ne ey kesê ku rewneqê dide qelbê

1864. Zindaniyê min kî ye hevalê te?
Sewdaserê min kî ye dostê te?

1865. Ey dil tu ji qelbê min derkeve
Ey can tu bi dilê min ra hevaltiyê bike

1866. Hûn herdu herin Memê bibînin
Xeberekî ji bo min bînin

1867. Ey dil tu ku lê dikî selamê
Zû bîne ji me ra cewabê

1868. Gelo di çi halê da ye ew esîr?
Weya di çi xeyalî da ew dilê birîndar?

1869. Gelo ew ji me razî yan bihêrs e?
Baxê wî bihar e yan payîzd e?

1870. Ew reng xweş e û letîf e wekî sorgulê?
Yan jar û zeîf e wekî bilbilê

1871. Qesr li me bûye xaniyê muşeqqetê
Zindan bi min bûye baxê cînnetê

1872. Xweziya Mîr li min xezeb bikira
Wekî Memê bi qeyd û zincîra

1873. Ez jî bişandima wê çalê
Rojek tenê ji salê li derê min bixista

1874. Carek bidîta min ew esîr
Min derman bikira ew birîndara.

1875. 'Emrê min e ger çî yek remeq bû

Birastî heq bû mirin ji bo me ra ('ebareta M. Bozarlan: Wîlo ku pir hindik bûya ji êmrê min birastî di heq bibûya mirin ji bo min). Ah.

**Tehewwura Tacdîn e Ji Xîreta Birayî Meşwereta Digel Biran e Li Xilasîya
Bênewayî**

1876. Eczayê kitaba ‘eşqê
Mucelledê kitaba ‘eşqa mecazê

1877. Şîrêz û cuz û bend û terkîb
Wiha kirine bi nezm û tertîb

1878. Go Zîn û Memê ku di nazyê da hatine xûyîkirin
Gava vebû li wan derd

1879. Ew derd wiha bûne behra agir
Ew agirê xemê wisa bûye serkeş û ‘inadkar

1880. Ew xelqê ku hebû ji wan ra eserek ji ‘eşqê
Wî agirê li wan te’sîr kir

1881. Nexwaşbûn hemî bi derdan
Yek car derketin ji ber perdan

1882. Xisûsa ku hevalê wanê berê
Hem herdu hevalê wnnê ku Sitî û Tacdîn in

1883. Derdê teze li wan peyda bûn
Îdî ji wan nedihat xeberdan

1884. Her çend ku ew ji van qetiya bûn
Dîsa bi wî derdî mubtela bûn

1885. Derdê Sitîyê xeyala Zînê bû
Tacdîn ji xema Memê dîn bû

1886. Her lehze digel biran di şerê da bû
Qesda dilê wî ev xeber bû:

1887. Rabe bi xezeb here pêşiya Mîr
Da bixaze Memê bi teqşîr

1888. Carekî here Memê rica bike
Bo sûc û gunehê Memê teleba şefa'etê bike

1889. Da weku Mîr ji we ra birayê berde
Yan jî ev ser û mal yê têda here

1890. 'Arif wiha gote Ristemê Zal (Tacdîn)
Ev emr bi min bê xeberdan nabe

1891. Bê cidal û bê herb û bê cura'et
Qet tesewwur nekin vî şuxulî

1892. Ev herb bi dîwanê nabe
Em mane û sibê meydana herbê maye

1893. Ya qenc ew e em sibê siwar bin
Hersê bi silah û kar û bar bin

1894. Çarane û zirxa li xu kin
Zendane û mixfera bidine ser xu

1895. Gurzan bihejînin, bi rima bileyîzin
Wiha Memê ji Mîr bixwazin

1896. Yan jî bi zorê Memê berdin

Weya tamamî bi mêranî serê xu bi der din

1897. Eger Mîr bi vî rengî Memê xelas kir
Ew î derdê dilê me derman kir

1898. Eger ew î li ser 'inadê ma û israr kir
Em ê bi vî rengî cihad bikin

1899. Ewwel ve em ê herin Bekir parçe parçe bikin
Wî xaîn û bêbextî der bi der kin

1900. Bila dujmintayî qenc ser bi ser be. (Perwîz Cîhanî: Lewra li ber her derîkî gurek bibe dergevan ew dujmin e lazim e ew kuta bibe û nemîne)

1901. Eger Mîr ji wî (Bekir) ra te'essub bike
Ew rabe li me xalibtî bike

1902. Aşê ecelê em ê wisa bigêrin
Mîna heba serê însana bihêrin

1903. Bila ehlê Botan bike reqs û govend
Hetta bêne temaşeyê rindikê devken

1904. Gava ku em dest bavêjine herba
Bila mehbûb werin temaşa derba

1905. Her lehze bibêjin ew jinê bedew:
Gelî genca destê we nerizin

1906. Hinek bigirîn hinek medh bikin
Hinek bikenin, hinek du'a bikin

1907. Jinê rind bila nezer bikin ji qel'a
Morî û mircan derkevin ji qutiyan

1908. Qîzê padişah ji pencerê binêrin
Gulberî kirasê xu biqelişînin (yan jî: Şehzade kirasê xu yê gulgulî parçe
bikin).

1909. Her weqt em bibihên ji nazenînan
Sed medh û hezar aferînan

1910. Tacdîn guh da xebera birayê
Muhkem di dilê xu da bi cih kir

**Te'essub û Tedarika Tacdîn û Biran e Bi Emrê Xîretê Siwariya Wan e Li Hespê
Hemîyyetê**

1911. Serê sibehê ku şahsiwara (ku tav) hespê sipî (ku weqtê rojê ye)
Kîşande cihê hespê belek (ku şewq e)

1912. Hespê reş (ku şev e) veşart di tewlê da
Zîn teze li hespê sipî kir

1913. Gurzê xu yê agir deranî
Şûrê xu yê zerin derarî

1914. Dunya ji heybeta xu zer kir
Serî û kembera çiya parçe parçe kir

1915. Tacdîn û biran ji xelqê nêzîk
Xwestin bi dilê xu helalî

1916. Kîşandine ber derî bi reqs û lîstik
Bi hespê 'Erebî û çargavî

1917. Zengî kirin hesp weqta xefletê
Hişyar kirin dujmin bi hicum kirinê

1918. Wan hespa meydan kur kolan simê xu
Qey te digo dujmin ra gor vedidan

1919. Tacdîn ji cema'eta xu yekî pîr
Te'yîn kir û zû şande Bal Mîr

1920. Got: Here bêje Mîr û axan
Merivê 'aqil danamirînin çira (yan jî nakujin xulama)

1921. Mîrê me eger çi zana û 'aql e
Îro di çavê wî da nûr nîne

1922. Em çar birayê Sadiq hebûn
Herçar 'aşiqê xitmeta wî bûn

1923. Gelo însaf e ji salekî zêdetir e
Memê maye bêxuyî di çalê da?

1924. Dujmin li me şad dibin dost jî mehzûn in
Mirina Çeko û Tacdîn ferz e

1925. Mem ger çi pir zêde gunehkar e
Feqet 'aşiq e, 'eşq jî padişah e

1926. Tu hukmê meke li padişahan
Zilmê meke li bêgunehan

1927. Em hêvî dikin Memê xelas ke
Derdê di dilê Memê derman ke

1928. Em çar bira ne çar dîwar
Em herçar rikin se'adeta wî ne

1929. Serê me herçara wekî topa
Gopalê îradeya wî kaşoyê golfê ye

1930. Ya Mîrê ji me ra sulhê çêke
Yan jî yê ji me ra Bekir bişîne

1931. Da weku em xeberan jêra bibêjin

Derdê xu li wî birêjin

1932. Rûmeta me nema li cem xelqê
Em ê bar bikin û biçine memleketê Şamê

**Tedbîra Bekir e Ji Bo Def'a Mezenne' û Înadê Tezwîra Wî ye Ji Tirsa Fitne û
Fesadê**

1933. Qasidê teqrîr temam kir
Hasid bi halê hesiya

1934. (Bekir) Zanî ku ji bo wî ra xerab e
Got: 'Efû a Memê rast e

1935. Mîrê min çima min ji ewwel va negote te?
Tacdîn û biran ji xu neêşîne

1936. Zînê bide wan yan jî min bikuje
Yan ew î ji te ra bibin xesm û dujmin

1937. Ya qenc ew e ku qet nekî xeberdan
Tacdîn zena ne baş ji te nake

1938. Bêje (ji qasidê ra) me Mem û Zîn feda kir
Zewicandin û me dane Tacdîn

1939. Eşkere meke tu vê 'înadê
Carekî bikuje agirê fesadî

1940. Paşê tu ji destê xu neke fîrsetê
Zinhar neden eman û muhletê

1941. Dujminê ku tu nikarî bibî muqabil
Derman çî ye? Şerbeta je'rê ye

1942. Lewra lazim e ji bo hakima du fincan
Yek ji bo xerban yek jî ji bo qencan

1943. Da weku yek ji bo wî nexwaşa pak bike
Ya dî xwaşan ji bo wî nexwaş bike

1944. Yek rûh ji dujminan bibe
Ya dî miriyan teze sax ke

1945. Kerba xu eşkere meke
Ya qenc ew e em mudaratê bikin

1946. Hinek tişt hene ew bi kerbê nabin
Lewra bi zor û lêxistinê nabin

1947. Miharetiyê dixwaze û te' emmulê
Veşartinê û texaful û tehemmulê

1948. Ewqatê zemanê rengareng in
Xuda ew ji me ra kirine nimûne

1949. Ye'nî (ew ewqatê zemanê) şev û roj, sibe û êvar in
Hinek rohnî ne hinek ji wan tarî ne

1950. Em jî di şev û roja da
Da weku bèn bi dizî û eşkere

1951. Hineka eşkere dikan hineka jî vedişêrin
Hineka radikin û hineka jî telef dikan

1952. Wî (Bekir) virekî şûr wisa av da
Şûrê Misirê ji xu ra wisa tûj kir.

1953. Şîret û şaşî û nerastî û vir

Bend û şaşî û torbe û kalan

1954. Çêkirin zehf virê ewqasî pîs
Bi wan şûr xemiland mîna tersî'ê

1955. Ew şûr danî binê serê xu
Wisa veşart ku kesî nizanibû

1956. Mîrê ku dilê wî bi kerbê şewitiye
Her çi tiştê ku Bekir jêra gotiye

1957. Bawer kiriye (Mîr) gote merivê qasid:
Ey pîr, neke fikra fasid

1958. Eger temamî ferza derbaz bikim
Tacdîn çawa bi destê xu erzan bidim

1959. Qewet û selteneta min bi wî ye
Şan û şuhreta min ji wî ye

1960. Ev nav û nîşan û ev meqam
Bê riza wî li min heram e

1961. Ew Ristemê Gêw e pehlewan e
Ez xezîne me ew ejdeha ye

1962. Bêjê (ya qasid) bi dilê xu min Mem û Zîn
Herdu bi halalî dane Tacdîn

1963. Bi çi sebebî tu ji min dûr disekinî
Ka te ji min xwest ku min jî neda?

1964. Tacdîn û Çeko 'ezîz û delal in
Her tişt yê bibe wekî xwastina wan

1965. Qasid ji cem Mîr çû,
Temam xebera bi şiklekî baş qise kir

1966. Şêrê ku ji şer ra amade bûn wisa sernerm bûn
Gotin: Bila zemanê Mîr û dewleta wî daîm bibin.

Nesîheta Sahibxerezê Pirmerezî Digel Dilê Kul Ji Bo Mîrê Bêtemîzê Sadedil

1967. Êvarê ku asman menqel (istêrk) danîn
Meş'ele (roj) li wan veşart

1968. Ye'nî damirand çirayê rengê zer
Teze wergirt kincê rengîn

1969. Mîrê ku daîmî şad û bextewar e
Te digo li xu kiriye kincê şînê

1970. Ew hîlekarê rûreş û mel'ûn
Gava ewî dît Emîrê mehzûn.

1971. (Bekir) Go: Xemê mexwe ey çiraya dewletê
Eger 'emir bide me muhletê

1972. Eger tu vî kerb û elemê bixwazî
Zînê û Memê ji dilê xu bavêje

1973. Ew herdu bûne ba'isê fesadê
Ew bûne sebebê 'inadê

1974. Eger Mîr îznê bide min
Ez ê bi tedbîr Memê bikujim

1975. Tacdîn û biran bi şerbeteka je'rê
Tu dikarî wan qehr bikî demekî

1976. Ew îşê ku tedarika wî rahet e
Nebêje ji bo tu xelq û nasan

1977. Mîrê min tu here bibêje Zînê
Mem şewitiye bi agirê hezkirinê

1978. Mem tî ye û tu ava heyatê yî
Mem miriye û tu rûhê daîmî yî

1979. Bêje ku here Memê derxe
Min ewa daye te ji xu ra bîne

1980. Ez zanim Mem zehf jar e
Perperoke meqseda wî agir e

1981. Gava li Zînê binêre
Muheqqeq tu heyatê nake

1982. Derhal dema ku wê (Zînê) bibîne
Bawer neke (li cem Perwîz Cîhanî: Bawer nakim) ew bi rûh bimîne

1983. Mem eger bi vî rengî zû fena be
Xisûmet û qerebalixî yê rabe

1984. Zehfî Mîra ‘aqil in, ‘ezîz in
Feqet sadedil û nezan in

1985. Ew sade ji ehmeqî û bê’aqiltiyê
Dil nadine cihê xeberdanê

1986. Qelbê wan guh in, guh bi dil ve nîne
Reşçav in feqet reşikê çavê wan sipî ne

1987. Xûyê xerez çi tiştî jê ra bêjin
Ewana bawer dikin xwariyê bi rastî

1988. Nabêjin ev a qenc e yan jî xerab e
Nabêjin yan ev a xeta ye yan jî rast e

1989. Kurt nezer in, bêta'mul in
Hazir e hêrsa wan, bêtehemmul in

1990. Exleb wan bi 'eqlê mexrûr in
Zehfê wan ji 'alem û zanînê dûr in

1991. Hesûd û bexîl û kotîfikiran
Bed'esl û sefîh û bedfi'alan

1992. Dikine heval û rehber
Merivê navê pîs dibin wezîr û serwer

1993. Karê dewletê dispêrine van kesan
Ev kes jî dewletê dixine qusûrê

1994. Mîrê bi dewlet û feraset
Xûyê şefqet û xûdan siyaset

1995. Tu kesî xûyî nakin
Hettî ku wan imtihan nekin

1996. Çil carî merivekî tecrube dikin
Paşê ew î nêzîk dikin

1997. Ev mîrtî û wezîrtiya dunyayê
Ev lîstika zemanê ya (begme kizîr)

1998. Herdu bi misalê yek lîstik in

Herdu betal in û ne temîz in

1999. Hetta tu wekî lîstika navê wî kerenebî heqîqeta
Kengî tu yê bibî wezîrê mutleq

Ruxsetdane Mîr e Li Dîtina Dildarê Bêhişbûna Zînê ye Ji Zewq û Şewqa Dîdarê

2000. Ew merivê tedbîrzan murşidê 'aqil
Wiha ji bo me neql kiriye

2001. Gotiye: Mîr bi muşaweret û rayê
Weqta wisa çû qesra Heremê

2002. Gazî Zînê kir û li cem xu da rûniştandinê
Ew perde ji serê wê hilda

2003. Go: Min bêdiliya Memê bes kir
Eziyeta min a li wî bêfayde bû

2004. Ew cewr û zilma ku min li wî kir
Ew cewr te kir, zilm ew î kir

2005. 'Eşqa te 'aqlê wî revand
'Aşiq û mecnûn û mûbtela bû

2006. Me ji hekîmekî tedbîr zanî
Merivê mecnûn pak dibin bi zincîra

2007. Lewra min bi xezeb ew şande çalê
Ew hebs li wî gihande salê

2008. Da weku 'eşq hasil bike kemalê
Hezkirina we gihîştina we betal neke

2009. Niha bi qelb û rûh
Min miqdara hezkirina we zanî

2010. Hûn herdu di merteba kemalê da ne
Meqbûl in û qabil in ji bo wisletê (gîhiştina hev)

2011. Mem 'aşiq e sadiq e a rastî
Qelbê mi/me tesdîqê dike ji bo wî

2012. Ew a bi fermana padişahiyê ma'mûr e
Me'zûr e bi 'uzra bêgunahê

2013. Çi kesî li bike 'itabê
Muheqqeq yê bibîne 'ezabê

2014. Rindaya te ye ew kire esîr
Hezkirina te ye ew kire birîndar

2015. Ew tîra li qelbê wî ketiye te lê daye
Ew dermanê bêhişiyê te dayê

2016. Te ew kilê di çavê wî kişandiye
Hetta wî tu nedîtî dilê wî neêşiya

2017. Toqa ku te li gerdana wê daniye
Mîna dûpiş e û dilê wî gestiye

2018. Te de'fek te vegirt li dil û canî
Çunçika te ya ku dest û piyê wî girêdabûn

2019. Çawa te vekirin herdu xezal (çav)
Te berdane feqîrî her cazu (sahir)

2020. (Ya Zînê) Dîsa tu here digel (bi Memê ra) xeberde
Qeydan veke û ji bo jê derxe

2021. Ey kulîlka gula sora ku hê venebûye
Qefesê bişkêne û bilbilê derxe

2022. Ew tî ye tu kaniya ava şîrîn î
Ew nexwaş e tu kaniya heyatê yî

2023. Ew tî ye tu ava heyatê yî
Ew mirî ye tu rûhê dewamiyê yî

2024. Ew pişt perdeya ku dilê wî bi ‘eşqê tijî bû
Hatibû zebtkirinê bi perdeya heyayê

2025. Weqta ku birayê (Mîr) ew perde hilda
Xûnê ji dev û poz wiha avêt

2026. Zîna ku dused birîn di cigerê da hebû
Ji şabûnê çû ber haletê mirinê

2027. Behra ku pêl dida bi hezkirinê
Hatibû muhafezekirinê bi perdeya şermê

2028. Weqta ku perdê ‘eşqê revand ji ortê
Di herdu behra da şerm û heyra nema

2029. Ew xema wekî behrê ye keliya ye bi xûliyan
Û kelînî xeta firandin

2030. Xetaya ku revî ji dil pela xûnê
Avêt wekî çemê Firat û Ceyhûnê

2031. Goya hejiya hezar darê mêşe

Şerab bû rîjîya ji qelbê şûşe

2032. Mîrê bi xerez hate ba Zînê
Bi wî awayî ku wisa eva revand kela girînê

2033. Derhal ji dûyê kebabê ulfetê
Çêbûn di çavê wî da hêsirê şefqetê

2034. Kaniya rehmetê derketî û bi kel hat
Emîr mecbûran giriyê wî digel hat

2035. Bira digel wî ewqasî giriya
Wiha man di xelwetê da hetta sibê

2036. Zîn xeniqî di xûna qelbê da wekî gulê
Mîr jî giriya li ser wê (Zînê) wekî bilbilê

2037. Eqrebayê wan hemû top bûn li cem wan
Gişk bezîne bal dest û pêşan

2038. (Gotin:) Ya padişahê heqnas û 'adil
Tu çima bêheq bûyî qatil?

2039. Zîn gula baxê 'îsmetê bu
Zîn dara serwî çîmên 'iffetê bû

2040. Temîz e durra sedefê ye ji durcan
Laîq nîne ji bo te ra ewî bikî mercana sor bi xûnê bilewitînî

2041. Nazek bidine, letîf e, me'sûm e
Bê sûc wî ji 'emrê mehrûm bikî

2042. Laîq nîne tu wî daynî di xûlî û xûnê da
Bê sûc rûh ji bedenê cuda nekî

2043. Mîr got: Mekin xeyala batil
Ew bêhiş e ez nebûme qatil

2044. Ez ê çawa Zînê bi qesda bikujim
Ew dara Tûbayê ye di cenneta heremê da

2045. Ehlê Heremê bezîne li ser wê (Zînê)
Çem rijandin (hêsir) li ser dara serwî (Zîn)

2046. Bû şîn û matem di xanûmanan
Feryad ghiştine asmanan

2047. Yek hat ji der va nişkêva
Got: Mem mir û daye we heyat

2048. Zînê mirina Memê bihîst
Her wekî miribû dîsa sax bû

2049. Rabû nihêrî li herçar kenara
Dît ku Mîr digirî mîna baranî

2050. Xelqê Heremê ji xas û 'amê
Rakirin şîn bi tamamî

2051. (Zînê ji Mîr ra) Got: Ey sebebê se'adeta min
Bêkêf nebe di de'weta min

2052. Ya şah te îzin faye rûh
Mirina xu ji bo xu firset dît

2053. Can çû gihîşte canê

Ew rûh bi rûh bûne yek

2054. Hetta ku nebû ji devê te îqrar

Ew (rûh) di hebsa cendekê da esîr maye

2055. Mîna Memê melûl û mehbûs

Ji bo hifza riza û nav û şerefê

2056. Lewra ew a nediçû û hetta îro

Mabû ji bo hevdîtina te girtî

2057. Ya rûhê min dema tu razî bûyî ji dil

Ya şahê min te sela da di memleketê cesed da

2058. Cismê min ê 'aciz giran bû

Ruhê min ê zeîf kişiya

2059. Derhal ji qelb (beden) derket

Şûşek ji rûhê Memê gihîştê û bi ber ket

2060. Wana dunya fanî terk kirin

Çûne bal 'alema daîmî

2061. Her kesê ku mekana qebûl neke

Ew ê sêr bike di lamekana

2062. Hûn vê seferî xelet mexwûnin

Şahidê me muqerrebûn in

2063. Gava we ku rûh terka cesedê kir

Ew me'şûqê dibîne û rûh digîje rûh

2064. El hasil piştî gihîştinê

Ew rewneq û meş'ela cemalê

2065. Qederek li cem hev sekinîn û mutmeîn bûn

Weqta ku ji hev emîn bûn

2066. Ew qetre di behra sifata

Ew zerre di behra muhlikata da

2067. Hinek weqta hatine terefê fenayê

Hinek cara çûne li ser heddê beqayê

2068. Xulase ji merkeza xûliyê

Ew zerre gihane rojê

2069. Qet'a ne bi hev girtinê

Esla ne jî bi hev qetandinê

2070. Weqta ku wana riya xu birine bal Zatê Xuda

Zerrat baqî bûn bi Zatê Xuda

2071. 'Ecêb nîne ev xebera ji bo min

Hûn viya nekin huner ji bo min

2072. Ew şêxê ku wisa ez heqîqî murîdê wî me

Ew rûh e, letîf e (ku sivik diçe) ez qedîd im (goştê hişk kerî me)

2073. Gerçî li cem we navê wî Memê bû

Feqet padişahêkî himmet mezin bû

2074. Bu laîqê ‘ezemata padişahê
Meqbûl e ji bo nêzîkbûna bal Xuda

2075. Qelbê wî ye wadiya muqeddes
Rûha wî bi nûra Xuda çirûsk girtiye

2076. Ez hilgirtim birime çiyayê Tûrê Sîna
Ew merivê bînende (bi çav) ez gerandim digel xu bîna (bi çav)

2077. Ez derxistim ji vî perdê
Ev zerre gihande bal rojê

2078. Weqta ku min bi rûh ev sefer kir
Min ev rûh ji ew ê rûha difroşe dîn kir

2079. Her çend zahirê got: Iqliyê
Derhal wî pey ra ircî ê got

2080. Lewra hatime ji bo ku we razî bikim
Razî bibim li pêşiya Xudayê Tealî

2081. Da ez ji we xatir bixwazim
Da hûn jî min rê bikin

2082. Dîsa vegerim ji ba we bi ferehî
Dilxweş bibim bi cenneta xas

**Tewsiyye û Tedarika Zînê ye Ji Bo Sefera Axretê Tehiyyeyê Esbabê Cihaz e Ji Bo
'Erûsiya Cennetê**

2083. Zîna ku nîşanî wan da gelek keramet
Ew çend menazil û meqamat

2084. Rûnişt û wesiyeta xu ji bo Mîr
Wiha beyan û teqrîr kir

2085. Ya padişahê rûha û qelba
Xweşk bûyî ji bo te feda û qurban

2086. Qurbana te bibin her roj dused Zîn
Ez hêvî dikim tu nebî xemgîn

2087. Roja ku min Mem ji xu ra bir
Xulase min ji xu ra xem bir

2088. Ez mensûr bûm di memleketê xemê da
Xem ji min ra bû metî'

2089. Mem ji bo min û merhemet ji bo te
Xem ji bo min, padişahî ji bo te

2090. Padişahim ji min ra de'wê nebîne
Ez razî me ji para xu

2091. (Ya Mîr) Rûnê li textê seltenetê wekî Xusrew
Taca xu ya zêrîn xwar bike

2092. Meclisa kêfê tertîb bike
Zewq û ferehê bigihîne hev

2093. Xort û ciwanan serxoş bike

Ji nû ve xweş ke kal û pîra

2094. Sebebê hereket û se'adetê

Adab û kêf û heyatê

2095. Hazir bike şerbet û te'ama

Azad bike cariyê û xulaman

2096. Pîr ke firaqa ji bo şebaşan (tiştê ku tê rijandinê li ser bûk û zava)

Da ku bibînê feqîr di vî de'wetê da

2097. Top bike tiştê meriva kêfxweş dikin

Tev hev bike bîne xweş

2098. Hetta meclis bi wan bêne avzêrkirinê

Ji nû bê tertîbkirinê dilşayî û ferh (M. Bozarslan: Dilşayî ji nû bê pêkanîn
û tîkuzkirin.)

2099. Da weku top bibin li cem me ewanê şirînken

Bihejin bi reqş û govend

2100. Qismê bixûr û 'ûd û 'enber

Ava gulê û zebad û miskê bîn xweş

2101. Ev cinsê ni'meta zehftir bin

Ew qismê ji hed zêdetir bin

2102. Heywantiya me çûye

Rûhantiya me mukemmel bûye

2103. Eger cismê me diçe çalê (qebrê)
Rûhê me yê bigihîjine hev

2104. Ew nikaha ku de'wetiye wê melek bin
Qismê bixûrê gelek bin

2105. Lewra ez û Mem melek sifet in
Meyla me bal bîna xweş û tiştê rind e

2106. Ew de'weta ku melaiket de'wetî ne
Zava û bûk cennetî ne

2107. Roja ku te Sitî da Tacdîn
Çawa ku te di şehr da çêkir ayîn

2108. Hişyar bike dikan û soqaqan
Bila mîna bûka bixemlînin

2109. Emrê ehlê Bohtan bike bila siwar bin
Tu bibêje 'eskeran da bi kar bin

2110. Meşxûl bibin bi wekî di 'eydan da
Bi hev ra qoşa hespa bikin

2111. Roja ku te ew perî rêkir
Te çiqas kêfxweş çêkir

2112. Ez hêvî dikim bikî tu 'inayet
Qanun wisa ri'ayet bikî

2113. Îro ji bo me ra du qatî
Dîsa tu wisa biken û şadî bî

2114. Tidareka de'wetê û cihêzan baş bike

Mutrib û sazan hazir bike

2115. Mîna hudca ku Sitî têda

Mîna mehmela ku ew perî têda

2116. Tabûteka neqşandî bi ava zêr û rengîn

Sindoqeke bi karekî nazik çêkirî û neqşandî bi ava zêr

2117. Xeta li ser wî bila neşandî bi ava zêr

Bila sîwana wî cîlakirî be

2118. Zinhar me herdu bûk û zava

Bêqedr meke li pêş çava

2119. Gava ku diçine nava meqberistan

Da xelq nebêjin digel elem û girînê:

2120. Roja de'weta Sitî çi xweş bû

Zînê jî ji ezel da bextreş bû

2121. Textê cinazê min bila Sitî digel be

Tacdîn bila dewsa Memê bigire

2122. Çawa ku Mem bû ji bo Tacdîn

Bila Tacdîn jî bibe birazavayê wî

2123. Bila ew bibe birazava digel Memê min

Şahî bibe ew digel xemê min

2124. Ey merivê mêla xu dide bal xêra bi mukafat

Ey merivê dide meqsed û mirada

2125. Hetta muddetê salekî bi temamî
Her tiştê ku telef dikî ji te'ama

2126. Her tiştê ku belav dikî ji kinca
Û her kesî gazî dikî ji 'amê û xas a

2127. Her tiştê ku tu telef dikî ji qumaş a
Her tiştê ku belav dikî ji me'aş a

2128. Her roj bi nêta xezayê û cihadê
Her çiqas gelek xêra belav dikî

2129. Her weqtê ku tu li textê rûdinê
Her roj tu wiha gazî 'eskera dikî

2130. Her tiştê ku vala dikî ji xezîna
Her mehzûnê ku tu wiha şa dikî

2131. Her feqîrê ku tu zengîn dikî
Her esîrê ku xelas dikî

2132. Çiqas di hikumetê da xeber didî
Çiqas girtiyên wiha tu berdidî

2133. Her çi tiştê ku ji bo xu tu dikî xerc
Her çi tiştê ku datîni di dercê xezîna da

2134. Qehra wisa ku def'a dujmina dike
Men'a wisa ku zalima radike...

2135. ‘Edaleta ku ji bo Xuda xas dikî
Mezlûmê ji zalima xelas dikî

2136. Sazê ku di herbê da dibêjî
Hetta ku ji muxalifa dirêjî

2137. Hetta xurega kelbê nêçîrê
Hetta ‘alifê kerê barkirinê

2138. Şahê min wesiyeta min ji te ra:
Wana serf bike bi nêta min.

2139. Tefekkur neke di heqîqet û mecazê da
Binivîse di deftera cihaz da

2140. Da weku ez fexr bikim li cem zavê
Şermende nebim di weqt û gavî

2141. Her çiqas min pir dirêj kir
Bi gotina zêde min serî li te gêj kir

2142. Ez qurbana te bim meqseda me dûr e
Dûrî te bi meqbera me kûr e

2143. Lewra ewqasî dibêjim bi diqqet
Da were dilê te rehm û şefqet

2144. Di heqqê min û Memê da neke ‘ar
Weqta dimre Memê birîndar

2145. Ez dê bi cinazeyê wî ra bibim
Hetta bigîje meqbera digel bim

2146. Weqta ez bimrim tu îznê bide
Da weku min digel wî defn bikin

2147. Min ji alê wî dîr neke
Bê perde digel wî defn bike

2148. Zînê ku axiriya wesiyetê kir
Derhal 'aqlê wê çû ji derd û êş a

2149. Mîr got: Tu here Memê bibîne
Eger mirîbe ew î bizvirîne bal heyatê

2150. Bawer bike tu bi rastî û îman
Ez ji bo te û Memê poşmanim

2151. Eger hûn bimirin yan jî rabin
Nabe ku tu û Memê ji hev cuda bin

**Pêşemaniya Mîr Zeyneddîn e Li Mehebbeta Mem û Zînan Merhemeta Wî ye Li
Halê Nazenînan Mirina Memê ye Bi Axiftina Birînan**

2152. Weqta ku Zînê bihîstin ew xeberdan
Ev hezkirin û wefa û ev rehmet

2153. Rabû ji pê hetta serî xemilî
Bû behr husnê û cewhera da xeniqî

2154. Dayê û Sitî û sed xitmetkar
Roj û hîv stêrkê seyyar

2155. Temam derketin ji burcan
Durdane derketin ji durcan (ew jinê mîna durra ne derketin ji mekanê xu)

2156. Sed cariye û Sitî û Dayê
Higirtin ew a (Zînê) bi resm û ‘adet

2157. (Zînê) Zanî ku mirad hasil nebû
Bê xelweta xas a digel şêxê kamil

2158. Ew stêrka Zuhre ya mîna zerre ya reqqas
Bû merhema sirra xelweta xas

2159. Gava ku gihane xelwetxanê (zindana Memê)
Vekirin derê hebsxanê.

2160. Temamê wen bi meş’el û fener çûn
Dayê û Sitî di beriyê da çûn

2161. Dîtî di sahila tijî sedef da
Xeniqiye di behra ‘eşqa xûnxwar da

2162. Rûhê wî yê ku mîna durra bêbiha

Derdaye ji destê xu belaş

2163. Fenera qefesê (qelb) wisa maye bê nûr

Çimên bedenê wisa maye bê av

2164. Wana pirs kirin ji xelqê ku di hebsê da ne

Halê wî feqîr û 'aciz û zeîfê

2165. Xelqê ku digel Memê di hebsê da bûn

Gotin: Me dît ji feyza dîwarê

2166. Berqeka 'ecêb li ser serê Memê rabû

Şewqek ji ser Memê derket

2167. Yek mîna rojê yek mîna hîvê bû

Yek mîna zêr, yek mîna zîv bû

2168. Ew roj û hîv weqta gihîştine hev

Derhal di hev da winda bûn

2169. Gava ku wisa rewneq ji hev hildan

Wan herduyan ronahî dan

2170. Wisa geriyan ronî û rewşen

Hebs li me kirine meydana bostan

2171. Mem ji bi vî rengî bêxeber bû

Xûna dilê wî derkete derva û der bû

2172. Ya merivê ku çavê qelbê wî venebûye

Înkara tecelliya rûh neke

2173. Da zen nekî ku ev hulûl e
Yan nesx e, ketine yan derketine

2174. Da zen nekî ku ev mesal e
Yan qewlekî zeîf e yan betal e

2175. Xûna tu dibînî ev meqam e
Tiştêk ji şuhûdiya na tamam e

2176. Hevaltiya Memê muckerrem
Agah kirin heval û hogir

2177. Wî murşîşê qenc li wan nezer kir
Qelbê wî di qelbê wan da eser kir

2178. Hemxelwetiya Memê girtî
Perde kişand ji ser dost û exyara

2179. Weqta ku Dayê û Sitî çûne serdanê
Wana ewqasî digel xeberdan

2180. Gotin: Ya Memê rabe Zîn hat
Ew rûha te ya bê şek bi yeqînî hat

2181. Ew lêv ziwa û tiyê ava zelala dîtînî
Kêfxweş nebû bi navê dildarê

2182. Çiqas tamarê qelbê wî kişandin
Çiqas ava gula lê reşandin

2183. Wana rûh di cismê da his nekirin
Îlla dûmanek ji serê wî radibû

2184. Ji wî çiraya damirî nişkêva
Dû ji serî diçû banî

2185. Zîn hat pêşva sekinî
Hîva ku daîreya li dewrê rewneq dide

2186. Rakir perde ji cemalê
Eşkere bû roj digel hîvê (rû û bijang)

2187. Zînê wiha got bi ‘ecele:
Rabe ya cendekê ku min pif kiriyê

2188. Şewqa xebera wê bedewê
Girtiye ser dûyê mûmê

2189. Wî dûyê ji şewqê hilda rewneq
Tijî bû mûma qefesê (qelb) bi rewneqê

2190. Ew ‘abidê di îtikafê da
Rabû bi nêta tewafê

2191. Ewî pêşiyê eda kir bi rastî û dirustî derhal
Tezekirina destnimêjê bi ava Zemzemê

2192. Sekinî Mem li musella û Meqamê
Wî ne’tik gihande îstîlamê

2193. Tewafek yan jî didû kir li dora beytê
Perperokê per gihande zeytê

2194. Gava ku perê wî şewitîn
Wana çend kelam bi hev ra gotin

2195. Perperokê got: Tu xweş delîl î
Şem'ê wiha got: Tu xweş xelîl î

2196. Perwaneyê go: Tu delîl û murşîd î
Şem'e wiha go: Tu saxkirê rûh î

2197. Perwaneyê go: Tu nûra dila yî
Şem'ê wiha go: Tu şewata sînga yî

2198. Perwaneyê go: Tu dermankar î
Şem'ê wiha go: Tu cezba qelba dikî

2199. Perwaneyê go: Tu padişah î
Şem'ê wiha go: Tu qiblegah î

2200. Perwaneyê go: Tu hûrê Zat î
Şem'ê wiha go: Tu nûra Zat î

2201. Wan lêv tî yê bi tekelluf
Wan şewitîyê bi bi teserruf

2202. Wiha hev ra dikirin suhbet
Beyandikirin bi hev ra hezkirina kamil

2203. Dayê û Sitî û ew xidmetkar
Bendê û girtî û esîr

2204. Meşxûl bûyîn bi xeberdanê
Serxoş bûyîn ji bîn û boyî

2205. Wana Memê ra gotin: Ey cegerxûn
Em hatine da weku tu nebî mehzûn

2206. Zîn bûye sebebê cunûniya te
Mîr bûye sebebê zeîftiya te

2207. Mîr ji te ra bû xûyê rehm
Zîn hat digel te kir xeberdan

2208. Eger tu tî yî ev ava heyatê ye
Eger tu nexwaşî hate ser te Loqman

2209. Eger tu Mecnûn î hate li bal te Leylî
Eger tu Wamiq î hate ji bo te 'Ezra

2210. Eger tu bilbilî gul ji bo te hazir e
Eger tu nîlûfer î roj li te dinêre

2211. Eger tu perperok î mûm şû'le dide
Eger tu mirî yî hate li ser te 'Îsî

2212. Dîwane mebe bi vî 'eşqê
Xerîb mebe tu dostekî nas î

2213. Ew hûriya ku rûh û qelb di dest bû
Ew Zîna ku daîma tu di hewesa wê da bûyî

2214. Çawa ku tu dixwazî wisa hate cem de

Dunya ye, fanî ye tê û diçe

2215. Erzan mefroşe 'emrê windabûyî
Bêhûde nebe firoşkar li rûh

2216. Heta tu venexwî cama ecelê
Tu nabînî ji bo xu kesekî rûhfiroş

2217. Dîsa xu bi 'aqlê bide naskirinê
Zincîra cunûniyê veke

2218. Lewra me qeyd û zincîr vekirine
Rabe bi me ra em biçine pêş Mîr

2219. Ew xûyê kerem û ehlê daînê ye
Siha wî wekî siha perê teyrê himayê ye

2220. Top bûne ji bo te yar û dost
Hazîr kirine tiştê raxistî û esbab

2221. Piyê Mîr mehkem eli de'weta te
Ber xu daye te text û dewleta te

2222. Eger derhal biçî pêşiya Mîr
Yê hasil bike ji bo te mirada

2223. Çawa tu ji wî mirad dixwazî
Yê wisa te bike serbilind

2224. Weqta ku Memê bihîst ev nesîhet
Wiha got ew î hunermend

2225. Ez naçima hizûra tu mîra
Ez nabime ‘ebdê esîra

2226. Ev mîrî û wezîriya mecazî
Ev lîstika xapandî û lîstika xeyalî

2227. Temamê wn betal in bêqena
Bêaqîbet in, hemî fena ne

2228. Ew mîrê ku jêra mirin hebe ew ne mîr e
Ew ê ku tê ‘ezlîkirinê ew esîr e

2229. Em çûne huzûra Mîrê Mîra
Ew î ku hakimê hakim û feqîra ne

2230. Şahînsahê Mîr û padişaha ne
‘Efûkarê gunaha ne

2231. Ew î ku çêkiriye neynika cemalê
Têda xu nîşan daye bi çûnçik û xalê

2232. Çira bedenê xemilandiye
Têda ji me ra tecellî kiriye

2233. Ew Mîra hekîm e, Zu’l celal e
Bê ‘ezl e, bê texeyyur û bê zewal e

2234. Wî (ez bi Zîne va) zewicandine di ‘alema xeybê da
Qewwet daye me bi emrê la reyb (bê şek)

2235. Di baxçeyê qedirbilind da em mêweyê teze ne

Sed şukir em bakîre û serbilind in

2236. Haşa ku di vî seraya fanî
Bê cenneta 'Edenê ya daîmî...

2237. Haşa ku em mîna heywana zinayê bikin
Beredayî di vî meskenê fanî da

2238. Pêş şil, ser berjêr, merdûd
Şermende herine pêşiya Xudayê Tealî

2239. Xudê ji bo me hûrî xilman
Di cenneta Ridwanê da xemilandin e

2240. Ewana li hêviya çûyîna me ne
Fexrî dikin bi de'weta me

2241. Lê Cenneta 'aşiqan cuda ye
Cihê we' da dîtina Kibriyayê ye (Xuda ye)

2242. Ewa bilintir e ji baxê Ridwanê
Ne munasibê wê ye qet'a hûrî û xilman

2243. Em wî ya ji me'bûd (Xuda) hêvî dikin
Nîne ji me ra tu xwestin ji xeyrê wî

2244. Gava ew î (Memê) kir di tenniya paşîn
Dergah vebû derhal li ber wî

2245. Teyrê ku li ber wî qefes vebû
Wisa firî her wekî qe nebûye

2246. Destê xu ji qeyda xûliyê kişandin
Baskê qelbê xu bakirin û hejandin

2247. Teyrê şahîn firî ji qeyda merkeza 'erdê
Firiya û gihîşte xûyê 'erşê (Xudayê Tealî)

**Ta'ziye û Matem û Mersîye û Şîwena Memê Şehîd e Mirina Bekirê Şeqî Bi Destê
Tacdînê Se'îd e**

2248. Ew hazir şînê yê ku xebardar
Wihareng ji bo me xebera reş anî

2249. Got weqta ku rûh ji hebsa bedenê cuda bû
Feryad fixan ji şehr rabû

2250. Bû welwele û fixan û zarî
Bû zelzele û revîne hewarî

2251. Bohtan ji mezin hetta biçûkan
Jin û keç û qîz û bûkan...

2252. Eşraf û merivê mezin û xûyê meqam
Zarê padişaha û genc û laubalî

2253. Nema kesek di şehrê da dilxweş
Temam geriyan serxoş û sergêj (muşewweş)

2254. Bi hev ra beziyan ser Memê
Wana derd birine ser xema

2255. Tacdîn û Bekir tesadufan
Di 'erdekî de rastî hev hatin...

2256. (Tacdîn ji bo Bekir) Got: Ey sebebê fesada 'alemê
Ey sifet şeytan li şeklê adem

2257. Ey sebebê fitne û fesadî
Ey manî'ê meqsed û mirada

2258. Ey dirandiyê perdeya Memê û Zînê
Ey ê daxkişandiyê ser birînê

2259. Ey îblîsê xebîsê pir poşman
Bes nîne te li min kir qiyamet

2260. Di heqqê Memê da te ne rind xeber da
Hetta te Memê li min der da

2261. Tu ewqasî munafiq û dujmin î
Hêj tu li ber çavê min têyî kifşê

2262. Gelo dibe ku Memê bimre û tu bimînî?
Hêj xweş bigrî li rûyê ‘erdê

2263. Ew î derhal Bekir avête ‘erdê
Rûh ji cendekê bi bela cuda kir

2264. Gava ku (Tacdîn) gihîşte ser birayê
Ew î nedî nûrek di wî çirayê

2265. Tacdîn tac û wemara ser xu
Avête ser cendekê Memê jar

2266. Tacdîn cunî bû ji hesreta birayê
Wî ejdehayê kî didît

2267. Dikir ku derhal wî fena bike
Mîna Bekir bavêje ‘erdê

2268. Qet kes nedikarî bibe muqabil

Bê şek (Tacdîn) yê bibûya qatilê wî

2269. Naçar xeber dane Mîr
Mîr hat û pê wî girêda bi zincîrê

2270. Gava ku wan cenaze hilanîn
Şehîd ji çi şehadetê deranîn

2271. Eşkere bûn li wan 'elamet
Rabû li xelqê qiyamet

2272. Ew dêwê ku qeyd kiribûn bi tedbîr
Vekir li ber xu qeyd, zincîr

2273. Ew î zincîr û kemend şikandin
Derî û perde hilanîn

2274. Ew ejder ji şikeftê derket
Derhal rev û xu avête ser carbestê

2275. Tabût danî ser serê xu
Qêrîn digihande asmanê

2276. Çiqas însan di şehr da hebûn
Temama kincê şînê li xu kiribûn

2277. Di şehr da çiqas meşhûr hebûn
Xatûn û ewanê di çadira da û ber perda da

2278. Gulî vekirî bi tayê finoyan
Ji serî hetta piyan temama li kincê reş li xu kirî

2279. Bê destmal û bê pêçe û bê laçik
Reş girêdabûn bi riza xu ji bo Memê

2280. Jinê şîn girtî û dûs û dadê
Bi nale nal kelim digotin mîna teyrê goyîn

2281. Ewana kelamê şîne distan bi aheng
Zîn rabû piya bi qameta nazik

2282. Mîna stêrka Zuhre li ber dengê sazê
Direqisî û diçû li cem cenazê

2283. Heywanê malê û kûvî û meriv û mûstang
Dar û kevir û tiştê bêrûh û teyr

2284. Temamê wan ji bo Memê dinalîn
Her yek bi meqamekî dikalîn

2285. Cema'eta reşa wan kincê reş in
Mîna 'ewrekî ku deng jê çêdibe

2286. Ew çend sûretê gulreng
Dirêjandin hêsirê pir xûn

2287. Goya weqtê ewwelê biharê
Li baxçeyê gulan dibarî baran

2288. Ev matem, ev şîn
Ev çarşev û ev pêşmal û kinc

2289. Bohtan wî zemanî kirine 'adet
Bû 'adetê qedîm hettî qiyametê

**Îltimas û Îstid'aya Zînê ye Ji Bo Bekirê Mufsîd Ra 'Uzurxahiya Wê ye Ji Bo Ewê
Mulhid Ra**

2290. Weqta ku wiha çûne ser mezarên
Dîtin mirîk di nav du daran

2291. Avêtine 'erdê wekî mirdaran
Bêşîngirtî û bêxûyî û bêxemxwar

2292. Pirs kirin: 'Eceba ev çi belengaz e?
Gotin: Eva Bekirê ku musteheqê cezayê ye

2293. Tacdîn ew a ji rûyê dunyayê fena kiriye
'Alem bi fenaîya wî şad kiriye

2294. Rawî wiha gote min rîwayet:
Weqta ku Zînê bihîst ev hikayet

2295. Evreng e gote Mîr û Tacdîn:
Ey şah û wezîrê 'izzet û hikumetê

2296. Ez hêvî dikim 'inadê nekin
Di heqqê vî çavê kaniya fesadî da

2297. Lewra ku Xudayê însan û cina
Ew xaliqê 'erd û asmana

2298. Roja ku ew î hezkirin da hebîba
Hingê ew î buxz da fesada

2299. Weqta ku Xuda em çêkirin ji 'ademê
Em tamamî bi hev ra bûn lazim û melzûm

2300. Em gula sor in, ew (Bekir) ji bo me bêje
Em xezîne ne ew ji bo me ma'r e

2301. Gul muhafeze dibin bi ser pîja
Xezîne bi maran tèn parastinê

2302. Ji ewwel ve eger ew î çî wî cefa kir
Axir bi me ra ew î wefa kir

2303. Zahir wî eger bi me ra muxalefet kir
Batin bi me ra muwafeqet kir

2304. Eger ew (Bekir) nebûya perde di nav me da
'Eşqa me yê bibûya betal û zaîl

2305. Ew î gerçî ji nefsa xu ra xerabî kir
Lê di heqqê me da zehf rind kir

2306. Ew bû sebebê heqîqeta me
Ew hate ser riya me (mezheba me)

2307. Ew jî di rê ya me da şehîd e
Muheqqeq bizanin ew a se'îd e

2308. Zinhar ji cihê ku Mem têda ye
Elbette cihê ku em têda ne

2309. Emanet e mehrûm nekin Bekir
Em bi wî seyê hatine muhafeze kirinê

2310. Gava ku em herine binê 'erdê

Ew ê bibe kelbê me yê li ber şîmîkê

2311. Gelo însaf e ji bo xûyê însafê (yan jî: Ji bo Xudê însaf bikin)

Ku neynikek ewqasî bibe saf

2312. Qet mumkin e av û şûşe

Wiha nekin qebûla kînê (şêlîbûnê)

2313. Haşa ku ji xeyrî kesê pehtiyê ‘eşqê

Na, na ji xeyrî şewitiyê ‘eşqê

2314. Ewqas li xûyê cefayê

Ewqas kesek bike li wefayê

2315. Ev taîfe merhemet tebî’et in

Lewra laîqê ne’meta cennetê ne

**Techîz û Tekfîn û Tedfîna Memê Mehrûmê Xemgîn e hemnefes û Hemqefesbûna
Bi Fewta Zîna Nazenîn û Xemrevîn e**

2316. Xulase şehîdê 'eşqa cellad
Meqtûlê zilmê û kuştîyê bineheqiyê

2317. Kuştîyê sûcê bêgunehiyê
Mîna xelata padişahê

2318. Hatiye raxistinê bi nûra pakiyê
Hatine veşartin di nav qîra xûliyê

2319. Ew durr spartine xezînê
Ew ma'r veşartine li ber piya

2320. Danîne ber serê wî 'elametek
Ye'nî ev e serwerê qiyametê

2321. Sersîwarê qebîla 'aşîqê temîz in
Meznê tamam serbilinda ne

2322. Zînê hat bi qameta senewberê
Bû dara serwî ya li ser wî (Mem) sî vedayî

2323. Bê perde mîna neyê dinalî
Hêsir dirijandin li pey hev pey hev

2324. 'Eynî te digo di fesla meha Nîsanê da
Dîsa behr rijiyaye ji 'ewra

2325. Barana ku dibarî ser xûliyê
Her hebek dibûne deh lû'lû'

2326. Her weqta ku ji derdê dil ah dikir
Ne'ûzu bi'llah ewanê şîn girtî jî

2327. Pêra bi aheng dikirin qîrînî
Deng digihîşte her neh feleka

2328. 'Esker û siwarî û emîran
Derwêş û millet û feqîran

2329. Mûhib û letîf û nazenîn
Hûrî û perî û xemrevîn

2330. Her kesî dikir hewar bi hev ra
Feryad digihîşte feleka etlas

2331. Weqta ku ji Zînê ra nema taqet û quwwet
Nalîna wê xelas bû û ji qudretê ket

2332. Rûnişt berserê Memê jar
Mem ji xeberdanê kir agahdar

2333. (Got:) Ya xûyê milkê cismê û rûhê
Ez bax im tu baxvan î

2334. Baxê te yê gihîştî bêxûyî ye
Bê rûyê te ew ji bo çira ye?

2335. Ev xal û xet û rûyê baxçeyê gulan
Ev rindayê û bedewî û baxê rûyan

2336. Beîfê reş û çavê belek

Hinar û bîhok û sêv û çiqê bilind

2337. Xweşreng û bilezzet û bi te'm in
Bê şubhe ji xeyrî te ra heram in

2338. Dara xurmê ya bedena xu bihejînim
Bi tamamî hirşînim van mêwe ya

2339. Van sunbul û laleyê rind
Reyhan û binefşeyê ter û teze

2340. Ye'nî ku rû û gulî û xal
Ya qenc ew e ez wan bi talanê bidim

2341. Wekî gula kinc parçe bikim
Ax û xûliyê hirşînim ser serê xu

2342. Guliya tamamî ta bi ta bikşînim
Heqê min e cî bi cî biêşim

2343. Ev bax û bihar û belg û mêwe
Goşî û bişko tamamê çîçekan

2344. Nezra nezera te bûn carek
Weqta mubarek ji bo dîtina te

2345. Ez talan bikim ewan tamamî
Hetta tu 'amî parekî jê nexwe

2346. Feqet ez xu bi xu tesewwûr dikim
Belkî tu ji min sil bibî

2347. Ew sebrê li cem te ne meqbûl e
Ez ditirsim tu min mes'ûl bigirî

2348. Temamê hebûna cendek û rûh
Mikê te ne, bêxûyî nînin

2349. Eger noqsan bibe ji rindayî mûyek
Belkî tu li min hêrs bibî

2350. Gava ku tu li min bikî lomê
Ez zanim ku nikarim bidim cewabê

2351. Nêzik e bibim wekî te bêhiş
Niha weqta ku ez û tu hev bikin hemêz

2352. Laîq ew e ku nivînê bipêçim
Temîz bibim ji ji têkiliyê

2353. Ya qenc ew e ku her bi vî cemalî
Neêşînim qet zulf û xalê

2354. Teslîm bikim emanetê Xuda
Xu teslîmî te bikim zînnet û rewneq î

2355. Wiha eda kir (Zînê) heqîqet
'Eleqe ji dunyayê birrî

2356. Hemêz li qebrê aland
Bedenê nîşan da bêzarî ji rûh

2357. Destê xu bi dil ji rûh şûştin
Te digo mûmek bû hate damirandinê

2358. Rûhê xu şande pêşiya Barî (Xudayê Telalî)

Cismê xu siparte wî mezarî

2359. Ew şîn girtî di dil da birîndar

Dîsa ji nû ve kirin hewar

2360. Fîxanê ji rûhê hazira

Feryada hindirê nazira

2361. Sê roj û sê şeva pey hev ji rûyê 'erdê

Pey hev diçûne 'erşê e'la

2362. Hetta Zînê bi merasim û bi 'adet

Techîz kirin wekî ku dîzanin

2363. Ew qebra ku Memê tê da

Ye'nî ew sedefa ku cewher tê da ye

2364. Ew çend li ser giriyan bi zarî

Barana hêstiran lê dibarî

2365. Ew çend li ser hebûn rijandiyê cewhera (ye'nî rijandin hêstir li ser qebrê)

Dîsa ji nû ve li ser vekirin

2366. Ew herdu cewher di cihekî da

Ew roj û hîv di burcekî da

2367. Bê wasite ewana danîne cem hev

Bê fasile ewana spartine hev

2368. We'l hasil tabût dîsa vekirin
Mîr got: Memo hanê evîndara te

2369. Sê cara ji qelbê (ji qebrê yan jî ji cesedê Memê) deng hat
Ew deng bi lefzê merheba hat

2370. Temaman ku sirr bihîstin heqîqeten
Gişka 'eşq tesdîqkirin

2371. Ji wan ra başî û sed aferîn
Bi wan ra qet mêla dunê nebû

2372. Neces nebûn bi xûlî û talaşê
Ev esera hezkirina temîz

2373. Ewana tahir û 'effî çûn
Ewana bakîre û serbilind çûn

2374. Lêv tî û mêweyê hev ji hev nexwarî
Bi hesretî çûne pêşiya Barî (Xudayê Tealî)

2375. Xweş heyatkirin bi 'eşqê welleh
Xweş bi hev ra mirin tebarekelllah

2376. Her kîjan bi cîwaniyê bibe mîna Zînê
Tebdîl bike 'eşqê li ser heyatê

2377. Yan jî mîna Memê serî bide bi 'eşqê
Di riya 'eşqê da heyatê û xweşiyê bi der bide

2378. muheqqeq mirada wê yê hasil bibe
Her çi mirad kiribe yê bibîne

2379. Ya Reb bi muşeqeta ‘eşqa rast
Ya Reb bi kemala rastiya ‘eşqê

2380. Ya Reb bi şîrîniya cemalê
Ya Reb bi hezkirina cemalê

2381. Ya Reb bi derdê ku hicra ku eziyetê dide
Ya Reb bi zewqa gihiştina bal hebîbetê

2382. Ya Reb bi şîrîniya hebîba
Ya Reb bi dujmintiya fesadî

2383. Ya Reb bi naziya nazenîn a
Ya Reb bi di’ayê xemkara

2384. Ya reb bi ava çavê bilbila
Ya reb bi xunava hindirê gula

2385. Ya reb bi hêsirê sor yê mehzûn
Ya reb bi rûyê Leylayê gulreng

2386. Ya reb bi Memê û bi vî hezkirinê
Ya reb bi hesreta li Zînê

2387. Weqta ku tu cuda dikî ji canê
Bêpar neke Ehmedê Xanî ji ‘eşqê

2388. Ye’nî welayeta Muhemmed ‘eliyê-s selam
Mehrûm nekî ya Reb tu Ehmedê Xanî

2389. Çawa ji nubuwwetê xeber dide

Metleba wî ji welayeta hal e

2390. Daîm xeberdana wî wela ye
Feqet teleba wî bela ye

2391. Gotinê wî serserî bê fayde ne
Kirinê wî tamamî muxalif in

2392. Zahir wî ji we ra rind xeberdane
Batin wî bi we ra kirinê xebîs e

2393. Wî nede 'ezabê mîna Memê
Mîna Bekir 'efû bike qencan.

Teswîl û tefawut û Îxtilafê Xîlqet e Temsîlê Teqazayê Siriştê Tiynet û Fitret e

2394. Hikmet ew e ewana ji darê dunyayê
Çûn û meşiyane bal serayê ‘uqbayê

2395. Wana terk nekirin tebî’etê xu
Her yek xulûqîn bitebî’etê xu

2396. Ye’nî li ser Memê û Znê
Hêşîn bû ji zira’eta evînê

2397. Du heb çiqilê bilind yê ‘inadkar hêşîn bûn
Rabûn bi hewayê ve herdu serxoş

2398. Yek dara serwî ku rast û bilind e yek dara çamê ye
Serkesk narîn in, sî û belgê wan zehf in

2399. Wan destî birin di sitûyê hev ra
Qameta xu dirêj kirin bal hev ra

2400. Hêşîn bû ji ewê darê xêrê
Darek li şeklê dara kinêrê

2401. Ew dar ji rahetê berê bû
Wekî xûyê bi pîj bû

2402. Rabû xu gihande herdu dara
Bû mani’ê gihiştina herdu yara

2403. Wî nikarî rahetî bike
Dujmintî eşkere kir

2404. Dîsa xu gihande wan hebîba
Xu li wana pêça wekî dujmina

2405. Xulase li çiqî û koka darê
Lê fitlê mîna fuzûlan

2406. Ew kesê ku bi'esl exlaq pîs in
Ew 'eslê ve ji wan tê şuştinê?

2407. Çil salî tu henzelê biçînî
Sed carî bi hingiv av bidî

2408. Xûyî bikî li ber rojê
Her weqt lê bireşînî ava gulê

2409. Her roj tu riha wî parçe bikî
Qelîşteka wî tijî şekir bikî

2410. Jêra xidmet bikî ewqasî zêde
Yê ji bo te bibe qawûn?

2411. Weqta ku mêwe bide te fikir neke
Ew ji xeyrî tehlâyê mêwe bide te

**Mîsalê Serencamê Benî Adem û Mealê Ne Bi Heseb Zahirê Sûretê Hal e Belkî
Mute'elliqê Batin û Me'na û Mewqûfê Meşiyetê Zu'l-Celal e**

2412. Xeberdarê ji halê dewrana roja
Paşiyê da wiha gote min:

2413. Go: Pîrekî muhib û 'aşiq
Gotinê wê wekî subhê sadiq

2414. Weqta wisa ku dibû muraqib
Rûhê wê dibû li cismê xalib

2415. Sir li cem wê dibûn eşkere
Nêçîr dikir li 'erşê Xuda

2416. Gava ku dîr diket ji 'alema heriyê
Xalib ku dibû li 'alema dil

2417. Qelbê wê pîrê ji ser lewhê mehfûz
Her lehze bi kişfî dibû xûyê par

2418. Eşkere dibû ji wê keramat
Dida zanîne xûyê meqamat

2419. Wê pîrê bi xewnê yan jî bi îlhamê
Wiha heqîqet beyan kir.

2420. Go: Çûme diyarê baxê Ridwanê
Min dît du hezar hûrî xulam

2421. Temam di qesrekî da xebatkar
Ew qesr temam ji durrê laîqê padişahan e

2422. Yekî mîna Bekir bi tac û binper
Sabit sekinîbû li ber derî

2423. Gopalekî ji xeyzeranê di dest da bû
Ema min nizanî ew çi kesî bû

2424. Min gote wî: Ey xudan meratib
‘Eceba tu xûyêyî yan dergevan î?

2425. Got: Ya şêx çima tu nizanî ez kê me?
Ez ew Bekirê ku dergevan im

2426. Ez muşterekê Mem û Zînê me
Lewra ez rûnîştîme li ber vî şîmîkê

2427. Ev qesra ku heşt tebeqê aşkar in
Yek ya min e heft tebeq yê wan in

2428. Ez evî derî emîn û mes’ûl im
Feqet ez di vî milkê da hissedar im

2429. Her çiqas bi şekl ez nûbedar im
Lê di mekanê da şerîkê wan im

2430. Min gote wî: Ey merivê ku ‘aqubeta wî rind
Halê ji min ra beyan bike

2431. Her çiqas kerema Xudayê ‘am e
Jî feqet bi çi terzî ev meqama da ne?

2432.(Bekir) Go: Ya şêx tu hêj nebûyî ‘arif

Ema di dunê da tu bûyî zana

2433. Ez ger çi bi xeber (zahirê) dujminê wan bûm
Feqet bin ezer (batinî) dostê wan bûm

2434. Min ewana li dunê parava kaş kirin
Min ewana hînê derd û êşandinê kirin

2435. Xweşî min ji wan der da
Min ewana hînê dax û derda kirin

2436. Ewqas min dane wan siyaset
Hetta ku bûn xûyî riyaset

2437. Lewra min ji zerara wan xeber da
Hetta ku min serê xu têda der da

2438. Ev herdu ‘alem bi hev ra hewî ne
Ev hewî zerera hev qewî ne

2439. Hetta tu yekî bernedî
Tu lezzetê ji ya dinê nabînî

2440. Ev dunya min li wan daye berdan
Min ewana kaş kirine ji ‘erdê bal asman a

2441. Min daye wan tamam cennetek î
Wan jî daye min ji baxê kerfêçek

2442. Şêx maye li gotina wî guh dayê
Got: Ey nebaşê ku ‘aqubeta wî xêr

2443. Ey Tacdînê ku tu kuştî bê sûc
Xuda wî ra çi hazir kir?

2444. Got: Cenabê Barî (Xuda) ew 'efû kir
Bû cennetî û neçûye cehennemê

2445. Çêkirê xerabî û nabaşî
'Efûkar e ew cennetî nivîsî

2446. 'Alema bi destê xerabiya min
Bêzar kiribû fesadiya min.

2447. Wî (Tacdîn) ez kuştim ji bo întizama 'alemê
Ji bo rahetiya 'ewamê 'alemê

2448. Li zahir eger çi qebahet kir
Di batin da ew qebahet bûye rahetî

2449. Hinek şuxl hene ku zahiran xerab in
Hinek kirin hene di sûretê da rast in

2450. Yek 'edl e di sûretê cefayê da
Yek qehr e di kincê wefayê da

2451. Feqet ew Xudayê ku perde kişandiye ser îşareta hikmetê
Bê hikmet ew xezîne nekiriye qismetê tu kesî

2452. Teqsîm nekir li tamamê însana
Ba'l xisûs daye dost û di nasan

2453. Ew sirra ji bo me me'lûm nekir
Hinek mehrem in (nêzîkî wî ne) hinek mehrûm in

2454. Sed şukir ez ê ku xerab im û Tacdîn
Tenê bi te'elluqa Mem û Zînê

2455. Mehrûm nebûn pir bi digel gunah
Bûne cihê zahirbûna rehmeta îlehî

2456. Ey dost bi dil bibe dostê qencan
Yan jî rind bibe dujminê qencan

2457. Ewana qenc in û qencyê dizanin
Ewana ji xeyrî qencyê nizanin

2458. Çiqasî tu cefayê li wan bikî
Ew bidil bikin wefayê

2459. Qet'a nebe dostê xeraba
Ne dost û ne dujminê kelban

2460. Eger bibî dost yê te mirdar (necis) bikin
Eger bibî dujmin yê te birîndar bikin

2461. Ev himmeta xasê 'aşiqan e
Ev mertebe riya sadiqan e

2462. Ew kesê wekî Bekir nebaş in
Kirinê wî tamamî neheqî ne

2463. Yan jî mîna Tacdînê xort
Qetilkar û dilawer cegerdar

2464. Yê bêne 'efûkirinê bi kerameta wan (ya 'aşiqan)

Yê bêne bexşandinê bi himmeta wan ('aşiqan)

2465. Quwweta wan yê bibe mededkar
Eteba'ê wan yê bike laîq

2466. Ev îşaret heqîqeta letîf e
Bizanibe vî nukteya rind

2467. Ey muderris vê meselê bizanibe
Ey muhendis vê mesahetê texmîn bike

2468. Weqta ku nesîbê dujmina di 'eşqê da hebe
Gelo dost yê mu'teber nebin?

2469. Wiha têkiliya reqîban
Gelo yê çiqasî bi bilindaya dost û yar a?

2470. Xasma ku muhib bibe mehbûb
Talibê heq jî bibe metlûb

2471. Birastî wiya tenê heq (Xuda) dizane
Qet xeyrê ji wî kesek heqqê nizane

**Îsbatê Xewas û Kemalê Cewherê 'Işq e Ku Kîmyayê Ekber û Kûkirdê Ehmer e Bo
Wicdanê Lewra Behîm û Dirrende û Şeytanî Dikene Milkê Nefsa Îsanî**

2472. Ey guhdarê rastiyê û virê
Ey muctehidê qiyas û ta'wîla

2473. Xanî ku ji şeraba 'eşqê dîn bû
Ew şeraba şor li wî şirîn bû

2474. Ew ê ku nehişyar e ji vexwarina şerabê
Agahî wî nema ji gotinê

2475. Serxoş e ma'mûrê bi kêfê ye
Dîwane ye ew bi 'urfê me'zûr e

2476. Sermest e, şerabxûr e, serxoş e
Lewra şerabfiroşe û şaş e (muşewweş e)

2477. Her tiştê ku (Ehmedê Xanî) dibêje ew hewa ye
Eger hûn guh bidinê ew dengê bilûrê ye

2478. Ew bilûr ne helal e û ne heram e
Bêtebet e feqet ne bêmeqam e

2479. Kurdî û 'Erebî û Derî û Farisî
Gihande hev bi laqirdî û lîstik

2480. Hinek ji efsaneyê Bohtanê ne
Hinek delîl in, hinek vir in

2481. Bohtî û Mehmedî û Silîvî
Hinek le'l in, hinek ji zêr û zîv in

2482. Morî û cewher û lû'lû'

Hinek şefaf in û hinek tarî ne

2483. (Xanî) Ewana gihandine hev wekî biçûka

Anî bal çarşî û bazaran

2484. Hinek qisse ne û hinek ji wan misal in

Hinek heram in û hinek helal in

2485. Her qisse ji hisseyê xûyî par in

Her misal eger tu bizanibî we'z in

2486. Feqet xereza wî ji vî gotinê

Û meqsûda wî ji behs kirinê

2487. Zahirkirina cemala 'eşqê

Sabitkirina kemala 'eşqê

2488. 'Eşq neynik e, Xuda nîşan dide

Wekî rojê rewneqdar e

2489. Xafil mebe ji 'eşqê heqîqet e

Ey rêwiyê terîqeta nêzîk

2490. Cewhereka rind e ji cinsê kîmyayê ye

Qedrê wî bizanibe, giranbiha ye

2491. Tebî'etê ku wekî paxir e, bê cila ne

Qelbê ku wisa qelp yan jî qela ne

2492. Ev ('eşqa) cewher e wan (tebî'et û qelba) avzêr dike

Ev ('eşqa) seyqel e wana dîke safî û berraq

2493. Her çî kesî ku tiştêkî bixwaze
Yan ew 'eşqê dixwaze yan jî 'eşq ew î dixwaze

2494. Neynika 'eksa sûreta bêmisal e
Xezîna sîrrê bêzewal e

2495. Kes nîne ku jî 'eşqê bêta' sîr be
Feqet mimkune ku jî zewqê bêxeber be

2496. Herkes bi qasî himmeta xu
Yê serf bike îrada xu

2497. Feqet zehfê însana nezan in
Nefsa xu jî bo xu ra nizanin

2498. Ewana 'aqil zeîf in û ehmeq û sefîh in
Yan zahid û sofî û feqîh in

2499. Ewana cahil in 'ummî ne sefîl in
Bêmurşîd û bêrehber û bêdelîl in

2500. Mecbûrî 'eşqê difroşin
Pereyê xu serfdikin di rindiya windabûyî da

2501. Hinek serfdikin di heyata dunyayê ra
Hinek pê serayê axretê dikirin

2502. Ev herdu qisim dibin ziyankar
Mehrûm dibin jî zewqa dîtinê

**Beyanê Meratib û Medaricê Sulûk û Wusûlê Îlallah e we Merasimê Fenayê Fîllah
û Beqayê Bîllah e**

2503. Ya şerabdêr were bibêje min çi reng e?
Ev ‘alema xeyal e yan xewn e?

2504. Te’bîr neke ew betal e
Teswîr neke ew xeyal e

2505. Ewwel ger çi rengê heyatê ye
Axiriya heyata wî mirin e

2506. Ye’nî ew hebûn bê hebûn e
Xweş çêkiriye heyf ne daîmî ye

2507. Eflak û ‘enasir û mewalîd
Exlat û tebayî’ û kilîd (ya xezîna asmana û ‘erda)

2508. Temamê wan ‘ecêb in di îştirakê da
Temamê wan zû ji hev diqetin

2509. Ser tayê cewhera beqayê ne
Sermayeyê ‘illeta fenayî ne

2510. Hinek giran in û hinek sivik in
Hinek veşartî ne, hinek letîf in

2511. Gerçi ew ji bo me ‘esl û ‘esas in
Her çar ji bo me ‘insur in

2512. Eger agir damire hewa pûç dibe
Eger av biçike ax dibe toz

2513. Felek mîna aša ne
Daîmî ye bi çerx û dewranê

2514. Dexlê wî aşi însan e
Yê têkeve binê ‘erdê mîna arê hûr

2515. Ew heba bi dor li pey hev
Daîmî dirijin ji devê çîwalê

2516. Herçi rijîya dibe parçe parçe
Ew ji hev diqetin û tînê hêrandinê

2517. Dîsa hevîr dikin ji nû ve
Ew qalib qelb e ku qabile ji bo agir

2518. Ewqasî dikşîne ew siyasetê
(Qelb) Razî ne bi merteba necasetê

2519. El hasil ne mirî ye ne sax e
Bi hesebê ayeta “la yemûtu yehya”

2520. Îlla ewî ku qedirgiran û xûyê xulqeta tahir
Ye’nî ew nufûsê temîz exlaq in

2521. Cotkar bi xusûsî ewana bijbêre
Wî (hebî) bi xusûsî biçîne

2522. Ew (heb) hetta nerize helak nabe
Hêşîn nabe, qenc pak nabe

2523. Dema ku ew (heb) gihişt û goşî girt

Wî dikutin da ku bibe zad

2524. Aşê dev û çeqçeqa ziman

Ava dev û kevrê dirana

2525. Ewana ewqasî ewî (hebî) dihêrin

Ewqasî di şehrê cendek da digerînin

2526. Ewqasî ev pale ewana dikutin

Hetta ku hûr bibe wekî ar

2527. Wel hasil ku piştî wan cefayan

Ew ê têkeve bin teserrufa quwayan

2528. Carna quweyê cazîbe kaşî bal hindir dike

Carna quweyê maske digvêşîne û diêşîne

2529. Hinek zemana quweyê hazme ew î hazm dike

Hinek zemana quweyê dafi'ê ew î hebs dike

2530. Tendûra me'deyê wî dipêjîne

Her tiştê ku xerab e jî hirdişîne

2531. Bilind dike tiştê letîf û nazik

Berjêr dike tiştê kesîf û six

2532. Paşê herçiyê naziktir in jê cuda bikin

Ji hev biqetînin bela bikin

2533. Yê dipêjîne herareta tebî'ê

Yê boyaxê dike û yê vediqetîne tiştê temîz

2534. Wana teqşîm dike li cism û ‘uzwan
Yê te’mîr bibin temamê cihet û erkanan (‘uzwan)

2535. Dîza cigerê û dilê şûşeyê
Dilop bikin şeraba mizacê

2536. Hasil xûhdana şeraba heyatê
Dilopkirina bû wekî nebatê

2537. Hêja ji eşkere bûna van tiştan
Bû laîqê ‘alema zikan

2538. Carna nûq dibe di behra avê da
Muddetekî rengîn dibe di avê da

2539. Muddetekî bi hev tê girêdan ji bo bigihîjine hev
Şekl digere bi nezm û tertîb

2540. Terkîbkirin ku bû mîna mircana
Bû qebûlkirê rewneqa can

2541. Ew rûh çî ye? Xûna qelbê nebatê ye (ye’nî xulasa nebatê ye)
Ew xûna qelb menşa heyatê ye

2542. Gava ku wisa di zik da disekine û dimîne
Ew bêdeng e û xwarina wî xûn e

2543. Weqta ku ji zeviya veşartî
Ew çêreya kesk taze çêbe

2544. Yê weqt bi weqt bi xûnê
Bê av dayîne piştî bûyîne

2545. Baran bi alîkariya Xudê nebe
Ew heb yê bibe dara xurma bê mêwe

2546. Ew çêraya kesk yê ji belg û mêwan
Eger li ser birije barana feyzê

2547. Ew çêreya kesk ku bûye dareka teze û bilind
Serxoş dibe ji ber mêweya xweş

2548. Ew mêwe weqta gihişte kemalê
Dibe mezher ji bo şu'le ya cemalê

2549. Eger laîqê 'izzeta Emîr be
Eger munasibê hizûra Qedîr (Xudê) be

2550. Wî hildidan ji bo hediye yê
Bê wasite dibin meqamê 'alî

2551. Derhal ku çû dibe mehbûb
Navê wî li wî dibe meczûb

2552. Ev darê xurma zehf in çiqîlê wan
Feqet zêde kê m e peydabûna wan

2553. Eger (mêwe) wiha bimîne ber hewayê
Ewê here cîhê cefayê

2554. Lazim ew e ku xûyîkirinê bibîne
Terbiyeta laîq hilîne

2555. Carna gihişte li ber tava şerî'etê

Carna şewitî bi hîva teqwayê

2556. Gava pijiya gihîste kemalê
Weqta rijiya ji ser çiqîlê

2557. Hetta nekeve ji jora 'izzetê
Hetta negihîje xûliya zilletê

2558. Ew nabe salikê terîqî
Wê nabine me'sera heqîqî

2559. Bi vî şeklî dest bi dest di rêda
Mertebe bi mertebe bi wê (rê) va

2560. Lazim e ew mêwe bi derbeyeka mezin xurt bixwe
Ew loqme xweş bibe şerbet

2561. Ew şerbet eger şîrîn e xam e
Eger tehl û tirş be ne tamam e

2562. Hetta bi destê pîrê şerbaxwer
Bê bikele di kûpê mezin da

2563. Gava ku di wî (kûp) da kel bi ser keve
Weqta ji kûpê mezin derkeve

2564. Ye'nî ji zehfbûna sifatan
Ew bipêçe tecelliyatan

2565. Hasil ji germayiya cemalê
Xulase bi qeweta celalê

2566. Cewherê ku bi tamamî winda bibe
Mîna 'erezê enfa'l bike

2567. Germahiya wan tecelliyatan
Ewanê ku dişewitînin û qewetê didin...

2568. Berjêr bikin ji wî (ji şerbetê) tozê
Hevraz bikin ji wî bûxarê

2569. Xalis ku bibine piştî hevrazkirinê
Hêja diçine meqamê tecrîdî

2570. Cewher ku ji 'erezê biqete
Wî datînin poteyê

2571. Ew pote gerçi teng e
Wekî sehayê fenabûna dilê fire ye

2572. 'Eynî mîna surehî û qedehê
Hema wisa sor e yan al e.

2573. Hê nebûye mîna şeraba mextûm
Hê neçûye bal meqamê me'lûm

2574. Muddet ku jêra hebe hebûn
Nîne ji wî ra 'elametek ji Xudê

2575. Bê qedeha wefaya şahî
Ew naçe bal meşreba îlahî

2576. Zemanê ku fanî nebe bi fenaya mutleq
Ew nabîne baqî mayîna bi'l- Heq

2577. Fanîî ji bo wî baqîî ye
Baqîî ji bo wî ghiştin e (çûyîna bal Xuda ye)

2578. Lêbelê (dîdara wî) ne bi şeklê ghiştina hev e ne jî bi şeklê ji hev
qetînî ye
Belkî ne bi şeklê ji hev qetînî û îtlaqê

2579. Bi vî şeklî mirad hasil dibe
Wî çaxî murîd dibe kesê ghiştî

2580. Ya Rebb çi dibe eger li ber me kora
Carekî tu rakî van perde û tora

2581. Biçav bikî mey ê 'aciz
Bêperde û bêhicab û haciz

2582. Behra yeqînê pêl bide
Em jî qederekî temaşe bikin

2583. Ev zen û guman û 'ilm û teqlîd
Biguhurîne bi 'eynê tewhîdê

2584. Esbab û wesîle qet nemînin
Carekî te musebbeb bibînin

2585. Îmana me bi Zatê Wacib heye
Madiyaheta me bûye perde

2586. Dîsa tu me ji nefsa me bidî xelaskirinê
Ya Rebb me ji bo xu ra bikî xwenas

2587. Ev seyr û sulûk û pêçandina menzilan
Xas e ji bo murîdê hatî

2588. Kengî ew a ji me ra muyesser dibe
Xaliq ku ji ezel da muqedder nekiribe

2589. Lewra ku xerabî û qencî
Nînin bi 'emelê pak yan ne pak

2590. 'Abid bi sebebê riyayekî helak in
Gunehkar bi du'ayekî pak in

2591. 'Alema ku wekî xeyala sipî ye
Sani' bi xu hadî û muzel e

2592. Ew a tîne bal menzera xeyalê
Ew datîne perdeya delalê

2593. Feqet daye me cuz'ê ixtiyarî
Lê nefsa me bi xapandin û hîlekarî

2594. Ew (cuz'a) ji destê me biriye mecbûrî
Em mane û lutfâ Xudayê mededkar

2595. Lewra qenc e ji bo me 'amiyan ra
Her ev bes e ji bo me gunehkaran ra

2596. Ewwel va em Xudayê xu nasbikin
Herçiqas qusûr û kêr û bêxîret in

2597. Paşê bi dilê xu jê (ji Xudê) bitirsin
Dînê xu ji 'alima bipirsin

2598. ('Alim) Çawa ku dibêjin em wisa bin
Hetta ku ji rûyî dinê fena bin

2599. Pişta xu bidine lutfa Barî (Xudê)
Belkî me xelas bike ji agirî

**Xatemiya Kitab û Nameyê Di Sûretê Xitaba Digel Xameyê Herçend Xerezê Xetmê
Kalam e Lakîn Li Mutekellimê Îham e**

2600. Ey sîwarê ku di rastiyê de peya ye
Ey 'aşiqê sehîfa sade û sipî

2601. Ey şa'irê zelîl û serberjêr
Ey sahirê qirfok û efsanebêj

2602. Ey şaşbûyê newala delalê
Ey ji rê derketiyê de'waya kemalê

2603. Ey qelema ser tiraşkirî ya rengê ne xweş
Bes e îdî wan nameyê xweşqumaş û xweşreng

2604. Bi navê xet û xalan rû reş ke
Navê xerab bike bi bê û dal an

2605. Weqta ku xet xubarî û hûr e
Ew xet ji rindayî ne dûr e

2606. Gava ku ji rengê meşqê pîr be
Yan jî mîna xet nesx û sulisê gir be

2607. Ew xettat nusxeya cemalê
Bê rewneq û rohnî û kemalê

2608. Lazim ew e dilberê sade
Xet lê bibe wekî gerdanê

2609. Xweşzînet e xet li hîva rû
Muddetê ku li rûyan nebûye hefsar.

2610. Ey qelem te gelekî dirêj kir
Ev kitaba bes e te pir qirêj kir

2611. Her çiqas kelimê wekî dur be
Bê qîmet dibe dema ku pir be

2612. Gelo tu nabînî cewher bi qîmet in
Lewra ku hindik in û kê m in

2613. Seh w û xelet û xeta û bîr kirin
Temam tiştê pîs û guneh

2614. Te top kiriye bê ta'mul
Ka kê wana pêş te va hilde?

2615. Kes nîne bike ji bo te tehsînî
Bibêje aferîn û nifrînî

2616. Ey bê edeb, xerabe, bê'ar
Nebaş û zalim û fâsiq

2617. Min çiqasî serê te qelem kir
Te ewqasî xet şaş reqem kir

2618. Çiqasî min serê te tiraş kir
Tu ewqasî reviyayî bal guneha

2619. Te nerindî kir mîna Xanî
Te neqş kir mîna Manî

2620. Îdî bes e bi lîstik û lehwan

Tobe bike ji xetayê xu û sehwan

2621. Carekî were li ser riya tobê
Hê ku negihîştiye te nobet

2622. Nobet ku ghişte xesmê xam e
Pêça (qelemê) li me ew şikayetname

2623. Ew qehreman û dilawer û xort
Ewwel kemera cesaretê girêda

2624. Bûye siwarê Duldulê tilî û pêçiya
Derhal derketiye pêşberî me

2625. Kîşand ji zimanê Zulfiqarek
Bû xismê me ew sersiwarek

2626. Lerizî û ricifî ji wan 'îtaba
Ziman geriya bi wan cewaba:

2627. Go: Ya Ehmed eger tu xebîs nînî
Herçi te got min ew nivîsîn

2628. Qewlê te qenc yan xerab be
Kirinê te xeta yan rast be

2629. Ey pîs 'emelo tu qenc dizanî
Tu qaîl û faîl û xudanî

2630. Bilûr bûm di 'alema baxê qamîşa
Şerab bûm ne bi destê şerabxwera

2631. Gava ku te ez birrîm ji sazê qamîşa
Ne deng ne jî gaziya min hebû

2632. Te ez dûr kirim ji cem hevalan
Te ez dame terkkirinê ji milk û malan

2633. Bend û giliyê min te ji jorê hetta jêrê
Te qûlkin bi emrê (kun)

2634. Paşê weqta ku te kir di baxê 'eşqê
Dilê min bi daxa 'eşqê qûl qûl kir

2635. Te rûh pif kiriye di cismê min da
Hatiye ji dilê min ah û fixan

2636. Pifa te dil û cegerê min şewitandine
Herçi ku te pif kirî, min ewa got:

2637. Ez lal im, bêziman im, di sikûtê da me
Bênefs û nefes ji qismê qamûş im

2638. Meclisa kêfê te bi min xweş kir
Dîwana guneha te bi min reş kir

2639. Gerçi bi zahir ez heme
Yê li sazê dixê tu yî ez jî wekî neyê me

2640. 'Eceba ney bi xu tiştêkî dibêje?
Qelem bi xu qederek ji hibrê dirêje?

2641. Katib qelemê dike gunehkar
Ney ji destê şexsê dike hewar

2642. Ney û qelem û hibr û nîşan
Tîr û hedef û kevan û kîsê têra

2643. Hukum li ser wan hatiye kirinê di teqdîrê da
Hêj nav guneh nehatibû nivîsandinê

2644. Ya Rebb tu dizanî Xaniyê jar
Wekî qelema esîr e

2645. Qelbê wî di destê te da ye heqîqeten
Destê wî di destê xu da nîne mutleqa

2646. Gava ku te li wî ser qelem kir
Herçi te îrade kiriye ewî nivîsiye

2647. Tu amir î, ew ma'mûrê bi emrê te ye
Daîmî ma'mûr xûyê 'uzrin

2648. Gerçi te daye wî ixtiyarek
Ew î jî ewa spartiyê te bi carek

2649. Ew eger însan bû yan jî qelem bû
Ew daîmî metî' emrê te bû

2650. Ew nizane menfa'et û zerera xu
Yê çawa bizanibe çi tişt jêra xêrtir e?

2651. Çawa ku ji bo te riza ye
Ew wekî neyê ye li gorî meqama ye

2652. Wellah ji sipîtî û reşahiyê (xêr û guneh)

Qesd û xereza wî tu yî ya Îlahî

2653. Emma ewî bi hibra nerind
Gelek sehîfe rûreş kirine

2654. Xettê te ye destûr ji bo nivîsandina min
Ew sî sal e xet şaş dinivîse

2655. Lewra ku weqta ji xeybê vebû
Tarîx hezar û şêst û yek bû


2656. Îsal gihişte çil û çaran
Ew îmamê gunehkaran

2657. Top kiriye ji gunehan gelek mal
Yek pûl tune ye ji ‘emelê rind


2658. Çawa ‘eşq dayê cara pêşîn
Wisa qenciyê lê bike cara paşîn

Pêvek 3

Mela Mûsayê Celalî û Çend Wêneyên Destxetên Wî




Pêvek 3.1. Destxeta Mesnewiya Mem û Zînê ya ku Mela Mûsa Şerha wî kiriye.




Pêvek 3.2 Pirtûka Mem û Zînê ya ku Mela Mûsa Şerha wî Kiriye.

وَالْمَعْقُوبُ بِاللُّهْمَةِ الْكُرْمَانِيَّةِ
 أَوْ حُرّاً رَكُومَهُ إِزْ رَوِي بِحُوثِ كَرِيهٍ أَوْ نَقْشِكَا بِجُوكِ. لَكِنْ مَقْصِدُ وَ مَعْنَا وَى
 كُورِهِ. بَا رِيَّتْ أَكْرَهُ. انْشَاك د ظَاهِرِدَا بِجُوكِ نَشَانِ دَايِهِ. أَوْ د حَقِيقَتِي دَا نَقْشِ
 كَلِمَا مَرُورِهِ. د رَوِنْدَا عَالَمَا شَهَادَتِ وَعِيبِي هِيه. هَم د رَوِنْدَا مَرْتَابِي وَ نَقْضَالِي هِيه.
 انْشَاك ظَاهِرِهِ. بِي نَحْسَبِ بِحَسْبِكَ خَوْه. نَوْرِهِ بِحَسْبِ رُوحِ خَوْه. آدَمِ نَبِيْرِكِ تَبِيه. ن
 رُوحِ خَوْه دَوْرِهِ. وَ كِه بِحَسْبِكَ خَوْه.


Pêvek 3.3. Beşek ji nav Şerha Mem û Zînê




Pêvek 3.4. Wêneyekî Mela Mûsayê Celalî




Pêvek 3.6. Destxeta Nehçûl En'am a Mela Xelîlê Sêrtî ya ku ji Aliyê Mela Mûsa ve Hatiye Şerkirin.




Pêvek 3.7. Destxeta Şerha Newbihara Biçûkan a Ehmedê Xanî



Pêvek 3.8. Destxeta Şerha Mewlûda Kurmancî ya Melayê Bateyî



Pêvek 3.9.Di Medreseya Mela Mûsa de Feqiyên ku Ders Dîbînin.

<p>بیتا دعوتی</p>	
<p>کلی ملت کلی ملت ، وارزی بیعتن درین صیرت طریق دارا کرنه دعوت ، وستی حرامی حقیقه عادت</p>	
<p>منک صومنی شاشاک صیره ، کتک طریقتا بیخمشیره خداا بیرکرته دودرک پیره ، صومیا کتک کرته پیره</p>	
<p>مال راندنا توی وئو برونک ، ناقوسین و روی خدایین یکنه دود ران بیویه دیا نرونک ، دیشاک شیطان لایق کالیکه</p>	
<p>کلی کرمناج کلی کوردی ، و یو دنیایین لایق بستر خیرا وه بیاک دوزخاندی ، بیارک شه بمانی یه شه</p>	
<p>ای شالیم و خدایا بگوین ، دودن دیکه دعوت برون نه کورله و یو توشی ، صبرنامه من بعد انکم درین</p>	
<p>ای طلال منی بجزی ، صومیا کتک کرته پیره نه هر خدایا کتک کرته پیره ، دودن دیکه دعوت برون</p>	
<p>دودن دیکه دعوت برون ، دودن دیکه دعوت برون خیرایی بره منی ، دودن دیکه دعوت برون</p>	

Pêvek 3.10. Beyta De'wetê ya ku di Pirtûka Mewlûdê de Cih Girtiye.